DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

**https://rantey.org**

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

roman

**MEHMED UZUN**



# Hawara Dîcleyê
# 1

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Hawara Dîcleyê
# – I –



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Hawara Dîcleyê
# – I –

**MEHMED UZUN**

NEFEL
Stockholm
2003

www.nefel.com
info@nefel.com



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

**Mehmed Uzun:** Hawara Dîcleyê – I –

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Mehmed Uzun û Nefel

Çapa dîjîtal: 2003
ISBN: 91-89687-13-2

Grafîka pirtûkê: Nefel
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Zerya, keça min*
*Alan, kurê min*
*Çaxê umrê min di umrê we de bû,*
*dengbêjên mîna Biro hebûn ko bi dengê xwe*
*ruhê me terbiye dikirin. Ew êdî neman...*
*Hûn ê hew bikaribin li kêleka wan rûnin*
*û li dengê wan guhdarî bikin.*
*Bi hêviya ko hûn bikarabin dengê wan*
*tê de seh bikin,*
*ez Hawara Dîcleyê yadîgarî we dikim...*

**MEHMED UZUN**


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Sonus est, qui vivit in illa...*
*Dengek, tiştê ko li pey wî/wê maye, aha ev e, dengek...*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Rêza yekemîn a vê romanê 28-ê adara 1985-an, lî Sûriyê, bajarê biçûk û şêrîn ê Derya Spî Baniyasê hate nivîsîn. Ez li mala neviyên Mîr Bedîrxan, Celadet Alî Bedîrxan û xanima wî (herweha dotmama wî) Rûşen Xanimê bûm. C. A. Bedirxan, ji mêj ve, 1951, wefat kiribû. Lê li her aliyê malê şopên wî yên jîndar dixuyan. Rûşen Xanim ko hingê umrê wê nêzî heyştêyî bû, li malê, bi xatire, bîr û siya Bedirxaniyan dijiya. Ez li wir bûm, – ji ber ko min dil hebû jiyana Mîr Bedirxan biqulibanda ser romanê. Ma ji bo vê yekê, ji wê mala kevnare ko di nav pêlên tarîxa do de bû, çêtir cîh hebû?

Belê, rêza yekemîn a vê romanê li wir hate nivîsîn, ji devê Mîr Bedirxan, bi nefesa wî. Lê ji navberê wext bihurî, dewr û dewran derbas bûn. Min sê romanên din nivisîn, – ko ji wan *Bîra Qederê* bi deng û nefesa neviyê Mîr Bedirxan, C.A. Bedirxan hate hûnandin.

Havîna 1994-an, roja 17-ê tebaxê, pismamê min Yilmaz Uzun li dora çiyayê Cûdî hate kuştin. Yilmaz, yek ji şervanên bijarte yê tevgera kurd bû. Ew bi qasî yanzdeh salên ko her rojeke wan bi lêdan, heqaret, şikence, birçîtî û kirêtiyê tijî bû, li girtîgehên eskerî yên Turkiyê ma, piştî ko ew ji girtîgehan derket, wî xwe spart çiyayên devera Botanê û tevî hevalên xwe, tevî serhildana çekdarî bû. Û ew li wir, nêzî çemê Dîclê, li serê çiyan hate kuştin.

Dotira rojê, nîvê şevê min xebara mirina wî bihîst. Ez ji tecrubeyên xwe dizanim, telefonên ko nîvê şevê tên, ne telefonên xêrê ne. Nîvê şevê telefon lêket, dostê ko ji Turkiyê telefon dikir, xebara nexweş bi min gîhand,: »Yilmaz hatiye kuştin... pêşî ew hatiye girtin û paşê bi şikence bedena wî lîme lîme bûye, guh, bêvil, dest, mil, pî, ling, hemû bedena wî perçe bi perçe jêbûye, heta ko ew hêdî hêdî miriye...«

Wê şevê, heta sibê ez li oda xwe ya xebatê rûniştim û li Yilmaz fikirîm. Li zaroktî û xortiya wî, li dê û bavê wî ko umrê xwe li ber deriyên zîndanan derbas kirin, li kekê wî ko Yilmaz hê zarok bû, hate kuştin, li herdu birayên wî yên din ko pê re li zîndanan bûn û xwehên wî ko li welatê xerîbiyê bûn, li têkoşîna wî ko hema çi bigire her roja wê bi xwîn, xwîdan, jan û keserê tijî bû, li mala wan a fireh, li rûyê wî yê ronî, bejn û bala wî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ya dirêj, meş û gotinên wî yên qehîm... Li qedera wî ko kêm-zêde, ji mêj ve ye, qedereke giştî ya navçê ye. Li şerê welatê kurdan ko kêm-zêde, ji sed û pêncî salan û vir ve, bixwîn, bi trajediyeke bêpayan dubare dibe û dewam dike.

Li ber destê sibê, gava çirûskên dawîn ên stêrên şeva ronî jî çûn ava, min li ser kaxizekê navek nivisî; Biro.

Biro, navekî bi du manan e, du kahniyên wî hene. Kahniya yekemîn Hezretî Brahîm e ko bi sebr û hêza xwe ya liberxwedanê nas e. Biro, kurtebiriya vî navê pîroz e. Kahniya duwemîn jî bira ye, yan jî birader.

Ew gotina ko min wê şevê nivisî, Biro, hêdî hêdî, bi wextê, qulipî ser dengekî. Dengekî ko nîvê şevan bi hêdîka dihat û li ber guhê min, mîna pejneke sivik a bayekî sivik, bang li min dikir; »li min guhdarî bike, guh bide min... li dengê dengbêjan, li dengê Dîclê, li dengê hez û evînê, şer û pevçûnê, kîn û nefretê, îxanet û hesûdiyê, hêvî û têkoşînê, afirîn û hunerê guhdarî bike...« Bi vî terhî deng jî, bi wextê, bû şexsiyetek. Navê ko min nivisîbû, dengê ko bîr û heşê min vedigirt, bû şexis, şexsiyet, huwiyet û leheng. Lehengê romana Hawara Dîcleyê... – tevî Mîr Bedirxan û lehengên din. Gotina wê şevê û dengê şevên din bûn rêz. Rêz bûn rûpel, rûpel jî defter. Romana ko min dil hebû binivîsanda û gotina wê ya yekemîn li Baniyasê hatibû nivisîn, kete ser riyeke din. Min ew pêncî, şêst rûpelên ko hatibûn nivisîn, danîn aliyekî û rê da Biro da ko ew gotina xwe bibêje, rê li ber xwe veke.

Carina şexs, leheng, bûyer an jî pêwendiyên romanekê zora nivîskarê/a romanê dibin, xwestekên nivîskar diguherînin û bixwe rê li ber xwe rast dikin û romana xwe dihûnin. Di romana Hawara Dîcleyê de jî weha bû. Dengê ko hûn ê di vê romanê de bibihîsin, dengê Biro ye, gotina ko hûn ê bixwînin, dîsan, gotina wî ye.

Biro kî ye? Dengê Yilmaz ko di nav dewr û dewranan de, mîna bayê hûnikê keleberbangan, digere û do bi îro, îro bi do digihîne? Dengê yek ji bapîrên Yilmaz ko di nav şerên xwîndar ên eşîran û osmaniyan de jiyaye? (Navê bapîrekî Yilmaz, ji çar bavan, Biro bû, Biroyê Dirêj.) Dengbêjekî ji dema Mîr Bedirxan ko wê dema tijî xwîn, xwîdan, keser û jan vedibêje? Dengekî ko ketiye dewsa Mîr Bedirxan? Dengê qederekê ko ji du sed salan û vir ve hertim dubare dibe?

Biryar, ya we ye. Lê belê Hawara Dîcleyê bi dengê Biro ve hatiye pê. Herçî tiştên ko min lê zêde kirine, ne zêde ne: Hin agahiyên ko dengbêj û vebêj jê hez nakin, mixabin, pêwîst bûn. Min ew, mîna notan, li dawiyê

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

li dengê Biro zêde kirin. Min şevbuhêrkên Biro yên balkêş, hinekî, ji hevûdu veqetandin, vegotin û serpêhatiyên wî ko carina tevlîhev dibûn, serrast kirin û ji bo her şevbuhêrkekê ko çêla dewr û dewranek dikir û ji gelek şevan dihate pê, serenavek û hin jimare danîn, – da ko dengê Biro zelaltir û rasterastir bigihe we. Mîna hemû dengbêjan serê Biro jî bi navên xerîb, bi tarîxên bûyer û qewimînan ne xweş bû. Lê belê ji bo vegotineke serast nav, tarîx, cîh pêwist bûn. Ji lewre min secereyeke weha, tevî nexşeyeke Mezopotamyayê, xiste dawiya vegotina Biro. Di vegotina Biro de gelek tişt, nav, cîh, gotin, term, cimle, bûyer, zahf caran, bi heyecan û germahiya gotinê, dubare dibûn. Û gelek sifat li pey hev rêz dibûn. Min ew hemû, bêyî ko ez vegotin û ûsluba dengê Biro xera bikim, gelekî kêm kirin.

Fermo, rûpelê biqulipînin û li dengê Biro guhdarî bikin...

**MEHMED UZUN**



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Qendîl

We xwest, ez ê jî bibêjim. Qendîlê pêxin û li dengê jibîrbûyiyan guhdarî bikin.

Heke gotina min we netirsîne, heke hûn ê heta dawiyê lê guhdarî bikin, hingê, berî her tiştî divê ez bibêjim ko gotina ko hûn ê niha lê guhdarî bikin, gotina jibîrbûyiyan e. Dengê hûn ê bibihîzin, dengê însanekî jibîrbûyî ye ko di wextê xwe de dengê însanên jibîrbûyî bû.

Ji bîr mekin; ji-bîr-bû-yî...

Berî ko hûn bipirsin, ez bibêjim we ka jibîrbûyî kî ne.

Jibîrbûyî, ez im; Biro, Biroyê Dengbêj, yan jî em bibêjin, Biroyê Êzîdî, yan jî Biroyê Kor, yan jî Biroyê Dirêj.

Jibîrbûyî, Ester e; Estera ko min jê re digot, Stêr, an jî Estera file, keldan, nastûrî, yan jî Stêra ezîza ber dilê min, roniya çavê min, Ester, sêwiya zarşêrîn e zarwinda, bejn û bala lihev...

Jibîrbûyî, Mîr e. Mîrê Cizîra Botan, serekê Ezîzan, an jî Mîrê serhildana kurdî, yan jî Mîrê nefîkirî, yan jî Bavê Têlî, Têliyê kor ko hevalê min e. Jibîrbûyî, Stephan Manolgiyan e, ko min jê re digot Mam Sefo, aqilmendê Mîr, alîmê ermen ê xwediyê kitabxana yekta, bavê Migirdîç ko hevalê min bû û min jê re digot Migo, bavê Armêya bextreş ko – heye – ez bûm sebeba mirina wê û mêrê Senemxana dîndar ko bi emrê Xwedê serê xwe danî ser axa rehmetê.

Jibîrbûyî, Apê Xelef e, şivanê yekta yê hemû Cizîra Botan, bilûrvan û dengbêjê zarotiya min, terbiyedarê ruhê min, bavê Heme ko hevalê min bû, ko navê xwe kiribû Malmîran û me, min û hevalên din jî Malmîrana wî kiribû, Malwêran. Û bavê Gulîzera reben ko li ser riya me ya koça bêdawîn winda bû.

Jibîrbûyî, êzidî ne, ko bav û kalên min in, ko hertim li serê çiya û newalên kûr ên welatê êzidiyan, tên kuştin, hertim ferman û talana wan radibe, ko ji tirsan nikarin danê sibê û danê êvarê, rûyê xwe ber bi tava rojê bikin û dua û ayetên xwe bideng bixwînin.

Jibîrbûyî, suryan, keldan û nastûrî ne, ko bav û kalên Stêra min a gor-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

behîşt in, ko nikarin li welatê xwe yê bav û kalan, rehet, azad û serbest li tîrêjên berbangan ko li milê rojhilatê Dîcle, Zab û Xabûrê hiltê binihêrin, li esmanên çikî sayî yên şevên Mezoptamyayê temaşe bikin.

Jibîrbûyî, ehlê Cizîra Botan, însanên Hekaran, xelkê Mikus, Wan û Serhedan in ko li dijî hevûdu, li dijî eşîrên cîran, eqeliyetên pismam, li dijî dewleta Osman û dewleta Farisan, li dijî hemû dinyayê şer dikin, heyata wan bi şer dest pê dike û bi şer kuta dibe û hertim tên xapandin, qirkirin û koçkirin.

Jibîrbûyî, mal û malbata Mîr, law û keçên wî, bira û birazî, xal û xwarziyên Bedirxaniyan in ko nîrê Osmaniyan û zîziya welatê xerîbiyê bûye qedera wan.

Jibîrbûyî, biraziyê Mîr Yezdînşêr e ko şopa umrê me da ser riya welatê xerîbiye; mîrê Hekaran Nûrilah Beg û ehlê wî, mîrê Mikusê Xan Mehmûd û ehle wî ne, ko tevî me ketin ber pêla welatê xerîbiyê û li wan deran ji bîr bûn.

Jibîrbûyî evana û kesên din in ko ez ê ji we re, ji pêketina qendîlan heta vemirtina wan, carina kite bi kite, carina di ser re, qala hal û hewal, coş û hêvî, jan û keserên wan bikim.

Hûn ê niha bipirsin ka ev însan çima jibîrbûyî ne. Ez bibêjim we; ev însan jibîrbûyî ne, ji ber ko bindest in, biserneketine û têk çûne. Bindestî, malwêranî ye, zimanê însanê bindest qifilkirî, destê wî zincîrkirî ye, ne dikare bibêje, ne jî binivîse. Biserneketin, mîna birîna min, birîneke xedar e, ko hêdî hêdî birîndar dikuje. Gotina însanê biserneketî, hêdî hêdî, winda dibe, heyata wî, dewr û dewrana wî dikeve ber pêlên wextê û dibe hîç û pûç. Ne gotineke însanê biserneketî dimîne, ne jî tarîxeke wî. Têkçûn, jixwe ji nav diyar e, mirin e. Dengê însanê mirî nayê bihîstin, nefesa wî nayê hîskirin.

Heke hûn bipirsin ka ez kî me, ez ê bibêjim ko ez, yek ji van însanan im, însanekî ji însanên bindest, biserneketî û têkçûyî.

Gotina min, gotina wan; dengê min, dengê wan e.

Ez, Biroyê dengbêj im, ez ê heyata wan, jan û kesera wan, hêvî û xwesteka wan ko di nav dengê wan ê windabûyî de veşartî ye, ji we re, bibêjim.

Umrê min ê ko niha êdî bi gavên lez ber bi qonaxa dawîn dere, eger ez ne şaş bim, kêm zêde, li dora pênceyî ye. Di vî umrê kin – heye ko dirêj – ê teres de, min gelek tiştên xweş-nexweş, rind-kirêt dîtin, pêrgî gelek tiştên ecêb ko min hîç texmîn nedikirin, bûm. Mîna vî çemê Dîcleyê, min jî şahidî li best, daxwaz, hêvî, dilşikestin, jan û keserê kir. Mîna


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

pelekî tenik ê rihanê ko ketibe ber pêlên Dîcleyê, ji Cizîrê heta Stenbolê, ji Stenbolê heta Girîtê, ji wir jî heta Şamê ez geriyam, min dît û bihîst. Li Cizîrê, Diyarbekir, Bêrûd, Şam, Heleb, Nînova, Mûsil, Bexda, Stenbol û Xaniyayê min ziyaretgeh, meyxane, dersxane, qesr, saray, zîndan, girtîgeh, mizgeft, dêr, hevra dîtin, gotinên xerîb, bi zimanên xerîb, li gotina xwe ya kurdî zêde kirin. Min li dengên bêhejmar guhdarî kirin, li rûyên bêhejmar nihêrîn, hîs û pejnên bêhejmar nasîn. Ez bûm şagirtê wext, tevger, însan û bûyeran. Ez bûm xwediyê ders û tecrubeyên bêhempa, – ko niha êdî bi kêrî çu tiştî nayên.

Lê belê tevî van ders û tecrubeyên heyata min a bêkêr, min, du tişt, çu carê, fahm nekirin; çima bindestiya vê Mezopotamya kambax evçend kûr, dûr û hûr e? Çima însanên Mezopotamyayê hertim bi derbeyên xedar hildiweşin? Çima bindestî weha bêdawîn e?.. Li milê din, ez çu carê tênegihîştim çima ev deverên kevnare yên miqedes evçend bi kîn û nefretê dagirtî ne? Çima însanên der û dorên Firat û Dîcleyê, tevî ko ew bindest in, evçend li dijî hev in, evçend gora hev vedidin?

Bêguman ez dizanim, însanê bindest mîna pizota êgir e, zirara wî, berî her kesî û her tiştî, jê re ye. Însanekî weha mîna dûpişkê bêkeysketî ye, ji bêgaviyê, bi der û dora xwe, eger li der û dorê kes nîn be, bi xwe vedide, derzî û jahra dûpişkê ko ji bo parastinê ye, dibe mirina wî. Ez dizanim, qurban, bêgav e û însanê bêgav dikare her tiştî bike, dikare, heke fersendê bibîne, ji nişka ve bibe celad. Di nav her miletî de, li her navçeyî bêgav, bindest, qurban û dûpişkên bêçare hene. Lê we li kû derê dinyayê dîtiye ko navçeyeke seranser, însanên hemû navçê, têr û birçî, xweş û nexweş, desthilat û jar, mîr û kizîr, gundî û bajarî, hemû bi hev re, bindest in, bûne dûpişkên jahrîn û bêrawest bi hev vedidin? Em bibêjin, li dereke dinyayê rewş, demeke kurt an dirêj, weha nexweş e. Lê we li kû dîtiye ko ev rewşa hanê her û her dewam dike, dubare dibe û dewsa ko biguhere, herkesî diguherîne û dike esîreki pêncperan ê vê qederê?

Hûn hatine ko li min guhdarî bikin, ez dizanim, lê niha bersîva pirsa min bidin; we mûsîbeteke weha li kû dîtiye?..

Li dora xwe binihêrin, ji her derî xwîn dilop dike. Ax dinale, av diqîre, ba dinehwirîne. Çima? Ji min re bibêjin çima ev axa bimbarek ko bi ava Firat û Dîcleyê dihate avdan, niha, di nav bêdengiya zîz a şînê de, bi xwînê tê avdan? Hema çi bigire, di hemû gavên kulek û xeşîm ên umrê min ê teres de, ez li van herdu pirsan fikirîm; bindestî û kîn û nefreta bêhempa ya navçê. Gava ez li Cizîrê, hê li Medresa Sor şagirtekî nezan ê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

zanîn û ilmê bûm, hê hingê, li milekî çavê min li ser rêzên tevîhev ên rûpelên kitabên zehmet ko li ber min bûn, devê min bi rêzên dijwar ên jiberbûyî tijî, min pisepis dikir, li milekî din jî heşê min li dereke din, li bersîva kahniya kîn û nefretê bû. Ev kahniya malmîrat li kû bû? Heye ko haya we jê hebe, di nav gotinên stranên min de ko min hê di xortaniya xwe de li bilindahiyên çiyayê Cûdiyê, di berbangên sibehan û hingûrên êvaran de, rûyê min ber bi tava ko hildihat, an jî diçû ava, digotin, hin rêz hebûn ko her dubare dibûn, kahnî, tu li kû yî? Kahnî tu li kû yî? Di nav wî şer, pevçûn, qetliyam û gola xwînê de ko ji nişka ve bi ser me de hat, ko ez ê qalê bikim, min hertim gotinek dibare dikir, çima, çima? Li ser riya dirêj û kesertijî ya sirgûnê, li ser pêlên har ên Derya Reş ko em di keştiyeke osmaniyan de mîna hêlekanekê, bi gurmegurma pêlan re, geh bi vir de, geh bi wir de diçûn, hingî min ji yara xwe ya birîndar dipirsî, Stêra min, li stêran binihêre... ma ev stêr bi halê me nizanin, ma çima ew nayên aliyê me û birînên me derman nakin? Çima ew bersîva vê zilmê, vê nezaniyê, vê kîn û nefretê nadin? Ez li Girîtê, danê êvaran, li ser bircên keleha Xaniyayê rûdiniştim, berê min li ava şîn a Derya Spî ko mîna cawekî hevrêşimî bi rengên şîn, kesk û sor leylan dida, destê min li ber guhê min ko hertim li ser dengan bû, min dengê strana xwe bi dengê pêlên Derya Spî digîhand û jê dipirsî, deryayê, ezbeniyê, çima, çima? Herçî Şam, ko qonaxa dawîn a koçberiya me bû, ez li oda biçûk û germ a Mîr ko bi mehfûr û kulavên rengereng raxistîbû, li kêleka Mîrê min ê şikestî û gelekî westiyayî rûdiniştim û gava ko Mîr, di destan de tizbiya sedefî ya not û neh libî, dest bi xwendina Qurana kerîm dikir, min jî gotinên stranên nû ko hêdî hêdî dikemilîn û li hev dihatin, di ber xwe de, dubare dikirin, Mîrê mino... em li kû, kahnî li kû?

Kahnî; kahniya heyata însan, zayîn; kahniya evîn û evîndariyê, zelaliya zaroktiyê, westa kalbûnê, kêf û henekê, best û coşê, şeng û şongê, xebat û lebatê, şer û pevçûnê, kîn û nefretê û mirin û kuştinê... Kahnî, kahniya windabûna heyata însan, mirin... Heyata min, ji kahniyekê ber bi kahniyeke din.

Lê belê kahniya bindestiyê, kîn û nefretê?.. Ev ji kû dertên? Ji kûrahiyên şevê ko bi perda xwe ya reş dinyayê vedigire û dixe nav xeweke xeşîm ê kûr? Ji kûrahiyên vê axa reş a bi bereket ko ji hezaran salan û vir ve ye, hemû Mezopotamyayê têr dike? Ji kûrahiyên ba û bahozên qedîm ko li gopikên çiyayên Cûdî, Herekol, Bagok û Hekaran, bi fizîn, bi xeşmet, xwe li ba dike? Ji kûrahiyên xewnên şevên reş ên bêpayan bêdeng


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ko hema çi bigire hîç wextekê nayên zimên? Ji kûrahiyên xwîna sor ko di rehên însanên bêgav de, hertim bi coş, bi kel, bi rik û bi kerb diherike? Ji kûrahiyên dilê wan ko bi hesret, hêvî, best, êş, xizîn, şerm û bi daxwaza tolê hildavê?

Li dara dinyayê ji herkesî bêtir diviya me, însanên Mezopotamyayê, ehlê Dîcleyê bizanibûya ka ev kahniya ko mîna kabûsekê, mîna şûrekî li ser stûyê me hilawestiye, çi ye û li kû ye. Lê ez ji tecrubeyên keft û leftên heyata xwe ya fetloke dizanim; em bi hîç tiştekî nizanin, ne kahnî, ne zayîn, ne heyat û ne jî mirin, bi çu tiştî... Heke me bi tiştekî bizanibûya, ji tecrube û keft û leftan ders werbigirta, ne halê me dibû ev halê bêhalan, ne jî mirin dibû nan û ava însanên Dîcleyê. Serê xwe hildin û li derve, li Dîcleyê binihêrin, guhê xwe bidinê û dengên ko ji Dîcleyê bilind dibin, seh bikin. Ev, dengên çi ne, dengên kê ne? Ava Dîcleyê çêla çi dike, behsa kê dike?

Dîcle, ava Dîcleyê, dengê ava Dîcleyê. Ez, dengê min, stranên min, stranên min ên li ser Dîcleyê;

Ro, ronahiya rojê, tîrêjên ronî.
Germahî. Geşî, xweşî.
Bihar, dilşahî.
Dinya dikene, ax dinale, sar, seqem dihele.
Av vedije, Dîcle hişyar dibe.
Bîhn, ax, herî, dar, ber, gul, kulîlk. Dinya vedije.
Av, avzê, kahnî, co û çem.
Ji dahl, daristan, zinar, çiya.
Ji herderî, ji jêr, ji jor, ji çarmedor.
Av, Dîcle. Dîcle vedije, Dîcle har dibe.
Ro û Dîcle. Tav û av. Tîrêj û pêl.
Bi hev re, di nav hev de.
Dîcle dibiriqe.
Dîcle diçirise.
Dîcle distrê.
Dîcle dibêje.

Dîcle çi dibêje? Guhê xwe bidin ser dengê Dîcleyê, bi dîqet, bi hizir. Bibêjin ka gotina Dîcleyê çi ye?

Ez, dengbêjê Dîcleyê, ji we re bibêjim; deng, dengê mirî, windabûyî û


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

jibirbûyiyan e û ava Dîcleyê strana zîz a wan dibêje.

Roja ko fermana me rabû û Mîr, çar bermaliyên wî, çardeh cariyên wî, keç û lawên wî yên hê hingî bêhejmar, bira û biraziyên wî, mal û malbata wî, ehl û eşîra wî, em, dildar û şirîkên şikestî yên qedera wî, hemû bi hev re, ketin ser riya welatê xerîbiyê, danê sibê, gava tîrêjên roja zêrîn li ser ava Dîcleyê diçirûsîn, bi dilekî zîz û kesertijî, min li Dîcleyê nihêrî û ez weha fikirîm; li vê yeka kambax binihêre, Dîcle heyat, bextiyarî û serfiraziyê dibexşîne me û em jî mirin, jan û keserê didin wê.

Umrê Dîcleyê çiqas e, ji çend hezar salan û vir ve, ev ava boş weha bisebr, bêwest, bêrawest diherike? Umrê mirinê çiqas e û ji kengî ve ye ko mirin li der û dorên Dîcleyê, mîna xezeba Mûsa yan jî tofana Nuh, evçend bi xurtî, li dar e? Xezeba Mûsa ya li ser fîrewnan yan jî tofana Nuh a li ser neçêyan heta dereke û wextekê bû, piştî wê ew miçiqîn. Lê kahniya vê mirina kambax ko gelekî bi xezeba Musa û tofana Nuh dişibe, ko hertim li dora me ye, çima namiçiqe?

Berî niha bi demeke kurt, Mîr mir. Heye ko sê, çar hefte, wî, di oda xwe ya biçûk de, li ber pencera fireh ko pelên çîkî kesk ên dara ziqûmê li dorê rapêçiyayî bûn, di nav kitab, ayet, hedîs û telqînên xwe de, bi hesreta axa bav û kalan, kahniya evîn û derdan, serê xwe li Şamê danî ser axa rehmetê û ji her tiştî xatir xwest û bêveger çû.

Stêr mir, na ne ko mir, hate kuştin.

Mam Sefo Manolgiyan, Migo, Armê, diya Migo û Armê Senemxan, xizmên wan, hemû, mirin.

Apê Xelef mir. Heme, Malmîranê malwêran mir. Gulîzera xwediya guliyên reş mir.

Ne yek, ne dudo, bi hezaran nas, dost, heval, ehl û însanên ko min dinasîn, mirin.

Ermen mirin. Suryan, keldan, nastûrî bêhejmar mirin.

Êzidî mirin. Kurd mirin.

Ez ê jî bimirim. Ez bi birîna xwe dizanim, ev birîn nacebire, ev ê min bikuje.

Ez dibêjim, ew mirin, lê rastî weha ye, ji Mîrê min ê ko ji derd, kerb û hesretê mir pê ve, yên din hemû hatin kuştin. Bi ecelê xwe mirin tiştekî ye, bi şûr, xencer, kêr, demançe, tiving û topan mirin tiştekî din e. Li der û dorên Dîcleyê mirin nîn e, kuştin heye. Ecel nîn e, fermana melekê Ezraîl, bi qewlê Êzidiyan Melekê Tawis, ko bi haletên kuştinê tê, heye. Melekê Tawis bi du şêweyan tê nik me, însanên fanî, ko ji afirînê bêtir ji


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hilweşînê, ji evînê zêdetir ji kînê hez dikin; yek, bi lorîna nazik, gotina xweş û xewa şêrîn. Dudo, bi şûr, xencer, demançe û tivingê. Para Mezopotamyayê, şêweyê diduyan e.

Ez ê jî bimirin, ji ber ko qesta xencerê, fermana melekê nemir, qesta kuştina min bû.

Bêşik ez ê ji we re çêla evîn, xweşî, hêvî, coş û heyecanê jî bikim. Lê heke hûn meraq bikin ka ez çima weha behsa mirin û kuştina bedbîn dikim, bersiva min ev e; mirin û kuştina ko min, di hemû heyata xwe de şahidî lê kiribû, berî niha bi çendekê, piştî mirina Mîr, di nav kirasê yekî zikreş de, mîna segekî har ê devgirêz, ji nişka ve, derket ser riya min û êrîşî min jî kir. Çare nîn bû, min diviya bersîv bida, mîna hespê ko di geremola çemê Dîcleyê de, veciniqî û matbûyî, çavên wî li qeraxên çêm, li ber xwe dide û dixwaze xwe bi qiraxê bigihîne, welê min jî diviya xwe ji geremola xwînê xelas bikira. Çare nîn bû, min segê har di nav xwîna wî de gevizand. Da ko ez nemirim, min segê segan kuşt, da ko ewî nikaribûya dest bibira xwe û ez bikuştima.

Belê, min însanek kuşt. Ez ko ewçend ji kuştinê direviyam, ewçend min ji kuştinê nefret dikir, di dawiya umrê xwe de, bûm mêrkuj û min jî merivek, bi derbên xencerê, xiste erdê. Gerçî însanê ko min kuşt, segekî har, bênamûsekî rezîl bû û xwîna wî, bi pereyên çikosan jî, bi pênc pereyan nedikir, lê kuştin bi min nediket. Bila Yezdanê mezin ceza wî bidayê, bila ew bêbextê bêbextan bi derdekî bêderman biketa ko dermanê wî şîrê teyran û qoçê keran bûya. Mixabin welê nebû, di wextekî min ê gelekî zîz de, ko ne dengê dil, ne jî dengê heş digihîşte min, her tişt bi leza birûskê qewimî. Lê eger wî bênamûsî bi xencera dudevî ya zîvhêlî êrîşî min nekira û ez birîndar nekirima, min ê ew nekuşta.

Xencera ko pêşî di destê wî bêşerefî de bû, rabû, bi qasî kêliyekê li hawayê, bi şewqeke gelekî ronî çirûsî û ber bi zik û navtenga min daket. Xencêr cil û bergên min çirandin, laş û çermê min qelişandin û agir berda bedena min. Mîna ko hûr û pizûrên min derbin, welê nefesa min çikiya, bi qasî bîskekê dinya li ber çavê min reş bû. Lê çi bû, çawan bû, ez nizanim, gava xencer dîsan rabû, min rahiştê. Destekî min li ser devên xencerê, bi destê din, min çend gurmistên rehmanî li ser sûretê wî bêşerefî teqandin. Tevî ko destê min jêbû û devê xencerê gihîşte hestiyan, min ew berneda. Û em tewirîn erdê. Demeke gelekî dirêj li erdê me hevûdu bir û anî. Mirin li odê bû, Melekê Tawis, bi xencera dudevî, li wir, li ser serê me hilawestî bû. Em ê bimirana, ez, yan jî ew, yan jî em herdu. Rengê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

oda xweşraxistî guherî, xwînê rengê xwe da hemû odê, cil û bergên me, dest, pî, mil, rû û hemû laşê me, mehfûrên li erdê raxistî, dîwarên odê yên spî, dîwana mişmişî ya koşê, hemû, her tişt di nav xwînê de ma.

Bi dû pevçûneke gelekî dirêj re, ez, bi hêdîka, hemû bedena min bi janeke bêpayan ketî, rabûm ser piyan. Lê ew bêşerefê bêşerefan ranebû. Xencer di destê min de bû. Bi qasî çendekê ez, bi zehmetî, li ser serê wî rawestiyam û min lê nihêrî. Çavên wî, beloq, vekirî bûn, rû, simbêl û rîha wî di nav xwînê de bû, ji bêvila wî xwîn diçû û ji stûyê wî xwîneke boş dipijiqî.

We hîç li çavên însanên nûmirî nihêriye? Min gelek caran, li gelek deveran ev çav dîtine; li qeraxên çemê Dîcleyê ko gelek caran bi rengê xwînê diherikî, li newalên kûr ên Lalêşê ko ziyaretgeha êzidiyan e, li der û dorên Kahniya Spî ko kahniyeke miqedes a Laleş û yêzidiyan e, li gundên Nînovayê ko cîh û warên êzidiyan e, li ber lingên keleha spî ya Seîd Begê ko bi hêlîneke teyrên êlo dişibiya û bi destê paşayên osmaniyan hilweşiya, li ber û di nav dêrên keldanî û nastûriyan de ko mîna hêlînên teyrên baz xwe di nav gelî, zinar û çiyayên asê yên Şemdînan, Şîrwan, Dêrezor, Nehrî, Bişems û deverên din ên Cizîra Botan û Hekaran de veşartibûn, li ser kelekên ko di çemê Dîcleyê de, ji hezar salan û vir ve, însan, heywan, rêwî, birîndar û mirî dibirin û dianîn, li hewşa fireh û hertim ronî ya Medresa Sor ko warê îlim, zanîn û merhemetê bû, li kêleka Birca Belek a qesra Mîr ko li ber devê Dîclê lêbûbû, ko hertim tijî jin, cariye, zarok, aqilmend, kumandar, alîm, şaîr, dengbêj, dîndar, şêx, mîr û axa bû, li zozanên çiyayê Cûdî ko bi bilindahiyên xwe mîna teyrê simîr, nobedarî li hemû navçê dikir, li hawîrdorên gola Ûrmiyê ko hêzên çekdar ên Mîr dirêjî kiribûn, li deştên zer ên Cizîra Botan ko qulipîbûn ser qata şer ko di navbera hêzên kurdan û osmaniyan de dihate pê, li doraliyên sûr û bircên keleha çiyayê Ewrexê ko me, Mîr û nêzên wî, ji bêgaviyê, xwe spartibûyê, li ser riya bêdawîn a welatê xerîbiyê ko piştî şikestinê derketibû pêşiya me, di nav keştiya kevnare de ko li ser pêlên Derya Reş, mîna pelekî zerbûyî û hilweşiyayî yê payizê, bi hêdîka, hêl dibû, li Stenbolê, paytextê padîşahê osmaniyan Siltan Evdilmecîd, di zîndanên tarî de ko em, girtiyên Cizîra Botan, Hekar û Mikusê, mîna pezên ko bi şebekê ketibin, li ser hev, bêyî ko haya me ji roniya rojê, tariya şevê hebe, rûniştibûn, li Girîtê, warê me yê xerîbiyê, li bajarê kevnare Xaniyayê ko ji bo min bû medreseyeke nû mîna Medresa Sor û gotina serpêhatiyên Hektor, Parîs, Helena, Aşîl, Odyseus û Penelopê ko gelekî bi gotina ser-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

pêhatiyên me dişibiyan, gîhande min...

Min li hemû van deran, bi çavê xwe, mirî dîtin, çavên wan ên vekirî, rûyên wan ên sar, termên wan ên ko hew diliviyan dîtin û bi guhê xwe li çêlên mirî û ketiyan guhdarî kirin. Û dawiya dawîn jî li Şamê, bajarê miqedes ê misilmanan, bajarê ko diviya bajarê merhemet û wijdanê bûya û di dawiya umrê me de sikûnetekê bexşî me, însanên nesakîn û westiyayî yên şer, pevçûn û xerîbiyê bikira, ji bo min, qulipî ser bajarê mirin û kuştinê. Her cara ko min çaven mirî dîtin, ez li melekê ezîm û abadîn, Melekê Tawis û li şûr, xencer û tivingên wî fikirîm. Çavên mirî ez dilşikestî dikirim; hemû keft û lefta heyatê hîç bû, dawiya ko hîç çu însanekî nikaribû jê bireviya, xwe jê xelas bikira, bi tenê ev bû, mirin. Çavên mirî ez kêfxweş dikirim; mirî ne ez bûm, mirin ji min dûr bû. Lê li Şamê, mirina ko hertim li dora min bû, hertim di nav hîsên kûr de nefesê li min diçikand, hate û pêşî bû pardarê heyata min, paşê jî heyata min, heyata yara min têkbir.

Min kê, çima kuşt? Ez ê, kite bi kite, vê ji we re bibêjim.

Ez ê çêla kuştina Stêrê, yara heyata min, jî, dîsan, kite bi kite, bikim, hem çawan Stêr çendîn caran ji şûrê mirinê xelas bû, hem jî çawan, bêyî ko hay jê hebe, ew kete tora mirinê û bi derbên xedar ên xencerê mir. We nedît, min dît; ew bedena wê ya nazîk û narîn qulipîbû ser seradeke sor a qulqulî ko jê xwîn diçû.

Lê sebir bikin. Gotin ê gotinan veke, bûyer ê bûyeran, derî dê deriyan, rê dê riyan. Ji bilî gotinê û lihevanîna wê ez bi kêrî çu tiştî nayêm. Ne pevçûn û şer, ne kar û şixul, ne îlim û siyaset, ne îdare û kargerandin, ne xulamtî û murîdî, ne jî serekî, mîreki, şêxîtî, axatî. Ez bi tenê, bi karê gotinê dizanim, û ez ê wê ji we re bibêjim. Lê ne bi lez û bez, bi hêdîka, bi sebir, bi germahî, bi sadehî û zelaliya gotina edebî.

Berî niha bi demeke dirêj, gava ez ketibûm pey reh û rêçên xwe û li newalên Lalêşê, li ber deriyên neqişandî yên tirba şêxê qedîm ê yêzidiyan Şêx Adî, min li dengê kalên rîhspî û cilspî yên yêzidî ko bi bilûr, def û erbanê telqîn û stranên yêzidiyan digotin, guhdarî dikir, hin gotin, mîna lûlûyên zelal ko di telqînên yêzidiyan de behs dibe, ketin ber guhê min, na ne ber guhê min, ber dilê min; xwedavendê nûranî ji nûra xwe heft melayike deranî, mîna însanekî bi qendîlekê qendîleke din pêxîne, melayike welê afirandî... Bi qendîleke ronî pêxistina qendîleke din, bi çirûskekê çirûskeke din, yeka din, yeka din... Qendîl, çirûska jînê, hêviyê. Jan, keder, hizin, lê tevî vê jî qendîl, ronahiya hêviyê ko rehê jîn-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dar ê heyatê ye. Qendîl, ji gotinekê ber bi gotineke din, ji şevbuhêrkekê ber bi şevbuhêrkeke din... Weha, biûsil, tekûz, bi rêzdarî, aramî. Bi nûr û ronahî.

We qendîl pêxist, ez ê jî bibêjim, quweta gotina xwe bi we bigihînim, gotin bi gotin, şev bi şev, qendîl bi qendîl.

Lê belê dengê ko hûn ê lê guhdarî bikin, ji bîr mekin, dengê dengbêjekî ye. Dengê dengbêjekî jî, dengê xewnan e, ko tê de do û îro, îro û sibê dibin yek; mirî û zindî, çûyî û yê bê bi hev re ne, rastî û qewimî, fikir û xeyal dikevin nava hev, gelek dengê kesên din jî di nav de ne. Dengê dengbêjekî, xuşexuşa Dîcleyê ye ko ji kûrahiyên avê dertê; gumîna çiyayê Herekolê ye ko ji bilindahiyên çiyê hawîrdor vedigire, nalîna pîrejinekê ye ko hemû însanên xwe winda kiriye, girîna zarokekî ye ko li darê dinyayê sêwî û bêkes maye, tepetepa dilê evîndarekê ye ko evîn lê qedexe bûye, kesera dilê şikestî yê mîrekî ye ko li hember hêzên çekdar ên dewletên mezin şikest xwariye û bindest ketiye, hawara birîndarekî ye ko nefesa mirinê ya Melekê Tawis bi ser de hatiye, şerqîna şûrekî ye ko xwîn jê şîp, şîp, şîp dilop dike, hîrîna hespekî ye ko siwarê wî bi berîkeke tivinga dijmin ketiye, fîzîna bayekî ye ko xwe ji rojhilatê çiyayên Hekaran dirêjî çiyayê Bagokê dike. Di nav dengê dengbêjekî de dengê jibîrbûyî yê asûr, nastûr û keldanên dêr û qesrên Tiyarê, Tixûbê, Deştan û Nînovayê, dengê qedexekirî yê yêzidiyên kahnî, ziving û mezelên Lalêşê, dengê mazlûm ê misilmanên medrese û mizgeftên Cizîrê, Hekar, Wan û Diyarbekirê heye. Dengbêj, pêşî, seh dike, guh dide dengan, paşê wan werdigire û diqulipîne ser dengê xwe û dawiyê jî, mîna ko ez niha dikim, wan mîna dengekî ko ji dengên têkel ên wext û dewr, hez û evîn, hesret û jan, kîn û nefret, tirs û heyecan, coş û hêviyê hatiye pê, vediguhezîne însanan.

Ji lewre divê hûn ji min nepirsin ka dengê min aîdê kê, çi û kengî ye. Dengê min, aîdê herkesî, her tiştî û her wextê ye. Lê bervajiyê vê yekê jî heye ku, dengê min, aîdê çu kesî, çu tiştî û çu wextê nîn e.

Ji min mepirsin ka çi rast e, çi ne rast e, çi kengî û çawan qewimiye. Dengê min, dengê rastiyê ye, lê ne rastiya şûr û xenceran, tiving û topan, axa û began, şêx û seyidan, berdevk û waqanûseran, mîr û paşayan, siltan û padîşahan. Rastiya dengê min, rastiya Dîcleyê ye ko tê de hemû dewr û dewran, şexis û însan hene, ko mîna dewr û dewranan, însaniyet û însanan, her û her, diherike.

Fermo, ji we re rastiya Dîcleyê;


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Guhê min li dengê te, ko qîrîn e, hawar e.
Çavê min li pêlên te, ko xuşexuş e, herikîn e.
Ji deverên dûr ber bi deverên dûr e, di nav wext û heyaman de.
Dengê te, ko bi dengê ba, baran û berfê ve yek dibe.
Endam û bala te, ko bi tîrêjên tavê, çirûskên heyv û stêrê li
hev dipêçikine.
Li dengê te guhdarî dikim, ko kûr e, dûr e, nûr e.
Her roj, her şev, ji jor ber bi jêr e, li vir e, li wir e...

Min ji dengan hez kir; li dengên ko dihatin bihîstin, guhdarîkirin û li dengên ko nedihatin bihîstin, meraqkirin. Ez ketim pey dengan, min guhê xwe, dil û ruhê xwe ji dengan re vekir û bûm dengbêj. Li dinyayê her tişt xwediyê dengekî ye. Ne bi tenê însan, teyr, tilûr û heywan, herweha erd û ax, dar û ber, zinar û çiya, av û çem, ba û bahoz, berf û baran, tav û heyam jî xwediyê dengekî ye. Heta dengê bêdengiyê jî heye. Gava însan hosteyê şixulê dengan be, ev deng, hemû bi hev re, yan jî yek bi yek, dikarin werin bihîstin. Lê belê berî her tiştî meraq divê. Meraq, bi dû re sebat, bi dû re jî xebat, da ko însan bikaribe dengan seh bike, wan bibihîse û li wan guhdarî bike.

Hê gava ez zarok bûm û min li ber rehleyên dersxaneyên Medresa Sor ayet û hedîsên kitabên miqedes, bi erebî, rêzên seydayê Cizîrî, Teyran û Xanî, bi kurdî, rêzên şaîrên faris Fîrdewsî, Hafiz, Sadî û Xeyam, bi farisî ji ber dikirin, hê hingê min, tevî wan rêzên bedew ên şaîran, li dengê wan jî meraq dikir; gelo dengê wan çawan bû? Dewsa feqeh û melayên me yên rûtirş ko çoyê wan ê dirêj hertim li ser serê me bû, eger şaîran bixwe rêzên xwe bixwenda, wan ê çawan, bi çi şêweyî bixwenda? Dengê wan ê çawan derketa? Ew deng ê çawan bigihîşta me? Hê hingê, danê êvaran, gava ez û hevalê min ê file Migo ko Medresa Sor jê re qedexe bû, piştî keftûlefta rojane ya ders û medresan, li mala wan ko li ber perê Dîcleyê bû, li kitabxana gelekî fireh a bavê wî Mam Sefo, ko tijî kitab bûn, em li ser xalîçeyên rengîn ên kitabxanê dirêj dibûn û me li rûpelên kitabên mezin ên qehîm cîldkirî ko tijî resim û wêne bûn, dinihêrîn, min dengê wan wêneyên însanên bêdeng meraq dikir; eger ew ne wêne, lê însanên zindî bûna, ew ê çawan bipeyiviyana, bi çi zimanî, bi kîjan dengan? Wêneyan çi digotin? Kitabeke gelekî mezin hebû, rûpelên wê zerbûyî, cîldê wê yê darîn çermkirî bû. Di her rûpelê kitabê de wêneyekî zelal, reş-spî, hebû. Filîsof û kumandarekî yewnanî ko tevî deh hezar neferan di Anatolî û


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mezopotamyayê, di welatê kurdan û ermenan re derbas bûbû, wê kitaba mezin ko çêla wê gerê, yan jî bi qewlê nivîskar vegerê, dikir, nivisîbû. Navê nivîskar gelekî zehmet bû, ji lewre min navekî din lê kiribû, Keso. Min û Migo, rûyê me ber bi pencera vekirî ko li Dîcleyê dinihêrî, di nav gulokên tîrêjên tavê de ko di ser ava Dîcleyê re xwe dirêjî hundirê kitabxanê dikirin, me rûpelên kitaba Keso vedikir, li wêne û sûretan dinihêrî û li gora tevger û hereketên sûretan, dewsa wan, em dipeyivîn. Ez û Migo dibûn dengê sûretên bêdeng. Min bi zimanê kitabê ko bi tîpên latînî hatibû nivisîn û ji milê çepê dihate xwendin, nizanîbû. Lê Migo ko ji bilî ermenî, bi hin zimanên din ên welatên rojava mezin dibû, bi zimanê kitabê, eger ez ne şaş bim, bi fransizî bû, dizanîbû. Carina, gava wêne û sûretan şer û pevçûn salix didan, Migo rêzên li binî wêneyan dixwendin û ew ji bo min şerh dikirin. Lê bala min ne li ser gotinên Migo bû, min li dengê bêdeng ê sûretan meraq dikir. Kesên wêneyan çawan diqîriyan, bi çi texlîd dengan êrîş dibirin ser dijmin? Gava ew bêkeys diketin, wan çawan gazî û hawar dikirin? Bi qîrîn û qîjîn, bi tika û lavelav?

Ji bilî Keso hin nivîskarên din jî di kitabxana germ û şêrîn de ko jê bîhna taybetî ya kitaban difûriya, hebûn. Navê hemûyan niha nayê bîra min, lê gava gotin gotinê veke, bi alîkariya qendîlê, ronahiya gotinê bireşe ser bîr û heşê nankor ko hosteyê jibîrkirinê ye, hingê heye ko navê hemûyan bête bîra min. Lê diduyên din hebûn; Maro û Naso ko herdu jî Romayî bûn û di wextê Keysar Agustos de jiyabûn. Kitabên wan jî gelekî girs, bi textekî tenik cîldkirî, rûpelên wan neqişandî û nava rûpelan tijî wêne û sûret bûn. Herçî ev herdu kitab bûn, Migo jî bi zimanê wan ê latînî nizanîbû. Lê me li sûretên ko gelekî zelal û lihevhatî bûn, dinihêrîn. Di şevên bê de ez ê çêla kitaban û sûretên wan bikim, lê bi xêra sûretan û şerhên peregende yên Mam Sefo ko carina dihate kitabxanê, bi ken li me û kitaba li ber me dinihêrî, simbêlên xwe yên boq badidan û ji me re, bi çend gotinan, behsa sûretan dikir, em hînî serencamên kitaban jî bûn. Çi serencamên balkêş, tijî xwîn, xwîdan, girî, jan, keser, heyecan, evîn û hêvî ko çiqasî bi heyata me ya neçar û bi serpêhatiyên me yên keserkûr dişibiyan! Min dengê wan hemû hîs û pêjnan ko di nav rûpelan de bêruh razayî bûn, dibihîstin, ew hemû hîs û pêjn vedijiyan û xwe bi ruhê min ê qeşmer ko ji ber zaroktiyê, hê bîr bi çerxa dinyayê nedibir, digîhandin. Lê piştî ko min jî, bi vî çavê xwe, şer û pevçûn, xwîn û xwîdan û ew hemû hîs û pêjnên rûpelan di heyata xwe ya kambax de dîtin, di dil û ruhê xwe de hîs kirin, hingê ez têgihîştim ko Maro û Naso ne bi tenê dengbêjên


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

welatê Romayê, herweha ew dengbêjên min bûn jî. Kitaba Maro ko bi dengê hizîn ê şikest û bindestiyê ve hatibû hûnandin, çêla bajarê Truwayê, hespê qerase yê îxanetê, şewata bajêr û reva Enasê ber bi welatê xerîbiyê dikir. Ma heyata me jî nebû mîna serencema kitaba Maro? Ma hespê qerase yê Trûwayê, çaxa hêzên çekdar ên Mîr ji bajarê Cizîrê bi dûr ketibûn û di germa havîna zelal de ko xwîdan, bêrawest, ji me û ji hespên me diçû, li ber qeraxên gola Urmiyê ko tavê li ser avê bi rengên têkel leylan dida, haziriya şerên mezin dikirin, hingê, bi navê Yezdînşêr û hêzên osmaniyan, bajarê me yê qedîm Cizîrê venegirt? Ma me şikest nexwar û serê xwe li ber paşa û siltanên osmaniyan netewand, stûyê xwe xwar nekir, riya me, bi dengê strana hizîn a veqetînê, ber bi welatê xerîbiyê neçû û em li welatê xerîbiyê bi hîsa hesretê nekizirîn?

Herçî Safo bû, wî jî di kitaba xwe de ko li welatekî gelekî xerîb û nenas ê Derya Reş, bi keserê hatibû nivisîn, çêla xerîbiyê dikir. Ma xerîb kî bû? Ne em bûn? Ma xerîbiya malkambax nebû qedera me, pêlên hov ên Derya Reş ko bi rastî jî bi rengekî girtî yê xoftijî diçelqiya, tirseke bêpayan nexist dilê me jî? Ma bayên seqem ên welatên nenas rûyê me jî nebirî?..

Deng li çeperên wext û dewran, tixûbên însan û welatan guhdarî nake, ew hertim xwe bi dengan digihîne. Deng rê li dengên din vedike. Mîna qendîlê, bi dengekî dengekî din dertê, bilind dibe. Lê însan divê dengan bibihîse, dilê xwe ji dengan re veke, heşê xwe bi dengan bineqişîne û ji dengan dengekî nû biafirîne da ko bikaribe bibe dengê jibîrbûyî û nebihîstiyan...

Dengê nebihîstiyan – an jibîrbûyiyan – dengê birîndaran, dengê Armêya çavreş, dengê Gulîzera zirav, dengê şirîka qedera min Stêrê. Estera porzer, Stêra çavşîn, gotinên wê yên birîndar ko mîna kuliyên berfa çiyayê Cûdiyê, yek bi yek ji zimanê wê yê lal derdiketin. Û dengê nebihîstî yê bav û kalên min ko min tu carê nedîtin û nenasîn.

We ez ji Şamê hilgirtim û anîm bajarê umrê min Cizîrê. We û xêrxwazên mîna we ko bi hesreta min a ava Dîcleyê û axa siûda min, warê bav û kalan dizanîbû, çêyiyeke mezin bi min kir. Piştî umrekî gerok ko bi xaçeriyên fetloke tijî ye, ez dîsan vegeriyame warê ko ez jê derhatim. Riya navbera Şam û Cizîrê dirêj bû, zehmetî zahf bûn. Lê bawer bikin, li rê, ne êş û jana birînên min ên kûr xema min bû, ne jî zehmetiyên bêhejmar ên rêwîtiya dirêj. Her tişt niha li pey ma, ez li vir im, ez ê li vir, li ser axa bav û kalan nefesa xwe ya dawîn bidim û xwe berdim hembêza Melekê Tawis. Ez ê li pêlên ava Dîcleyê, li ronahiya tavê, li şewqa heyvê, li çirûsî-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

na stêrê binihêrim û bimirim, bi lorîna dengê ava Dîcleyê, bi strana bayê hûnik ê berbangên Mezopotamyayê. Wesiyeta min li we, gava dengê min hate birîn, ne bi tenê dengê ava Dîcleyê, divê dengê dengbêjên nûgihîştî jî bistrê, dengê pîrejinan binehwirîne, dengê kalemêran bibêje. Hûn divê min bi dengan bi rê kin. Ez ê herim. Lê xwezî min bizanibûya ka bav û kalên min li kû veşartî ne, da ko we bedena min a sar li nik wan veşarta. Lê ne ez, ne jî hûn pê dizanin. Ji lewre hûn divê min li bilindahiyeke qeraxên Dîcleyê veşêrin, an jî li kêleka tirba Nebî Nuh ko bi keştiya xwe li bilindahiyên vê axa Mezopotamyayê venişt û konê xwe li van warên kevnare yên însaniyetê vegirt û ev ax kir welatê me, welatê bav û kalên me. Yan jî min li ber lingên Birca Belek ko ji sedan salan û vir ve, tîmsala abadîn a mîr û dotmîran, evîn û evîndaran, deng û dengbêjan, şiîr û şaîran e, veşêrin. Hûn bi qîma xwe ne, lê şertekî min her heye; dengê ava Dîcleyê divê ji min û gora min bi dûr nebe. Yan jî hûn dikarin weha bikin, bedena min bi mehfûreke neqişandî ya Botanê bipêçin, wê deynin ser kelekekê û pê qehîm girêbidin, dawiyê jî kelekê berdin nav ava Dîcleyê da ko Dîcle min bi xwe re bibe welatên xerîb û warên nenas. Ma însan û umrê însên ne mîna dilopeke ava Dîcleyê ye ko di boşahiya avê de winda dibe?

Ez nizanim ka kê ev nav li min kiriye, lê navê min Biro ye, Biroyê dengbêj, Biroyê dirêj an jî bi qewlê hesûd û xêrnexwazên min ko mîna siya min her li pey min bûn, ji deng û eserên dengê min dihesidiyan û bûn sebeba kuştina Stêrê, Biroyê kor. Bila kêfa hesûd, çavnebar û dijminan were, Biro, yanî ez ê herim, lê heke ez bikaribim xewn û xeyalên serpêhatiyên xwe di van şevbuhêrkên me de ko bi agirê qendîlê ronî dibin û bi dengê Dîcleyê olan didin, bibêjim û bibim serî, hingê, tevî her tiştî, min hêvî heye ko dengê Biro, – herweha dengê jibîrbûyiyan – li pey min bimîne.

Herçî korahiya min e, ji şopa kûr a derba şûrê tûj ko ji enî heta çengê ye, diyar e. Li vê qedera min a teres binihêrin, min çavê xwe yê rastê bi derba mirinê vekir û niha jî ew ê bi derba mirinê were girtin. Berî niha bi umrekî, gava min çavê xwe vekir, bi tenê çavekî min ronahiya dinyê dît. Ronahiya çavê min ê çepê bi derba şûrekî mirinê vemirîbû. Umrê min ê beriya derba şûr ko ne zêdeyî çend salan bû û bêguman bi bav, dê, heye ko bira, xweh, nas, xisim bû, hema çi bigire nayê bîra min. Ew çend salên umrê min ê beriya şûr di bin siya tarî ya nenasiyê de ye. Tevî ko ez carinan xewn û kabûsan dibînim, çu kes bi zelalî nayê bîra min, çu deng kite

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bi kite xwe bi min nagihîne. Di umrê min ê piştî derba şûr de ko destpêka heyateke nû bû, yan jî ez weha bibêjim, ji mirinê veger bû, ne bav û dê, ne jî bira û xweh hebû. Bi tenê Biro hebû, zarokekî birîndar, bêkes, sêwî, rûyê wî bi derbeya şûr qelişî û çavekî wî kor. Û xerîb. Û dilşikestî. Û tirsiyayî...

Min gote we ko dengê bêdengiyê jî heye. Niha ez ê dengê xwe bibirim û ez ê li dengê bedengiyê guhdarî bikim. Belê, deng, dengê bêdengiyê;

Deng. Hîrîn. Hesp.
Tekbîr, Allah, Allah, Allah.
Deng, teqîn. Qîrîn. Qîjîn.
Agir, gulok, şewat.
Deng, şîrqîn.
Şûr. Şewq, xwîn.
Dilop bi dilop.
Şûr, dudevî.
Şûr, çirûsîn...

Û tirs, ji dengê hîrîn, tekbîr, teqîn û şirqînê tirsiyayî...

Hemû însan, qeder, bûyer, pêwendî û serpêhatiyên ko ez ê ji we re behs bikim, min bi çavekî, bi ronahiya çavê rastê dît û bi çavê xwe yê kor ê çepê jî hîs kir. Şûrê ko şekil û şemalê rûyê min guherand, dinya min jî kir du perçe; perçeyê ronî ko didît û perçeyê tarî ko hîs dikir. Çavê min ê rastê ko mîna dûrbîneke, bergehên însan, war û mekanan li ber min radixistin, ne bi tenê alîkariya min dikir, herweha wî alîkariya hevalê min Têlî jî ko ji herdu çavan bû, dikir. Ez û Têlî, em du kesên girs û dirêj, bi çavekî, diketin pey seyd û nêçîran, di geliyên bêbinî yên bakûrê Girîtê de, em diketin pey bizinên kovî ko ehlê Girîtê jê re digotin krî krî.. Herçî çavê min ê çepê ye, ew dûrbîna bûyerên ko mîna pêlên xezebê yên Derya Spî ko bi ser me de dihatin, bû. Ez bi çavê xwe yê kor bi hatina bûyerên ko li rê bûn, dihesiyam. Gava bûyerek ê biqewimiya, şopa şûr, birîna kûr jan dikir.. Heyata min a şerpeze û peregende ko ji ronahî û taritiyê hate pê, mîna kelekeke Dîcleyê ko ketibe ber lehiyeke har, di navbera dîtin û hîskirinê de çû û hat. Ji lewre gotina min a ko bi ronahî û tarîtiyê hatiye hûnandin, esereke herdu çavan, ê ronî û yê tarî ye, bi gotineke din, esereke dîtin û hîsan, mêjî û dil e.

Ez êdî westiyam. Îşev hewqas. Gotina min a îşev heta vê derê, êşa birînê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

nefesê li min diçikîne, dengê min dibire. Niha birînên dest û laşê min derman bikin, taseke av û misteke mewîj deynin ber serê min, lehîfê bikêşin ser min, qendîlê bitefînin û herin. Lê beriya wê, ji kerema xwe, wî kevirê boz ê kehrîbar ko sûretê teyrê tawis lê kolandî û neqişandî ye, ji dîwarê ber pencerê deynin û bînin bi stûyê min kin. Feqîrekî rîhspî yê yêzidî ew, di feqîrxana xwe de ko li ber Kahniya Spî, li Lalêşê bû, mîna yadîgareke oxirê da min. Min jî ew da Stêrê da ko teyrê tawis bibe oxira evîna min û Stêrê. Oxir... Ez ê gotinê bînim ser oxirê, lê ne niha. Cara dawîn min kevirê teyrê tawis ko tîmsala Melekê Tawis e, li nik mêrkujek, mêrkujê ko bedena nazik a Stêrê kiribû mîna seradê, dît. Bi xêra vî kevirê hanê ko ehlê Girîtê jê re dibêjin madalyon, min fahm kir ka mêrkujê Stêrê kî bû. Niha wî kevirê min ê pîroz bidin min, da ko teyrê tawis li ser sînga min be û nefesa Stêra min ko ji asimanên min xuricî li nik min be. Heye ko Melekê Tawis jî îşev, bi dengê Dîcleyê û ronahiya stêran, were û min, bi baskên xwe, hilde û bibe warê heyv û stêran, warê Stêrê. Hingê ez ê tevî teyrê tawis, bikevim ser riya dawîn ko Melekê Tawis ê nîşanî min bide. Ka ew roja hanê!

De herin, lê ji bîr mekin, berî ko hûn derin, qendîlê bitefînin.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## ŞEVBUHÊRK YEK
**asiman**

Dengê min yanî dengê Biro ko hûn ê îşev bibihîzin, dengê însanekî jibîrbûyî ye ko di wextê xwe de dengê însanên jibîrbûyî bû.

We xwest, ez ê jî bibêjim. Birînên min îro jî derman bûne, min mewîjên xwe xwarine, ava xwe vexwariye. Tasa mewîjê û tasa avê li kêleka min, kevirê min ê spî yê teyrê tawis li stûyê min, tizbiya belek a not û neh libî ya kehrîbarê di destê min de ye. Çavekî min girtî, yek vekirî, dilê min bi liyan, merama min niha êdî kelam e. De hûn jî, xortên delal, xwediyên dengê zelal, rûnin, cîh û balîfan li ber xwe û pişta xwe rast bikin, dengê xwe bibirin, guhê xwe vekin. Êvara welatê keserkûran dadikeve, tariya êvara bêgavan hawîrdor radipêçe. Wext, wexta gotinê ye, de qendîlê pêxin û li dengê jibîrbûyiyan guhdarî bikin.

Ji derve deng tên, dengên têkel ên hingûra helesor a Mezopotamyaya qedîm; gujeguja ava çemê Dîcleyê ko hertim bedew, nazenîn û ciwan e, qebeqeba kewên ko xêrhatinî li êvara nû û şevbuhêrka me ya nû dikin, qurequra beqên ko tevî dengê ava Dîcleyê strana êvarê dibêjin, şihîna hespên ko li hêviya siwarên xwe yên şevê ne, borîna mih û beranên ko bi dengê şivanan derin mexelên xwe, gumîna def û daholên ko dengê dîlanê bi bajarê Cizîrê digihînin û himehima bayê şerqî yê sivik ko dengên êvara Dîcleyê li hawîrdor belav dike.

Ji hundir jî deng tên, dengên westiyayî û birîndar ên welatê Dîcleya abadîn; tepetepa dile min ê bêterbiye ko hertim zarok e, hertim mîna zarokekî xeşîm li pey dengan e û çu carê terbiye nabe, çîqeçîqa kevirê hesteyê ko fitîla qendîlê pêdixe û rê li şewqa qendîlê û kelamê vedike, reperepa lingan ko haziriya şevbuhêrkê dikin, pisepisa dengên ko li dengên do meraq dikin û dengê pîrejina ko li doraliyê me cîhekî, straneke zîz dinihwirîne û dengê xizîn ê stranê bi me digihîne...

Dengên derve, dengên hundir, dengên doralî, hemû bi hev re, tişteki ji min re, ji Biroyê dengbêj re dibêjin; xwe bi dengên dewr û dewranên bihurî bigihîne, wan dengan ji wir derbîne, wan vejîne, dengên vê êvara


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

aram bi wan dengan bixemilîne.

Dengên vê êvara ko li pey rojeke westiyayî, nû, hawîrdor vedigire, min hildigire û dibe nik dengên do; ez li wan, li qeder û heyatên tevlihev ko hew kesek li wan difikire, difikirim. Ez, yek ji xwediyê wan dengan bûm, ez bi wan re bûm. Ew çûn, ez mam, lê ew hemû, tevî heyat, qeder û tecrubeyên xwe, îro, qulipîne ser dengê min, bûne merivek, bûne dengbêj Biro, yanî ez, yanî însanê bêkêr ko ji bilî dengan ji tiştekî re nabe, ko di wextê xwe de ne dikaribû ew xelas bikirana, ne jî bi wan re biçûya.

Ewana, însanên serpêhatiyên ecêb ko bi xwe jî, bi qeder û serpêhatiyên xwe mat û şaş diman; ewana, derdê dilê min ê kambax, maneya heyata min a bêrûmet... ew însanên bêgav ên ji hizûr û bextiyariyê dûr, bêdeng, bêzar û bêziman, ketî, birîndar, şikestî, nefîbûyî, şewitî, kuştî û jibîrbûyî. Bêgor, bêşîn, bêgoristan. Ji axa xwe, ji welatê xwe dûr. Ji çemê Dîcleyê, ava wê ya pak dûr. Dengên vê êvara sakîn û zelal ko nû hiltê û ji umrê min rojeke din jî dibe, mîna pêtên sor ên êgir li ser dilê min, li ser eniya min, li ber çavê min ê ko dibîne, diçirûsin û bi qîreqîr ji min re dibêjin; dengbêj deng bide, olan bide, bibe dengê wan.

Êvar tê, mîna her êvarê ev êvar jî bi fen û lîstikên xwe, bi qayide û xwestekên xwe tê. Êvar ji min dixwaze ko ez, Biroyê dengbêj, hişyar û serwext bim û dîsan herim nik wan, bibim deng û nefesa wan, bikevim nav dewr û dewranên wan û di nav dewr û dewranên wan de ko bi temamî dewr û dewranên min bûn jî, li gotinan, dengan, pejnan, tevgeran, stran û serpêhatiyan bigerim, bikevim pey şopên hîsên însanî, pey xwestek û hêviyê, keser û xiznê, – da ko dewr û dewranên bihurî, serpêhatiyên min û wan, hemû bi hev re, îro, wextên bihurî bi bîr bînin, wan vejînin û bîr, hîs û zanîneke nû bireşînin ser wexta me ko îro yekcar bi darê zora paşayên osmaniyan dîlketî ye.

Fen û lîstik, qayide û xwestek, mixabin, ne bi tenê ji bo êvaran, lê li her derî, ji bo her tiştî hene. Ji bo heyatê, xwarin û vexwarinê, hezkirin û evînê, şer û pevçûnê, şev û gotinê, dengbêj û guhdaran, min û we. Ji bo do, îro û sibê. Herçî qayideyên vegotinê ne ko ez ji tecrubeyên xwe dizanim, bi kurtî ev in; gotin divê vegerin wan dewr û dewranên ko vegotin tê de dizê, bikevin nav kûrahiyên wan dewr û dewranan û li wan kûrahiyan cîhaneke nû bînin pê ko hem nêzîkî rastiyê ye hem jî jê dûr e. Gotin divê nerm, germ û pak bin, ne gulover û tirtire, ne jî nizm û durû bin. Ne bi tenê gotinên xweş û bedew bin, ne jî bi fort û payebilindî pozbilind û jixwerazî bin. Gotin divê tesîreke welê bînin pê ko qedera însanên ko ve-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

gotin qalê dike, biqulibe ser qedera dengbêj û qedera wan însanan û herçî qedera dengbêj e, ew jî bikaribe biqulibe ser qedera guhdaran. Yanî qayideyê ko ez ê carina lê vegerim, ev e; dengbêj, guhdar û însanên ko lehengên vegotinê ne, hemû bi hev re, bibin yek û bi hev re qedereke nû bînin pê. Qedereke nû ko bikaribe rê nîşanî we xortên delal, nifşên nûhatî bike, ko hûn bikaribin tê de hem kêfxweşî û mesûdiya însanan bibînin, hem jî derd û kulên wan.

Heke we dil bi vê yekê heye, hingê bidin pey gotina min ko dê bide pey dewrên bihurî.

Heke we dil bi qayideyê dengbêj û guhdaran heye, hingê ne bi tenê guhê xwe, dil û mêjiyê xwe jî bidin ser gotina Biroyê dengbêj ko êdî ne bi tenê Biroyê dengbêj e, herweha dengê mîrekî xort ê hêvîdar, şivanekî kalemêr ê zarşêrîn, evîndarekî çeleng ê ziravbihîstiyar, evîndareke dilsoj a siûdxirab, stêreke ciwan a birîndar, alîmekî simbêlqeytan ê bextreş, destbirayekî qelew ê dilsoz, dîndarekî diranşikestî yê zikreş, rastîxwazekî rûtirş ê kîndar, berdevkekî rîhspî yê durû, mîrzayekî bejndirêj û pozberan ê têkçûyî ye...

Biroyê dengbêj êdî ev hemû ne; şagirtekî jîr ê ders û terbiyan, guhdarekî baş ê gotin û stranan, evîndarekî nexirab ê hîs û pêjnan, şervanekî nebaş ê şer û pevçûnan, dilsozekî derewîn ê mîr, şêx, axa û began, peregendeyekî serserî yê bajar û welatan û di ser van hemûyan re, dawiya dawî, têkçûyiyekî pêncperan ê bêmal, bêwar, bêwelat, bêsewda.

Ji rûniştin, nihêrîn û nefesa we ya kûr diyar e ko hûn dixwazin, ez gotinê bînim ser bûyer û serpêhatiyan. Sebir bikin. Herçend gotina bedew û vegotina lihevhatî sebir divê, ewçend guhdarîkirineke biûsil û rêzdar jî sebir divê. Gotinên ko niha bi guhê we dikevin, gotinên dengbêjekî kal in. Dengbêjekî kal ko êdî gihîştiye rojên xwe yên dawîn û êdî têgihîştiye ko hemû heyat, bi tenê şikesteke xedar e. Û gotinên wî, ko li welatê şerqî, li qiraxên Dîcleyê kemilîne, li newalên kûr û li gopikên çiyan bi tava berbanga ronî ya welatê şerqî ronahî dîtine. Û ji kêfxweşiya van gotinên kevnare re, ko xwediyên wan hemû, ji bilî min, mirine, îro, vê êvara nûzayî ya zelal û sakîn, payan nîn e, ji ber ko ew dibin gotinên we, dengbêj û hunermendên rojên bê, sermayedarên vejîn û rizgariya gotinan.

Heke ez gotinê weha geh li vir geh li wir digerînim, ev ne bê sebeb e. Ev gotinên ko niha ji lêvên min derdikevin, hemû, ji bo haziriya çûyinê ne, çûyina dewr û dewranên bihurî, peyketina deng û gotinên jibîrbûyî. Ez ê niha bidim pey dengê Apê Xelef û gotinên wî yên dewr û dewranên bi-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hurî û herim wê roja pîroz ko Mîr bû mîr.

De hûn jî bidin pey min.

Dengê Apê Xelef li gora wext û heyaman, li gora pêwendî û tevgerên wî diguherî. Di berbanga sibê de ko dinya nû hişyar dibû, dengê wî bi rengekî bû, di danê êvarê de, ko roj diçû ava, yan jî di nîvê şevê de ko dinyaya westiyayî dikete xewê, bi rengekî din. Apê Xelef ko xêrxwazên wî jê re digotin »Xelefê şivan« yan jî »Xelefê zimanşêrîn« û xêrnexwazên wî jî jê re digotin »Xelefê ehmeq« yan jî »Xelefê doxînsist«, bi herkesî re, mîna wan dipeyivî. Bi zarokan re mîna zarokekî, bi kalemêrekî re mîna kalemêrekî, bi begekî re mîna begekî û bi şivanekî re mîna şivanekî. Heta ez dikarim bibêjim, bi berxekê re mîna berxekê, bi beranekî re jî mîna beranekî. Apê Xelef ko bi eslê xwe pêşî êzidî, paşê misilman û şixulê wî jî şivanî bû, bi celebên dengê xwe û bi bilûra xwe ya şeş helqeyî ko jê celebên bêhejmar ên dengan derdihat, dikete her qalibî. Ew hem hosteyê dengan bû, hem jî hosteyê lêxistina bilûrê. Mîna dengê wî, bilûra wî jî di xizmeta, pêşî însanan û paşê jî heywanan de bû. Bi qasî însanan, heywan, nemaze pez jî hevalên heyata wî ya neçar bûn. Wî ji zimanê wan, wan jî ji dengê wî û nefesa bilûra wî fahm dikirin. Pezên ko hema çi bigire hemû bi destê Apê Xelef dihatin dinyê û pê li erdê dikirin û li ber destê wî mezin dibûn, bi dengekî wî, bi ûsil û dûzan, diçûn çêrê, ser avê, zozanan, mexelên xwe, bêriyê û hevşiyên xwe yên hingorî.

Em, zarokên Apê Xelef, ez Biroyê sêwî ko li ber destê wî mezin dibûm, Heme ko di umrê min de bû û kurê Apê Xelef bû, Gulîzer ko ji min û Heme bi qasî du salan mezintir û sê tiliyan dirêjtir, lê ne gulî zer, gulî reş û keça Apê Xelef bû, geh bi dengê Apê Xelef geh bi dengê bilûra wî, em ji xewan hişyar dibûn, me dixwar vedixwar, tevgera xwe girêdida û derengê êvaran em diketin nav xewan.

Herwekî wê roja ko kurdan bi dû re mîna »roja pîroz« bi nav kirin û di heyata min, ya Mîr, ya ehlê Cizîra Botan û ya kurdan de bû qonaxeke nû.

Wê rojê, berî ko stêrên şeva Dîcleyê bi temamî herin ava û tîrêjên roja nû ya welatê Cizîra Botanê li pey çiyayê Cûdiya serî li esmanan hilwerin, ez bi dengê Apê Xelef hişyar bûm. Apê Xelef ko kesî nizanîbû ka kengî dikete xew û kengî ji xewan hişyar dibû, dest bi heyata roja nû kiribû. Ew bi gavên sivik, di navbera mezelên malê ko ji sê jûrên biçûk hatibû pê û axura dirêj û tarî ya kêleka malê ko tê de hertim mîh û kavirne nesax ko nikaribûn bidana pey dengê bilûra Apê Xelef û biçûna çêre û berx,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

berdîr, kahr û gîskin hebûn, diçû û dihat û strana bajarê Cizîrê bi hêdîka dinihwirand;

Çûme Cizîrê, Cizîra Botan
Şalûl û bilbil hev bûne cotan
Wele wê rindê dilê min sotan
Wele wê kewê dilê min sotan
Gotina evinê hevre digotan
Xizim winda bûn, lê, lê, lê
Ez derime cem mîrê Botan

Min bi çavê xwe yê rastê ko dibîne, nedîtibû, lê li gora xêrxwaz û xêrnexwazên Apê Xelef, »rindê û kewên« ko dilê Apê Xelef sotandibûn û wî umrê xwe pê re kiribû cot, li welatê kurdan, zahf bûn. Hinan digotin ko Apê Xelef bi kêmanî çar caran zewicîbû û li welatê Amediyê, Hekaran, Amedê û Mukisê, bi qasi keriyê pezên ko Apê Xelef şivanî lê dikir, nebûya jî, ne kêmî keriyekî, zarokên wî hebûn. Ne bi tenê pez, nemaze pezê mêşîn, qerqaş, riser û hemdanî ko guhê wan pel e, guh didan dengê nermik ê Apê Xelef û dengê bilind ê bilûra wî, herweha keçên bedew ên bêrîvanan, nemaze yên gerdengaz û lîstikbaz ko heyrana dengên bedew bûn, guh didanê. Hûn bi ûsila bêriyê dizanin, danê êvarê, gava pez ji çêrê dihat, berî ko mîh û berxan xwe bigihanda hevûdu, di cîhê bêriyê de, keçên xama yên bêrîvanan, di destên wan de sîtil û elb, bi qesta guhanên mîhan ên tijî şîr, xwe digihandin mîhan. Li gora gotinan, wexta ko Apê Xelef di nav wextên rojê de herî zêde jê hez dikir, wexta bêriyê ko di danê êvaran de dinya diqulipand ser dîlanê, bû. Hingê dengê wî xweştir, bilûra wî geştir, kela wî germtir bû.

Gotin û pistepistan weha digot; piştî ko Apê Xelef bi dengê xwe yê nermik pezên ko bi hesreta berxan sotî bûn, aş û dilê bêrîvanên çav li henek û lîstikê nerm dikir, hingê, gava wî keys didît, di cîhekî xewle de, bi qesta alîkariyê, li nik bêrîvana herî lîstikxwaz çog datanî erdê û dest davêt guhanên bêrîvana ko bi guhanên mîhekê mijûl bû. Heke bêrîvana ko şîr didot, dengê xwe nekira û dest ji guhanên mîh berneda, hingê Apê Xelef jî dest ji guhanên bêrîvanê bernedida û ew didotin. Apê Xelef gav bi gav, her danê êvarê, şixulê xwe bi pêş de dibir û serê her gavê hunereke nû nîşanî bêrîvana guhanfirkiyayî dida. Çaxa şixul bi ser diket û bêrîvana xama, bi temamî, mîna pezên Apê Xelef, dibû heyrana deng, bilûr û tevgera


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

destên wî ko ne bi tenê hosteyên lêxistina bilûrê, lê herweha firkandina memikan bûn jî, hingê Apê Xelef, dîsan di wexteke çê de, bêrîvan xewle dikir û hunereke nû ji hunerên xwe yên bêhejmar nîşanî wê dida; doxîna şalên xwe ko hertim sist bû, vedikir û berî ko bêrî xelas bibe û tava hêlesor a danê êvarê here ava, tiştekî xwe yê din ko li gora gotinên xêrnexwazan, mîna lingê wî yê sisiyan bû, nîşanî bêrîvana dilnerm dida.

Devê xelkê ne doxîna Apê Xelef bû ko însan bikaribûya sist bikira yan jî bişidanda. Xelk dipeyivî û digot ko hunerên Apê Xelef zahf bûn, destekî wî li ser peleguhê wî, destekî jî li ser doxînê, ew gav bi gav li welatê kurdan digeriya û hem digot hem jî tovê xwe direşand. Piştî ko tov hêşîn dihatin, dibûn zarok û zarok jî mezin dibûn, tevî bêrîvana ko êdî bûbû dayikeke guhançilmisî, bi qîrevîrê, nefes lê diçikandin, hingê Apê Xelef nîvê şevan, doxîna xwe dişidand, bilûr û gopalê xwe digirt, bi dizîka, pişta xwe dida warê tovê û berê xwe dida warên nû yên bi bereket ko tijî bêrîvan bûn.

Ev hemû riwayet bûn ko me carina dibihîstin, çiqas rast, çiqas derew, kesî pê nizanîbû. Gava min êdî bîr bi çerxa dinyayê bir, hingê Apê Xelef kalekî jar, diranketî, porweşiyayî, lingekî wî kulek, rîh û simbêlên wî zerbûyî û xûzikderketî bû. Gerçî wî hê jî destê xwe yê rastê çu carê ji ser doxîna xwe ranedikir û bêyî ko haya wî jê hebe, hertim destê xwe dibir ser gunikên xwe yên êdî qermiçî û ew bi kêfxweşî difirkand, lê hingê li dora me, ji bilî Gulîzera ko bi qasî heyşt, neh salan bû, çu jin, keç, bêrîvan û evîndareke xama ya dilnerm nîn bû, ko wî jê re stran bigota û memik û hêtên wê bifirkanda. Tevî ko wî navên me tevlîhev dikir û carina bi hin navên din ko me nebihîstibûn, bang li me dikir, ji bilî me hersiyan çu zarok jî nîn bûn. Û wî hew dev ji welatê Cizîrê berdida û diçû deverên din, bêguman heke em stranên wî nehesibînin, ji ber ko ew hertim, bi dengê stran û çîrokên xwe, diçû deverên din ên welêt.

Bi tenê em hersê zarok hebûn, du zarokên sêwî û zarokekî hem sêwî hem êtim. Diya Heme û Gulîzerê ko navê wê yê eslî jî Bêrîvan bû, wefat kiribû. Dîsan li gora gotinan, çend roj bi dû bûyina Heme re, Apê Xelefê doxînsist ko hertim di nav mîz, rêx û zibilên pêz de bû, lingê xwe yê sisiyan xurandibû û ketibû hembêza dayika reben a birîndar û bûbû sebeba mirina wê. Gulîzera ko êdî di wî umrê xwe yê kicik de bûbû hek û dayikek, diya xwe dîtibû, lê Heme, mîna min, bêyî ko carekê ronahiya rûgeş a dayikekê bibîne, mezin dibû.

Ziman bêhestî bûn û qala »rindê û kewên« Apê Xelef dikirin. Ji lewre


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

mebesta Apê Xelef bi »wê rindê« û bi »wê kewa dilsotî«, çi bû û wî çêla kîjanê dikir, kîjan hatibû bîra wî, min ji dengê wî yê wê berbangê dernexist. Gelo wî çêla dayika Heme dikir? Yan bêrîvaneke din ko ji bîra wî nediçû? Min nizanîbû, lê belê min bi tiştekî dizanibû; her çaxa ko Apê Xelef strana Cizîrê bigota, hingê bûyereke girîng diqewimî. Mîna dengê wî, stranên Apê Xelef jî li gora dewr û dewranan bûn. Wî her stranê li her derî û her wextê nedigot. Her stran xwedî cîhekî diyar û wextekî misoger bû. Min, Heme û Gulîzerê bi gelek stranên Apê Xelef dizanîbûn. Gava wî stranek digot, me jê derdixist ka wî bi çi mebesta ew digot. Mebesta strana wê sibê ya Cizîrê, roja nû ya biharê bû, ko hê bi tîrên çîkî sor dinya venegirtibû û li ser çemê Dîcleyê leylan nedabû.

Gava min çavê xwe vekir û li Heme ko li aliyê din ê jûrê, bi nefeseke kûr, dinivist û lehîfa hirî ya belek ji ser xwe ve avêtibû, nihêrî, hingê bi tenê rêzeke stranê li ber guhê min ket; ez derime cem mîrê Botan... Tevî ko hê xew li ser çavê min bû, ez li rêzê fikirîm. Bi gumana min, Apê Xelef ko bi deng û gotinên xwe hem xelkê hêrs dikir hem dida kenandin, hem qirf û henekan vediguhezand guhdaran hem jî ders û tecrubeyan, hem pez dibirin ser avê hem bêrîvan dibirin cîhên xewle, dîsan, mîna her carê, bi gotinên stranê lîstibû. Ji ber ko »ez derime« di strana Cizîrê de nîn bûn, bi tenê »mîrê Botan« hebû. Çima Apê Xelef »ez derime« lê zêde kiribû? Sebeb diyar bû, ji ber ko ew roj, rojeke xas bû. Bi saya gotinên lêzêdekirî yên strana bicoş a Apê Xelef, hate bîra min ko wê rojê Mîr ê bihata ser hukim û bibûya mîr.

Heke heşê min ê kal niha min nexapîne, hingê umrê min li dora şeş, heftan bû û ew roj jî ne bi tenê roja destpêka hukimdariya Mîr, lê herweha roja Newrozê bû. Min xwe da hev û ez ji nav cîhan derketim. Hemeyê fisgenî ko bi tir û fisên xwe hewayê mezelê me yê biçûk herimandibû, bi fisefis li ser doşega hirî ya nerm diniviya. Ez bi gavên sivik ber bi pencerê çûm da ko wê vekim û tir û fisên Heme bi hewaya paqij ê çemê Dîcleyê ji xwe bi dûr xînim. Lê berî ko ez pencerê vekim û li çemê Dîcleyê ko hinekî ji pencerê bi dûr li ber min, mîna marekî fetloke çîv dida, binihêrim, min li pêşiya xwe, li derpiyê xwe yê spî nihêrî. Li pêşiya derpiyê min konekî biçûk hatibû vegirtin. Teresê hacetê min ko hingê min û Gulîzerê jê re digot »bilo« mîna lingê sêyemîn ê Apê Xelef serî rakiribû. Min şeqamek avêtiyê û jê re got, teres, ma tu bûyî lingê sisiyan ê Apê Xelef ko tu weha, biwext-bêwext, derpiyê min diqulipînî ser konekî spî yê koçeran? Ma te çu fedî û ar nîn e?


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Heye ko min hingê welê, mîna însanekî mezin ev gotin negotin û erzê biloyê reben neşikand, kitekit nayên bîra min, lê gava însan hertim tiştine balkêş dibihîse û li wan difikire, bivê nevê, ew hem tên heşê însên hem xewnên wî û hem jî tên ser lêvên wî. Piştî şeqamê min pencere vekir û hewa derve ko ji hewaya hundir a genî ko ji hûr û pizûrên xetimî yên Hemeyê gemarî derdihat, gelekî cihê bû, kêşand hundirê xwe. Bayekî sivik ê şerqî rûyê min ko bi birîna şûrê sor bûbû du bir, birî. Ro hê hilnehatibû, lê sorahiya tîrêjên royê li pey Cûdiyê û çiyayên din ko li dûrahiyên çemê Dîcleyê dixuyan, rengekî nû didan hawîrdor. Niha tevî dengê strana Apê Xelef, dengên nû yên tebiyeta ko kirasê xewê ji ser xwe davêt, dikete ber guhê min; dengê sivik ê ba, nefesa axa biharê ko zik lê qelişîbû û hêşinahiyeke bor jê dihate der, deng û pêjnên çem û çiyayên dûr ko hîs û hestê azadiyê digîhandin min, dengê çiqil û pelên darên bî û spîndaran ko bi bayê sibê diliviyan û pêjna giyayên kesk ê tarî ko bi dilopên xunava ko ketibû erdê, dibiriqîn. Ava çêm, hinekî xwarî min, bi rengekî ronî yê paqij, bi hêdîka, diherikî. Li milê din ê çêm celeb bi celeb xanî, qesr, qonax û xan, bi rengên xwe yên reş û spî dixuyan. Li pey wan jî çiyayên bilind ko serê wan bi mij û xumameke tenik hê jî hinekî tarî bû û sînga wan bi darên gwîz, zeytûn, bî, spîndar û tûyan hêşîn dikirin. Ev bergeha hanê ko Yezdanê dilovan li ber çave min ê sax, bi comerdî radixist, li roja nû ya pîroz dihat. Şefeq, rengên teze û jîndar ên roja nû, bîhna giya û kulîlkên hawîrdor ez sermest kirim. Bergeha ko dê bi dû re bibûya kahniya keder, hizîn, hesret û hêviya min û bibûya hevalbenda serpêhatiyên min, wê berbangê, li wir, li ber çavê min bû. Mîna ko ez xwe bispêrim tebiyeta welatê çemê Dîcleyê, min çavê xwe girt û serê xwe ko ji bîhna tir û fisên Heme gêj bûbû, ji pencerê derxist, dirêjî derve kir da ko dengan bêtir bibihîsim û hewaya paqij bêtir tenefus bikim.

Deng, pêjn û hîsên roja nû quweteke nû dan mêjiyê min ê zarok û min xwe zînde û bextiyar hîs kir. Her cara ko ez xwe zînde û bextiyar hîs dikim, di heşê min de sed fikir û ramanên ecêb, balkêş derin û tên. Hingê jî welê bû, bi best û hestekî mezin min dil kir ko ez bibime ba, bibime dengê bê da ko ez xwe bi hemû dengên tebiyetê bigihînim û dengê xwe û dengê wan bikime yek. Hê welê ez bi best û hestên xurt jixweveçûyî ketibûm nav gumanan, ji aliyê mezêl dengek hat. Bêşik dengê Heme, dengê tir û fisên wî bû. Tireke dirêj bi çend dengan ko ne kêmî dengê topên osmaniyan bûn, jê diçû. Min ê çi bikira? Bêyî ko ez wî fistûjê segê segan ji xew hişyar bikim, nifir û çêr li ser lêvên min, ez ji mezelê derketim.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Apê Xelef, serşivanê şivanên hemû welatê Cizîra Botan, li wir, li ser doşegekê rûniştî, pişta wî ya hinekî xûzikî bi min, strana wî li ser zimên, nanê sêlê yê hişk hûr dikir û direşand nav tawika xwe ya fireh. Mezela me li milekî mezela Apê Xelef bû. Mezela Gulîzerê ko hem mezel hem mitbax bû, li milê din bû. Ew herdu mil li mezelê Apê Xelef ko tê de ji bilî du mehfûrên dirêj, coteke doşekên hirî, çend bahlîf, du lehîf, tasa avê, misînê avdestê çu tekbêrên malê nîn bûn, digîhan hev. Apê Xelef beriya me hemûyan hişyar dibû, paşê Gulîzer, paşê ez û piştî min jî Fistûj.

Apê Xelef ko welê dixuya çûbû axurê, mîh dotibû, tawika xwe tijî şîr kiribû, bi dengekî nizm digot;

Çûme Cizîrê lê, lê, lê, lê
Lê, lê, lê, lê
Ax Cizîra Botan...

Ez, Biroyê Sêwî ko li ber destê Apê Xelef mezin û bi dengê wî terbiye dibûm, min jî beşdarî li dengê wî kir û bi dengê xwe yê zirav bersîv dayê;

Çûme Cizîrê, Cizîr wî alî
Keçikên Hebîbiyan werine vî alî
Keçikên Mêrdîniyan herine wî alî

Gava Apê Xelef dengê min bihîst, tavilê ew zivirî, rabû ser piyan, kenekî germ li ser rû, bi gavên govendê û bi lingê kulek, hate nik min, ez hembêz kirim û bêyî çu gotinê, stran domand;

Ji kerba delalê lê, lê, lê, lê
Ketime vî halî, vî halî, vî halî...

Wî gotin dîsan anîbû ser delaliyan. Bi qasî çendekê welê yek ji wî, yek ji min, me li ber hev got, heta Gulîzer, di destan de sîniyekê, hate hundir, nik me. Me dil hebû dev ji stranê berda, lê Gulîzera ko meşa wê mîna govendekê bû û ji deng û govendê gelekî hez dikir, tavilê, sînî danî erdê û dest bi lîstikê kir. Govend jî li stranê zêde bûbû; roja Newrozê, roja hukimdariya Mîr hingê, di destpêka roja nû de, li nik me, mala Apê Xelef, dest pê kiribû. Fistûj jî ji dengan hişyar bû û hat, tevî me bû.

Ez bawer im, we ji niha ve bîr bi hal û hewalê mala me biriye; mala me,


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

heke ne mala tiredînan bûya jî, ne mala b'aqilan bû.

Bi qasî demekê, heta Apê Xelef derkeve û here, welê li ser lingan, bi gotin, stran û dîlanê, me roja nû, Newroza qedîm, hukimdariya qehîm, bi ûsil û awaza xwe, pîroz kir. Piştî ko Apê Xelef nan û şîrê xwe li ser lingan, bi kevçiyê darîn xwar, wî doxîna xwe şidand, şal û şepikên xwe dan hev, gopalê xwe ko li ber devê derî bû, xiste destê xwe û ji derî derket û çû. Lê berî ko ew ji derî derkeve, li me vegeriya û gote, zarokno, cil û bergên xwe yên paqij li xwe bikin, xwe bidin hev û herin mala Mam Sefo. Mam Sefo û malbata wî, ji bo taştêyan, li hêviya we ne. Ez ê jî kerî teslîmî şivanan bikim û bêm mala Mam Sefo.

Dengê çemê Dîcleyê herî xweş ji mala Mam Sefo dihate bihîstin, bêguman heke em Birca Belek nehesibînin. Mala Mam Sefo ko ji xaniyekî bêtir bi qesrekê dişibiya, li ber devê çêm bû. Avahî, tevî mezel, meclîs, dîwanxane, kitabxane, mitbax, jûrên bêhejmar, şaneşîn, hewş û eywanên fireh mîna yek ji qesrên Harûn Reşîdê Bexdayê, bi spehî û bedewî, dirêjî avê dikir. Xanî bi du qatan û bi kevirên reş ên ferişandî hatibû lêkirin, lê ew dirêj, bi qasî ko çav didît, dirêj bû. Ez bawer im, avahiya herî dirêj ko min di heyata xwe de dîtiye, mala Mam Sefo bû, heke însan qonaxa Mîr û yên osmaniyan nehesibîne. Mal ji çend milan hatibû pê, milê mezelên razanê, milê civat û meclîsê, milê şixul, ders û îlmê, milê qewraş û berdestan û milê mezelên mêvanan, nêçîrê, xwarin, vexwarin, şuştin û lîstika me zaruwan. Hema çi bigire her roj, danê êvaran, çaxa Mam Sefo li dîwana Mîr, xanima wî ko navê wê Senemxan bû, di nav cîhan de bû, em, ez, Gulîzer û Heme, diçûn mala Mam Sefo da ko tevî hevalên xwe, zarokên Mam Sefo, Migo û Armê bilîzin. Bi tenê du milên malê ko li qata jêr bûn, ji bo me vekirî bûn, milên mitbax û berdestan. Û hewşa malê ko ne li aliyê çêm, lê li aliyê din ê xênî bû. Milên din ko piraniya wan li qata jorê bûn, li me qedexe bûn. Jixwe gava Mam ko hertim bi şixulekî girîng ê mîrekiyê mijûl bû, li malê bûya, diviya herkes gelekî bêdeng û bisemt bûya.

Mam Sefo û malbata wî ermenên Cizîra Botanê bûn, ko ji bav û kalan di xizmeta mîrekiyê de bûn. Navê Mam Sefo, Stephan Manolgiyan, navê Migo, Migirdîç û Armê jî Armenuhî bû. Navê xanimê jî, jixwe, me gote. Lê me, ehlê Cizîra Botanê ko ji kurtkirina navan hez dikir, mîna hemû navan, navê wan jî kurtir kiribû. Heye ko ez şaş im, lê bi qasî ko ez dizanim û min dîtiye, însanê herî têgihîştî û zana yê hemû welatê Cizîra


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Botanê Mam Sefo bû. Ji zimanê ermenî, kurdî, osmanî, farisî û erebî pê ve, wî bi zimanê îtalî, fransewî, îngilîzî û hinekî jî bi yê yewnanî û latînî dizanîbû. Wî dunya dîtibû, war û welat geriyabû, li Stenbol, Venedîg û Parîsê xwendibû, îlmên cihê, tevî kitabên miqedes ên cihû, file û misilmanan, xetim kiribû, hal û hewalê gerandina karên dewletê, birêvebirina pêwendiyên aborî û biserxistina hunera şer û aştiyê, bi hostehî, hîn bûbû. Wî dewlet, saray û sultanên osmanî ko hertim di nav dek û dolabên veşartî yên vegirtin û kavilkirinê de bûn, baş dinasî. Mam Sefo ne bi tenê osmanî, lê padîşahên farisî ko bi pozbilindî, derew û bêbextiya xwe nas bûn, eşîr, serekeşîr û şêxên ereban ko hertim di nav xirecireke vala û pûç de bûn û mîr û mîrekiyên din ên kurdan ko nikaribûn dost û dijminan ji hev veqetandina û dijminê dostên xwe, ji ber hesûdî û neyariya mîr û mîrekiyên cîran, dostên dijminê xwe, yanî dostên dewletên desthilat bûn, ji heft bavan û vir ve, yek bi yek, nav bi nav, kite bi kite, dinasî. Ew hem dostekî dilsoz ê mîrên Cizîra Botan û xelkê kurd bû, hem jî dostekî yekta yê ehlên din, ermen, asûr, suryan, keldan, nastûr, yaqûbî, cihû, elewî, yêzidî ko di nav me de diheyat û hertim bi êrîşên xedar ên desthilatên cîran dihatin qirkirin. Nav û dengê wî li hemû welatê osmanî û rojhilat belav bûbû. Mîrên din ên kurdan, bi kesereke kûr, digotin; dewsa ordiyeke bi sed hezar neferî, xwezî şêwirmendekî me yê mîna Sefo hebûya...

Lê Mam Sefo şêwirmendê mîrekiya Cizîra Botan ko bi erdê xwe yê fireh, bi mizgeft, dersxane, medresên xwe yên navdar û bi xan, bazar û karxanên xwe yên mezin, yek ji mîrekiyên herî girîng ên kurdan bû. Ew mîna bav û kalê xwe alîgirê mîrên botî ko ji wan re, ezîzî dihate gotin, bû.

Mam Sefo ko riya heyata min da ser vê xeta ko gihîştiye îro, zanayekî bêpayan bû, ko bi bîhnfirehî dida pey kitekitên bûyer, pêwendî, fikir û tecruban; bi hest û xurtî dikete nav şixulên çareserkirina gelşên siyasî, dînî û civakî; bi hez û coş heş, ruh û dilê xwe ji huner, edebiyat, zanîn û musîkê re vedikir û bi heyecana zarokekî dikete nav dewr û dewranên bihurî yên destan, rîwayet û çîrokan.

Mam Sefo, yekî girsî qalind, xanima wî Senemxan jî bervajiyê wî, yeka jarî zirav bû. Li gora gotinan, ko mîna Apê Xelef, xêrxwaz û xêrnexwazên Mam Sefo jî gelek bûn, gava Mam Sefo ji welatên xerîbiyê vegeriyabû, hingê xanimeke îtalî ji Stenbolê pê re bû. Xanima Mam Sefo ya şox û şeng û bi bal û endam ko di demeke kurt de, bi bedewî, kîbarî, kêf û henekên xwe deng dabû, hînî heyata welatê Botan nebûbû û vegeriyabû


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bajarê xwe yê bav û kalan Stenbolê. Bi dû vegera xanima îtalî re Mam Sefo ko hingê jî zanayê qesra mîrekiyê bû, Senemxanê ko keça patrîkê dêra ermenan ya welatê Wanê bû, anîbû.

Me zarokan ne Mam Sefo ko hertim li civat, meclîs, dîwan, nêçîr an jî li seferan bû, didît, ne jî xanima wî ko hertim nexweş, merezî û bêhal bû. Carina Senemxan, mîna siyeke tenik ko însan hebûn û nebûna wê baş seh nake, ji qata jorê dadiket mitbaxê, tiştin ji qewraşan re digot û dîsan winda dibû. Migo ko di umrê Gulîzerê û bi qasî bihustekê ji min û Heme firehtir, Armê ko di umrê me de û bi qasî bihustekê ji me jartir bû, dayika xwe zêde nedidîtin. Nexweşiyên Senemxanê çi bûn, me ew jî nizanîbûn. Lê ew mîna xeyaletekê her li qata jorê, di nav cîhan de bû.

Li malê, ji bilî keya, seyid, şivan, gavan û xulaman ko hertim dihatin û diçûn, bi qasî pênc, şeş keç û jinên berdest hebûn. Di nav malê de hertim tevgereke boş, çûyin û hatineke geş hebû; ji bixêriyan hertim dû radibû, beroş li ser êgir, sînî û teyfik li ser refan hazir bûn, bi telîsan sewze û fêkî dihatin, berx, mî, mirîşk, werdek serjê dibûn, bi teştan hevîr dihate strandin, bi sîniyan nan dipijandin, şîr eyvan dibû, rûn û nivîşk ter dibûn, penêr dihelî, cil û berg, firax û teyfik û tiştên din ên malê dihatine şûştin, xalîçe û mehfûr paqijkirin, mezel, hewş, eywan, şaneşîn maliştin. Xwarin, vexwarin, çerez, şîrînahî û zexîreyên zivistanê ji havînê de hazir dibûn û diketin nav tûr û kûpên zerzemîna malê. Herweha ji şîrê pezên Mam Sefo ko bi qasî sedî bûn û Apê Xelef, tevî pezên Mîr û yên sereskerê Mîr, dibirin çêrê, her celeb xwarin û vexwarinên şîr, firo, mast, to, dew, nivîşk, rûn, penîr, sal donzdeh meh, çêdibûn.

Gava em, ez, Gulîzer û Heme, wê roja Newrozê gihîştin mala Mam Sefo êdî ro li taştêyan bû. Ji ber xirecira Gulîzer û Heme em dereng mabûn. Apê Xelef ko hertim weha gotineke tewş digot û rûyê xwe badida diçû, dîsan bi gotina xwe xirecirekê xistibû malê û çûbû. Cil û bergên xwe yên paqij li xwe bikin, wî gotibû. Cil û bergên paqij ko gotina wan hêsan, peydakirina wan zehmet, li kû bûn? Hemeyê ko bi tir û fisên xwe em gêj kiribûn, îcar jî, bi xirecira xwe ya cilên paqij em gêj kirin. Gulîzera reben ê ew ji kû peyda bikirana! Ne cil û bergên me yên paqij û ne jî yên nepaqij hebûn. Cil û berg bi tenê yek bûn, yên li me ko êdî riziyayî bûn. Cotek derpiyên bideling ko hertim bi çilkên mîzê û lekeyên tahretê pêşî û paşiya wan zer dikirin, cotek şal ko ajnoyên wan êdî spî dikirin, kirasekî tenik î spî û şepikekî sor î tarî ko êdî tayên wan ji hev diçûn... Kincên me, hemû ev bûn. Gava Gulîzerê ew, di rojên cilşo yên mala Mam Sefo de, ji


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bo şûştinê, dibirin çêm, nik qewraşên mala mezin, min û Heme kulavên sor ên Apê Xelef ên şivaniyê li xwe dipêçan û diketin nav xeyalên rojên bê yên bi cil û bergên zêde.

Û wê rojê Heme diqîriya ser Gulîzerê û digot, min cil û bergên nû û paqij divên! Bavo jî ewaha gote me! Newroz e, pîroz e, cilên nû gerek e!

Axir, piştî xirecireke çendekê ko em hersê jî jê bêzar bûn û westiyan, cil û bergên me yên heyî li me, me da rê û em çûn mala Mam. Ji ber bextê me yê çê, sifre hê li erdê bû, ji mitbaxê bîhna nanê sêlê yê nûpijandî û şorbenîskê difûrî, li ser sêniyan her texlîd penîr, penîrê ter, pûngê, sîrikê, helandî, şoravkê, rîsî û texlîdên nivîşk, mast, dims û hungivê hebûn. Migo û Armê ko ji sifrê rabûbûn, bi bihîstina hatina me, cil û bergên wan ên nû li wan, rûyê wan geş, vegeriyan mezelê xwarinê ko li kêleka mitbaxê bû. Rûgeşî û germahiya wan tavilê veguziya dilê me jî û bîhntengiya ko Fistûjê rûtirş anîbû pê, bi carekê winda bû. Min dest bi straneke ko min di cîh de, bi gotinên xwe yên xeşîm, li hev anîbû, kir.

Newroz e, Newroz e
Xweş roj e, pîroz e
Dinya geş e, bihar e
Dilê min germ e, dîlan e...

Ji bilî Heme, herkesê ko li wir bû, li çepikan xistin û em rûniştin ser sifrê. Armê ko gelekî bi dayika xwe ya esmer dişibiya û mîna skeletekî jar û zirav bû, li nik min rûnişt. Ew jî hevala min a lîstikan bû û mîna Gulîzerê wê jî di lîstikên me de »bilo« dîtibû û jê re, mîna Gulîzerê, digot »bilo.«

De zûke, bixwe, em herin bilîzin, wê got û tasika hungiva zer î zêrîn a welatê Hekaran anî ber min.

Min ajnoyeke xwe danî erdê, dirêjî sifrê bûm, tiliya xwe xiste nav tasikê û tiliyeke hungiva şêrîn a ron bir devê xwe û gotê; îro Newroz e, em ê, herkes, hemû bi hev re bilîzin.

Mayrîg zahf nexweş e, wê got, Mayrîg dixwaze, em herine balê.

Hayrîg li kû ye? Min jê pirsî.

Bi xêra çûyin, hatin û lîstikên me, ez gotinine ermenî hîn bûbûm. Armê çêl li dayika xwe, min jî, bi henekî, li bavê wê dikir.

Hayrîg li kitabxanê ye, wê li min vegerand, tiştekî dinivîse.

Piştî ko me zikê xwe têr tepisand, tevî du qewraşên malê, em hilkişiyan qata jorê, mezelê Mayrîgê ko tê de têkber ne zede bûn û jê bîhneke mîna


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bîhna misk û emberê difûriya. Senemxana zerbûyî li ser textekî razanê yê teng, di nav nivînên paqij ên çikî spî de bû. Gava çavê wê bi me ket, kenekî diyar li ser rûyê wê yê gelekî zirav diyar bû û wê xwe hinekî da hev, bi alîkariya qewraşekê, balîfên pişta xwe rast kirin û qama xwe bilind kir. Kirasekî şevê yê spî û neqişkirî lê, xaçeke stûr a zêrîn jî bi stûyê wê ve bû. Li ber serê wê maseyeke dirêj ko resmekî nûranî yê Mesîh, zengilekî kiçik ê hesinî, kitabeke reş a cîldkirî, tasek û teyfikeke kûr lê bûn, hebû. Li hember me jî pencereyeke hinekî vekirî ber bi çemê Dîcleyê hebû. Dengê ava Dîcleyê mîna straneke xweş û nerm a Newrozê bi guhê me diket û ronahiya ko ji pencerê dirêjî hundir dikir, heta nik me, ber derî dihat. Oda spî di nav gewheriyeke berbanga wê roja girîng de bû.

Wê herdu destên xwe vekirin û bang me kir; werin gidîkên min, werin...

Gidîk, berxik bû, em berxên wê ko di yarî û lîstikan de hîç ne mîna berxikan bûn, ber bi wê çûn. Armê bi hedîka xwe avête hembêza wê. Bi qasî çendekê wê tiliyên xwe yên zirav di nav porê Armê de gerandin, geh li me, geh li Armê nihêrî û bi zimanê xwe duayek xwend; hayr, vortî, hokîn sûrp, astvadz... Du rondik ji çavên wê ber bi jêr bûn, lê tevî rondikan, ken li ser rûyê wê bû.

Cejna we pîroz be, wê bi kurdî, bi dengekî gelekî sext got û bi ermenî domand, park dîroç, park dîroç...

Em yek bi yek, bêyî ko çu dengî derxînin, bi edeb, ko di esasê xwe de ne şixulê me bû, çûn destên wê. Çaxa dor hate min, wê bi kêfxweşî gote, dixa were, dixa were. Lê gava ez çûm destên wê yên qermiçî û zirav û wê jî dil kir eniya min ramûse, wê madê xwe tirş kir.

Ew çi bîhn e bi ser te ketiye, zo!.. Wê gote min.

Tavilê ez li Heme vegeriyam, lê min fedî kir ko ez bibêjim, sebebê van bîhnan aha eve ye.

Heye ko bîhna kadîn û axurê be, min bi fedî gotê.

Piştî ko em hemû çûn destên wê, ew li qewraşan vegeriya û gote wan; şekir û diyariyên gedeyan bidin wan, Heme, Biro û Gulîzerê bibin, bişon û cil û bergên paqij li wan kin... De herin, Baron li hêviya we ye.

Gava em ji derî derketin, mîna ko tiştekî hatibe bîrê, wê bangî min kir.

Biro, were Avedaranê bide min.

Çima wê di nav zaruwan de bangî min kiribû, ez pê nizanim, lê min dizanîbû ka mebesta wê bi Avedaran-ê çi bû, ez vegeriyam ber masê, min rahişt Mizgîniya Xwedê, yanî Încîla Îsa Mesîh û min ew dayê.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Dengê teyrê tawis çawan e? Mîna dengê teyrekî goştxwir, em bibêjin êlo, doxan û bazekî, ko hêlînên wan di bilindahiyên asê yên çiyayên Cûdî û Herekolê de veşartî ne, tîz û dirêj? Mîna dengê qulingekî koçer ko di destpêka biharan de tên qiraxên çemê Dîcleyê, nerm û xweş? Mîna dengê leglegekê ko mîna qulingan di biharan de tên û hêlînên xwe li ser qubîdankên kêleka çem ava dikin, hişk û nexweş? Mîna dengê qaz û werdekên çemê Dîcleyê neşêrîn? Mîna dengê şalûl û bilbilên ko di qesra Mîr de, li Birca Belek, strana gul û rihanan dibêjin, zirav û bihîstiyar? Mîna dengê teyrê sîmir ko di efsaneyan de mîrê teyran e û di her perekî baskên wî de huner û neqşên bêhejmar, ronahî û şewqên bêpayan hene, xurt û bilind? An jî mîna dengê teyrê zumritî anka ko her pênc sed salan carekê dixuye, baskekî wî zêrîn, baskekî jî sor e û ji xulava xwe, ji nû ve vedije, gur û kûr?

Heke we teyrê tawis nedîtibe û li dengê wî guhdarî nekiribe, hûn pê nizanin.

Min jî pê nizanibû, heta ko ez, di xortaniya xwe de, çûm warê miqedes ê yêzidiyan, geliyê Lalêşê yê pîroz û li wir min bi alîkariya neqiş, sûret û dîmenan, li xweşikahiya teyrên tawis temaşe kir û bi dû re jî, li bexçê sereya siltanê Osmanî û li qeleha bajarê Xaniyayê ko li girava Girîtê ye, li dengê wan guhdarî kir. Lê belê heta wê rojê, ji bo min, dengê teyrê tawis mîna dengê Mam Sefo bû; dengekî gur, xurt û kûr. Ez ê di şevbuhêrkên bê de jî çêla dengan bikim, lê bi mebesta dengê Mam Sefo, divê ez bibêjim ko dengê gur, xurt û kûr, balkêş e, însan li xwediyê deng meraq dike, bîr dibe ko li pey wî dengî hin mebestên din ên veşartî, hin zanînên kûr ên nediyar hene. Gurbûna deng ji heyecanê, xurtbûna wî ji coşê, kûrbûna wî ji zanînê ye. Heyecan, coş û zanîn, sê celebên hîsên însanî ne ko tahm û rengekî xweş didin heyatê.

Em vegerin ser wê roja xwe ya pîroz... Piştî ko ez, Heme û Gulîzerê, bi destên nermik ên qewraşan hatin şûştin, bi bîhnên xweşik bedenên me hatin mistdan û em ji bîhna mîz, zibil, ka, alif, fis, tir, toz û tebarê rizgar bûn, me kiras, derpî û cilên nû yên paqij li xwe kirin, tevî du qewraşên bedenzirav û gavsivik ko hertim bi me re bûn, bêrîkên fireh ên şalên me yên nû û rengîn tijî şekir, bihîv, gûz û loqim, rûken û kêfxweş, em dîsan ji pêpelûkên kevirên nehît ên malê hilkişiyan qata jorê û çûn kitabxanê, warê ko Mam Sefo li hêviya me bû.

Li ber derî, qewraşan em dan sekinandin, cil û bergên me dan hev û tembîh li me kirin; li nik Baron bi terbiye bin, xwe melivînin, bi hev re


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

melîzin, yarî mekin, mepeyivin, bêyî ko ew bi we re bipeyive yan jî tiştekî bipirse, bersîv medinê, destê xwe medin tiştan, şekir mexwin.

Mîna ko em nediçûn kitabxanê, nik Mam Sefo, lê diçûn zîndanekê.

Gava deriyê giran ê kitabxanê, bi herdu milan, vebû û em ketin hundir, Mam Sefo ko bi bejna xwe gelekî dirêj, bi milên xwe stûr, bi bala xwe lihevhatî bû, li aliyê din ê kitabxanê, li ber deriyê şaneşînê yê fireh li pê rawestiyabû û çavên wî li der, li ser ava çemê Dîcleyê, di nav fikir û gumanan de, bi hêdîka, bi aramî, qelûn dikêşand. Dûmana qelûna wî ber bi aliyê şaneşînê bilind dibû. Mam Sefo ko me hertim wî di nav şal û şepikên spehî û bi taybetî risiyayî yên botî de dîtibû, niha di nav kincên frengî de bû, çakêt û pantolên dirêj ên boz î tarî, coteke pêlavên reş ên frengî di pê de, gomlegekî spî lê û qrawateke belek î sor li ber bû. Simbêlên wî yên boq ên kizirî mîna her carê ber bi jor badayî, rîha wi ya kin û qît ko ne mîna rîhên palik ên paşayên osmanî, şêx û melayên botiyan bû, bi rengekî morî tarî hatibû henekirin. Çavên wî yên belek kilkirî, porê wî yê bi tayên spî hinekî gewr ber bi paşiyê xweş şehkirî bû.

Gava çavê wî bi me ket, rûyê wî geş bû, bi ken, ew ber bi me hat; zarokno werin, werin... Cejna we pîroz be, roja we bimbarek be...

Tevî ko Mam Sefo bi gelek zimanan dizanîbû, wî tu carê, mîna xanima xwe û gelek kesên din ên file, ziman tevlihev nedikirin û bi kurdiyeke zahf paqij û edebî ya Cizîra Botanê dipeyivî. Herwekî ko hûn seh dikin, kurdiya min ne ewçend kurdiyeke saf a Cizîra Botanê ye, min kurdiyek ko li stran, gotin û serpêhatiyên min tê, ji devok, lehçe û gotinên herêman aniye pê. Lê kurdiya Mam Sefo, bi gotin, ûslub û lezeta xwe, ya ehlê Cizîrê bû. Herçend Apê Xelef hosteyê stran, bilûr û firkandina gunik û memikan bû, Mam Sefo jî hosteyê hunera axaftinê bû.

Wî em, yek bi yek, hembêz kirin, ji eniya me ramûsa, şekirên rengîn ko di nav siniyeke zêrhêlî de bû, dan me û em birin ber deriyê şaneşînê.

Di heyata her însanî de hin şev, hin roj, hin berbang, hin hingûr hene ko ruhê însên vedigirin, riyeke nû didin ber însên û tu carê ji bîr nabin û mîna siya însên, heta gorê, bi însên re ne. Bayekî sivik ê berbangeke ronî, tîrêjeke tenik ê danê êvareke aram, taveke germ a rojeke havînê, stêreke xuricî ya şeveke tarî, çend kulîlkên nerm ên berfeke spî, çend dilopên baranê yên xunaveke paqij dikarin tesîreke welê li hemû heyata însên bikin ko însan, heke bixwaze jî, êdî tu carê nikare xwe ji bin bandûra wan rizgar bike. Ew roja ronî ko êdî ber bi nîvroyan diqulipî, ji bo min, rojeke welê bû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Em, li kitabxana Mam Sefo, li ber deriyê fireh ê şaneşînê ko vekirî bû, li kêleka hev, destên me li ser bêrîkên me yên tijî şekir, bi coş û meraq, li pê rawestiyabûn û me li dengê Mam guhdarî dikir, li bergeha havîrdor dinihêrî. Çemê Dîcleyê li ber me, bi nazenîn û aramî, diherikî. Tîrêjên tava germ a roja nû ko êdî Cûdî û çiyayên rojhilat li pey xwe hiştibûn û xwe gîhandibûn bilindahiyên esmanan, li ser ava şîn leylan didan. Çend kelekên tijî însanên ko bi def û zirnê û bi dengekî bilind stranên Newrozê digotin, li ser avê bi hêdîka hêl dibûn û ber bi aliyê jor, qesra Mîr diçûn. Refekî teyrên mezin, ko ez bawer im, quling bûn, mîna ko ew jî bixwazin roja nû pîroz bikin, di ser Dîcleyê re, bi nizmahî, difiriyan û dikirin qîre-qîr. Hinekî ji me bi dûr, li deverên xanên mêvan û kerwanan, mehîn û hespina dikirin hîrehîr. Qiraxên çêm bi rengên têkel ên giya û kulîlkên têkel ko piranî hilaleyên spî û sor bûn, qulipîbûn ser seyrangeheke rengîn. Reng û dengan hingê ruhê min ê zarok vegirtin. Min guhê xwe û çavê xwe yê sax da ser deng û rengan.

Piştî çendekê, mîna ko ji nişka ve hatibe bîra min, min serê xwe ji bergeha çêm bada û bala xwe da aliyê hundir, kitabxanê.

Evçend kitab!.. Min tembîha qewraşan ji bîr kir û bi dengekî bilind û heyirî got.

Belê, evçend kitab, ji bo îlim, îrfan û zanînê, Mam Sefo li min vegerand.

Ma te ev hemû xwendine, Mamo?

Xwezî, xwezî... lê ne wextê min heye ko ez hemûyan bixwînim, ne jî umrê min têrî dike.

Lê hayrîg dixwîne, varjabed dixwinin. Lê ne Migo, ne mayrîg. Migo bi tenê li sûretan dinihêre, Armê, çavên wê yên mezin li ser Migo, got.

Kitabxana ko ji hemû mala Apê Xelef mezintir bû, seranser kitab bûn. Dîwarên spî yên kitabxanê hemû bi refên rengê qehweyî, ref jî hemû tijî kitab bûn. Her celeb kitab, bi her texlîd rengî li ser refan bûn; biçûk, mezin, cîldkirî, zirav, qalind... Ez ji komê veqetiyam û çûm ber kitaban. Bîhneke taybetî ya kitaban hebû, ko hinekî bi bîhna hirmiyeke çilmisî yan jî bi bîhna gendoreke qelişî ko li ber tavê maye û bûye tirşokî, dişibiya. Herfên li ser pişta kitabên ko li hember min bûn, herfên ecêb bûn. Min herfên mihemedî dinasîn, lê ev herf ne mihemedî bûn. Min rahişt kitêbekê û ew ji ref kêşand. Di rûpela yekemîn a kitaba qalind û cîldkirî de sûretê kalekî rîhdirêj û di binî de jî rêzine bi wan herfên ecêb hebûn. Min tiliya xwe ya dirêj a destê rastê bir ser herfan û çend caran tilî bir û anî.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Evene, tîpên latînî ne, Mam Sefo, ko bêdeng hatibû û li pey min rawestiyabû, got.

Tu bi van herfan dizanî, Mamo? Min li rûyê wî yê gulover nihêrî û pirsî.

Helbet, wî, rûgeş, got, tîp cûre bi cûre ne, ji bilî van jî tîpine din hene, tîpên ermenî, grekî, rûsî, sînî... Ji yên sînî pê ve, ez bi hemûyan dizanim.

Ji lewre serê hayrîg evçend mezin e, Armê bi dengê xwe yê zirav got.

Ez hertim li mala Mam Sefo bûm, lê çu carê neçûbûm kitabxanê. Ew cara yekemîn bû ko ez li wir bûm. Kitabxane bi çu mezel, jûr, dîwan û meclisên ko min dîtibûn, nedişibiya. Wê hingê ruhiyeteke gelekî xas da min ko min çu carê hîs nekiribû, mîna ko ez li cîhekî miqedes, li malek ko însan ruh û heşê xwe tê de geş dike, li nexweşxaneyek ko însan tê de birînên xwe yên nefsî dicebirîne, bûma. Gerçî umrê min ne zêde bû, lê heta hingê min di heyata xwe de, bi tenê du kitab dîtibûn, Qurana kerîm ko li mala Apê Xelef, li dîwêr hilawestî bû û çu carê destê kesekî lê nediket û Încîla Mesîh ko hertim di destê Senemxanê de bû. Niha, li kitabxana Mam Sefo, li ber min deryayeke ronî û bêdawîn ji kitaban vedibû.

Li erdê çend mehfûrên bi neqşên rengîn ên welatên Hekar, Behdînan û Wanê hebûn. Li dîwarê hember min, li jorî ref û kitaban çend lewheyên rengîn ên bi destan çêkirî dixuyan. Kitabxane ronî bû, tîrêjên tavê, bi comerdî, dirêjî hundir kiribûn û bûbûn hevalên me yên dilsoz ko roja me hîn bêtir geş dikirin.

Ez dîsan ji komê veqetiyam û çûm ber refên hember û min li lewheyan nihêrî. Lewheyek ko di nav çarçeweyeke neqişkirî û zer de bû, ya Îsayê Mesîh bû. Yeka din sûretê dêreke kevnare ko di nav çiyan de, li ser girekî bilind bû, berpêş dikir. Li ser birca dêrê ya zingilê, xaçeke stûr û li kêleka dêrê jî çend mehîn dixuyan. Du, sê lewheyên din jî li kêlekên wan hilawestî bûn. Lê lewheya ko herî zêde bala min kêşand, lewheyeke stûr a teyrekî bû. Teyrekî ko bi qasî qazeke mezin bû û stûyê wî bi yê werdekekê, lingên wî bi yên leglegeke, nikulê wî bi ya qulingekî dişibiya, per û bask vekirî, di lewhê de dixuya. Min teyrekî weha xas ko ji çend teyrên cihê hatibû pê, hê nedîtibû. Per û baskên teyr gelekî balkêş bûn, hem per û bask ko stûr bûn hebûn hem jî li pey teyr ji perên dirêj sîwaneke bilind yan jî konekî vajî yê gewendeyan hebû. Û hemû per bi rengên têkel, mîna keskesora piştî baranên boş, bedewiyeke bêpayan dihanîn pê. Teyr, ne bi heft rengên keskesorê, lê bi heftê û heft rengan xemilîbû. Ez li ber lewhê rawestam û bêdeng, bêlebat, min lê nihêrî. Ez ji


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

her tiştên wê roja nû ko ez weha kite bi kite qal dikim, bi dûr ketibûm û bi lewhê re bûbûm yek. Çavê min, kite bi kite, per bi per, reng bi reng, neqiş bi neqiş, li ser teyr diziviri.

Eve teyrê tawis e, Mam Sefo ko dîsan hatibû kêleka min, got, teyrê reng û neqşan...

Li welatê Cizîrê ji van hene, Mamo? Min jê pirsî, bêyî ko ez rûyê xwe ji lewhê badim.

Naxêr, lê li welatê başûr, Lalêş û Nînovayê hene. Ev teyrê hanê remza bav û kalên te ye.

Bav û kalên min? Min bi meraq lê vegerand.

Belê, bav û kalên te, yêzidî... bîrewerên kevnare yên dînê Zerdeşt... Lê belê, êdî xwe bidin hev. Biro, Heme û Migê, hûn ê bidin pey min. Em ê herin dîwana Mîr, ji bo pîrozbahiyan... Botî bi mîrê xwe, Şervanî bi şûrê xwe, Hekarî bi ra û tekbîra xwe... De zûkin, em herin nik Mîrê xwe...

Dengê bêdengiyê jî yek ji dengên bêhejmar ên heyata min e. Her cara ko çêl tê ser bav û kalan, Laleş û êzidiyan, mîna niha, şopa şûr a rûyê min diêşe, germahiyek ko nefesê li min diçikîne, bi ser min de tê, dengê min tê birîn û dengê bêdengiyê zora hemû dengên din dibe, wan difetisîne.

Dengê bêdengiyê seh nabe, hîs dibe; ne bi guhan, bi ruh û can tê bihîstin. Ji ber ko dengê bêdengiyê ji şûrê osmanî, ji derbên şûrê çavsoran û ji xwîna mazlûman hatiye pê.

Çavê min ê kor jan dide.
Şopa şûrê tûj ko rûyê min qulipandiye ser sûretê mirinê, diêşe.
Bedena min a girs ko hew xwe radigire, bi kela êşa birînên do
û îro, dilerize.
Heşê min ê westiyayî dengê min dibire û min hildigire dibe.
Bi qesta bîhnvedan, av vexwarin, mewîj xwarin û cixare pêçanê,
ez derim wê roja şûrê tûj, ko rojek ji rojên welatê bav
û kalan e.
Bêdengiya ko ji şerm û fediyan e, êdî dengan vedigire.
Heke we dil hebe, heke we hunera bihîstina dengê bêdengiyê
hebe, fermo, werin dengê bêdengiyê ko êdî li dar e.

Deng.
Dengê kundekî nîvê şevan ê mûsîbetê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Dengê dîkekî berbangê yê miyeseriyê.
Dengê wawîkekî çolê yê qeza û belayê.
Û dengê dayik, dayika şîr û hembêzê.
Reng.
Rengê ronî yê welatê bav û kalan.
Rengê tarî yê çiyayên Şengalan.
Rengê kesk ê bihara gundê yêzidiyan.
Û rengê gewher ê dayik, dayika hebînî û evînan.

Bîhn.
Bîhna axa sor a nûhişyarbûyî.
Bîhna rihan, sosin, nêrgiz û gulên nûbişkovî.
Bîhna kulîlkên spî yên darên behîvî.
Û bîhna dilovan a dayik, dayika rehmet û delalî.

Bi tenê bîhna nerm a hêşinahiya biharê û ronahiya berbangê.
Bi tenê dinya bedew û hawîrdora spehî ya şewqê.
Kulîlk, çiqil, pel, dar, ber, heywan.
Çivîk, vîçevîça çivîkan.
Av, xuşexuşa avan.
Paqijî, zelalî, nermî û geşiya destê sibehan.
Seg, tajî, nobedarên bêhejmar ên gund û gundiyan.
Pisîng, ker, dahşik, hesp, mehîn, cahnî, mîh, bizin, berx, kahr.
Dîk, mirîşk, wefadarên qedîm ên gund û gundiyan.
Bi tenê tevgera geş a heyata gund û daxwazên heyatê.
Bi tenê heyata sade û xwestekên basid ên vê heyatê.

Lê deng, dengên nexweş, bisaw.
Pêşî seg, bi hewtehewt, bi kûzîn.
Paşê teyr û çivîk, bi çîqeçîk, bi qîjîn.
Paşê ker, hesp, mehîn, bi hîrehîr, bi revîn.
Paşê însan, bi qîreqîr, bi tirsîn.
Paşê dayik, bi nalenal, bi axîn.
Paşê zarok, bi welewel, bi girîn.

Lê deng, dengên nexweş, bisaw.
Dengên dûr, mîna dengê zelzeleyekê,


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Dengên sim û lingên hespan, mîna dengê berfendeyekê.
Dengên siwaran, mîna dengê birûskekê.
Û paşê dengê şûrbazan, mîna dengê qiyametê:
Allah, Allah, Allah...
Allah, Allah, Allah...

Dengê bav û kalan, belê, min gewriya xwe bi avê şil kir û bîhna xwe veda, em gotina xwe bidomînin... dengê bav û kalan ko hingê bi tenê mîna dengê lawaz ê çîrokekê digihîşte me û dibû şirîkê dengê me zarokên li kitabxanê, – ko hê bêhay ji qiyametên rojên bê û bêguman bûn. Cizîra wê rojê, Cizîra zarok û xortan, Cizîra hêvî û heyecanê bû, ne mîna Cizîra îro ya mirî û xewn û xeyalên şikestî. Şer hê nîn bû, xwîn nerijabû, mirinê mohra xwe li eniya însanê botî nexistibû û heyatê terkî me nekiribû. Ji berevajiyê, hêvî û heyatê, mîna dengê dengbêjekî xurt ko olan dide, bi sê dengan, bang li me dikir; gelî botiyan werin dengê me, werin dengê heyatê.

Hingê bihar û tav bû, şinahî û çîçek bû, newroz û cejn bû, Mîr û hêvî bû. Hingê, wê rojê tarîtî diçû ronahî dihat, serma diçû germahî dihat.

Dewleta osmanî nexweş bû û derb li ser derbê dixwar. Gelên bindest ên osmanî kêfxweş bûn û serhildan li ser serhildanê danîn pê. Kurdên ko di nav mîrekiyên bêhejmar de belav bûbûn, vê yeka hanê, ji bo miyeseriya xwe, îmkaneke zahf baş didîtin. Û wê roja Newrozê, Mîr Salih ko însanekî zahf dîndar û kekê Mîr bû, dev ji mîrîtiyê berdida û birayê wî yê kiçik Bedir Xan dibû mîr. Me nizanîbû ka Salih Beg çima dev ji mîrîtiyê, mal û milkên dinyayê, şan û şohreta hukimdariyê berdida. Lê li gora gotinan, wî dev ji her tiştî, heta ji jin û cariyan jî berdida û dibû mirîdekî dîn û terîqetê, nimêj û niyazê.

Ji Cizîra Botanê re mirekî jîr, xurt, serwext û bîrbir diviya, ko bikaribiya hukimdariyeke tekûz bianiya pê û eşîr, binemal û deverên peregende li hev girêbida, wan têxista qalibekê, mîrekî welê ko xelkê hem jê hez bikira hem jê bitirsiya, hem hêvî bida xelkê hem xirecirên xelkê ko hîç xelas nedibûn, haş bikira, hem xelkê bi serê wî sond bixwara hem zarokên xwe bi tirsa wî bikira xew, hem stran û destanan ji bo wî lêkira hem bi fermaneke wî biçûya mirinê, hem bi edaleta wî aştî bianiya hem bi şûrê wî aştî têk bida. Ji Bedir Xanê xort û xurt ko min di hin stranên xwe de mîna »Mîrê Zirav« bi nav kiribû, pê ve, kî dikarîbû bi van karan rabûya?

Li dinyayê çu tişt ji bextiyariya destpêka rojeke ronî ya cejnan çêtir nîn


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

e, heke hêvî li ber deriyan, hest jî li ser dilan be... Mam Sefo, Migo, Heme û ez, tevî çar pasevanên Mam ko bi şûr û xencer bûn, ji hewşa fireh a malê ko bi gul û kulîlkan reng dida, bihurîn û ketin nav şêniyên bajarê Cizîrê. Mam Sefo ko hertim bi şal û şepikên xwe yên hewrêşimî, li ser pişta hespê xwe yê belek î kihêl ê erebî bû, îcar, di nav cilên frengî de, mîna alîmekî frengî cîdî û jixwerazî, dixwest bi peyatî here qesra Mîr da ko li rê, cejna ehlê Cizîrê jî pîroz bike. Tevî ko Cizîr bajarekî kevnar ê hemû Mezopotamyayê bû û ji demên Nebî Nuh mabû, wê rojê bajêr mîna bûkeke nûgihiştî û nazenîn xwe xemilandibû; xelk bi cil û bergên xwe yên paqij û rengîn li kuçan, dar û ber bi cil û bergên xwe yên rengîn li qiraxên çêm, minareyên spî yên mizgeftan û bircên dêr û qesran bi rengên xwe yên spî û reş, ber bi asimanan bûn. Piraniya dîwarên xan û xaniyên bajêr ên tarîxî ko bi çelpeka spî nû hatibûn sîwaxkirin, şewq didan. Asiman zelal, xanî û kolan paqij, însan rûgeş û hêviya rojên bê li dar bûn.

Madem qal hat ser asimanê, divê ez bibêjim ko asiman û hawîrdor wê rojê mîna rêzên qewlê yêzidiyan bûn; dûre ji renga xemilî. Sor bû, spî bû, sefirî. Sor bû, spî bû, geş bû. Ji minareyan dengê azanê, ji bircên dêran dengê zingilê, ji kuçe û kolanan dengê def û zirnê, ji medrese û dîwanxaneyên terîqetan dengê tekbîr û erbanê, ji xanan dengê têkel ê kerwanan, ji hewşên malan dengê tilîliya jinan û qîreqîra zarokan dihat. Herkesî, bi rûyekî ken û geş, hevûdu pîroz dikir, mezin diçûn rûyê hev, zarok diçûn destê mezinan, kal û pîr diçûn eniya zarokan. Herçî dildarên ko nû bi taya evînê ketibûn, diyar e, nikaribûn herin rûyê hev, lê wan jî, di wê roja Newrozê de ko herweha roja evîndaran bû, ji ber derî û penceran, eywan û hewşan, bi livîna lêvan, kenê rûyan, nêrîna çavan û xeyalên bi heyecan, hevûdu hembêz dikirin. Dua dihatin xwendin, xaç derdiketin, stran dihatin gotin. Şêniyekî boş ê bêpayan ko Cizîrê çu carê nedîtibû, mîna pêlên Dîcleyê ko di biharan de dibû lehî, bi ser bajêr de hatibû. Ehlê welatê Hekar, Behdînan, Amediye, Soran, Baban, Urmiye, Şikak, Diyarbekir, Siwêrek, Riha, Semsat, Dêrsim, Bêdlîs, Mikus, Wan, Serhet, Mêrdîn, Tor, Çiyayê Kurmênc, Antaqiya û gelekên din, bi hênceta pîrozbahiya Mîr, hatibûn Cizîrê. Bajar qulipîbû ser bajarê ko Seydayê Xanî, şaîrê bajarê Cizîrê û welatê Botan, di beytên xwe de çêl lê dikir;

Roja ko dibûye îd û newroz,
Tazîmê ji bo dema dilefiroz,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Sehra û çîmen dikirine mesken,
Beyda û dîmen dikirine gulşen.

Gava em ji malê hinekî bi dûr ketin, Apê Xelef jî, bi gavên kulek û bi bîhneke giran a ka û zibilê, xwe gîhande me. Rûyê wî ko bi xêzikên heyatê qermiçî bû û bûbû mîna axa nûcotkirî, dikeniya.

Min pez şand çêrê, wî got û serê xwe bilind kir da ko here rûyê Mam Sefo.

Mam Sefo ko jê gelekî dirêjtir û girstir bû, xwe xwar kir, çû rûyê wî, cejna wî pîroz kir û gotê;

Eger te dil hebe, bi me re were. Yan na, here malê, xwe bişo, bixwe, vexwe û paşê were qesra Mîr.

No, ez jî têm, wî got û xwe da bin çengê Mam Sefo û meşiya.

Gava em, Mam Sefo û Apê Xelef li pêş, Migo, Heme û ez li paş, pasevan jî li herdu milên me, di nav girseya şêniyan de, bi zehmetî, bi ramûsan û bi gotinên pîrozbahiyê, gav bi gav ber bi çêm dimeşiyan, cil û bergên fireh ên Migo li min, şekir di devê min de, destekî min di bêrîka min de li ser şekirên şêrîn, destê din jî geh li ser çavê min ê sax, geh di nav difnên min de, bala min li Migoyê stûr û Hemeyê zirav ko min xwe hinekî jê, jiber bîhna fis û tiran, bi dûr xistibû, hingê, ez nizanim çima, lê hingê çavê min ê kor êşiya û min tiştekî, bi xurtî, hîs kir; ew meşa me ko ber bi Mîr diçû, dê, tevî Mîr, heta mirinê bidomiya. Meş ê li qesra Mîr xelas nebûya, ji wir jî, wê dê li ser rê û xaçeriyên fetloke yên heyatê ko tijî sir bûn, ber bi qesr û qonaxên din ên heyatê biçûya, heta mirinê.

Piştî ko me çend kolan û meydanên bajêr ko bi kevirên reş ên biçûk lêbûbûn, li pey xwe hîştin û em gihîştin ser riya fireh ko mîna milekî çêm bû û dirêjî çêm, ber bi qesrê diçû, hingê min çem bi hemû bedewiya wî dît. Çem, bi rengê asimanê, çîkî şîn, bi nazenîn, bi aramî, diherikî. Darên kevnare yên çinaran ko bi keskekî tarî xwe xemilandibûn û riya fireh ko riya sereke ya kêleka çêm bû û hemû riyên bajêr, bivê nevê, xwe digîhandinê, dirêjî çêm, mîna şirîkên heyata çêm, diherikîn. Hingê hîseke nû ko bi hîsa min a din nedişibiya, ko di esasê xwe de pirsiyarek bû û di tahma şekirên Mam Sefo û Senemxanê de bû, ruhê min vegir. Ev çemê ko hertim, bêdeng, tevî heyata me dibû, bêdeng şahidî li serpêhatiyên me dikir, çi difikirî? Wî li me çawan dinihêrî? Heke ew jî mîna me benî ademan bikaribûya bipeyiviya, wî dê çi bigota? Dengê wî dê çawan derketa?..

Çilka kela strana Dîcleyê, afirîna destana Dîcleyê hingê kete dilê min. Bi dû re, gava ez bûm însanekî têgihîştî û dengbêj, min bîr bi hîsa xwe ya wê rojê bir; min diviya strana çemê Dîcleyê li hev bianiya û mîna çêm, bêwest, bêrawest, bêdawîn, her bigota.

Dengê strana Dîcleyê, ko hemû umrê min pê re çû, herwekî çêm, geh geş e, geh zîz, geh şên e, geh keserkûr, geh tahl e, geh lezîz. Ew geh bi awazeke bilind e, mîna stranê, geh bi dengekî nizm e, mîna şiîrê. Weha;

Dîcle me ez,
Dengê Dîcleyê,
Nêrîna tarîxê, dilê însaniyetê,
Destpêk im ez, zayin, hebûn.
Çemê cenetê, destebirayê Aras, Zap û Firatê,
Tewrat, Încîl, Quran,
Adem im ez, Birahîm, Nûh.
Tofan, Cûdî, Herekol.
Kevokeke spî, pelekî hêşîn a dara zeytûnê, vejîn, vejîna heyatê.

Wext, do, îro, sibê. Wext diherike, diçe, tê.
Xem, xewn, xeyal. Sûretên wextê, heyam, dewr û dewranê.
Kesk, şîn, zer. Sor, rengê xwînê. Rengê wextê, do, îro.

Xurt nerm, zîz şên, bilind nizm. Deng im ez, dengê bayê,
Berf û baranê, ax û brûskê.
Bi stêrên zêrîn ên xuricî dikevim xewê,
Bi tîrêjên zêrîn ên tavê hişyar dibim.
Şîn im, mîna asimanê, bîhnfireh, bihîstiyar.
Kesk im, mîna biharê, evîndar, hêvîdar.
Boz im, mîna kevirê, xemgir, stûxwar.
Sor im, mîna axê, şikestî, birîndar.

Keser im ez, mirin, li eniya însanên botî nivisî.
Bextiyarî me ez, heyat, li axa Mezopotamyayê zayî.
Xizîn im ez, hesret, li pey malwêran û derketiyan hîştî.
Evîn im ez, hez, li pey salan, esran, însan û medeniyetan mayî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Keştî me ez, kelek, ya Nûh, ya Keso.
Selahedîn, Ezîzan, Mîro. Ji Cûdiyê ber bi Nînovayê, Babîlê,
Basrayê.
Welat bi welat, gel bi gel, ziman bi ziman. Heyam bi heyam.
Esker, şûr, tîr, mirtal.
Hesp, dewar, pez.
Titûn, zeytûn, hevrêşim.
Însan, însan, însan.
Şer, pevçûn, şewat, hilweşîn.
Sil, sext, şaş, mat, dudil, ketî, windabûyî, mirî.

Dîcle me ez, zimanê bêzimanan, dengê bêdengan.

Dengê însanan, ruhê wan e, ji dengê wan hûn dikarin nexşeya ruhê wan, daxwaza dilê wan keşf bikin û bîr bi fikir û gumanên wan bibin. Lê belê wê roja Newroz û pîrozbahiyê ev yeka hanê ne mimkun bû, ji ber ko deng bêpayan, însan bêhejmar, tevger bêrawest bû. Ji her derî dengên têkel bilind dibû. Li her kuçe, kolan û meydanê govend hatibûn girêdan, dîlan li dar bûn, bilûrvan û tembûrvanan lêdixistin, keç û xortên xama dilîstin.

Gava me xwe gîhand kelehê û qesra Mîr, êdî tav ko bi şewq û germahiya xwe beşdarî cejnê dibû, gihîştibû nîvroyan. Gelek pasevan û nobedarên çekdar li ber dîwar û deriyê keleh û qesra Mîr ko ji du milên hesînî yên girs hatibûn pê û heta dawiyê vekirî bûn, rêz bûbûn û mêvanên ko dihatin, yek bi yek, derbasî hundir, aliyê bexçeyê kelehê dikirin. Bexçe bêpayan mezin, tijî dar û ber, gul û kulîlk bû. Ne bi tenê kitabxana Mam Sefo, herweha bexçe û qesra Mîr jî, min, wê rojê, cara yekemîn, didît. Bêguman ez zahf caran ji ber derî û dîwarên kelehê ko tevî sûr û bircên xwe keleheke qehîm bû, bihurîbûm û min meraq li heyata milê din ê dîwaran kiribû, lê niha, bi saya Mam Sefo, derî li ber min vedibûn û ez diketim hundir. Bexçe bi gelek riyên biçûk ên xîçik hatibû birîn û di her birekî de dar, ber û kulîlkên cihê, mîna nêrgiz, binevş, sosin û lalezarên bişkovî hebûn. Li herdu milên riya mezin ko digihîşte qesrê, nobedar rêz bûbûn. Bexçe jî mîna rê û meydanên bajêr, tijî şênî bû, heye ko bi hezaran însan, kom bi kom, çavê wan li govendkêşên zirav ko mîna marekî xwe dilivandin û guhê wan li dengê saz, def, zirne û erbanên ko awazên têkêl ên hemû mîrekiyên kurdan guheztibûn bexçeyê Mîr, li

ser gihayên hêşîn ên bexçê rûniştibûn. Sîniyên fireh ên riz, savar û goşt ko jê bîhn û dûmaneke lezîz difûriya, li ber wan bûn. Bi cil û bergên xwe yên têkel û rengîn, wan têkelî û rengîniya welatê kurdan jî nîşan didan.

Qesra Mîr, ez dikarim bibêjim, avahiya herî mezin bû ko min di heyata xwe ya peregende de dîtiye. Bêguman heke însan saraya sultanê osmanî, navenda gumreh a heyata me ya welatê xerîbiyê, ko riya heyata min, Mîr, Têlî û gelek kesên din ji Cizîra Botan, ber bi girava Girîtê zivirand, nehesibîne. Qesir, bi dîwan, meclîs, mêvanxane, kitabxane, dersxane, mizgeft, şaneşîn, aşxane, mitbax, hemam, xan, jûrên seyd û nêçîrê, cilşuştin û nanpêjiyê, mezelên keç û jinan, zarok û qewraşan, xulam û cariyan ên bêhejmar, avahiya herî navdar a hemû welatê kurdan bû. Li gora gotinan tê de bi qasî 360 mezel hebûn, – ji bilî mizgeft, zîndan û xana ko li ber devê çêm bû. Herçend saraya sultanê osmanî navenda hemû şixul û karên dewleta osmanî bû, qesra Mîr jî ewçend navenda hemû pêwendî û şixulên mîrekiyên kurdan bû. Li ser qesrê gelek şiîr hatibûn nivîsîn, gelek stran, çîrok, rîwayet hatibûn lêkirin. Milê herî navdar ê qesrê, bêguman, Birca Belek bû ko bi rêzên şaîrên navdar bûbû remza mîrekiya Cizîra Botanê. Birca Belek ko mîna bircekê ko bi teyrê êlo dişibiya, li ser ava çêm û bi kevirên şehkirî yên reş û spî hatibû lêkirin û ji lewre jê re »Birca Belek« dihate gotin, dîwanxana Mîr bû. Her celeb şixulên Mîr û mîrekiyê ji wir dihate gerandin. Her celeb mêvan, paşa, wezîr, mîr, sefîr, alîm, şaîr, seyda, keşe, patrîk, heham, qasid li wir dihatin qebûl kirin. Civat û civîn li wir dihatine gerandin, soz û biryar li wir dihatine girtin, derengê şevan, gava gerandina şixulên resmî yên mîrekiyê kuta dibûn, bi deng û awaza dengbêjan, şevbuhêrk li wir li dar diketin, qeşmer û berdevk li wir hunerên xwe pêşkeş dikirin, şaîran şiîrên xwe ko hemû pesn bûn, waqanûseran nivîştên xwe ko hemû methiye bûn, li wir dixwendin.

Berî ko em di deriyên qesrê re bibihurin, li ber deriyên mezin, li nik Mam Sefo, ko bi kêfxweşî simbêlên xwe ba dida û Apê Xelef ko bi kêfxweşî gunikên xwe difirkandin û bi pitepit ji Mam re tiştin digotin, min serê xwe hilda û bi dîqet, bi qasî kêliyekê, li keleh, sûr û bircên wê, li qesra fireh û bilind û li Birca Belek nihêrî. Herçiqas ez ne sihêrbaz û remildar bim jî, mîna niha tê bîra min, wê gavê, li wir, çavê min ê kor dîsan êşiya û dengê dilê min, bi liyan, gote min ko qonaxa Mîr ê wê rojê bibûya qonaxeke nû ya heyata min û min ê pê qonaxeke nû ya heyata xwe bibiriya.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Çaxê em ketin hundir, ne xulam û xizmetkar, lê bilûrvanên ko ji şal û şapikên wan diyar bû ko her yek ji deverekî mîrekiyê bûn, rê pêşkeşî me kirin. Hejmara wan niha nayê bîra min, lê gelek bilûrvan, ez bibêjim pêncî, hûn bibêjin sed, di nav şal û şapikên rîsandî û neqişkirî yên rengîn de, bilûrên wan ên reş, spî, sor, qehweyî, zirav, kurt, dirêj, şeş, heyşt, donzdeh xelekî, li ser lêvên wan, li pey hev rêz bûbûn û bi awaza bilûrê ya bi aheng ko hemû dengan li hev dianî û diyar bû, bi pesn, çêla Mîr dikir, riya dîwanxanê ko bi mermerên gewr ên ferişî raxistîbû û bi pencereyên fireh ên qesrê ronî dibû, şanî mêvanan dikirin. Apê Xelef ko bi pitepiteke bêmane Mam Sefo bêzar kiribû, dev ji gotinên xwe yên tewş berda, li min zivirî û bi hêdîka, bi ahenga dengê bilûrê, dest bi stranekê kir û hêniji;

Mîro, mîrê mino,
Bejnziravo, aqiltemamo,
Çelengo, rûgeşo,
Li roja xweş hukimdaro...

Herçiqas min strana Apê Xelef çu carê nebihîstibû û welê dixuya ko wî, dîsan, mîna her carê, gotin, li gora mercên ko em tê de bûn, li hev anîbûn, min jî, bêgav, gotinên wî dubare kirin. Bi dengê bilûrê û pisepisa »mîr û mîro« em gihîştin dîwanxana Mîr. Li ber derî em sekinîn. Deriyên dîwanxanê ko bi zîvê gewher neqişkirî bûn û li serê jî sûretê şêrekî di nav kevirekî reş de hatibû kolandin, vekirî bûn û dîwanxana ronî ko bi tîrêjên tavê û leylana ava çêm aliyekî wî şewq dida, tijî şênî bû. Li hember derî, li milê din ê dîwanxanê ko ji me bi qasî sed gavan dûr bû, Mîr li ser dîwaneke rengîn, ji şêniyên der û dor hinekî bilindtir, rûniştibû. Gotina mîr ko însanekî bi rîh û simbêl, mêrekî bi kêmanî navsal an kal dianî bîra însanan, li wir, bi bal û endama xortekî şox û şeng, bi şal û şapikên gewher, bi simbêlên zirav û rûyekî delal û geş, rûniştibû. Mîrê me li wir, di nav girseya kalemêran de mîna şitileke rihanê zirav, delal, aram, maxrûr li mêvanan dinihêrî.

Mamo, mîrê me gelekî xort e, min, bi heyret, ji Mam Sefo re got.

Herê xort e, lê jîr û zana ye, serwext û hişyar e, wî destê xwe bire ser serê min û got.

Rûyê Mîr biken bû, ji rûniştin, nêrîn û tevgerên wî yên giran dixuya ko Mîr, tevî umrê xwe, ehlê şixulê mîran, zana û kumandaran bû. Di rû û awirê wî de tarîxa me ya nû ko qonaxa nû ya heyata min bû jî, dixuya;

yekîtî, pêşketin, sermaye, aştî, edalet, xurtî, xweserîtî û mîna netîceyeke van tiştan hemûyan dijîtî, nemaze dijîtiya bi osmaniyan re ko çu carê li ser axa kurdan mîrekî xurt nedixwestin. Û dawiya dijîtiya bi osmaniyan re, mîna her carê, diyar bû; şer, xwîn, jan û keser...

Hemû giregirên welatê osmanî û kurdan li dîwanxana Mir bûn. Apê Xelef ew yek bi yek, bi tiliya xwe ya qermiçî û bi rengê titûnê zerbûyî, nîşanî me zarokan da; mîrên Hekar, Behdînan, Baban, Bedlîs û Mukisê bi şal û şapikên welatên xwe; paşayên osmanî yên bajarên Diyarbekir, Bexda, Mûsil û Wanê û çend zabîtên mezin bi kincên xwe yên resmî, fesên xwe yên sor û bi simbêl û rîhên xwe yên palik; çend sefîrên welatên frengî bi cil û bergên frengî ko bi cil û bergên Mam Sefo dişibiyan; patrîk û keşeyên civatên ermen, suryan, keldan, nastûr, yaqûbî bi cil, berg û kumên xwe yên reş ên dînî; sê serekên ruhanî yên civata cihuyan bi kumên xwe yên biçûk ên reş û bi rîhên xwe yên gelekî dirêj; şêxên êzidiyan bi libasên xwe yên spî û por, rîh û simbêlên xwe yên dirêj ên nûranî; şêxên ereban bi galabî û egalên xwe yên rengîn; şêxên terîqetên îslamî û seydayên medrese û mizgeftan, bi rîhên xwe yên reş ên henekirî; axa, beg, malmezin û serekên eşîrên kurdan bi şal û şapikên xwe yên xusûsî yên rojên weha û gelek kesên din ko bi gotina Apê Xelef »tirtire« û di esasê xwe de, ji bav û kalan, dijminê hevûdu bûn û heke fersend bidîtina, wan ê gora hev bikola, li wir, mîna perwanên ko li dora find û qendîlê difirîn, li der û dora Mîr bûn.

Belê Mîr, mîna qendîla şeva me, qendîleke ronî bû. Şevbuhêrk bi qendîleke ronî, tarîx bi zilamên ko mîna qendîlê ronî ne, li dar dikeve.

Civat şên e, de em herin hundir, kuncikê yadîgar û bexşîşan, Apê Xelef got û daf da me ko em bikevin hundir.

Kuncê ko Apê Xelef nîşan dida, bi rengên têkel diçirûsî; her celeb zêr û zînet, lûlû û gerdeniyên mirarkirî, şûr û xencerên kalanzêr û qewdmirarî, tivingên helqedar, nêrgizî û berwec ên zîvhêlî, caw û qedîfeyên hevrêşimî yên giranbiha, mehfûr û xaliçeyên hevrêşimî yên hemû welatên rojhilatê, li wir, bi dûzaneke têkûz, li nik hev, rêz bûbûn. Diyar bû, her mêvanê ko hatibû, bi hênceta pîrozbahiyê, tiştine spehî û giranbiha yên welatê xwe jî, mîna diyarî, ji bo Mîr anîbû.

Lê Mam Sefo bi milê Apê Xelef ko hê jî çavê wî li ser çirûskên zêr û zînetan bû, girt, no Xelef, got, civateke din a şên li milê din heye, tu zaruwan hilde û here wir.

Mam Sefo em, tevî Apê Xelef û du pasevanan, şandin cîhekî din,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

meclîsa dengbêj, çîrokbêj, stranvan û bilûrvanan ko li milê din ê qesrê, ji dîwanxana Mîr gelekî bi dûr bû. Meclîsa dengbêjan ko bi eslê xwe mêvanxane bû û ji bo wê rojê bûbû cîhê dengbêjan, ne bi qasî Birca Belek bûya jî, ne kêmî wê mezin bû. Civat geriyabû, dengêbêjên herêmên cihê yên binav û bênav, sazbendên hoste, bilûrvanên ko her texlîd deng ji bilûra darîn derdixistin, tembûrvanên ko ji her têleke tenbûrê donzde deng derdixistin, musîkejen, zurnejen û deflêderên bijarte yên welêt ko hosteyên hunera lêxistina haletên têkel ên musîkê bûn, gelek şagirt û berdevk ko nû digihîştin, hemû li ser doşegan rûniştibûn û haziriya danê êvarê dikirin. Piştî merasîma mîrîtiyê, dengbêjên mîr û began ê derketina hizûra dîwanxanê û bigotana. Wan ê di roja tarîxî de hemû hunera xwe pêşkeşî şêniyê bijarte bikirana û nîşan bidana ko ew dengbêj û hunermendên yekta bûn. Bi dû re jî wan ê li bajarê Cizîrê û deverên din ên mîrekiyê, heft roj û heft şevan ko pîrozbahî dê bidomiya, her û her lêxistana û bigotana.

Paşê, piştî tecrubeyên kirêt ên salan ko tijî keser, hesret û jan bûn, ez têgihîştim ko ew meclîsa hanê ko wê rojê, ji bo min, bi tenê şênahiyeke germ a rojane bû, di esasê xwe de, dengê têvel ê tarîxê bû. Derbên heyatê hînî min kir ko qayida çerxa felekê weha bû; her rûpeleke nû ya tarîxê bi dengan vedibû, carina bi dengê şûr û tivingan, carina bi dengê qelemşor û dengbêjan, carina jî bi hemû dengan ko hungiva tîr û xwîna ron tevî hev dikirin.

Çaxê Apê Xelef ko li ser gotina Mam Sefo xwe negîhandibû bexşîşan û hinekî eciz bûbû, dengbêj û bilûrvan dîtin, kêfa wî hate şûnê, tavilê, em li ber derî hiştin û tevî kulekiya xwe, bazda, çû koşeyekî meclisê. Hunermend kom bi kom rûniştibûn, siniyên fêkî û xwarinan li ber wan, lêdixistin û digotin. Her yekî li gora meqam û qalibên deverên xwe, li gora awaz û ûsluba xwe, hunereke xas li dar dixist. Awaza dengbêjên çiyayên Hekarê tevî awaza dengbêjên beriya Mêrdînê, ûsluba gotina nastûran ko gelekî bi duayên Îsa Mesîh dişibiyan, tevî ûsluba telqînên êzidiyan, meqamên neqşîbendî û qedirî yên îslamî tevî meqamên ermen, keldan û cihuyan dibûn. Sed deng û sed awaz li bin guhê hev diketin.

Bavo em dîsan terk kirin, Heme, rûtirş, got, ew hertim welê dike.

Apo dîsan da pey dengên nas, min lê vegerand, da ko rê li teşqeleyekê bigirim, Apo hertim dide pey dengan. De em jî herin nik wî.

Bêyî ko kesek bang me bike yan cîhekî nîşanî me bide, em hersê çûn koşê, li nik Apê Xelef rûniştin. Haya kesî ji me nebû, herkes bi şixulê xwe

ve mijûl bû. Koma ko em li kêlekê rûniştibûn, dostên Apê Xelef û ji deverên çiyayê Şingalê bûn. Wan stranên gelekî kevn, geh li ber hev, geh bi dor, digotin. Stranên wan bêtir pesn bûn, pesnên mîr û şêxan, axa û began, dîn û îbadetê, tebiyet û dinyayê. Mîna ko ew ji xwe ve çûbin, welê ji her tiştî dûrketî, destekî wan li ber pelê guhê wan, piraniya caran çavê wan girtî, wan her digotin. Wext ne xema wan bû, gava ew radiwestiyan, wan bîhna xwe vedida, fêkiyekî dixwarin, fireke av vedixwarin da ko ji nû ve dest pê bikin.

Min du sêv, sê hurmî û portaqalek xwarin. Lingên min ko di bin min de bûn, tevizîn. Tevî ko pencereyên meclîsê vekirîbûn, bîhneke giran a cixare, qelûn, xwîdan û bêguman ya tir û fisên fistûjê me, bi ser meclîsê de girtibû. Bîhna min çikiya. Ez, bi qewlê Armê, Biroyê henekçî ko hertim li pey henek û lîstikan bûm, hînî rûniştina vê celebê nebûbûm. Bi min êdî welê hat ko dengên ko di destpêkê de ewçend ji hevûdu cihê, xweş û balkêş bûn, qulipîn ser dengekî, bi tenê dengekî; dengê nas ê pesnan. Çavê min li wan, min hinekî mewîj, hêjîrên hişk, tevî kakilên gûzan, xwarin û bi qasî cêrekî jî av vexwar. Wan digot, lê ne bi dengê dil, ne bi hostehiya afirînê, ji bervajiyê, bi dengê qalibên kevn ko bêyî ked û xîreteke hêja, li pey hev rêz dibûn...

Ji navberê çiqas wext bihurî, ez pê nizanim, lê çaxê tîrêjên tavê êdî ji meclîsê bi dûr ketibûn û xwe gîhandibûn ser banê qesrê, ji eciziyê, ji nişka ve, piştî ko dengbêjekî kal ê rîspî ko diran di dev de nemabû û gotina wî baş fahm nedibû, rawestiya, min jî dengê xwe yê zirav û zelal bilind kir. Di nav wan dengên qert de, dengê min mîna dengê çivîkekê derket, lê dengê çivîkekê ko hê nû, bi heyecan, çavê xwe li dinyê vedikir û hêdî hêdî bi firê diket. Dengê min jî dengê pesnê bû, lê ne mîna dengên din, dengê min çêla axa û began, mîr û şêxan nedikir, wî çêl li çemê Dîcleyê dikir;

Ez Dîcle me, Dîcleya lehî.
Ne qam e, ne bihur, ne jî delav... hertim zindî.

Dengbêjên xwedantecrube ko qedirgirên şagirtan bûn, ji ber bextê min ê çê, dengê min nebirîn. Gava kesî dengê min nebirî, êdî rê li ber min vebû, min ê heyfa xwe hilaniya û mîna wan, heft roj û heft şev, her û her bigota! Lê îcar, ji ber bextê min ê neçê, hingê tiştekî qewimî ko heyata min xist ser riyeke din. Pişta min ber bi derî bû, min hay jê nîn bû ka li



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wî milî çi dibû. Bêyî ko ez zêde lê bifikirim, min gotin li hev siwar dikirin û strana ko bi çu stranê nedişibiya, dirêj dikir. Lê ji nişka ve ji bilî dengê min, hemû deng hatin birîn û bêdengiyekê bi ser meclîsê de girt. Ez bêtir kêfxweş bûm û min bêtir zor da dengê xwe yê çîveçîv î reben. Ji bilî min, hema çi bigire hemû şêniyên meclîsê rabûbûn ser piya jî. Meclîsê, dengbêj, tembûrvan û bilûrvanan dengê xwe birîbûn û rabûbûn ser piyan da ko li dengê min guhdarî bikin û qedrê hunermendiya min bigirin! Lê gava Apê Xelef, bi zixtan, çêrî min kir, min rastî fahm kir;

Kero, dengê xwe bibire, gêjo, gêjo... tiredîno!..

Çaxê min dengê xwe birî û xwe zivirand, min rastî dît; Mîr, tevî Mam Sefo û çend kesên din ên girs ên simbêl û rîhpalik, li pey min, li pê rawestiyabûn. Çima ew hatibûn meclîsê, ez pê nizanim, lê ew li wir bûn! Ez veciniqîm û bi carekê rabûm ser piyan. Mîrê bejnzirav û umirciwan ko bi awirê xwe aramiyek, rêz û rêzdariyek direşand doraliyê xwe, dikeniya.

Bêje min xorto, ev strana kê ye, tu dibêjî?

Strana min e, Mîrê min, min, bi şermzarî, gotê.

Naxwe te li hev aniye?

Herê.

Kengî te ev strana delal çêkir?

Niho...

Çaxa min gotê »niho,« ew û kesên pê re keniyan.

Dîcla ko tu çêl lê dikî, kî ye, çi ye?

Ez im...

Tu kî yî? Tu kurê kê yî? Navê te çi ye?

Biro, min gotê û dewsa bersîva pirsa din, min serê xwe xwar kir û li delingên şalên xwe ko ji erdê diçûn, nihêrî.

Piştî ko Mam Sefo di guhê Mîr de tiştin gotin, Mîr destê xwe bir serê min û paşê got;

Aferîn, dengê te zahf xweş e, lê jê re û ji gotinên te re terbiye, ders û nîzam divê.

Paşê jî ew vegeriya ser rîhpalikan û gote wan,

Biro bişînin medresê, Medresa Sor. Bala min ê lê be, haya min ê jê hebe, kekê Stephan ê lê xweyîtî bike...

Dengê Mîr xurt bû, tê de germahî û coş, ferman û cîdiyet hebû. Herçî gotinên wî bûn, ew toveke teze bûn ko Mîr, ji bo umrê min ê teres, hey-

ata min a têkel diçand axa Cizîra Botanê.

Herçî gotinên min û dûmahîka tova ko dihate çandin û riya teze ya umrê min in, hûn ê wan di şevbuhêrka bê de guhdarî bikin. Ez êdî westiyam, şeva Dîcleyê diqulipe û stêrên ko niha diçin ava, Stêra min tînin bîra min.

De min û Stêra min bi tenê bihêlin.

De qendîle bitefînin û herin...


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ŞEVBUHÊRK DUDO

## heyv

Dengê min yanî dengê Biroyê dengbêj ko hûn ê îşev jî bibihîzin, dengê xewnên dewr û dewranên bihûrî û xem û xeyalên kevn e.

Dewr û dewranên bihurî, yanî wext, wexta ko li tu kesî, tu tiştî, tu zirûfî guhdarî nake û her tiştî, her kesî, her bûyerê dide ber xwe û hertim diherike. Heyam tên û derin, ew diherike; mîr û beg, siltan û paşa tên û derin, ew diherike; felaket, şer, pevçûn, qetliyam, koç tên û derin, ew diherike; em, însanên basîd ko ji bo demeke kurt dibin mêvanên vê axa ko pirî caran bi xwînê tê avdan û paşê, pirî caran bêşop dibin binax, tên û derin; ew diherike.

Herwekî çemê me yê Dîcleyê ko bêrawest diherike û hertim, şev û roj, sal û babilîsk, li serencama me însanan şahidî dike.

Her roj lîstika heyatê dubare dibe, heyat ji nû ve hişyar dibe. Di berbanga sibehê de tav li pey çiyayê Cûdî, bi tîrêjên xwe yên zêrîn, bi sê dengan, bang li me, însanên ko mêvanên heyatê ne, dike; ez têm, ez têm, ez têm... Bi dû re, di danê sibehê de, ew, mîna kevanekî vekişiyayî, li ser gopikên zincîra çiyayan, bi rengekî helesor, bi ronahiyeke bêpayan, mîna keskesorekê, diçirûse. Bi rengên tavê ko rengên heyatê ne jî, heyat hişyar dibe, dar û ber xwe dixemilînin, însan, mîna min ko bi firteke avê û bi çend lib mewîjan dest bi roja nû dike, mîna we ko bi dengê zar û zêçan û bi dest û tiliyên nermên jin û keçan hişyar dibin, çemê Dîcleyê ronahiya tavê hembêz dike û kirasekî ji kirasên xwe yên bêhejmar ko bi rengê tavê hatiye hûnandin, li xwe dike û axa abadîn bi saya tîrêjên tavê, ji nû ve, bi bîhnên abadîn ên heyat û dinyayê difûre. Gava danê sibehê diqulipe ser nîvroyan û tîrêjên tavê di navbera kevanên pira Cizîrê re xwe dirêjî avê dikin, hingê êdî dinya û heyat di nav ronahiya boş de ye û xwe dişo, bi gotineke din, xwe ji curim û gunehên xwe paqij dike. Meriv bawer e ko ew zîndeyî û xurtiya tîrên tavê yên nîvroyan îlelebet e, lê sed mixabin, ne welê ye, mîna her tiştî, piştî seyrana ronahiyê, tav di ser çiya, çem, gelî, newal, deşt û beriyan re diqulipe milê din ê asimanan û ji hêz û quweta

xwe dikeve. Danê êvaran, berî ko hingura êvarê dakeve, li milê rojava yê çemê Dîcleyê, li pey çiyayên bilind, tîrêjên tavê ko êdî qels û jar in, dîsan bi rengekî helesor xwe dixemilînin û hêdî hêdî winda dibin. Lê berî ko tav ji me xatir bixwaze û li pey çiyan winda be, mîna bûkeke nazdar ko bi gavên giran û bi şermokî dikeve mezelê gerdegê, careke dawîn li me însanan û dinyayê vedigere û bi sê dengan bang li me dike; ez derim, ez derim, ez derim.

Tav dere, stêr tên, bêhejmar, bêpayan, boş. Asiman duqilipe ser bixêriyekê ko tê de pêtên êgir, bêrawest, diçirûsin. Stêr, mîna rêberên şevê, rê li ber heyvê, banûya şevan, evîndara keserkûr a royê û hukimdara reşahiya şevê, vedikin û heyv, bi tevgerên aram, giran, nazenîn tê û cîhê xwe yê giranbiha di qata asimên de werdigire. Ronahiyeke din ko bi ronahiya tavê naşibe, li hember dinya û heyatê, radibin govendê; Komika Sêwiyan ko mîna siwarên şevê ji rojhilatê hiltên, Tirmê Mexilan, ev heft stêrên xweşik ko bi hev re neqşeke zêrîn di sînga asimên de dihûnin, Leyl û Mecnûn ko hertim yek li rojhilatê, ya din li rojavayê diçirûsin, Çerx û Felek ko di gewriya asimên de rêzeke gewher tînin pê, Dûpişk ko bi dûpişkan dişibe û hertim li rojhilatê ye, Pîr û Mizên ko mîna tavê ji rojhilatê serî hildidin û li rojavayê dihelin, Kerwankuj ko piştî nîvê şevan dixurice û Qurux ko di destê sibehan de li rojhilatê diyar dibe, ev stêr hemû, ji bervajiyê tavê ko hukimdara tekane ya rojê ye, bi hev re, bi hevkariyeke têkûz a qayideyên tebiyetê, serkêşiya govenda şevê dikin. Şev perda xwe ya zêrhêlî ko bi kela heyvê û govenda stêran diçirûse, vedigire ser dinya û heyatê, hemû west û keft û lefta rojê ji holê radike û dinya û heyatê dixe nav xeweke şêrîn û wewneke rengîn, da ko di berbangeke nû, xurt û zînde ya sibeheke nû de, dîsan, xatir bixwaze û here. Çaxa heyv û stêr êdî xatir dixwazin û derin, tav jî, bi tîrêjên xwe yên çîk î zer, dîsan, li pey çiyayê Cûdî serî hildide û bi sê dengan bang li dinya û heyatê dike; ez têm, ez têm, ez têm...

Çerxa dinyayê, herweha bi hatin û çûyina roj û şevê, hefte û mehan, sal û sedsalan, dizivire, em jî tê de, ez jî tê de. Kurd dibêjin, heta xwe nas kir, umrê xwe xelas kir. Niha, di xelasiya umrê xwe de, ez hew roj û şevan, meh û salan dihijmêrim. Êdî ne qaxû, şik, guman û lez û beza rojane, ji bo min, hene, ne jî xwestek, miraz û xeyalên weha. Mîna berfendeyeke xurt ko xwe ji sînga çiyan rizgar kiriye û ber bi geliyên bêbinî gêr dibe, min jî xwe ji zîncirên wextê û nîrên ko wext li stûyê însanan dike, rizgar kiriye û mîna berfendeyekê ber bi geliyên xewn û xeyalên xwe yên bihurî gêr dibim.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Herwekî vî çemê Dîcleyê ko niha, çend gav ji me bi dûr diherike; ji çerxa wextê rizgar, ji hemû barên wextê azad, ji hemû kesp û kospên wextê serbest, lê di eynî wextê de di nav hemû dewr û dewranan de, pê re. Belê mîna Dîcleyê ko di nav pêlên wî de do, bi dengên bihurî, bi xuşexuş, xwe bi îro; îro, bi dengên têkel ên îro, bi guregur, xwe bi sibehê digihîne, hemû dewr û dewran, tevî hemû reng, deng û tahmên xwe, bi hev re, carina tevîhev û serûbin bûyî, carina li kêleka hev û bi dûzan û aheng, diherikin û pergal û serpêhatiya heyata min, heyata we, heyata ehlê der û dorên çêm tînin pê.

Êdî ne kêfxweşî, ne keser, ne hêvî, ne jî şikestina xeyalan ji bo min maye. Ne mal û milk, ne şan û şohret, ne malbat û zarok, ne hesab û kitab, ne hatin û menfeat... Heta berî niha bi çend mehan, ji hemû tiştên min ên heyatî ko li ser riya heyata min a fetloke yek bi yek winda bûn, du tiştên min mabûn; Stêr û dengê min. Stêr çû, heliya û xuricî. Dengê min jî êdî diçe. Çu tiştê ko êdî min bi vê heyata kambax ve girêbide, nîn e û nema. Tevî ko çerxa wextê li dijî bîranîn, xewn û xeyalan e, niha êdî bi tenê tevgera xewn û xeyalan, herikîna wan a bêrawest heye û maye. Hedefa min, îro, êdî bi tenê ev e; ez bikaribim xwe bigihînim binê geliyê xewn, xeyal û dengên bihurî û wan veguhezim îro, heye ko peregende û tevîhev, bigihînim we, nifşên nû, dengên dewr û dewranên bê. Niha ez, bi tenê, ji bo vê yekê, dil dikim ko hinekî din bijîm, bêyî çu mebesteke heyata rojane, bêyî çu haletekî însanî mîna hesûdî, zikreşî, kîn û nefretê ko însanan dike dîlê xwe, lê belê hê jî bi hez û evîna gotin, vegotin û bihîstinê, bi bihîstina dengên xewn û xeyalên bihurî û bi bîrbirina tevger û lebatên rojên bê, xetên sereke û kitekitên wan ên xweş-nexweş, çê-neçê yên rojên bihurî, yên rojên bê, çend roj, çend hefteyên din bijîm, – mîna çemê Dîcleyê ko her tiştî dibîne, dibihîse û bi dengê xwe yê xas, bi xuşîna xwe vedibêje, mîna axa ko carina bi tava germ, diyar, zelal, leylan dide, carina di nav mij û dûmanê de veşartî, nexuya, carina mîna rengên teyrê tawis rengîn, bi şox û şeng, carina mîna çîrokên Tewratê xizîn, bi keser û jan.

Hema çi bigire her şev, piştî ko wawîk û kundên şevê jî êdî dengê xwe dibirin, mîna ko hin deng bangî min dikin, ez hişyar dibim. Dinya hê tarî ye, stêr neçûne ava, tîrêjên tavê hê bangî dinya û heyatê nekirine û keleberbanga sibê hê neavêtiye. Bi qasî bîhnekê di nav cîhan de rûniştî, ez firtek av vedixwim û çend lib jî mewîj davêjim devê xwe. Ji dengê çêm pê ve çu deng nayê bihîstin. Ez xwe didim hev, radibim ser piyan û der-

im ber pencerê, da ko li çêm, li hawîrdor binêrim. Ez li dengan digerim, dengên ko di xewnên min de bûn û ez hişyar kirim, gelo ew li kû ne? Di nav çêm de? Pê re? Yan jî dengê çêm bi xwe? Çem li wir, ji min bi qasî sed lingan dûr, li ser rûyê wî çirûskên stêran ko vêdikevin û vedimirin, nazenîn diherike. Piştî ko ez li çêm ko her û her navenda qedera min e, fedikim, hingê ez têdigihêm ko dengên ko ez hişyar kirime, ne li hawîrdor, lê belê li heşê min in. Deng, gotin, kelam, stran, serpêhatî, destan, rîwayet, hedîs, lawij, dua, çîrok, beyt, rêz, hemû bi hev re, di heşê min de olan didin da ko riyekê bibînin û xwe ji min rizgar bikin, xwe bi ronahiya dinyayê bigihînin. Her çawan ko kulîlka berfînê zikê axê, qeşa û berfê diçîrîne û di seqema zivistanê de serî hildide, her wisan dengên ko di heşê min de ne, dixwazin serî hildin. Deng bang li min dikin, divê ez xwe bi wan dengan bigihînim, wan ji binê geliyê kûr ê xewn û xeyalan derbînim, wan li hev bînim û ji wan gotineke nû, serpêhatiyeke nû pêk bînim. Gotineke nû ko tê de hem rastiyên min û we hene hem jî xewn û xeyalên min û we.

Xewn û xeyal mîna hespekî rewan e ko dest bi bezê kir, êdî gelekî zehmet e ko meriv bikaribe rê lê bigire. Mîna her hespê çê ko zengûyan nagihîne xwe, hespê xewn û xeyalan jî rê li ber xwe rast dike û bi gotinên têkel, çê-neçê, kirêt-nekirêt, bedew-sivik, bilind-nizm, şêrîn-neşêrîn, xurt-qels dibeze. Rast e, gotina xweş, bihara dilan e, lê her biharê jî zivistanekê heye, her biharek li pey zivistanekê ye. Ji lewre hespê xewn û xeyalan bi gotinên xwe carina dilan bi ken û henek dikelînin, carina jî bi keser û jan disotînin, carina deng û gotin dibin hingiv ko meriv jê têr nabe, carina dibin jahr ko meriv jê xelas nabe, carina mîna tîrêjên tavê hêvî û xwestekan hişyar dikin, carina jî mîna stêrên ko dirijin, coş û heyecanê divemirînin. Hespê xewn û xeyalan çav natewîne, her û her, bi sê dengan, bang li siwarê jîr dike.

Çavê min ê sax li ser ava zêrîn ê çêm, dil û mêjiyê min ber bi geliyê kûr ê deng, xewn û xeyalan ko di heşê min de veşartî ye, ez xêrhatinî li tîrêjên yekemîn ên tavê dikim û xwe berdidim binê geliyê, dikevim nav dengan, nav xewn û xeyalên bihurî. Li wir ez carina bi tenê me, carina bi dehan, sedan, hezaran dengan re me, carina pêrgî rastiyan têm, carina derewan, carina dengên heyata min bi ser min de tên, carina dengên heyatên ko şirîkên heyata min bûn, carina şikefteke dengan li ber min dixuye, carina deryayeke bêdawîn a olan û axînan... Heta ko hespê min ê rewan ji bezê dikeve, heta ko dinya ronî dibe û deng ronahiya dinyayê dibînin.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Fermo, eve jî çîroka min û deng, xewn û xeyalan e.

We xwest, ez ê jî bibêjim. De tasa min tijî av bikin, qutiya cixarê, heste û xwelîdankê bînin û deynin kêleka nivînên min, deriyê dilê xwe vekin û li dengên ko di berbangên sibehên çemê Dîcleyê de li hev hatine, guhdarî bikin.

Dengê Medresa Sor ji dengên têkel hatibû pê; dengê seydayên xwedî îlim û îrfan, dengê feqehên ko li ser riya îlim û îrfanê bûn, dengê şagirtên ko hê haya wan ne ji îlim û îrfanê hebû ne ji çerxa felekê, dengê bangvanê mizgeftê ko rojê pênc caran hemû taxa Medresê tijî dikir, dengê pêşnimêj ko bi rêz û rêzdarî, rêberî li ehlê ko dihatin mizgeftê dikir, dengê qutabiyên ko diketin hicreyên Medresê û tê de li Xwedayê alemîn difikirîn û dersên xwe jiber dikirin, dengê kahniya hewşa Medresê ko hertim bi xuşexuş diherikî, dengê ayet, hedîs û dersên ko ji mezelên bêhejmar ên Medresê bilind dibû, dengê xwendina dersan ko ji dersxanan derdiçû û dengê fatîheyên ko hertim ji gora Melayê Cizîrî vediguhezî Medresê...

Di wexta me de, Medresa Sor, yek ji navendên herî girîng ê îlim û îrfanê yê hemû Mezopotamya jorîn bû. Medreseyên kurdan nas in, medreseyên welatê Mikusê, ko ya herî meşhûr medresa Mîr Hesenê Welî ye, medreseyên Westanê, Xeydayê, yên bajarên Çolemêrg, Bazîd, Farqîn, Amed, Çepexçûr, Sêrt, Mûş, Bêdlîs, Norşîn û gelek deverên din, hem bi nav û deng in hem jî warê zanîn û îlim in. Lê belê di nav wan de, bi qasî ko ez dizanim, ya herî navdar û herî girîng Medresa Sor e, ko bi destê mîrên welatê Cizîra Botan ava bûye û hertim bi alîkarî û çavneriya wan heyata xwe dewam kiriye. Ji bilî Medresa Sor hin medreseyên din ên navdar ên Cizîrê mîna Medresa Mîr Evdal û Medresa Sulêymaniyê jî hene. Lê Medresa Sor, bi avahiya xwe ko ji qermîtên sor ên hûnandî avabûbû, bi tirbeyên xwe yên muhîm ko ji bo hemû welatê kurdan muhîm bûn, bi alîm û seydayên xwe yên bijarte ko li hemû welatên Rojhilat xwedî nav û deng bûn, bi terbiya xwe ya mîna pola ko şev û roj, sal donzdeh meh dewam dikir û perwerdeyiya xwe ya mîna hevrêşim ko ji çend sed salan û bi vir de her û her li dar bû, bi hewşa xwe ya fireh ko hertim şên û geş bû, bi eywanên xwe yên hûnik ko bi sitûn, kemer û kevanên xwe ko celebeke taybetî ya avahiyê dianin pê, bi kitabxanaya xwe ya dewlemend ko di hemû cîhana îslamiyetê de navdar bû, bi rehle, ref û hicreyên xwe yên biçûk ko di zikê dîwaren de vekolandî bûn, bi mizgefta

xwe ya neqişandî ko li ser riya hevrêşim ko ji welatê Romê heta Çîn û Maçînê diçû, qonaxeke esasî bû, bi nivişt, hedîs û gotinên bijarte yên rêzdaran ko li dîwarên Medresê kolayî bûn, bi dîwarên xwe yên çikî sor ko di berbang û hingoran de bi şewqeke sor dibiriqî, bi gorên Melayê Cizîrî û malbatên mîrekiyê ko li hemû herêmê ziyaretgehekî nas bû, bi pencereyên xwe yên fireh ên çaxkirî ko tîrêjen tavê tê re dirêjî hundir dikirin û hertim şewqeke zêrîn direşand hundirê dersxanan, bi mêvanxana xwe ko ji çend mezelan hatibû pê û her şev tê de civata seyda, alîm û zanayan digeriya, bi mezelên xwe yên bîhnvedan û razanê ko hertim hûnik û bêdeng bû, bêpayan bû.

Medresa Sor ko bi xwe jî mîna kelehekê bû, ne dûrî keleha Cizîrê û qesra Mîr bû. Hinekî ji çêm bi dûr, lê nezîkî Birca Belek, qesra Mir û nêzîkî mizgefta Silêmaniyê, tirbe û mizgefta Nuh Pêxember bû. Medrese ko hertim bi şêniyan, bi mêvan, rêwî, şêx, mela, alîm û dengbêjan ve tijî bû, di nava bajêr de bû. Hertim tê de bi qasî sed, sed û bîst şagirt, bi qasî panzdeh, bîst feqe û bi qasî deh seyda hebûn. Ew hemû li wir dijiyan, wan li wir dixwarin, vedixwarin, radizan, dixwendin û terbiye dibûn. Medresa Sor ne bi tenê warekî girîng ê îlim û îrfanê bû, herweha maleke germ a malbata misilmanan bû jî. Xwarin û vexwarin jê kêm nedibû, mêvanxane hertim tijî bû. Û hemû mesrefa Medresê li ser qesra mîrekiyê bû.

Hema çi bigire hemû navdarên edebiyata kevnare ya kurdî li Medresa Sor xwendibûn. Melayê Cizîrî ko bi dîwana xwe navdar bû, hem li Medresê xwendibû hem jî mamosteyê Medresê bû û li wir wefat kiribû û hatibû veşartin. Feqiyê Teyran ko şagirtê Melayê Cizîrî bû û di esasê xwe de dengbêjekî xelkê bû, ko bi şiîr û dîwanên xwe nas bû, li wir xwendibû. Li gora gotinan, seydayê Ehmedê Xanî ko destana Memê Alan qulipandibû ser şiîra manzûm û jê şahasereke mîna Mem û Zîn anîbû pê, ko me jî kitabên wî, nemaze Nûbara ko ewî ji bo me zarokan nivisîbû, li Medresê dixwendin, li wir xwendibû. Û hê gelek kesên din ên navdar ko eserên nemir anîbûn pê.

Belê, cîhê ko Mîr dil kiribû ko ez lê bûma û min tê de dil, ruh û mêjiyê xwe terbiye bikira, cîhekî weha yê dengên têkel ên sebir, xîret, metanet û manewiyatê bû. Aqil ko taca zêrîn bû û di serê herkesî de nîn bû, li Medresa Sor, di nav rûpelên kitaban de bû û kitab hemû li hêviya min bûn.

Mîna niha tê bîra min, gava Apê Xelef di wê roja germ û ronî ya payîzê de ez teslîmî Mam Sefo kirim û Mam Sefo jî ez birim Medresê û çaxa em


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

di deriyên zexm ên ji darê gûzan re bihurîn û min gava xwe ya yekemîn avêt dinya zanîn û terbiyê, hingê, li eywanê, berî ko Mam min teslîmî seydayên Medresê bike, wî, li nik seydayên rûtirş, bi qasî çendekê, ken li ser rûyê wî, mîna her gavê simbêlbadayî, şal û şapikên rengîn û paqij şidiyayî, bi fikir û baldarî, li min nihêrî, bi herdu destên xwe qama min a hinekî xwar rast kir, destê xwe yê rastê bir serê min û kite bi kite gote min; Biro, guhê xwe bide min, van gotinên min bike guhar û bixe guhê xwe... li ser daxwaza Mîr, îro heyata te dikeve ser riyeke nû, riyeke pîroz, gidî tu bî, tu heta mirinê vê şîretê ji bîr nekî; zanîn, kesê ko li jêr e, bilind dike, nezanî, kesê ko li jor e, nizm dike.

Bêguman min, bi heyecana xwe ya zaroktiyê û heşê xwe yê xeşim, gotinên Mam û şîreta wî di demeke zahf kurt de, piştî ko ewî Medrese terk kir û çû, ji bîr kirin, lê belê ew gotin û şîret, bi dû re, car bi car, di nav rûpelên zerbûyî yên kitaban de û li ser riyên fetloke yên heyata min, hertim pêrgî min hatin, kitaban û heyatê ew hertim bi bîra min anîn û ew jî bûn mîna vî guharê guhê min û bûn perçeyên heyata min, ruh û heşê min.

Dengê terbiya ruh û heşe min, heke ez rastiyê bibêjim, berî ko ez li Medresa Sor dest bi xwendine bikim, kete dilê min. Bêguman bi deng, hest, coş û alîkariya Apê Xelef ko rûyê min ber bi Medresa Sor, îlim û îrfanê zivirand.

Herçiqasî Mîr daxwaz kiribû ko min dest bi xwendinê bikira jî, min dil nîn bû ko ez biçûma Medresa Sor. Herçend xelkê bi pesn çêl li Medresa Sor dikirin, ewçend jî bi xof û saw. Seydayên Medresê bi hişkahî û zalimiya xwe, feqehên wê bi rûtirşî û maxrûriya xwe, hicreyên wê jî bi tarîtî û tenêhiya xwe nav dabûn. Herkesî pê dizanîbû; tiştê yekemîn ko şagirt li Medresê hîn dibûn, ço û lêdan bû, da ko şagirt hînî dersan bibin û hemû kitêbên dersan jiber bikin. Jixwe Medrese jî, ji aliyê derve, bi dîwarên xwe yên bilind û bi qermîtên xwe yên sor ên çarçik, mîna zîndanekê dixuya, ko ji zîndana kelehê jî xirabtir bû.

Çend roj bi dû wê roja pîroz a Newroz û desthilatiya Mîr re, rojekê, çaxa ez hişyar bûm, tavilê, ez ji mezelê min û Heme ko mîna her carê bi fis û tirên Heme genî bûbû, derketim û çûm nik Apê Xelef ko li axurê bû û mîheke kulek didoşiya. Straneke kevnare ko gotinên wê bi ayetên kevn ên cihû û filehan dişibiya, li ser zimanê wî bû. Carina, gava ew bi tenê dima, mîna ko ew here dinyayeke din, wî stran û kelamên welê digotin ko çu kesî ne gotinên wan bihîstibûn û ne jî jê fahm dikirin, mîna ko ew jî ji

dinyayeke din hatibin. Li axura bêdeng ko jê bîhneke giran a tirşokî dihat û însên jê hinekî saw digirt, ez jî, bêdeng, li kêleka wî, li ser totikan, rûniştim, min elbika şîr hinekî din bir bin guhanên mîhê û guhê xwe da ser stran û maqamê wê ko gelekî ji maqama stranên ko me dizanîbûn cihê bû.

Aşiq û maşûq mifte di dest e
Me miraza xwe ji wan dixweste
Ewan miraza xwe bi heqî dixweste...

Piştî ko wî strana xwe got û elbik heta nîvî tijî şîr kir, bêyî ko ji hev re tiştekî bibêjin, em rabûn ser piyan û derketin derve. Deriyekî axurê rasterast vedibû hundirê malê, lê Apê Xelef îcar di deriyê derve re derket. Li derve ronahiyê leylan dida, asiman zelal, ava çêm zelal, hawîrdor zelal bû. Piştî ko me bi qasî çendekê li dora xwe nihêrî, em zivirîn aliyê malê ko dîwar û pencereyên wê bi tîrêjên yekemîn ên keleberbanga sibê û bi şewqa zer ko ji ava aram a danê sibehan a Dîcleyê dirêjî hawîrdor dikir, dibiriqî. Li hundir, em li hember hev, li kêleka pencerê, li ser doşegên rengîn ên rîsîn rûniştin, rûyê me bi tîrêjên tavê ronî, hê jî xew li ser çavê me, bi qasî kêliyekê bêdeng, me li hevûdu nihêrî. Apê Xelef, dîsan bi pitepita straneke, tawika xwe tijî şîr kir, nanê tisî yê hişk tê de hûr kir û bi kevçiyê xwe yê darî dest bi xwarinê kir û ji min pirsî,

Xorto, ma tu jî naxwazî?

No, min gotê û min rûye xwe jê zivirand û di pencerê re li çemê zelal ko bi rengên keskesorekê şewq dida, nihêrî.

Çi ye? wî pirsî, çi derdê te heye? Mîna ko wî fahm kiribe ko ez li tiştekî difikirîm.

Apo, ez ê tiştekî bibêjim, lê mexeyide, min bi dengekî gelekî nizm gotê.

Na, kurê min, bibêje, ez ê nexeyidim, çima ez ê bixeyidim?

Apê Xelef, min dil nîn e ko ez herim Medresê, bêyî ko ez lê binihêrim, min jê re got. Ez naxwazim bibim mela yan jî seyda, ez dixwazim, mîna te, bibim dengbêj, bibim şivan...

Li ser gotina min, Apê Xelef ko heta hingê gelekî cidî bû, bi qasî çendekê keniya û paşê dîsan, ji destpêkê, dest bi wê strana êxur kir,

Mêr û melekan dan medehan
Û xasêt nava qubehan
Ronahî dabû berê sibehan...


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Min li rûyê qermiçî yê şivanê mîrên botiyan nihêrî, rîh û simbêlen wî spî dikir, eniya wî bi xêzên umrekî neçar û kal tijî bû, ji ber ko hema çi bigire diran di dev de nemabû, lêvên wî li ser hev siwar bûbûn. Demarên qirika wi, mîna ko ew li der bin, sor dikirin. Lê belê çaven wî mîna çavên zarokekî biçûk dilîstin, bi coşa destê sibê, bi heyecana stranê, bi kela jiyîna heyatê... Na, ez fikirîm hingê, Apê Xelef ne şivanekî xirab bû, ji bervajî ew, bi wexta ko her û her diherikî, bûbû şivanekî yekta, hosteyê şixulê xwe û zanayê dengan. Lê bêguman hostehî û zanahiya wî, bi keda salan û xîreta umrekî hatibû pê, di pey şagirtî, xeşîmî, nezanî, şaşî û kêmaniyan re hostehî hatibû, xirecirên vala, kar û şixulên rojane, pêwendiyên bêmane, tiştên bêkêr, wextên bêkeys hemû li pey mabû û bi tenê tiştek di heyata Apê Xelef de mabû; şivanî, bilûr, stran, deng û gotin. Kêfxweşiya wî ya heyatê, êdî piştî ko bêrîvanan jê xatir xwestibûn, bi tenê ew bûn; berxeke nûzayî ko bi destên hoste yên Apê Xelef, cara yekemîn, pê li erdê dikir; straneke nûçêbûyî ko wî bi hinceta dawet û dîlanê yan şîn û tahziyê li hev anîbû, kelameke kevnare ya însaniyetê ko ji bîr bûbû û bi dengê Apê Xelef vediguhezî nifşên nû; giyayekî nûhêşînhatî ko nîşana heyatê û miyeseriya pêz bû; gotineke kemilî ko tê de germahiya însanî hebû û meseleyeke xweşlihevhatî ko guhdaran her dixwestin lê guhdarî bikin. Ji bilî van ne mal û milkê dinyayê, ne şan û şoreta wê, ne jî xirecir û keftûlefta wê xema Apê Xelef bû. Zerikek şîrê teze ko ji guhanên tijî yên mîheke qerqaş dihate dotin, pariyekî nan ê teze ko bi destê pîrejinên cîran li argûnan dihate pijandin, bilûreke spehî ko ji dewr û dewranên stranên kevnare yadîgar mabû, şêniyekî dilsoz ko hewcedariya wan bi gotina Apê Xelef hebû, guhdarekî bimeraq ko mîna we dixwest deriyê dilê xwe li ber serpêhatî û destanan veke, evîneke germ a bêrîvanekê, ya axa welatê Dîcleyê, ya berbangên sibehê, ya borîna beranekî qert, ya binevşeke nûbişkovî ko hemû perçeyên biçûk ên heyata Apê Xelef bûn û gotineke nerm ko deriyê dil û ruhan vedikir... heyata Apê Xelef ji van hatibû pê.

Apê Xelefê ko hîç nediguherî, heke em diranên wî ko roj bi roj kêmtir dibûn, lingê wî yê kulek ko roj bi roj dijwartir dibû û xûzîka wî ko roj bi roj pişt lê xwartir dikir, nehesibînin, hîç kal nedibû, car bi car, weha gotibû min, kurê min, hezar riyên hînbûn û zanînê hene, lê belê, ji bo ko tu bikaribî xwe bidî ser riya zanînê, te hêsanî, zelalî û sadebûn divê. Şixulê te çi dibe, bila bibe, lê divê ew zelal, sade û hêsan be, eger xelk ji te, ji şixulê te, ji gotina te fahm nake, hingê divê tu bizanibî ko tu ne hostehê şixulê xwe yî; hostehî ji tevîheviyê zelalî û sadebûnê, ji zehmetî û zorê jî

hêsanîbûnê derxistin e; zelalî, sade û hêsanbûn li pey çiyayên zor û zehmetan e, eger tu hilkişiyayî çiyan û te xwe ji gopikên wan ko di nav mij û dûmanan de ne, bera jêr da û te xwe ji mij û dûmanê rizgar kir, hingê tu hoste yî... Eger ez dikenim, dilîzim, distrêm, li bilûrê dixim û bi hêsanî dipeyivim, tu bawer meke ko min di jiyana xwe de zehmetî, dijwarî, zor û kirêtî nedîtine, ji bervajiyê, hemû jiyana min di nav neçarî, zehmetî û kirêtî de bihurî. Min zahf mirin û kuştin, qetl û qetliyam, bindestî û bêgavî dîtin û jiyam. Lê min hertim hewl da ko ez xwe bi zelalî, sadehî û hêsanîbûnê bigihînim, ji lewre min ji dudilîbûn, tirs, sûzenî, şik, tiralî, sersarî, tembelî, hesûdî, pozbilindî, zexelî, şixulên derewîn û fortên vala rû bada. Min hertim xwe da ser riya şixulê ko ez dikarim pê rabim, hevalên ko ez dikarim pê re bim, gotina ko ez dikarim jê zelalî û kêfxweşiyekê bînim pê... Tu bî, tu vê yekê çu carê ji bîr nekî, tu gotina min bikî gustîr û têxî tiliya xwe...

Gustîrên Apê Xelef û guharên Mam Sefo ko riya zanîn û terbiya ruh û heş li ber min vekirin...

Wê berbangê min li rûyê Apê Xelef ko bi erdekî nûçotkirî dişibiya, nihêrî û ez li ders û tecrubeyên wî fikirîm.

Xorto, tu çi diponijî? Ewî got û ez ji dinya xem û xeyalan vegerandim nik xwe.

Apo, ez ê çima donzdeh an jî panzdeh salan li wê medresê ko mîna zîndanekê ye, bimînim? Dewsa ko ez jî mîna te li deşt û zozanan bim, li bilûrê xim û bistrêm?

Hingê wî bi qasî kêliyekê li min, bi baldarî, nihêrî, taweka xwe bir devê xwe û şîrê ko tê de mabû, vexwar û tiştekî ko ez hîç li hêviyê nebûm, ji min pirsî; Biro, ev strana ko min niha got, strana çi bû?

Stran bû, min gotê, da ko ez bersîvek, lê bersîveke tewş bidimê, strana şivanan bû.

No, ewî, gelekî cîdî, gote, no kurê min, no, strana şivanan ji bo mîh, berx, bizin, nêrî, kahr, beran, gîsk û celebên din ên heywanan e, ev strana ko min niha gote, di esasê xwe de, ne stran e. Ew, diwa ye, diwa merivan, diwaya ronahiyê, berbanga sibê, diwaya me yêzidiyan.

Bi gotina wî re bêdengiyek hate pê, dinya ko nû hişyar dibû, jixwe aram bû. Ne Gulîzera gulî reşik hê hişyar bûbû, ne jî Hemeyê fistûj. Zincîra çiyayên abadîn li dûr di nav mij û dûmanê de, mîna efsaneyên kevnare ko hertim li ser zimanê Apê Xelef bûn, dixuyan, Çemê Dîcleyê bi nazenîn xwe li ba dikir û ber bi jer diherikî. Heyatê li derve jî dest pê

kiribû, li pey çêm, di navbera çiya û çêm de, kerwanekî dirêj ko ji hesp, ker û deveyan hatibû pê, ber bi aliyê welatê Mûsil û Basrayê bi rê ketibû û ji bajêr bi dûr diket. Çend segên tiral li qiraxên çêm baz didan û dilîstin. Qaz, werdek, mirîşk û dîk, peregende, bi dirêjahiya çêm re, herwekî ko ew jî mîna Apê Xelef kulek bin, digeriyan. Siwarekî li ser mehîneke mezin ko cahniya wê jî li pey bû, ber bi çiyan hildikişiya. Refekî teyrên mezin ên qulingan jî her wisan ber bi wî alî, li asimana çikî zelal difiriyan.

Min Apê Xelef ko hema çi bigire hertim bi kêf bû, çu carê ewçend cidî û bêdeng nedîtibû.

Biro, wî disan dest bi axaftinê kir û got, ji bîr meke Biro, navê te ji Brahîm Pêxember tê. Nave te pîroz e, hem navê pêxemberekî hemû dînan e, hem jî bira û hîm e. Navê te, hîmê biratiyê ye. Hemû dîn bira ne, Xwedayê alemîn, bi gotina me, Yezdanê dilovanê dilovîn, yek e, hemû dîn jî pê re ne. Çi yezidî, çi misilman, çi file, çi cihû. Navê te tîmsalê hemûyan e... Lê belê divê tu tiştekî hîç ji bîr nekî, em, tu jî tê de, yezidî ne. Herçiqas li mala me Qurana kerîm hebe û navê Heme ji Mihemed, resûlê Xweda, were jî, em êzidî ne, xwediyê dînê hemû dînan, zimanê hemû zimanan, kitaba hemû kitaban... Bav û kalên me weha digotin, Yezdanê dilovan bi zimanê me yê şêrîn axiviye, ji lewre, kitaba me Mishefa Reş bi zimanê kurdî dahatiye... Lê belê Yezdan yek e; dilovaniya wî yek e; rehmet, wijdan, merhemet, nûr, germahî, rindî yek e; şev dikarin reş, asiman girtî û heyam cûn bin, lê berbanga sibehê hertim yek e, berbangeke nû, teze, zelal û sade; rê dikarin gelek bin, lê deriyê zanîna ruh û dil yek e. Tu here Medresê, tu dê bibînî ko Medrese dê te bide ser riyeke rast a terbiya ruh, heş û dil...

Dengê gotina niviskî û dengê gotina devkî ji hevûdu gelekî cuda ne. Di dengê gotina nivîskî de ko li ser kaxizên bêruh û bêcan ên spî û zer in, gotin heye, deng nîn e, di dengê gotina devkî de ko bi tenê di bîr û heşê însên de ye, deng heye, gotin nîn e. Însan li gora daxwaza dilê xwe dengekî dide gotina niviskî, lê herçi gotina devkî ye, ew pêşî deng e û bi dû re, çaxa deng ji devê însên derdikeve, dibe gotin. Gotina nivîskî hazir e û li ber we ye, hûn wê dixwînin, werdigirin, hînî wê dibin û wê digihînin heşe xwe. Gotina devkî nîn e, hûn wê ji heşê xwe derdixin, diafirînin, heyat didinê, bi alikariya dengê ko ji devê we derdikeve, bi maqam û şêweyekî xas, hûn wê vediguhezînin kesên hemberî xwe, mîna ko ez niha dikim. Di van herdu celebên gotinê de, ji deng pê ve, her tişt

vajî hevûdu ye. Bi tenê deng wan digihîne hevûdu. Ji ber ko di heyata însên de her tişt bi dengan ve giredayî ye; bi dengekî mîna qîrînê hûn tên dinyayê, bi dengekî mîna axînê hûn ji dinyayê koç dikin, di navbera van herdu dengên ko destpêk û kutahî ne de, bi qasî umrê xwe, hûn dipeyivin û pêwendiyan datînin, derin û tên, dixwin û vedixwin, însanan dinasin û bi wan re dijîn, ders û tecrubeyên heyatê werdigirin û digihînin însanên din, fêr dibin û fêr dikin, dikenin û digirîn, diqîrin û dilorînin, dihebînin û dihewînin... û bi alîkariya dengan her tiştî dikin. Gava însan hosteyê dengan be, hingê her celeb deng bi hêsanî diqulibin ser gotinan, geh ser gotina devkî, geh ser ya niviskî.

Çaxa Mam Sefo ez birim Medresa Sor û min li wir dest bi xwendinê kir, hingê, cara yekemîn ez di heyata xwe de pêrgî gotina niviskî hatim. Rûpelên defter û kitaban li ber min vebûn, herfên mihemedî ko ji herfên kitabên kitabxana Mam Sefo cuda bûn, li ber min dest bi govendê kirin û min ji wan herf û gotinên ko ne zindî bûn, dengekî û heyateke zindî afirand.

Roj û heyamên ders û dersxanan, xwendin û kitaban êdî dest pê kiribû. Di dersxaneyeke biçûk de ko hertim ronî bû û tîrêjên tavê di caxên pencereyan re xwe digîhandin hundir, tevî heft zarokên din ko zarokên malbatên giregiran bûn û her yek ji devereke Cizîra Botan dihatin, cil û bergên min nû, porê min bi hevringa dirêj û ko ya Apê Xelef qusiyayî, guharekî nû yê zêrîn ko Mam Sefo mîna yadîgara Mîr dabû min, di guhê min ê rastê de, li kêleka pencereyekê ko li hewşa fireh a Medresê ko hertim paqij û maliştî bû, dinihêrî û kevanê wê mîna heyva çardehê mehê ko nû hilhatiye, xweşik û spehî, rehleyeke kevn ko şagirtên berî min tê de bi kêr û çaqûyan hin herfên ko diviya herfên navê wan bûya, kolandibûn, li ber min, çavê min ê sax geh li ser hogirên min ên dersê, geh li ser gul û kulîlk an jî kahniya hewşê, di heşê min ê tevîhev de bi sedan, heye ko bi hezaran deng, min dest bi dersan kir. Pêşî, bi hezar zehmetî û teşqelê, bi qîreqîr û xirecir, bi şiva darê hinaran ê feqehê min ê bêbav ko navê wî Evdilstar bû, ez hînî elifbêya erebî bûm. Evdilstar ko gava min şiva wi dît, tafilê, navê wî qulipand ser Ya Star, bi destxeteke xweşik, li ser kaxizeke spî, herfên mihemedî, yek bi yek, nivisî û ew yek bi yek, lê car bi car, roj bi roj, hefte bi hefte, bi mirûzekî tirş û bi sebreke fireh, hînî min kir; elîf, bê, tê, sê, cîm, hê, xê, dal û herweha yên din... Herfên ko bi mûriyan dişibiyan, li ser kaxiz bûn, lê bi nêrîn, xîret û şiva Ya Star ko li kû diket jê agir diperpitand, ew dibûn deng. Bi dû herfan re gotin hatin, gotinên

nivîskî ko di nav rûpelên kitaban de, bêdeng, bêpejn, bêruh nivistî bûn û li hêviya min bûn ko ez wan biqulipînim ser dengan û ruh bidim wan.

Kitabên ko me dixwendin, piraniya wan bi erebî, hinên wan jî bi kurdî bûn. Ders gelek, kitab zahf, xwendin û jiberkirin bêdawîn, şiv û ço bêhejmar bûn. Li gora ders û kitaban feqehek diçû, yekî nû dihat, gotin, kitab, deng û şêwe diguherîn, lê hişkahiya seydayan, fortên melayan, bêbaviya feqehan û êşa şiv û çoyan her mîna xwe diman. Melayekî me yê rîhrîs, çavbeloq, devgirêz û zimandirêj hebû ko navê wî Sebhetullah bû. Sebhetullah ko min di cîh de navê wî jî qulipandibû ser Nehûzûbillah, ne bi tenê bi zimanê xwe yê dirêj, lê belê bi şiva xwe ya dirêj jî nas bû. Şiveke bi qasî çend mîtroyan a wî Nehûzûbillahê ko xwe ji Mîr jî mîrtir dihesiband, hebû ko bi hêsanî digihîşte goşeyê herî dûr ê dersxanê. We hay jê nîn bû ka kengî û çawan şiva mela Nehûzûbillah ê li ser serê we çirûsk bi firê xista û pêtên agir ê li ber çavê we biçirûsiya. Her cara ko çavê min li dersxanê bi Nehûzûbillah diket, min bi qîreqîr dersa xwe dixwend; Xweda yek e, bê hevrê û bê heval. Ne mezûlî ye, ne mirin, ne zewal... tefsîr, mewlûd û gelek ders û kitabên din ên xwendinê hebûn. Lê di salên pêşîn de min herî zêde ji kitaba Nûbarê ya Seydayê Xanî hez dikir û hertim ew dixwend. Nûbar, ferhengokeke biçûk bû ko Seydayê Xanî, bi kurmancî, ji bo hînbûna gotinên erebî, nivisîbû da ko şagirtên medresan ew bixwenda. Kitaba yekemîn ko min di tariya şevê û ronahiya rojê de hertim xwend û jiber kir jî, jixwe, Nûbar bû. Seydayê Xanî ko di wextê xwe de hal û hewalê Medresa Sor û heye ko hal û hewalê şivên dirêj ên kambax ko ji mêj ve, perçeyekî Medresê bûn – baş dizanîbû, kitab ji bo me zarokan lê kiribû û tê de digot,

Vêk êxistin Ehmedê Xanî
Navê »Nûbara biçûkan« lê danî
Ne ji bo sahîbrewacan
Belkî ji bo biçûkên kurmancan...

Deriyên zanînê ko ez tê re bihurîbûm û ketibûm nava kahniya terbiya heş û dil, divê ez bibêjim, di eynî wextê de, heş û dilê min, di navbera gotina devkî û gotina nivîskî de perçe kir. Û ne bi tenê hewqas, herçî cîhana gotina niviskî bû, ez li wir jî perçe bûm. Di Medresê de hertim qayideyên zimanê erebî û kitabên ko çêla dînê îslamiyetê dikirin û piranî bi erebî hatibûn nivisîn, hebûn. Lê çaxa min dîwarên Medresê li pey xwe

dihiştin û gava xwe davêt dinya derve, hingê qayideyên cîhaneke din li dar bûn, qayideyên bilûrvan û dengbêjan ko li ser hîmê gotina devkî ava bûbû, yên gundî û şivanan ko li ser heyateke sade ya gotina sade hatibû pê, yên ehlê bajarê Cizîrê ko ji xwendine bêtir bi gotinê heyata xwe dijiya... Û ya herî girîng jî qayideyên mala Mam Sefo ko ji hemû qayideyên din ên heyata min cihê bû.

Min êdî li Medresê dixwar û vedixwar, dijiyam û radizam, lê çaxa min bixwesta, piştî dersan, danê êvaran, an jî rojê îniyan ko roja bîhnvedane bû, ez, Biroyê sêwî û kor ko li ber çavê seydayên min, hinekî tiredîn, derdiketim derve û diçûm malê û ji wir jî, mîna berê, tevî Heme û Gulîzerê, yan jî bi tena serê xwe, di ber qeraxên çêm re û di bin siya darên qedîm ên çinar, bî û berûyan de, diçûm mala Mam Sefo û diketim nava qayideyên mala ermen ko bi gotinên niviskî yên dînê Îsayê Mesîh hatibû pê û ji derve hîç nedixuya.

Li hewş an jî mitbax û mezelên qata jêrîn a malê de em, ez ko ji Medresê dihatim, Migo ko piraniya caran ji dêrê dihat, Armê ko hertim li nik diya xwe bû û ji qata jor dihat, Heme ko ji nik Apê Xelef, çêrê dihat û Gulîzer ko jixwe piraniya caran li mitbaxa mala Mam Sefo bû, digihîştin hevûdu û me carina bi teşqele û xirecir, carina bi kêfxweşî û henekan, hetika hevûdu dibir. Mal mezin, mezel zahf, xizmetkar û qewraşên ko li pey me bazdana û keleporên ko me li pey xwe, peregende, dihîştin, hildana, pir bûn. Mitbax, mêvanxane, hewş, bexçeyê kêleka çêm, serşok, mezelên qewraşan, zêrzemîna malê, mezelên bîhnvedanê, evana hemû meydana me ya lîstikê bûn. Lê herî zêde min ji zêrzemîna ko însan ji aliyê hundir ê mitbaxê, bi pêpelûkine kevirîn dadiketê û hertim tarî bû, hez dikir. Gava min keys didît, lê bi şertê ko Armê yan jî Gulîzerê li nik min bûya, min xwe ji ber çavan winda dikir û ez, tevî Armêya ko mîna diya xwe hinekî merezî bû, yan jî Gulîzera ko hertim cahniyeke nûgîhayî ko hîrehîr jê diçû, dianî bîra min, bi dizîka, dadiketim zêrzemînê, warê her texlîd kûp, dîzik, elbik, kiloz, tûr, têr, telîs, kîs, sîtil, kodik, meşk ko heta dev tijî xwarin û vexwarinên şêrîn bûn. Evîna dizan şevreş, daxwaza dilê min jî tarîtiya zêrzemînê bû.

Migoyê ko mîna min dest bi xwendinê kiribû û Hemeyê ko tevî bavê xwe diçû ber pêz, lê wî jî dil hebû bihata Medresa Sor, hevalên min bûn, lê cîhê Armê û Gulîzerê cihê bû. Ew ne bi tenê hevalên min, lê herweha şirîkên sirên min bûn jî. Min navê wan jî guherandibû, Armê kiribû Sosinê, Gulîzerê jî Cahniyê. Armê, sosina min a nazenîn, sosineke delal,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bejnzirav û jar bû ko li qiraxên çemê Dîcleyê, di nav nêrgiz, binevş, lalezar û sosinên bêhejmar de, hêşîn hatibû û bi tava germ a welatê Mezopotamya jorîn diçilmisî. Gulîzerê, cahniya min a qemer, cahniyeke hov bû ko tûmik û bijiyên wê bi bayê çiyayên Cûdî, Herekol û Gabar li firê bû û li deşt û zozanên welatê bav û kalan, çeleng û rewan, derketibû geşt û seyranê. Yek bi dilpakî û zîziya xwe, ya din bi hebînî û kêfxweşiya xwe dilê min ê teres û zarok, bi heyecaneke xerîb û keleke ecêb, diguvaştin.

Li zêrzemîna malê, me hem devê kûp û dîzikan vedikir û dixwar û vedixwar, hem jî lîstikên ko me bi wan dizanîbûn, dilîstin û yên ko me pê nizanîbûn jî diceribandin. Devê me şêrîn, dilê me germ, bedena me nerm, em diketin nav cîhaneke din ko ji hemû cîhanên din ên heyata me cihê bû û tê de bi tenê miraz û xwestek, xewn û xeyalên xeşîm ên zaroktiyê hebûn. Niha, piştî umrekî dirêj ê kambax û kirêt ko ji zelalî û paqijiya dewr û dewranên wan rojan êdî gelekî dûr e, ez dikarim bibêjim ko hingê, di wan roj û salên min ên herî xweş de, li zêrzemina tarî ko cîhaneke ronak berpêşî min dikir, cara yekemîn, min bîr bi sihêr û quweta xewn û xeyalan bir û hêdî hêdî, bi alîkariya lîstikên me ko ji xewn û xeyalan dihate pê, ez têgihîştim ko xewn û xeyaleke zelal û sade, li milekî, gelek caran, ji quweta bîr û nêrînên ko heyata me li me dikin zîndan û nahêlin em di heyata xwe de jî, nêzîkî li xewn û xeyalên xwe bikin, bi quwettir in û li milekî din jî, ji rastiyên umrê me ko çu carê ji xem, şik, tirs, dek, derew, bêgavî, bîhntengî û kirêtiyê rizgar nabin, bêtir û çêtir rast in.

Lîstikên me ko hem lîstikên adetî yên welatê me bûn, hem jî yên nû yên xewn û xeyalên me bûn, zahf bûn. Ne hewce ye ko ez niha wan ko hê jî mîna ko ew do qewimîbin, tên bîra min, kite bi kite, ji we re bibêjim, lê di nav wan de lîstikên ko me herî zêde jê hez dikirin, çima ez ê tiştê ko Yezdanê dilovan pê dizane, ji we veşêrim, lîstikên ko »bilo« tê de bûn an jî çêl li »bilo« dikirin, bûn.

Çaxa ez û Armê dadiketin zêrzemînê û em li wir dilîstin, carina em li ser telîsan an jî li tenişta kûpên hûnik rûdiniştin û me bîhna xwe vedida. Hingê ewê serê xwe datanî ser milê min û li hêviyê disekinî ko min jê re tiştine xweş bigota. Min texsîr nedikir, bêguman piştî xwarina şêrînahiyên kûpan, min jê re behsa gul û kulîlkan, teyr û tilûran dikir. Di esasê xwe de min dil dikir jê re stran bigotina, stranên ko min ê li hev bianiyana û tê de qala xweşî û delaliya wê bibûya. Lê min hê nikarîbû gotinên evîn û hebînê li hev bianiya, ji lewre min û wê qîma xwe bi got-

inên gul û kulîlkan dianî. Herçî Armê bû, wê jî behsa diya xwe ya nexweş ko jê re kitaba Îsayê Mesîh dixwend û roj bi roj xirabtir dibû û carina jî behsa bavê xwe yê zane dikir, bavê ko bi şixulên Mîr û mîrekiyê diçû deverên dûr û gava ew vedigeriya ji Armê re cil û bergên xweşik, şekir û şêrinahiyên rindik dianî û Armê hildida hembêza xwe û jê re behsa welatên dûr, zimanên xerîb dikir û ji rûpelên kitaban tarîxa ermenan ko mîna tarîxa kurdan bi derd û keser bû, dixwend. Lê rojekê, ji lîstik û xwarinê westiyayî, li tenişta kûpekî tijî kakilê gûzan rûniştî, wê rûyê xwe yê zirav ko bi tesîra siya finda ko li ser kûpê dişewitî û ronahiyeke gelekî qels direşand ser me, hîn bêtir jar û zer dixuya, ber bi min zivirand, bi qasî kêliyekê bêdeng, li min nihêrî û paşê gote min,

Mayrîg, mamî... Biro, mamî dê bimire. Kahniya aşxara wê dimiçiqe...

Na keçê, min, ecizbûyî, gotê. Çima tu welê diaxivî?

Mamî hew dikare Avederan bixwîne û şaragan bibêje... Nefesa wê diçike.

Hayrîg çi dike? Ma Mamo alîkarî nake? Mîna ko haya min jê nîn be, min jê pirsî.

Hayrîg ji kitabxanê kitaban tîne û jê re dixwîne û dibeje, wê kelegirî got, herdu destên xwe yên biçûk birin ser rûye xwe, hinekî din nêzîkî min bû û çêl li warê ko min herî zêde meraq dikir, kir;

Gava Mayrîg di xew re dere, ew vedigere kitabxanê, nav kitabên xwe yên gemarî û tozgirtî û bi saetan, bi şevan, ew li wir dimîne, bêyî ko bi kesekî re bipeyive, bixwe yan jî vexwe... Ew, qelûna wî û kitab û kitab û kitab...

Dengê kitabên tozgirtî ko di nav rûpelên kitaban de, mîna gotinan, rêzbûyî ye, di esasê xwe de, dengê heyat û tarîxê ye. Her kitabeke çê û bikêr bi tecrubeyên însanî û zanînên umrekî hatiye hûnandin. Li cîhanê çu berhemeke hêja nîn e ko tê de keda însan û ders û tecrubeyên însanî nexuyin. Niha nayê bîra min ka kê gotibû, lê hosteyekî ji hosteyên ders û tecrubeyên heyata min ko ez ê niha qalê bikim, li dereke weha gotibû; her berhemeke bedew mîna tavê ye, carina hiltê û cîhanê bi ronahiya xwe dişo, carina dere ava û li hêviya hilhatinê dimîne. Kitabên tozgirtî yên qedîm ên kitabxana kêleka çeme qedîm Dîcleyê ko di nav rûpelên wan de ders û tecrubeyên însanî carina bi qîrîn, carina bi lorîn, olan didan, hema çi bigire bi temamî tavên avaçûyî bûn ko ji Mam Sefo pê ve kesekî rêz û rêzdarî nîşan nedida û ronahiya wan a veşartî nedidît. Belê, ew tav


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bûn, lê tavên welê ko li hêviya ruhekî bimeraq, daxwazeke bêpayan û dilekî birîndar bûn, da ko ji nû ve hilwerin û bi şewqa xwe hawîrdor ronî bikin, dilê birîndar bicebirînin, ruhê bimeraq hinekî haş bikin.

Ez jî jixwe însanekî welê bûm û hê jî, tevî ko ez êdî li ser riya çûyina bêveger im, welê me; ruhekî bimeraq ko hertim li pey zanîn, ders û tecrubeyan e, daxwazeke bêpayan ko li pey hedef û armancên ko mîna Cûdî bilind in, û dilekî birîndar ko ji zaroktiyê heta mirinê şûr û xencer bûne qedera wî û şopa şûr û xenceran hertim pê re bûne. Kitabên tozgirtî yên kitabxana Mam Sefo hewcedarî dil û ruhê min ê xeşîm bûn, da ko wan dest bi axaftinê bikira, ronahiyeke germ bireşanda ser hawîrdor. Ez jî hewcedarî kitaban bûm, da ko mîna tovê bin axê, min ji kitaban germahiyek, nermahiyek werbigirta, zikê axê biqelişanda, hêşîn bihatama, serî rakira, mîna darên çinaran ko li qiraxên çêm bûn, reh û rêçên xwe di dilê axa reş de berda, bi gewdê xwe yê qehîm bilind bibûma, bi şax, çeqil û pelên xwe bibûma tîmsaleke biçûk a ders û tecrubeyên însaniyetê... Hûn dibihîsin, ez, zarokekî bi qasî bihustekê, Biroyê sêwî ko kesekî wî nîn bû, li pey xewn û xeyalên weha giranbiha bûm. Ez niha têdigihêm; gotinên min qure, daxwazên min bilind, riya min ji riya însanên din cihê bû, ji ber ko min dixwest, ez cihê bûma, ne dareke ji darên bêhejmar ên daristanekê, lê çinareke qehîm a li qiraxê çemê Dîcleyê ko ji dûr ve jî dihate nasîn. Min dil nîn bû ko ez mîna herkesî bûma. Bila yeqîna we ji Xweda hebe, min bi gotinên xwe yên qure fort nedavêtin, dek û dolab nedigerandin, xwe mezin, xelkê biçûk nedidît, lê ez bi tenê welê bûm, di nav hemû riyên heyatê de ko ez pêrgî wan dibûm, min dil dikir riya xwe ya xas peyda bikira. Ji lewre jî diviya min xwe bi kitabxanê û kitaban bigîhanda.

Migo jî dest bi xwendinê kiribû, lê ne li Medresê, li dêrê. Ermen ko ji hezaran salan û vir ve, mîna me, ehlê vê axê bûn, bi belavbûn û pêşketina dîne Îsa Mesîh, bûbûn file û filehan cîhên taybetî yên xwendin û perwerdeyiyê hebûn. Migo danê sibehan diçû dêrê, danê êvaran jî li malê, li qata jorîn, li mezeleke biçûk ko li nik kitabxanê bû, li ber destê mamostayên xas ko Mam Sefo ew ji bo zarokên ermen, ji Stenbol û Bêrûdê dabû anîn, dixwend. Gava me hevûdu didît, min jê re çêla ders û mamostayên xwe yên Medresê, ewî jî ji min re çêla dêr, keşe, ders û mamostayên xwe yên malê dikir. Bi dû çûyina min a Medresê re bi qasî salek, salek û nîvê, rojek ji rojên payizê ko germahiya tavê hê jî xurt bû û baranên navdar ên Dîcleyê hê nehatibûn, danê êvarekê ko tîrêjên tavê li

ser sînga çiyayê Cûdî leylan dida û ava çêm bi rengekî belek ê sor î tarî dibiriqî, li malê, min jî da pey Migo û em hilkişiyan jor, mezelê xwendin û perwerdeyiya Migo ko gelekî biçûk bû û tê de ji du kursî, maseyeke biçûk, refekî kitaban û li dîwarên spî jî lewheyeke Îsa Mesîh ko serê wî di nav ronahiya tavê de bû, pê ve çu tişt nîn bû. Mamostayekî navsal, rûqemerî, simbêlboq û rûgeş, bi cil û bergên alafranga, li hêviya Migo bû. Gava ewî ez dîtim, hinekî şaş bû.

Tu kî yî, xorto, wî pirsî.

Ez Biro me, min gotê.

Biro, hevalê min e, Migo jî lê vegerand.

Tu file yî? wî bi meraq domand.

Naxêr, ez, êzidî me, min li pênûsa wî ya xweşik a murekebê ko di destê wî de bû, nihêrî û got.

Biro li Medresa Sor dixwîne, Migo got.

Êzidî û Medresa Sor, mamosta, hîn bêtir şaşbûyî, got, lê nexwest gotina xwe bidomîne û mijar guherand, baş e, xorto, em ê niha dest bi dersa xwe bikin, tu dixwazî çi bikî?

Ez dixwazim li we guhdarî bikim, min gotê.

Lê em ê bi zimanine ko tu jê fahm nakî, bi ermenî û fransewî, bipeyivin, tu dê eciz bibî, wî got û nerazîbûna xwe nîşan da.

Ma tu çima naçî kitabxanê Biro? Migo got, Bavo li kitabxanê ye. Wî tu dipirsî...

Min xatir ji mamosta xwest, ez û Migo ji derî derketin û çûn ber deriyê girtî yê kitabxanê, li ber derî Migo cil û bergên min rast kirin, bi hêdîka li derî xist û li hêviya bersîvê ma. Bi dengekî berz re, em ketin hundir, Mam Sefo li wir, mîna cara berê ko min dîtibû, simbêlbadayî, li pê, li ber deriyê şaneşînê, qelûn di dev de, lê îcar di nav şal û şepikên botî de, biken, li me dinihêrî. Serê maseya kitabxanê ya gelekî dirêj tijî kitab bûn, kitabine peregende jî li dora kursiyê ko hinekî ji deriyê şaneşînê dûr bû, li erdê bûn. Tafilê min çavê xwe li dîwaran gerand, ref, kitab û lewheyên li ser dîwaran li cîhe xwe bûn.

Û teyrê tawis jî, ko min her û her li bejn û bala wî, li şekl û rengên wî, li deng û xwendina wî meraq kiribû, li wir bû.

Biro, malavayo, tu li kû yî? Mam Sefo, bi dengê xwe yê gur ko di navbera qîrîn û orînê de bû, gote min.

Biro hertim tê, bavo, Migo, bersîv dayê, lê em naxwazin te eciz bikin. Ez ê vegerim dersê, ma Biro dikare li vir be, heta ez dersê xelas dikim?

Tu here, tu here Mamo got, jixwe min jî dixwest Biro bidîta.

Tevî ko Armê behsa toz û gemarê dikir, li kitabxanê her tişt, refên dîwaran, kitabên li ser refan, mehfûrên li erdê, mase û kursiyê wê, kursiyên ko li milê din ê kitabxanê bûn, lewheyên li ser dîwaran, paqij û nû dixuyan. Maseya ko bi rengekî qahweyî dibiriqî, mîna ko ew nû hatibe cîlakirin, germahiyek dida însên. Kitabxane ronî bû, ji deriyê şaneşînê û pencereyên fireh ên kitabxanê Dîcle, darên bî ko li qiraxên Dîcleyê bûn, li pey Dîcleyê jî Cûdî dixuya.

Were Biro, malneşewitiyo were, Mamo gotê.

Min hêdîka gava xwe avêt hundir, mîna ko ez bikevim cîhaneke nû ko ji bedewî, spehîtî, bêdengî û hizûrê hatibû pê. Ez raste rast neçûm nik Mamo, pêşî ez ber bi masê çûm, min bi destê xwe, mîna ko ez destê xwe bibim porê Armê, koşeyên masê mist dan û li kitabên ko peregende li ser masê bûn nihêrîn. Tîrêjine soreron li ser masê û piştа kitaban dibiriqî. Ji wir jî ez hêdîka çûm ber dîwarê ko lewhe lê bûn û ez li ber lewha teyrê tawis rawestam, min serê xwe hinekî bilind kir û lê nihêrî. Çarçoweya ko bi rengekî zîvîn hatibû neqişkirin, teyrê ko di nav ronahiya rengên bêhejmar û bêpayan de, stûyê dirêj li jor, sîwanê rengîn vebûyî, bi çavên biçûk, maxrûr, nazenîn, li min dinihêrî, sikûneta ruhî ya kitabxanê, tafilê, na ne tafilê, hêdîka, digîhand dil û ruhê însên. Bi qasî çendekê, ji milê rastê, ji milê çepê, geh ronahî li vî milî, geh li wî milî, mîna ko ez diayeke yêzidiyan an jî rêzine ji mewluda misilmanan bixwînim û pê re herim, bi bihîstiyariyeke welê, min li teyrê tawis nihêrî. Heke Mamo deng nekira, heye ko ez ê bi qasî demeke dirêj, welê jixweveçûyî, li ber lewhê rawestiyama. Lê ez bi dengê Mamo li xwe warqilîm.

Biro, ho Biro, heşê te li kû ye? Were nik min.

Ez bi gavên zahf giran, çavê min li ser ref û kitaban, çûm nik wî, teniştа derî. Mîna ko Mamo bi deng û pêjnên ko di dil û ruhê min de olan didan, bihese, wî pirsî,

Tu ji kitaban, kitabxanê û vê derê hez dikî, ne welê?

Belê, min kin û kurt, gotê.

Tu dixwazî bibî çi, wî dîsan pirsî, mamoste, seyda, alîm, nivîskar?

No, min gotina wî birî û got, no, ez dixwazim bibim dengbêj.

Denbêj, wî gotina min, lê bi dengê xwe yê qert, dubare kir... dengbêj û kitab... Baş e, tu dê çi bi kitaban bikî, heke tu dixwazî bibî dengbêj?

Ez dixwazim dengê kitaban bibihîzim, ez dizanim, kitab tijî deng in, di nav rûpelên kitaban de her texlîd deng hene...

De werin vê ecebê! Mamo, şaşbûyî, got. Biro, xortê çeleng û têgihîştî, kî te hînî gotinên weha dike? Seydayên te? Hinên din?

No, min got, ez pê dizanim, ma kitab ne tijî deng in, dengên heyatê?

Çawan? Dengên çi? Mamo, mîna ko min heşê xwe winda kiribe, bi dîqet, li min nihêrî û got. Di kitaban de deng nîn in, herf, kelîme û gotin hene.

Ma herf û gotin ne deng in?

Wî dengê xwe birî, bi heste agirê qelûna xwe gur kir, çavê wî li min, jê çend nefesên kûr kişand. Dûmana qelûnê, gurz bi gurz, di deriyê ko hinekî vekirîbû re, ber bi derve kişiya. Paşê, mîna ko tiştekî ketibe bîra wî, ew zivirî nik masê, ji ser masê kitabeke gelekî qalind û mezin ko bi devûrû vekirî, wergirt û vegeriya cîhê xwe yê berê. Wî herdu qumçikên jorîn ên gomlegê xwe yê pembûyê spî jî girt, deriyê şaneşînê vekir û got,

Were Biro, were. Dev ji dengan berde û were, ez ê tiştekî nîşanî te bidim.

Em derketin şaneşîna fireh ko hemû Dîcle mîna marekî ko çiv dida, ji pira ser Dîcleyê, bi dû pirê re keleh û qesra Mîr û li milê jêr jî heta erdên hêşîn ko bi daristaneke biçûk a darên bî, spîndar û mazû, ji ber çavan winda dibû, dixuya. Li herdu milên şaneşînê kursîne nizm û maseyên biçûk hebûn. Em çûn ber bi milê rastê û li ser kursiyan rûniştin. Mam Sefo kitaba ko bi çermekî tarî yê qehweyî cîldkirî bû, danî ser masê, kursiyê min hinekî ber bi xwe kişand û rûpelên kitêb ên gelekî zerbûyî vekirin. Li dereke kitabê ko tê de çermekî sor hebû, ew rawesta û rûpelên vekirî nîşanî min da. Min ji rûpelan çu tişt fahm nekirin. Rûpel bi herfên latînî lê bûbûn. Lê di rûpelê milê rastê de sûretek ko bi qasî nîvê rûpelê bû, dixuya.

Heke tu zimanê kitabê meraq dikî, ez bibêjim, Mam Sefo, sakîn, got. Kitab bi fransewî ye. Lê tu ji min re bibêje ka ew kesên ko tu di resim de dibînî, kî ne?

Di sûretê zahf bedew ko bi qelemeke reş û her kite bi hostahiyeke zarîf lêbûbû de, çemekî dirêj û fetloke ko bi Dîcleya me dişibiya û tê de leşkerên bêhejmar ên çekdar, li milê çepê çêm, li ser girekî, girseyeke însan ko di destê wan de çek û pûsat, qîreqîr dikirin, li milê rastê jî dîsan şêniyeke boş ko li erdekî mîna deştê, bi dest û mil, bang dikirin, dixuya. Ne ji cil û bergên wan, ne ji çek û pûsat, ne jî ji rû û rûçikê wan fahm dibû ka ew kî bûn.

Ez nizanim, min got...


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ez dizanim ko tu nizanî, Mamo, kenek li ser rûyê wî yê gulover, got. Ez bibêjim te, ev kesên ko li milê çepê ne, bav û kalên te kardux in, ev kesên milê rastê, bav û kalên min, ermen in û ev kesên ko li çêm in, yewnanî ne. Milê çepê, welatê karduxan, milê rastê jî welatê ermenan e û ev çemê ko tu dibînî, çemê Botanê ye. Ev bûyer berî niha, kêm zêde, bi du hezar û du sed salan qewimiye. Nivîskar û kumandarekî yewnanî ko bi xwe jî tê de bûye, hem ev bûyer û hem jî gelek bûyerên din ên rêwîtiya yewnanan nivisiye... Di vê kitabxana ko tu dibînî de, bi sedan, bi hezaran kitabên weha hene. Di kitaban de deng nîn e, lê tarîxek heye, tarîxek ko di vê geremola osmaniyan û navçê de, me zahf hewcedarî pê heye... Ez dibînim ko tu li pey riyekê yî, li riyekê digerî. Fermo, were kitabxana stûxwar ko jixwe li hêviya mêvanan e, kengî dilê te bixwaze, kengî wextê te hebe, were, heye ko kitab alîkariya te bikin. Ez ê bi Migirdîç, mamostayên wî û keyayên malê re bipeyivim da ko tu bi serbestî werî kitabxanê û ew hemû alîkariya te û pirsên te bikin. Ma nabe?

Germahiyek bi ser min de hat, çavê min tijî bû hêstir, ez rabûm pê, heta ber caxên şaneşînê çûm, li milê jor, li keleh û qesra Mîr, li Cûdiyê serî li asimanan, li darên bî ko bi rengekî mîna rengê xweliyê, ber bi asimanan bilind dibûn, nihêrî, carek, du caran ji milekî heta milê din çûm û hatim, paşê, çend dilop hêstir li ser rû û hinarikên min, vegeriyam û çûm destê Mam Sefo.

Mamo, min bi dengekî ko ji kela dilê min şikestî bû, gotê, Mamo, heke min per û bask hebûna, ez ê niha bifiriyama.

Lê belê, tevî spasdariyê, min dev ji înada xwe berneda û bersîva xwe jî, mîna pirs, gotê;

Mamo, ma tarîx ji dengan nayê pê? Ma çaxê em dixwînin, herf û kelîmeyên kitaban nabin deng?

Dengê Keso ko di kitaba ko Mam Sefo nîşanî min dabû de olan dida, yek ji dengên esasî yên kitabxanê bû. Deng gelek bûn û hemû hevalên min bûn, an jî ez weha bibêjim, hemû, gav bi gav, roj bi roj bûn hevalên min û bi hev re, mîna dengekî yekgirtî yê ders û tecrubeyan, dengê min terbiye kirin. Ji wê roja ko min niha qalê kir û pê de, êdî her roj, danê êvaran û rojên îniyan ko rojên bîhnvedanê bûn, ez li kitabxanê bûm. Siûda min, mîna siûda mîrekiya Cizîra Botanê, siûdeke bêpayan bû; geş, xweş, pêngav bi pêngav pêşketî, germ û bi heyecan.

Bi hatina Mîrê Zirav re, siûda mîrekiyê ko ji ber xirecir, şer, dijîtî, berberî û cehaletê hertim reş bû, qulipîbû ser ronahî, geşî û pêşketinê.

Tevî ko Mîr gelekî xort bû, wî şixulên mîrekiyê bi hunereke welê digerand ko di tarîxê de nehatibû dîtin; aştiyeke qehîm di navbera eşîr, navçe, dîn, terîqet û ehlê mîrekiyê de hatibû pê. Mîrekiyê ko pêşî aştiya xwe ya hundirîn anîbû pê, bi mîrekiyên din ên kurdan re jî pêwendiyeke samîmî û xurt ava kiribû û hema çi bigire bûbû mîrekiya herî girîng a hemû heremê. Cizîrê û der û dorên Cizîrê bûbûn navenda tîcaret û bazirganiyê, kerwan diçûn, kerwan dihatin, ji welatê Romê bigire heta welatê Basrayê û welatê Çînê hemû mal û heyinên Anatolî, Mezopotamya û Asyayê dihatin û diçûn. Dirav zahf bûbû, dewlemendî fireh dibû, tevî dewlemendiyê karxane, dûkan, xan, qonax, bazar ava dibûn. Medrese û mizgeft tijî dibûn, dêr, hawre û cîhên dînî yên din ên cihû, ermen, suryan, keldan û nastûran bi pêş diketin. Alîm û zane dihatin û li Cizîrê bi cîh dibûn.

Herçî ez bûm, min jî du cîhan, na cîhan gotineke mezin e, du hêlîn ava kiribûn; Medresa Sor û kitabxana Mam Sefo. Li Medresê ez hînî kitabên erebî, îlmê îslamê, hesab û erdnîgariyê, felsefe û edebiyatê dibûm. Lê belê ji hesab û hendesê, felekiyat û kitabên tevîhev ên felsefa Îslamê bêtir min ji çîrok, efsane, serpêhatî û gotinan hez dikir. Memê Alan û Mem û Zîn'a Seydayê Xanî ko ez ê şeveke din, çaxa gotin were ser gotinê, qal bikim, Şêxê Senan û şiîrên Feqiyê Teyran ko bi zelalî û mijarên xwe, gelekî bi yên şaîrê ecem Ferîdûn Ettar dişibiyan, çîrokên Leyl û Mecnûnê ko min dikarîbû bi erebî û kurdî bixwenda, Yusif û Zuleyxa ko ji Tewratê derdihat û bi kurdiyeke zelal lêbûbû, Ferhad û Şêrîn ko mîna Memê Alan evîneke bêpayan lê xizîn vedigot, Rustemê Zal ko çîrokeke hevbeş a kurdan û eceman bû, Gulîstan û Bostana Sadî, Dîwana Hafizê Şirazî, çarînên Xeyam, Mesnewiya Rûmî û Şehnama Fîrdewsî ko alayên herî bilind û rengîn ên edebiyata Rojhilatê bûn, bala min dikişandin û min ew dixwendin.

Bêguman Melayê Cizîrî jî ko jixwe tevî rêz û şiîrên xwe, heyat û tirba xwe, hertim, bi me re bû. Tirba Mele li tenişta Medresê û mizgefta wê bû. Ez nizanim ka niha çawan e, lê hingê yek dikarîbû hem ji aliyê mizgeftê biçûya mezelê Mele, hem ji aliyê derve. Ez ji aliyê hundir, di mizgeftê re, ko bi deriyekî nizm û biçûk vedibû hicreyeke gulower ko ji kevirên reş ên şehkirî yên zinarên Cûdiyê lêbûbû û ji wir jî di qulikeke teng re, bi nêrdewanên teng ko ji navenda hicrê ber bi jêr, mezelê Mele dadiket, diçûm nik Mele. Di mezelê Mele de, ji bilî tirba Mele ko bi qedîfeyekî kesk ê giranbiha yê tijî rêz û hedîs, hatibû rapêçandin, tirbine din ko yên ehlê mal-

bata Mîr Eziziyan bûn, hebûn. Lê gava ez dadiketim mezel, raste rast diçûm ber tirba Mele, min caw radimûsî û di destê min de dîwana Mele, li tenişta kêla tirbê rûdiniştim. Mele ko di dîwana xwe de gotibû, »heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf / di dinyayê tu nabî ne meşhûr û ne marûf«, bi rêzên xwe yên bijarte, bûbû yek ji seydayên min ên bijarte ko riya meşhûrî û mesrûfiyê nîşanî min didan. Gava bîhna min teng bûya yan kêfa min ji tiştekî re bihata, yan min dil hebûya destaneke nû bixwenda yan jî gotinên straneke nû li hev bianiya, min xwe davêt bextê Mele ko bi comerdî, zelalî û evîna xwe nas bû û herkesê bêgav, li nik xwe, diheband.

Di şevbuhêrkên me yên Medresê de jî, piştî ders û xebatê, em şagirt û feqe, li meclîsa medresê, li hev diciviyan û me li meqam û awaza gotina devkî guhdarî dikir. Çîrok û destan zahf bûn, şagirt û feqeyên ji deverên Serhed û Bazîdê, Şikak û Urmiyê, Mikus û Bedlisê, Diyarbekir û Fîsê, Heran û Ber-Firatê, Mêrdîn û Torê, Hekar û Behdînanê ko gelekî dil dikirin bibûna hafizên yekta, stran û destanên deverên xwe, di direjahiya şevên westiyayî û bêdeng de, bi gelek deng û celeban, mîna tizbiyeke not û neh libî, li pey hev rêz dikirin. Di wan şevbuhêrkan de, gava gelekî pêwist nebûya û şagirtan zorê nedane min, min nedigot, lê guhdarî dikir. Ji bilî Memê Alan ko hema çi bigire em hemû zarokên Cizîra Botanê pê mezin dibûn, kêfa min ji Xecê û Siyabend ko çêla evîneke keserkûr ko li çiyayê Sîpanê Xelatê dawî dihat, dikir. Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekaran ko bi devê zelal û sade yê Hekaran her dîsan çêla evîneke zîz dikir û destana Dimdimê ko çêla berxwedana mîrekî kurd, Xanê Lepzêrîn û ehlê wî yê keleha Dimdimê dikir, dihat. Ev hemû çîrok û destan, tevî lehengên xwe, bi xêra wan şevbuhêrkan, ji wan şagirt û feqehan bêtir bûn hevalên min, şirîkên ders û tecrubeyên heyata min.

Herçî hêlina min a din bû, li wir jî deryayeke zelal û bêdawîn ji kitabên têkel ko bi zimanên xerîb lêbûbûn, hebû. Li kitabxana Mam Sefo, bêguman, kitabên ko bi zimanê kurdî, erebî û farisî lêbûbûn û min jî êdî dikarîbû bixwenda, hebûn, lê piraniya kitaban, li gora ko Migo û mamosteyên wî şerh dikirin, bi zimanên ermenî, aramî, latînî, romî, îtalî û fransewî bûn. Di nav rûpelên wan kitaban de cîhaneke gelekî cihê, bi herf, cimle, gotin, mijar, serpêhatî, wêne, dîmen, xêz û rêzên xwe, silav li min, li rebenê Xwedê ko gelekî dûrî wê cîhanê bû, dikirin... Min bi wan zimanan nizanîbû û heke ez rastiyê bibêjim, min ne dil, ne jî taqet hebû ko ez wan hîn bûma jî, lê jiber bextê min ê çê, li tenişta min, hevalê min

Migo ko min navê wî kiribû Hûro, ko ji kitaban bêtir bala wî li ser xwarinê bû û mamosteyên wî ko ji bilî dersan têkilî tiştekî nedibûn, hertim dûrî însên bûn û mîna rêzên kitabekê bersîva pirsiyaran didan û Mam Sefo ko carina, bêtir jî rojên îniyan, danê êvarê, dihate kitabxanê û ders û şîret didan min, hebûn. Her çi tiştê ko min dil dikir bipirsiya û bizanibûya, bêyî ko ez şerm bikim an li rewşê bifikirim, kitabên ko ez lê hûr dibûm di destên min de, heşê min bi dengên kitabên têkel tijî, ez diçûm mezelê Migo û mamosteyan, min li derî dixist, biken, diketim hundir û rasterast daxwaza dilê xwe dipirsî;

Rêzên vê kitabê jî, mîna zimanê frensawî, ji milê çepê tên xwendin, ne welê?.. Navê vî şervanê ko şûr di dest, tîr û kevan li mil, diqîre, çi ye?.. Ev kesê rîhdirêj ko dikene, ev kitab lêkiriye, ne welê?.. Ev bergehê hanê ko çêl li qada şer, mirin, kuştin û xwînê dike, li kû, çawan, kengî qewimiye?.. Ev çi war û welat e ko jê dûman radibe?.. Ev derya ko diqelişe, li kû ye, navê wê çi ye? Ev însanên ko li berê ne, çi kes in, ji kû tên, derin kû?.. Ferq di navbera van herdu kitab û zimanan de çi ne?..

Belê, herçawan ko ez bi xêra gotina devkî ya Apê Xelef, dengbêjên Cizîrê, şagirt, feqe, mela û seydayên Medresê, hem hînî deng û pêjnên welatê kurdan û hem jî hînî hêvî û kêfxweşî, derd û keserên însanî bûm, herwelê, bi xêra gotina nivîskî ya gelek zimanên ko min dizanîbûn û nizanîbûn, ez hînî dengên zindî yên însanî ko carina germ, carina sar, carina zelal, carina tevîhev, carina çê, carina jî kirêt bûn, bûm. Li kitabxanê, di nav wan kitabên bêhejmar de, hin kitabên ko bergên wan ên bi çerm cîldkirî bi hev dişibiyan, bêtir bala min dikêşandin. Ji aliyekî Mam Sefo rast digot, kitab napeyivin, lê ez dikarim piştî tecrubeyên umrekî vê yekê bibêjim ko kitab, heke ne hemû bin jî, kitabeke bi hostehî, bi ked, xîret û evîna însanî lêbûyî, bîr bi hal û hewalê însên dibe û bi awayekî welê nêzîkî li însên dike ko însan bivê nevê, bixwaze, nexwaze, bêgav, di nav bêdengiya ko kitab tîne pê de, bi kitabê re dipeyive, pê re hevaltiyeke germ ava dike û sohbeteke xweş, geş û bikêr li dar dixe.

Kitabên ko herî zêde bala min dikêşandin, min rûpelên wan diqulipandin û li bergeh û sûretên tê de dinihêrtin, di destpekê de, bi alîkariya Mam Sefo, kitaba Keso ko çêla deh hezar leşkerên yewnanî dikir, leşkerên ko ji welatê xwe derdiketin, diçûn Babîlê, li wir şikesteke xedar dixwarin û bi hezar zehmetiyan, di welatê Med, Kardûx, Ermen, Derya Reş, Stenbol re dibuhirîn û xwe digîhandin welatê xwe. Bi dû re jî min ji Tewrata ko çêla zehmetî û dijwariyên ko ehlê benî îsrael dîtibûn dikir,

kitaba Maro ko çêla qehremanekî ko ji bêgaviyê dev ji welatê xwe yê şewitî û xirbebûyî berdida û dikete ber pêlên welatê xerîbiyê, dikir, kitaba biçûk a Naso ko hem çêla şox û şengê, kêf û henekê, evîn û eşqê, hem jî derd û keserê, hesret û bêrîkirinê dikir, hez kir. Ji ber ko nave nivîskaran dirêj û ecêb bûn, mîna ko min hertim dikir, min ew jî li gora daxwaza dilê xwe guherandin û bi navine nû ko di bîra min de diman, bi nav kirin. Ev kitabên ko ez niha qalê dikim û yên mîna wan hemû, bi çerm cîldkirî, bi neqşên zêrhêlî hûnandî, navê kitab û nivîskar li ser berg, bi xeteke gelekî spehî lêbûyî, mezin û bedew li kêleka hev, li ser refekî ko nezîkî dîwarê lewha teyrê tawis bû, rêz bûbûn. Kitab bi sûret û xêzên gelekî spehî ko însên dikarîbû tê de hemû kitekitên kitabê bidîta, tijî bûn. Sûret bi pênûsa reş lêbûbûn û hemû bi destê hosteyekî hosteyan ê resimê afirîbûn. Ne hewce bû ko însên kitab bixwendina, çaxa însên li sûretên kitaban dinihêrî, tafilê, têdigihîşt ka kitab û ew rûpelên kitabê ko sûret tê de bûn, qala çi dikirin. Danê êvaran, piştî dersên zimanê kurdî û erebî, ez ji Medresê, cîhana îlmê îslamiyet û Rojhilatê derdiketim, bi lez û bez, carina di kolanên teng ên bajêr re, carina bi dirêjahiya çêm re, di ber darên qehîm ên Dîcleyê re, tevî ko ez westiyayî bûm, min xwe digîhand mala Mam Sefo, li mitbaxê, bêyî ko ez bala xwe bidim tiştekî an jî mîna berê, bi qesta lîstikê, lîstikên »bilo« jî tê de, herim nik hevalên xwe, min çend parî qeliya sêlê, seriyekî pîvaz an îsotek dixist nav pariyekî nan û hildikişiyam jor, kitabxanê. Çaxa min deriyê qehîm ê kitabxanê vedikir, cîhana min a din ko bi deng û pêjnên dewr û dewranên gelekî dûr tijî bû, bi comerdiyeke bêpayan, xêrhatinî li min dikir û hemû tiştên xwe pêşkeşî min dikir.

Mîna ko ez li Medresê dest bi xwendina Quranê bikim, an li tenişta tirba Melayê Cizîrî dest bi xwendina beytan bikim, welê bi rêz û rêzdarî, bi hizr û dîqet, ez pêşî diçûm ber dîwêr, nik teyrê tawis, min bi qasî kêliyekê lê dinihêrî, nêrdewana ko ji bo kitabên jorî refan li kitabxanê bû, dikêşand û dianî ber dîwêr, hildikişiyamê, bi destê xwe çarçowe û resmê teyrê tawis mist dida, paşê ji ez diçûm ber refên kitaban û min kitaba ko wê rojê min dil dikir, ji ref werdigirt û rûyê min ber bi dîwêr, teyrê tawis, şaneşîn û Dîcleyê, ez li erdê, li ser mehfûrên rengîn ên bi neqşên bedew ên Cizîra Botanê hûnandî, berbixûn, dirêj dibûm û min rûpelên kitaba mezin vedikirin. Gotina Armê rast bû, tevî ko berdestên malê her hefte an jî du heftan carekê kitabxane dimaliştin û toza kitaban jê dibirin, ji kitaban bîhneke ecêb ko hinekî bi bîhna încas û hejîrên çilmisî dişibiya

û nefesa însên diçikand, bilind dibû. Lê ne xem bû, bîhna kitaban jî aîdê wan dewr û dewranan bû ko kitab jê dihatin. Pirî caran tîrêjên sor ên taveke qels li ser rûyê min, dengê ava çêm li ber guhê min, min rûpelên zerbûyî vedikirin, ez li ber her rûpelê ko tê de sûret, xêz, bergeh an jî şekil hebû, disekinîm, bi qasî çendekê min li wan dinihêrî û paşê ez bi wan re dipeyivîm. Na, ne ko ez dipeyivîm, min xwe dixist dewsa kes û şêniyên ko di sûretan de, bi libas, tevger, awir nêrîn ên cihê dixuyan. Carina ez dibûm leşkerek û mîna leşkerekî diqîriyam, carina dibûm kalepîrekî bi gopal û min lawij dixwendin, carina dibûm qumanderek û ferman dibarandin, carina dibûm pîrejinek û stran dinehwirandin, carina jî ez dibûm şaîrek û min, mîna dengbêjekî, gotin li pey hev rêz dikirin. Her kesekî bi dengekî, her tevgerekê bi şêweyekî û her dengekî jî bi meqameke xas. Li gora min, bi qasî ko min ji şerhên mamosteyan û sûretan fahm kiribû, dengê Keso mîna pola sert bû, ko kevir jî dibirî, dengê Naso mîna qedîfe nerm bû, ko ruhê herî şêt jî haş dikir, dengê Maro jî mîna dengê ava çemê Dîcleyê bû, ko carina bilind, carina aram, her û her diherikî.

Herwekî kitaban, di nav sûretan de jî, nemaze hin sûret li ber dilê min, bêtir, ezîz bûn. Di Tewratê de, di yek ji rûpelên pêşîn ên kitaba yekemîn a Mûsa Pêxember de, sûretekî gelekî spehî hebû, ko çemê Dîcle û Firatê, bi hemû zelalî û bedewî nîşan dida. Herçiqas, piştî ko ez pêrgî Stêrê hatim, hejmara sûretên Tewratê ko li ber dile min ezîz bûn, zahftir bûn, lê belê hingê, di kitabxanê de ew sûretê ko çemên qedîm ên însaniyetê berpêşî min dikirin, hem heyecaneke boş dida min, hem jî sikûneteke kûr. Ma kî dizane, heye ko destpêka strana min a Dîcleyê jî, hingê, ji nav rûpelên Tewratê, kahniya serpêhatiyên Firat û Dîcleyê, derhat? Di kitaba Keso de ew sûretê ko Mam Sefo nîşanî min dabû, ko tê de bav û kalên min, ên Mam Sefo û yewnan ko paşê, piştî sirgûna me, ew ê bibûna heval û hogirên heyat û qedera min, bi qîreqîrên şer û pevçûnan, li hev dinihêrin, hertim bala min dikêşand. Kardûx, ermen, yewnan, çek û pûsad, qîrîn, gazîn, hawar, mirin, kuştin, tirs, revîn, di wî sûretî de ev hemû, bi hêsanî û bi zelalî, dixuyan.

Di kitaba Naso de, sûretek ko tê de kalemêrekî ko Naso bixwe bû, li qiraxên deryayeke bi pêlên tarî harbûyî, li ser zinarekî rûniştibû û bi keser, bi xizîn, li derya reş, pêlên tarî, ewrên girtî dinihêrî, gelekî bala min dikêşand. Heye ko hê hingê, çaxa min, car bi car li sûret nihêrîbû, bêyî ko haya min jê hebe, çavê min ê kor, mîna her cara mûsîbet,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

jeniyabû û min bîr bi qedera we ya welatê xerîbiyê ko gelekî bi qedera Naso dişibiya, biribû.

Herçî kitaba Maro bû, dîsan di rûpelên pêşîn ên kitabê de sûretekî ko eceb xweşik, na ne xweşik, zîz hebû, ko bêpayan bala min dikêşand; di sûret de, li pêşî, qehremanekî bejndirêj, birîh û çeleng, zarokekî li pişta wî, şûr di destan de, li tenişta wî jî jinikeke ciwan a bedew, kalemêrekî veciniqî û hin kesên din ên bi cil û bergên şewitî û lîmebûyî, bi hev re dimeşiyan, li pey wan jî bajarê ko tevî birc, beden, xanî û avahiyên xwe di nav gulokên êgir de bû, dixuya. Qehremanê me, tevî jin, zarok, bav û nasên xwe, axa bav û kalên xwe yên mirî, bajarê xwe yê şewitî, heval û dostên xwe yên kuştî, jin û zarokên nasên xwe yên dîlketî li pey xwe dihişt û diket ber pêlên welatê xerîbiyê, mîna ko me dê jî, piştî têkçûna serhildana Mîr, bikira...

Û di kitaba Maro de, bi xêra mamosteyên Migo, ez hînî cimla xwe ya yekemîn û dawîn a latînî jî bûm: Arma, virumque cano.

Yanî; ez strana sîleh û însanan dibêjim...

Dengê bêdengiyê, gelek caran, ji dengê sîlehên ko bi dengê xwe yê ecêb hemû dengan ji holê radike, tê pê. Belê, dengê sîlehan, dengê şûr, dengê tivingê, dengê topan, dengên ko dengê însên dikuje û hawîrdor diqulipîne ser çoleke bêdeng.

Bêdengî, west e,
Heke ne west be, keser e,
Heke ne keser be, hesret e,
Heke ne hesret be, jan e,
Heke ne jan be, bîr û heş e.
Yan jî ev hemû ne.
Yan jî hin ji van in.
Mîna niha,
Mîna ko ez niha dikim, bi qesta bîhnvedan û cixare pêçanê
radiwestim û dikevim nav pêlên bêdengiyê.
Na, ez nakevim nav pêlen bêdengiyê,
Pêlên bêdengiya dewr û dewranên windabûyî û jibirbûyî bi
ser min de tên...

Deng, di berbangeke çîkî zelal a heyameke zahf kevn de deng.

Ronahî, gewherî.
Di pey tarîtiya şevê re ronahî.
Ronahiya ko çêla stranên kevnare ye,
Ronahiya ko li ser her tîrêja wê, her tevgera wê stranên
abadîn lêbûne.
Heyamek û rojeke weha ya stranan.
Taveke gewher ko li ser sînga çiyayê Şengalê leylan dide.
Tîrêjên ronî ko di nav pel û çeqilên darên kêleka çemê
zelal re diseridin.
Çirûskên ronî ko li ser ava kahnî direqisin.
Şewqên rengîn ko li ser dîwarên ji kevirên reş ên xaniyên
gund dibiriqin.
Dinya aram, sakîn, ronî.

Lê deng, dengên xofê:
Allah, Allah, Allah...
Allah, Allah, Allah...
Saw, tirs, dengê qiyametê,
Pêla dengan, dengê simên hespan,
Dengê hîrîna hespan,
Dengê qîrîna siwaran.
Gav bi gav nêzîktir.
Gav bi gav ji aramî û sikûnetê dûrtir.

Û deng, dengê tirsiyan.
Teyr û tilûr, bi bask û perwazan, dûr bi dûr.
Dîk û mirîşk, bi tiralî, geh li vî alî, geh li wî alî.
Hesp û mehîn, bi hîrîn û hîşîn, revîn, revîn.
Cahnî, pez, dewar, ker, bergîr, revîn, revîn.
Însan, zar û zêç, kal û pîr, jin û mêr.
Xwe veşartin, revîn, revîn.

Lê ewana, dengê wan;
Allah, Allah, Allah...
Allah, Allah, Allah...
Dengê tekbîrên wan.
Dengê şûrê wan.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qîrîna ko aramiya destê sibê diqelişîne.
Dengê ko bêdengiya însanî ya şefaqê têk dibe.

Lê ewana, dengê wan.
Di nava meydana gund de.
Li ber dîwarên malan.
Li ber deriyan.
Li ber deriyê ko niha, tevî mij û dûmana dewr û dewranan,
di nav mij û dûmane de bi bîr tê.
Li malekê ji malên gund, li milê êxur, pênc kes, sê zarok,
bav û dê.
Bav û du zarok, keçek û kurek, li êxur, di nav pêz de.
Dê û zarokek, kurekî ko hê jê bîhna şîr tê, di kadînê de.
Bêdengî, bêdengiya tirs û sawê.
Bêdengiya tirsa şûr, tirsa mirinê.
Kadîn, zarok di hembêza germ a dê de.
Dê, tirs, cirifîn.
Zarok, girîn, lerizîn.
Megirî kurê min, megirî, megirî.
Girîn.
Destê nerm ê dê, pihêt, li ser devê zarok.
Megirî, megirî, megirî lawê min ê delal...

Lê ewana, dengê wan.
Xerîb, ecêb.
Dengê ruhistîn.
Nêzîktir, li hundir. Li milê malê...
Qîrîn, şerqîn, pîrqîn.
Bêrawest, bi qasî çendekê.
Çendek ko bi qasî babilîskekê dirêj, bêdawîn.

Deng, dengê deriyê êxur.
Û dengê zarok, dengê keçikê;
Bavo, Bavo, Bavo,
Yadê, Yadê, Yadê.
Dengê pêz, berx, mîh.
Dengê kur, keç, bav.

Û dengê wan, carek, du caran, sê caran.
Car bi car.
Û dengê şûr, carek, du caran, sê caran.
Car bi car.
Qîrîn, axîn.
Birîn.
Û mirin, bêdengiya li pey mirinê.
Bêdengiya ko li pey dilopên xwînê yên devê şûr tê pê.
Bi qasî çendekê ko bi qasî babilîskekê ye.
Bi dû re dîsan deng, dengê wan.
Nezîktir. Li nik kadînê.
Megirî kurê min, megirî, megirî.
Dest, bêgav, li ser devê zarok,
Çav şil, beden bi taya tirsê ketî.
Çend serî li ser dîwarê kadînê.
Qîrîn, qirîna wan.
Qîrîn, qirîna zarok û dê.
Û şûr, dengê şûr.
Geh li jor, geh li jêr.
Carek, du caran, se caran.
Car bi car.
Axîn, xwîn.
Xwîna ko ji devê şûr dilop dike.
Û çûyin, çûyina zarok û dê.
Çûyina wan, şûrbazên xwînxwar.
Û bêdengî, bêdengiya boş a mirinê...

Dengê bêyom ê şer û pevçûnê, di umrê min ê xeşîm ê zaroktî û xortiyê de, tevî ko heyam aram, dinya ronî û wext hêvîdar bû, hertim, mîna şûrê xwinrêjan, li ser milê me, hilawestîbû. Me hertim, bi gelek hêncet û şêweyan, bîr bi dengê şer dibir, em hertim pê dihesiyan.

Niha, di vê şeva me ya westiyayî de, her tişt çiqas aram, çiqas bêdeng e! Guhê xwe bidin ser dengan... ji dengê min ê kal û birîndar, ji dengê çemê Dîcle yê abadîn û herikbar, ji dengê bayê sivik ê hûnik û evîndar pê ve çu deng hene? Na, nîn e. Lê hûn, dengê heyamên bê, divê baş bi vê yekê bizanibin; dengê min jî, dengê Dîcle û dengê ba jî, di esasê xwe de, rengekî dengê şer e, tê de dengên têkel ên şer heye. Dengê şer... kîn, ne-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

fret, berberî, çavsorî... şûr, xencer, tiving, top, hilweşîn, şewat, xwîn, birîn, axîn, qîrîn, hawar... mirin, windabûn, veqetîn, koç, hesret... şer, yanî birîn, birînên mêjî û dil, birînên însan û civatan ko çu carê nacebirin... Şer, yanî şopa kûr a birînan li rûyê însanan, li ruhê civatan, li kûrahiya wîcdan û merhameta dewr û dewranan. Bila ev aramî û sikûnet we nexapîne, beriya vê aramiyê şer hebû, tirsa min, ew tirs e ko piştî vê jî dê dîsan şer hebe. Hûn werin, dengê şer û pevçûnan, ji tecrubeyan, yanî ji dengê min, dengê Dîcleyê û dengê bayê destê sibehê bipirsin.

Heyata min ko di navbera Medresa Sor û kitabxana Mam Sefo, gotina devkî û gotina niviskî, mala Apê Xelef û mezelên Medresê, Armê û Gulîzerê de dibihurî, mîna kulîlkên sor ên xwînî yên hinaran ko di biharan de dibişkivin, roj bi roj, geştir û xweştir dibû. Wext diherikî, heyam diçûn, sal dibihurîn û heyata min, bi rûpelên nû yên ders û tecrubeyên heyatê ko di nav rûpelên kitaban de veşartîbûn, dewlemendtir dibû. Lê belê hema çi bigire, hemû tiştên ko ez hîn dibûm, li ser şer, pevçûn, evîn, hesret, jan û hêviyê bûn. Medrese, warê evîna manewî, kitabxane, warê evîna nefsî; gotina devkî, warê xewn û xeyalan, gotina niviskî, warê hesab û kitaban bû. Li Medresê, di destê sibehan yan jî di nîve şevan de, geh li dersxanê, geh li hicrê, geh li nik tirba Melayê Cizîrî, pirî caran kitabek ji kitabên dersxanê di destê min de, rêzên kitabekê yan jî yên çîrokeke mîna Hezar û Şevekê li ser lêvên min, heşê min li dûr, di nav kûrahiyên manewî yên heyata piştî vê heyatê, ez ji xwe ve diçûm. Li kitabxanê, danê êvaran yan jî derengê şevan, geh li erdê, li ser xalîçe û mehfûran, geh li ser dîwanê, dirêjbûyî, di bin ronahiya qendîlan de, çavê min pirî caran li ser teyrê tawis ê dîwêr, guhê min li ser dengê ava Dîcleyê, hertim kitab û rûpel û di nav rûpelan de jî sûret û bergeh li ber min, dilê min bi bedewiya sûret û bergehan keldayî, heşê min li ser xêz, kes û şeklên ko di nav bergehan de dixuyan, bi dengekî bilind, geh bi qîrîn, geh bi gazîn, geh bi olan, geh bi liyan, min însanên bergehan vedijandin û ruh û dengek dida wan.

Ez dibûm Naso û min li welatekî xerîb, li nik însanên xerîb ko bi zimanekî xerîb diaxivîn, ji rêz û rêzdar, hez û hezkarên xwe dûr, jibîrbûyî û di nav tenêtiyeke bêpayan de, bi dengekî xemgîn û zîz, bi keser û hesret, deng li derya xerîb û tarî ya xopan dikir.

Ez dibûm lehengê Maro, barê min giran, stûyê min xwar, welatê min ê şewitî û heval, nas û xizmên min ên kuştî li pey min, hevala min a heyatê winda, bav û kurê min westiyayî û dilşikestî, şûr di destê min de, dilê min

bi mirin, kuştin û ketinê guvaştî, mîna dizekî, bêdeng, tevî heval û hogirên min ên şerê man û nemanê, bi xwestek û hedefa dilopeke hêvî û çilkeke ronahî, ez li keştiyan siwar dibûm, min ji ava kesk a derya zelal lenger digirt û carina bi qîrîn, carina bi girîn, birîndar, min berê xwe dida welatên xerîb û nediyar, warê însanên ko ne mêvanperwer bûn û ne jî dildar.

Herçî Keso bû, jixwe ew, ez bûm. Çaxa min rûpelên zerbûyî yên kitaba qalind û mezin a Keso vedikir û li sûretan dinihêrî, tavilê, ez, carina, diqulipîm ser lehengekî tarîxî ko di sûret û bergehên kitabê de dixuya, carina jî ez dibûm kumandarekî serfiraz, alîmekî bîrbir, zanayekî dûrbîn û leşkerekî jîr û min bi qîreqîr, bi xirecir, geh siwar, geh peya, geh bi çek û zirx, geh rût û pêxwas, geh li çolên germ ên çikî zuha, geh li newalên kûr ên çiyayên bilind, pêlên çemê Dîcleyê, bilindahiyên çiyayê Şengalê, bircên welatê Babîlê, deriyên qehîm ên keleha Nînovayê, çiyayên asê yên welatê med û kardûxan, zozanên welatê ermenan, ava har a Derya Reş û gelek cîh, war, welat û qonaxên din, bi leza birûskê, bi sivikahiya perê teyrê tawis, di bîhnekê de dibirîn û min bûyerên ko bergehên kitabê berpêş dikirin, werdigirtin û ew diqulipandin ser wê heyama min a xortiyê ko jê bîhna geşbûnê difûriya; hin ji kesên bergehan ko di nav berfê de diqerisîn, dibûn osmanî, hinên din ko tî, birçî, westiyayî, lêv û hinarikên wan terikî, dibûn kurd, hinên din ko di nav mij û dûmanê de, rêwindayî, li riyekê digeriyan, dibûn ermen, mîr û mîrzayên bergehan ko bi dek û dolab, bi şer û pevçûn gora hevûdu dikolan, dibûn mîrên Cizîra Botan, Hekaran, Mikus û Serhedan û her yek dibû xwediyê dengek, dengekî xas ko min li gora helwest û rawestîna wan a sûretan, li gora xwe, diafirand û vedijand.

Gotineke kurdan heye, dibêjin, sî û sê çîrokên hirçê hene, hemû jî li ser hirmiyê ne. Heyata min jî welê bû; roj, hefte, meh, sal bi çîrok, mesel, efsane, şiîr, serpêhatî, lawij, rêz, hedîs, ayet, gotin û kitabên ko li ser şer, pevçûn, veqetîn, xizîn û keserê bûn, derbas dibûn. Heke hûn niha bipirsin, ka ez ji van hemûyan ko ne bi tenê neqşên heyata min, herweha hê jî birîn û keserên ruh û dile min in, çi hîn bûm, ez ê, piştî evçend qeda û belayên ko bi ser me de hatine, ji we re bibêjim ko li cîhanê her tişt, însan, teyr, tûr, dar, nebat, her celeb mehlûqat, mehkûmî mirinê ne, lê heke hûn bixwazin tiştekî, însanek, bûyerek, serpêhatiyek, pêwendiyek, hîsek, daxwazek, bikin nemir, hingê hûn divê xwe bispêrin gotinê, ger gotina devkî, ger ya niviskî û jê bîr û heşekî qehîm bînin pê, – bîr û heşekî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

qehîm ko rê li windabûn, jibîrbûyîn û têkçûnê bigire û nehêle wexta kambax ko her diherike, bi pêlên xwe, her tiştî bifetisîne.

Belê, ji ders û tecrubeyên gotinan a heyata xwe, ez dikarim, bi kurtî, vî tiştî ji we re bibêjim; herwekî ko di destpêka Tewratê de hatiye gotin, beriya her tiştî gotin hebû, bi gotinê, afirîna herî hêja ya însanan, her tişt afirî; ji lewre pê bawer bin, çu carê rû ji gotinê banedin, lê hûr bin, bawerî hem bi gotina Tewratê bînin, hem bi telqînên êzidiyan, hem bi ya çîrok û efsanan, hem bi ya bûyer û serpêhatiyan; xwe bigihînin cewhera gotinê û rê bidin ko bila gotin jî xwe bigihîne ruh û canê we; li gotin û cewhera wê bifikirin û wê vejînin, dengek bidinê, bi ruh û caneke nû wê bixemilînin, gotina bêruh ko hûn dibînin, an jî dibihîzin, biqulipînin ser heyineke zindî, bila ew bijî; heke hûn pêrgî gotinên tewş, pûç an jî vajî tên, rû ji wan bamedin, dewsa ko hûn yekê qebûl û ya din jî red bikin, bi hewldan û xîret, wan li hev bînin û ji wan dewlemendiyeke nû bînin pê, wan paqij bikin, zelaliyeke germ û samimiyeteke dilsoz bidin wan, ji bîr mekin ko her gotin li gora ihtiyac, daxwaz û mirazeke însanî hatiye afirîn û li cîhanê ne bi tenê daxwazek heye, ne jî ihtiyac û mirazek, ev hemû zahf in, têkel in û pirî caran jî li dijî hev in, lê heke hûn hostayê gotinê ne, hingê, bi xîreta zêrîngerekî wan bihûnin, bineqişînin û li hev bînin; gotina Memê Alan, an jî ya Zîna Zêdan li gora dewr û dewran, rabûn û rûniştin, cil û bergên Mem û Zînê bipîvin û herçi ya Bekoyê Ewan e, wê jî, bi cil û bergên nû, mîna ders û tecrubeyeke însanî, berpêşê guhdarê xwe bikin...

Aha kurtebiriya heyata min; gotina însanî û şerên neînsanî ko bi destê însanan tê pê, yanî bi qewlê Maro, însan û çek û vegotina wan...

Kengî ez bi dengê bêyowm ê şer û pevçûnan hesiyam? Bêguman gelek kitekit di heşê min ko ji kitekitan westiyayî de hene, lê belê, heke ez ne şaş bim, cara yekemîn, di wê roja pîroz a eydiya qurbanê ya misilmanan de, ez bi xurtî, bi dengê şer û pevçûnan hesiyam. Hingê êdî umrê min qonaxên destpêkê birîbû, min bîr bi çerxa felekê, kar û şixulên dinya û mîrekiya Cizîra Botanê dibir, hefteyek, du heftan carekê bi cûzaneke ko rîh û simbêlên ko bi şermokî nexşeyeke nû li ser rûyê min dianîn pê, jêdikir, bi dengê xwe ko êdî ber bi qertbûnê ve diçû, stranên nû ko mîna xwediyê xwe qonaxa zaroktiyê li pey xwe hîştibûn û çêla heyata Dîcleyê dikirin, li hev dianîn û mîna rojên xortiya Apê Xelef, min jî xeyal li firkandina ten û canên nermik û germahiya memikên gewher dikir. Tevî ko min qonaxa şagirtiyê jî birîbû, ez hê, bêyî ko bixwazim bibim feqe û

mele an jî alîmekî dîndar, li Medresa ko mîna mîrekiyê, roj bi roj dibû navendeke gelekî girîng, dimam.

Min û hevalên min, me hemûyan bejn avêtibû; gewdê min girs, bejna min dirêj bûbû. Hemeyê tirek, bi bejna xwe ya dirêj û zirav ketibû rewşeke welê ko êdî tirek û deh tir li ba wî mîna hev bû, Migoyê Hûro, bi xwarin û goştê ko wî bi şev û roj dadiqultand, bûbû mîna conegayekî bitirbûyî, Gûlîzer, bi bejn û bala xwe ya şox û bi memikên xwe yên mîna du portaqalên Derya Spî bûbû dareke behîvan a biharê ko pel û şax dide û herçî Armê bû, wê jî bejn avetibû, lê her welê mîna diya xwe, jar û merezî mabû. Gelek kesên din, ji Cizîrê û der û dorên Cizîrê, gundî, bajarî, kurên axa û began, gavan û cotkaran li civata me zêde bûbûn, lê ji wan dudo êdî bûbûn hevalbendên esasî yên koma me ya tiredînan; Têlî û Yezdînşêr.

Têlî ko ji min bi qasî çend salan biçûktir, ji herdu çavan kor û pozberanekî bi dilê we bû û li Medresa biçûk a qesra Mîr, li ber destê seydayên bijarte Quran û dersan hefiz dikir, kurê Mîr bû. Yezdînşêr ko ji min bi qasî du salan biçûktir, lê bi gewdê bi qasî min, xortekî çeleng û lihevhatî, rûgeş û jîr, biraziyê Mîr bû. Yezdînşêr ko du salan bi dû min re, li Medresa Sor, dest bi xwendinê kiribû, kurê Mîr Seyfedîn û xwarziyê Seîd Begê bû. Seyfedîn Beg, beriya Mîr û birayê Mîr Salih Begê, mîrê Cizîra Botanê bû û Seîd Beg jî serekê keleha Gurkêlê bû. Di şevbuhêrkên bê de, heke Yezdanê dilovan jî dil bike û heta hingê nefesa min neçikîne, ez ê çêla Seyfedîn Beg, Seîd Beg û keleha Gurkêlê ko qulipî ser qada şer û birîneke kûr di dilê welatê Cizîra Botanê de veda û nexweşiyên kûr anin pê, bikim.

Herçî Heme bû, ewî jî, mîna Yezdînşêr, du salan bi dû min re, heye ko ji hesûdî û zikreşiya li hember min, li Medresa Sor, dest bi xwendinê kiribû û tevî ko ew kurê Xelefê êzidî bû, li ser riya melatî û îlmê îslamiyetê pêngav bi pêngav pêş diket.

Ew roja ko niha tê bîra min, em herpênc heval li nik hevûdu, li qesrê, li şaneşîna Mîr bûn. Di bihareke germ de, ko êdî darên bihîvan kulîlkên xwe yên spî diweşandin û darên hinaran kulîlkên xwe yên sor diqulipandin ser hinarên biçûk, rojeke germ a çarê eydiya qurbanê bû û dinya êdî êvar bû. Rojeke tijî kêf û şahî li pey mabû, tevî ko dinya hê jî bi ronahiyeke qels a çikî sor xemilandîbû, êdî çirûsken stêran li ser gopikên çiyayê Cûdî dixuyan. Roja dawîn a cejnê bû, heciyên ko li ser riya Mekeyê bûn û her sal dihatin li xan û malên Cizîrê mêvan dibûn, niha li


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

axa pîroz a misilmanan bûn, zarokên ko li hêviya cejnê bûn, çar rojan, bi bexşîş, yadîgarî, lîstik û şahî û şênahiyan westiyabûn, tifikên mitbax û aşxaneyên qesra Mîr ko di nav wan çar rojan de hertim jê dû û dûman bilind dibû, êdî vemirîbûn û mizgeft û medresên bajêr ko tijî însan bûn, vala bûbûn. Mêvanên dawîn ên qesrê ko hemû giregirên welêt bûn, piştî xwarina şîva êvarê, ko ji xwarinên bijarte yên Cizîra Botan, kutlikên mêlakê, savara kerengê, çend celeb meftûnî, meftûneya dîzikê, bamyê, bacanê sor û reş, qelî, selateyên sevze, mastî, xamînê û bi dû şîvê re jî, şirînahiyên kulindê dimsê, qelezeng û tîlolokê hatibû pê, bi qewlê gotina kurdî, ji dinyayê re nan, ji axretê re îman, xatir ji Mîr û qesrê dixwestin û li hespên xwe siwar dibûn û diçûn. Bi dehan, heye ko bi sedan xizmetkar û qewraşên qesrê li bexçê qesrê û li bexçeyên fireh ko di navbera dîwarên bilind ên qesrê û qiraxên çêm de hêşîn dikirin, kelepûr û gemariya ko şêniyên Cizîrê li pey xwe hîştibûn, dixistin telîsan û riyên biçûk ên bexçeyan dimalaştin.

Em li jor, li şaneşîna fireh a qesrê ko ji kevirên şehkirî yên reş ên çiyayê Cûdî hatibû raxistin, peregende, bi şîva êvarê ya lezîz û keft û lefta çar rojên bi şahî westiyayî, li ser piyan bûn. Mîr, bira û biraziyên Mîr, Mam Sefo, pispor, şêwirmend, weznedar, seresker, mela û seydayên Mîr li milê din ê qesrê, li aliyê Birca Belek, li meclîsa teniştа Bircê bûn. Têlî ko kurê herî mezin ê Mîr bû û gelekî dişibiya Mîr, li nik min bû û min jê re çêla stêrên ko hedî hedî hildihatin û diçirûsîn, dikir. Tevî ko Mirê Zirav hê gelekî xort bû, ji niha ve hejmara zarokên wî gihîştibûn şeş heftan. Mîrê me ne bi tenê hosteyê gerandina şixulên mîrekiyê bû, herweha ew hosteyê pişta xwe bû jî; roj bi roj hejmara jin, cariye û zarokên wî zêde dibûn. Sê kurên wî yên mezin hebûn, Têlî, Necîb û Elî Şamil, lê ji wan Têlî, heye ko ji ber korahiya wî yan jî bêdengiya wî, bûbû hevalê min. Me, min û Têlî, du kesan bi çavekî, hevaltiyeke qehîm ko ew ê her û her dewam bikira, anîbû pê. Herçî Migo, Heme û Yezdînşêr bûn, ew jî li aliyê din ê şaneşînê bûn û bi xirecir di navbera xwe de dipeyivîn.

Ava Dîcleyê, bi hêza barana biharê, bi dengekî xurt, mîna lehiyekê, pihêt, ahengdar û têkûz, diherikî. Tevî ko êvarê hê nû dest pê kiribû, heyveke ronî ya nûger hatibû û li ser bilindahiyên çiyayê Cûdî hilawestîbû. Heyv, eynî mîna heyva ko di Mishefa Reş a êzidiyan de çêl lê dibû, bû; ronî, nûranî, spehî û abadîn. Û tiştê herî xweş jî, heyv û stêran huzmeyeke ronahiyê ya bêpayan li ser rûyê avê anîbûn pê. Min li milekî ji Têliyê ko ji nûra çavan bêpar bû re, qala nûraniya heyfê û stêran dikir

û li milekî jî car bi car, mîna ko ez li ber xwe bipeyivim, weha digot,

Stran divê, Teliyê bira, stran.

Têlî jî, ji gotinên min ên li ser stranê eciz, de bibêje Biro lo, de bibêje, digot.

No, Têlî no, min lê vedigerand, ez ê stran nebêjim, ez ê lêkim...

Lê êvara me bi wê kêfxweşiya êvara ronî û aram a eydiya biratî û xweşiyê kuta nebû. Hê ez û Têlî, guhê me li ser dengê Dîcleyê, bi gotinên tewş, dipeyivîn, li milê din ê şaneşînê qîrînek bilind bû. Migo, Heme û Yezdînşêr bi dest, pî û gurmistan ketibûn hev. Çima, sebeb çibû, kê li kê dida, me nizanîbû, lê gava em gihîştin nik wan û me, bi alîkariya hin berdestên qesrê ko xwe gîhandibûn şaneşînê, ew ji hev veqetandin, min dît ko ji bêvil, birûyê çavê rastê û eniya Migo xwîn dihat. Hersê jî mîna deveyê hêç har bûbûn û bi qîreqîr tiştine kirêt ji hev re digotin. Ez, Telî û du berdest li nik Migo man da ko wî haş bikin, çendên din jî Heme û Yezdînşêr ji wir bi dûr xistin. Lê çaxa ew ji şaneşînê bi dûr ketin, gotinên ko ji devê Hemeyê tiredîn, bi qîreqîr derketin, ko tê de hem tovên felaketên rojên bê û hem jî dengê şer û pevçûnên dîn, gel û welatan hebûn, çu carê ji bîra min neçûn. Her cara ko mûsîbetek hate serê me, ew gotin jî, car bi car, hatin bîra min. Niha, piştî umrekî, gava ez behsa wan dikim, mîna ko ew hê nû, dîsan, ji devê Heme derdikevin û ruhê min diguvişînin;

File, kurê filehan... neynûk file... ho, ehlê Cizîrê, hespê kule, seyê tûle û kesê file, lê mebe ewle, gelî Botiyan, lê mebe ewle...

Dengê strana Dîcleyê di mehên biharê de, ko hingê çem dibe lehî, xurt e. Ne bi tenê di mehên biharê de, herweha gava hestên hêrs, kerb û hîdetê li dar in, dengê stranê dîsan xurt e. Xurtahiya deng, ji hişyarbûna tebiyetê û serhildana hîs û pejnan e. Weha;

Dîcle me ez,
Dengê Dîcleyê,
Qîrîna ko olan dide,
Hawara ko bang dike,
Strana ko dibêje.

Li ser rûye min şopa şûr, rim,
Rengê derd û keseran,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pêjna miriyan,
Şer, pevçûn, veqetîn, talan.
Di nav şikêrên zinaran de dizêm,
Di nav boşahiyên deryayeke aram de têk derim.
Ez dizêm, bayê gur, zozan, berfa spî,
Arzû, coş, evîn,
Ez dimirim, bayê germ, çol, ne starî, ne sî.
Valahî, bêdengî, sakîn,
Li ser rûyê min kelek, keştî, mîna hêstirên çavan,
Siya darê çinaran, bî û spîndaran, mîna şopên derketiyan.

Ho tu, dengê qîrîna însaniyetê,
Dengê hawara însaniyetê.
Guh bide min, dengê min, dengê Cizîra Botanê.
Cizîra Botan, kurê Cûdî, neviyê Nuh,
Milekî li çiya û zozanan
Milekî ber bi çol û deryayan.

Asiman, ro, stêr, heyv, heyveron qedîm, qehîm,
Şahidên rûyê min, şopên li ser rûyê min,
Dinihwirînin lorîna keserê,
Difirkînin rûyê min ê birîndar
Li qiraxên min teyr û tilûr,
Eylo, baz, başoke,
Legleg, quling, teyrê tawis, bi rengên keskesorê.
Keskesoreke abadîn geh li pêsîra asiman, geh li ser rûyê min.
Ez diherikim, ji do ber bi îro,
Ji dengê xurt ê coşê ber bi dengê bêdengiyê.

Cizîra Botan, mercana jorîn a Mezopotamyayê.
Tê de hestên xurt, bestên kûr veşartî,
Gotinên delal, kelamên zelal, ji do ber bi îro,
Veguhastî, mîna lehî.
Siwarên hespên seglavî mîna lehî,
Ewrên bi baranê avis mîna lehî,
Refê qulingan mîna lehî,
Kevir û zinarên reş ên Cûdiyê, mîna lehî,

Tovê ko hêşîn tê, mîna lehî,
Simbilên ko serî radikin, mîna lehî,
Gotina ko tevî min diherike, mîna lehî,
Û ez, şopa însaniyetê mîna lehî.

Ho tu, qîrîna însaniyetê,
Dengê hawara însaniyetê,
Guh bide min; Dîcle me ez,
Dengê strana Dîcleyê,
Zimanê bêzimanan, dengê bêdengan...



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## ŞEVBUHÊRK SISÊ

**ro**

Dengê min yanî dengê Biroyê dengbêj ko hûn ê îşev jî seh bikin, dengê Dîcleya xopan, Firatê malikwêran, Nînovaya şewitî û Babîla hilweşiyayî ye.

Êvareke nû ya heyameke kevn a jan, keser, hesret û mirinê tê; siya êvarê ko remzeke kevn a çerxa dinyayê ye, hêdî hêdî hawîrdor radipêçe û tê; gotinên vê êvara nû ko ji dewr û dewranên bav û kalan mane, yek bi yek, xwe li ba dikin û tên û hûn, guhdarên vê êvara nû, xwediyên şevbuhêrka nû ko dê bi meraq li gotinên bav û kalan guhdarî bikin, bi evînî qefesa dilê xwe ji deng û pejnên min, Biroyê dengbêj, kalemêrê li ber mirinê, tiredînê pêncperan ê dinyayê re vekin, gav bi gav, nêzîki li min û li dengê min dikin û tên.

De werin, hûn hemû bi hev re werin da ko em hemû bi hev re herin. Em herin qiraxên çeman, bin darên wext û dewran, ber lingê sûr û bircên kelehan, gopikên girên hezar salan, kavilê bajaran, kûrahiya keleporên medeniyetan, nik kalemêrên rîhspî yên êzidiyan, eywanên malên keldanan, deverên sazî yên bedewiyan, welatê êzidiyan, misilmanan, filehan. Em herin geşt û seyrana şevbuhêrka me ya nû û xwe bigihînin van hemû dengan.

Belê, şevbuhêrka me dê îcar çêla deng, pêjn, reng û tahmên nû yên heyata min ko li derveyî welatê Cizîra Botan rabû govendê, bike. Lê pêşî xewnek... Xewnek ko min, çavê min vekirî, bi êşa xedar a birînên min, carina hişyar, carina jixweveçûyî, berî ko hûn werin, dît.

Xewna min, mirina min bû, min di xewna xwe de mirina xwe dît. Herçiqas min di her gaveke nû ya heyata xwe de mirin dît, hertim ez pêrgî mirinê bûm û min mirina ko jê xelasî ne mimkun e, mîna perçeyekî esasî ya heyata xwe qebûl kir û gelek ezîzên xwe gorî axa reş kir, çu carê ez neketim goreke nûvekolayî ya goristaneke kevnar ko bi darên bî û spîndaran warê aramî û sikûnetê ye. Lê di vê xewna min a nû de ez ketim gorê, goreke nû ko di bin siya dareke qedîm a tûyê de vedayî bû û jê bîh-

na axa reş a nû kolayî difûriya.

Şev bû, dinya aram, hawîrdor çîksayî, asiman ronî bû. Şewqa heyveroneke gewher û lîstikên ronî yên stêrên hezhezok şevê, kêm zêde, qulipandibû ser rojê. Pêşî bi qasî çendekê ez li aliyê hundirê malê ko ji vê mala belengaz bêtir bi mezeleke qesreke mezin, mîna qesra Mîr dişibiya, li ber pencerê sekinîm û min li lîstikên stêran, kenê heyva ronî, xuşîna ava zelal û pelên darên li kêlekên çêm ko yek bi yek hildiweşiyan û mîna çirûskeke zer ko di nav reşahiya tenik a şevê de dibiriqîn, hildiweşiyan, nihêrî. Welê dixuya ko tebiyetê dîsan kirasê xwe diguherand, pel diweşiyan, dar serqot diman, çiya bi hatina berfê şaşikeke spî dikêşand serê xwe. Mîna ko pel li ber min rabûbin govendê, ew hêdî hêdî ji çeqilên daran vediqetiyan, li hewayê çiv didan xwe, bi qasî kêliyekê dizivirîn û diweşiyan erdê.

Ma heyat jî ne weha bû? Ez, çavê min li ser govenda pelan, di xewna xwe de fikirîm. Gava wext tê, heyata insanekî ji dara jîndar a însaniyetê vediqete û diweşe erdê. Heyata pelan kuta dibe, heyata daran dewam dike da ko dîsan, bihareke din a bê, pelan bibişkovîne.

Di heşê min de fikr û pirsên weha, sergêj, westiyayî û hinekî bîhnteng, bi hedîka min derî vekir û ez derketim derve. Bi tena kiras û derpiyê spî, lê kulavekî qehîm a şivanan li ser milên min û cixareyeke pêçayî û heste di destê min de. Dinya hinekî hûnik bû, xunav ketibû erdê û bayekî sivik pişta der û ber, dar û pelên ko êdî reng guherandibûn, hêdîka, mist dida. Ez çûm ber çêm, çemê qedîm ê Dîcleyê ko hertim bi şêweyekî bi me re ye û niha jî dengê wî li ber guhê me dikeve. Di bin dareke çinarê de ko çend gavan ji çêm bi dûr bû û gewdê wê bi qasî birceke keleha Cizîrê stûr bû, ez li ser totikan rûniştim. Min cixare pêxist, jê çend hilmên kûr kêşand, li dûmana wê ko gurz bi gurz bilind dibû nihêrî û guhê xwe da ser dengê çêm, dengê ba û dengê sivik ê pelan.

Çem diherikî, av, bêrawest, ji welatên jor ber bi welatên jêr dixuşiya. Ber bi derine, lê ber bi kû? Xuşexuşa avê çi digot, li pey wê xuşexuşê çi deng hebûn? Çêm di zikê xwe de çi celeb deng vedişartin? Beriya min, kî hatibû û li dengê çêm guhdarî kiribû, jê vexwaribû, tê de xwe şuştibû, tê re derbas bûbû? Umrê dara çinarê çiqas bû? Kê ew çandibû? Wê şahidî li çi û li kê kiribû? Çiqil û pelên wê ko niha bi bayê sivik diliviyan, beriya min, ji kê re bûbûn dalde, bûbûn starî? Û ba... ew ji kû dihat, bi kû de diçû? Wî çi digot, çi distra, çêla çi dikir? Û pel, pelên ko yek bi yek, bi aheng, bi nazenîn diweşiyan. Remzê çi bûn ew? Umir? Wext? Heyam?


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Însan? Roj? Hefte, meh? Sal, sedsal? Heye ko hemû?

Belê, hemû. Ma umir, wext, heyam, însan, roj, hefte, meh, sal û sedsal jî mîna van pelan, gava wextê wan dihat, nediweşiyan û piştî ko ew diweşiyan, ma ew hemû bi bayê hûnîk ê berbangan, gav bi gav, bi wextê, nehatin ji bîr kirin?

Piştî ko min cixara xwe kêşand, di bin dara çinarê de, di nav dengê çem, ba û pelan de, bîr û heşê min bi deng û pejnan tijî, bi fikir û gumanan mîna hêlekanekê geh li vir, geh li wir, ji nişka ve, ez ji xwe ve çûm û mirim. Çima, çawan? Ez pê nizanim, lê ez, bêyî ko biêşim, bi jan û keserekê bihesim, bêyî çu kul û bîrînê, bi aramî, bi hizûr mirim.

Lê herwekî hûn dizanin, êzidî mirinê mîna dawiya heyatê nizanin, wan bawerî bi kirasguherînê heye. Beden dimire, ruh vediguheze bedeneke nû. Ruhekî pak û qenc xwe digihîne bedeneke pak, ruhekî kirêt û neqenc diqulibe ser ruhê heywanek an jî însanekî bêheş. Ez mirim, lê ruhê min hişyar bû, çavê min girtî, lê deriyên ruhê min vekirî bûn. Ehlê nas hatin ser min, feqîran Qewlê Îmanê li ser min xwendin, şêxê êzidiyan, bi beratê, ava çêm, dilop bi dilop, xiste devê min û li rûyê min reşand, wî ez şuştim, cilên spî li min kirin. Ehlê min ê ezîz, nas û dostên min ên nêzîk bi def, erbane û bilûrê, bi qewlê Mergê, bi terqîn û nasînê ez veşartim.

Ez hatim veşartin, lê hê dengê şêx û feqîran dihate guhê min;

Rojek ji rojan e
Werin xelkê arîfî zane
Ji mirinê bidin beyan e
Xelkê arîfî zane werin

Mirina ko beyan dibû, mirina min bû, lê ruhê ko lê liyan bû jî, ruhê min bû; deng dihatin, min ew dibihîstin, deng û dengbêjî ji min bi dûr ketibû, lê ez bûbûm guhdarê dengan. Di nav rengekî çîk î spî yê gewher de, bi nûreke tîj ko bi şewqa royê dişibiya, dengê ava çem, ba, dar, ber û pelan ko tevî xwe bi sedan, bi hezaran dengên din jî dianîn, digihîştine min. Dengên do, dengên pêr, dengê stran û serpêhatiyan, dengê ayet û hedîsan, dengê şer û pevçûnan, dengê mîr û ordiyan, mêrkuj û bêbextan, zarok û dayikan, dengê teyr û tilûran, rawir û direndeyan... Dengan her tişt, çem, dar, pel, behr, aso, erd, asiman, însan, heywan, keleh, xanî, deşt, gelî ser û binî hevûdu dikirin. Her tişt dikete nava hev...

Wext, eve bû; mekanekî bêserûber ko bi tenê ji dengan dihate pê.

Heyat, eve bû; dareke abadîn a çinarê ko ji pelên ko hertim dibişkovin û diweşiyan, hatibû pê. Hîs û bihîstiyariya însanî, eve bû; bayekî sivik ko di nav wext û heyaman, war û welatan, dar û pelan de digeriya.

Guhdarên ezîz, dema dil neşewite, çav jî hêstiran narijîne. Dema mirin bi yekî eyan nebe, ew bi vî şêweyî, nayê xewnan jî. Xewna min, mirina ko li rê ye, nîşanî min da. Bi min eyan e, min zêde wext nemaye. De bilezînin, qendîlê bînin, li koşa hanê ya li ber serê min, li ser refê deynin, tasa min a avê tijî av bikin, çend cixaran bipêçin, tevî heste û xwelîdankê deynin ber min, hûn jî xwe ji heyata derve ko hûn jê tên, xelas bikin û guhê xwe bidin ser dengan, dengên wext, heyat û hîsan...

Dengê dara tûyê, heke meriv bixwaze ferqekê têxe navbera dengên daran, ji dengê dara çinarê yan ji dengê dara henarê cuda ye. Dengê dara çinarê ya sedsalan mîna dengê çiyayê Cûdî ye, ko jê dengekî kûr û dûr bilind dibe. Dengê dara henarê ya jar mîna dengê aveke biharê ye, ko hûrik û tenik diherike. Herçî dengê dara tûyê ya xemilî ye, mîna dengê axa avis e, ko jê dengê heyatê tê. Welatê Cizîra Botanê tijî dar û ber e, her celeb dar, her texlîd şinahî tê de heye. Tu bi kêfa xwe yî, çi darê bixwazî, tu dikarî li binî paldî, çi darê bixwazî, tu dikarî hilkişiyê.

Di salên min ên xortaniyê de, bi meraqeke xortekî nûgihîştî, mîna gelek tiştên din, ez ketibûm pey daran jî, hem darên bêber hem yên biber. Darên li qiraxên çemê Dîcleyê, yên li ber ling û li ser sînga çiyayê Cûdî, yên bajarê Finikê ko bi keleh û avahiyên xwe yên tarîxî ko bi kevirên spî lêbûne, meşhûr e, yên der û dorên Gurgil, Kiver û Birkê ko şinahî hîç çu carê jê ne kêm e, yên welatê Torê ko darên erdê beyar in û ji darên hemû navçê cihê ne, yên welatê Hekaran ko darên çiyayên bilind û newalên kûr in, min ev hemû, hema çi bigire, yek bi yek dinasîn.

Umrê min hingê gihîştibû hevdeh, hejdehan, simbêlên min êdî mîna qeytanê, rîha min ko min jêdikir, mîna erdê cotkirî bû. Bejn û bala min ko jixwe girs bû, her diguherî û sal bi sal girstir dibû. Cil û berg biçûktir, sol û pêlav tengtir, derpî û kiras qirêjtir dibûn. Pêşiya derpiyên min ên delingdirêj bi çilkên mîz û avikê, hertim, zer bûn. »Bilo,« belê Biloyê bêbav ko êdî bîr bi hal û hewalê çerxa felekê dibir, mîna darên çiyayê Cûdî, hema çi bigire hertim, serbilind bû. Ne bi tenê di xew û xewnan de, herweha di dawet û dîlan, tahziye û şînan de jî. Bilo ko diviya hevalê herî baş ê min û bedena min bûya, qulipîbû ser cinawirekî bêbext û fet-baz û hertim, li her derî, nefes li min diçikand û dixwest min, ji bo

daxwazên xwe, bifetisanda. Wî ne li min, ne li dil û mêjiyê min û ne jî li tiştekî din difikirî. Wî her mîna xwe dikir, li pey xewn û xeyalan, strana xwe ya bêdeng a daxwaz û mirazan digot;

Hûr û kûr
Nerm û germ
Tenik û nermik...

Lê belê herçend bejn û bala min mîna dareke biharê şax dida, dengê min mîna dengê şêrekî dioriya û min êdî xwe peyayekî tirtire ko dikarîbû bi her şixulî rabûya, dihesiband, ewçend jî min xwe mîna şêrekî ko di qefesê de ye û di qefesê de diore, hîs dikir. Cizîr êdi ji min re biçûk dihat. Cizîra Botan bi carekê bûbû teng û hew kel û besta min tê de radibû. Tevî ko Armê û Gulîzerê hê jî li wir bûn û wan jî mîna min bejn davetin û memikên wan bûbûn mîna sêvên Hewrexê. Dil û ruh, mêjî û heş êdî bi firê ketibûn, min dil hebû dinya bidîta, dewr û dewranên din, welat û bajarên din jî nas bikira. Cizîr, çemê qedîm ê Dîcleyê ko di Cizîrê re bi fitloke çiv dida û diherikî, keleha qedîm ko ji pênc hezar salan û vir ve her li kêleka çêm şahidiya herikîna wext û çemê Dîcleyê dikir, qesra Mîr ko avahiya herî bedew a keleh û bajêr bû, xaniyên din ên spehî yên kelehê, çiyayê Cûdî û çiyayên din ên doraliyên bajêr ko bergeheke bêpayan dianîn pê, qiraxên çêm û darên qehîm ko li qiraxên çêm bilind dibûn, riyên fireh ko li kêlekên çêm, mîna şirîkên qedera çêm bûn, taxên kevn ên bajêr ko ji hezaran salan û vir ve şahidiya tarîxeke kevnare dikirin, taxên file, cihû û êzidiyan ko rengekî taybetî direşandin ser bajêr, kuçe û kolanên teng ên bajêr ko hertim tijî şênî bûn, bazarên bajêr ko meydana civîn û civatên hemû welatê Cizîra Botanê bûn û ehlê gundan hebûn û malên xwe dianîn û lê difirotin, mazatên pez û dewaran ko tê de ji hemû welatê Kurdistanê her celeb pez û dewar hebûn, dûkanên etar, necar, koşkar, terzî ko piraniya wan di destê file û cihuyan de bûn, qahwexane û aşxane ko piraniya wan di destê ehlê misilmanan de bûn, xan û hemamên bajêr ko hema çi bigire hemû di destê ermen û keldanan de bûn, mizgeft û medrese, dêr û hevre, ezan û zingil ko her yek bi ahenga xwe ya taybetî dengê xwe bilind dikir, evane hemû êdî perçeyên heyata min bûn û êdî çu kel û bestê nedigîhandin ruhê min. Min ew dinasîn, gav bi gav, li wan deran geriyabûm, qult bi qult jiyabûm. Li her koşeyî, li her derî tecrubeyeke min a xas, serpêhatiyeke min a nemir hebû.

Min bajarên nû, war û welatên nû, însan û zimanên nû, tecrube û serpêhatiyên nû diviyan. Yên nû diviyan li yên kevn zêde bûna. Mîna daran, şax û pelên nû diviya li şax û pelên kevin zêde bûna.

Herçî Medresa Sor bû, êdî ez jê têr bûbûm. Min xwendina xwe biribû serî, bi zimanê erebî hedîs xetim kiribûn, rêzên Fîrdewsî, Şîraz, Sadî û Xeyam bi farisî dixwendin, bi îlmê Îbnî Xaldûnê mexrîbî û hin alîmên din ên welatê Rojhilatê dizanîbû, rêzên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî hemû, bi kurdî, jiber kiribûn, di hicreyan de keser û eziyeta paqijî û manewiyeta ruh kêşandibû, bi salan di nav nivînê gemarî û odeyên teng ên Medresê de, bi ronahiyeke gelekî qels a qendîlekê, destê min ê çepê di nav şeqê min de, min piraniya kitab û kaxizên ko di Medresê de bûn, xwendibûn û êvareke şilî ya biharê, di hizûra Mîr de, ko Mam Sefo jî li wir bû, li meclîsa kêleka Birca Belek, li der dengê baran û çêm, li hundir pisepisa mele, seyda û şêxan, min beytên alîmên îslamiyetê û rêzên Melayê Cizîrî xwendibûn û Mîr jî tevî kîsekî tijî dirav ez perû û pîroz kiribûm û bi rûyekî geş ez ji hizûra xwe bi dûr xistibûm. Ez hê jî di navbera Medresê, mala Apê Xelef û Mam Sefo de, mîna miyeke gêj an jî mîna tiralekî kuçeyên peregende, bêkeys, bêkar, diçûm û dihatim, lê min her ji xwe dipirsî; min ê êdî li Medresê çi bikira?

Wexta min bi kitab, rêz, şiîr, stran, çîrok, serpêhatî û şevbuhêrkan derbas dibû. Ne mal û milkên min ne jî pere û dewlemendiyên min hebûn, hê jî min bi xêra alîkariya Mîr û Mam Sefo fort davêtin. Min hem stran digotin hem jî li hev dianîn. Hingê min xistibû serê xwe, ez ê bibûma kesekî xwedî şan û şoret, bibûma dengbêjekî xwedî rêz û rêzdarî, lê herçî stranên ko min çêdikirin, ne bi dilê min bûn. Ne zimanê wan çu ziman bû, ne jî ûslub, lihevanîn û mijarên wan. Hema çi bigire her êvar û her şev, piştî ko şevbuhêrk xelas dibûn û şênî diçûn, min dest bi stranan dikir. Ji stranan re bêdengî diviya, bêdengiyeke taybetî ko tê de tovên afirinê hene. Tevî ko ez ji stranan razî nebûm, wextên min ên herî xweş, ew wextên bêdeng bûn ko hingê dilê min, mîna lehikeye ko xwe digihîne deryayan, haş dibû, ruhê min dikete nav bêdengiyek ko bi dengên stranan xemilî bû. Di nav nivînên qirêj ên Medresê an jî yên paqij ên mala Apê Xelef ko bi destên nermik ên Gulîzerê hatibûn şûştin de, lehîf heta ber qirika min kêşandî, carina, mehên germ, pencere vekirî, carina, wextên sar û seqemê, di oda genî de bîhnçikiyayî, min her digot, rêzên kevn û nû, yên do û îro li hev siwar dikirin û stran li pey stran li hev dianîn. Lê tiştekî stranan kêm bû. Çi? Di wan kitab, şiîr û rêzên ko min


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wan salên xortiyê, dixwendin an jî lê dinihêrîn de, tiştê herî bala min dikêşand û coş û heyecaneke taybetî dida min, salixdana şêweyên heyatê bûn. Şêweyên heyatê, deng û pejnên wê ko ji heyata ko ez heta hingê jiyabûm, xurtir, dewlemendtir û balkêştir bûn. Di dawiya dawîn de, piştî bi sedan stranên tewş û pûç ên şevên min ên tenê ko min ji hîç kesekî re nexwendin û zûtirîn wext ew ji bîr kirin, ez têgihîştim ko kêmaniya stranên min ev yeka hanê bû; şêweyên heyatê, deng û pejnên jiyînê, dewlemendî, balkêşî, ders û tecrubeyên heyat û jiyînê. Belê, ez têgihîştim ko straneke hêja û kemilî, bi tenê, dikare li ser avahiya ders û tecrubeyên têkel ên însanî were pê.

Min û stranên min ev diviyan...

Şevek ji wan şevên min ên wekhev ên guman û ponijandinê, ko ez li mala Apê Xelef bûm, piştî şevbuhêrkeke xweş bi çend rîspiyên êzidiyan re, li ber destê sibê, ez ji nişka ve ji xew hişyar bûm. Bîhna min çikiyayî, nefesa min teng bû. Bi zehmetî min nefes digirt, xwîdan ji min diçû û tiştekî mîna gurmistekê qefesa sînga min diguvişand. Bi lez, bi tirs û xofa ko ez tê de bûm, min rahişt tasa avê ko hertim, ez li kû bûma, li ber serê min bû û min ava tasê hemû vexwar. Piştî ko hinekî bîhna min derket, min xwe da hev û avêt derve, nik çêm. Dinya çikî sayî bû, tevî ko baran nîn bû, şilî ketibû erdê.

Şeva wan rojan jî mîna şeva xewna min bû ko berî niha bi bîskekê min ji we re qal kir. Hawîrdor bêdeng, her der di nav aramiyeke boş de bû.

Li milê min ê rastê girseyeke tarî ji daran hebû û ez ber bi wan çûm. Zaroktiya min li wan deran derbas bûbû; min dar yek bi yek dinasîn, heta bi guherînên wan ên salewextê, mêş û moz, teyr û tilûrên ko dihatin û vediniştin jî dizanîbûn. Di her destpêka biharê de ez heftê du, sê caran diçûm nik daran û bi wan re dipeyivîm; darê, min digot, betirpêrar gewdê te jar bû, niha firehtir e. Dara biyê, xanima daran, betirpêrar ev şax û guliyên te nîn bûn, niha bi van şax û guliyan tu bêtir xama yî. Dara behîvê, bûka cilspî, pêrar kulîlkên te yên spî derengtir bişkovîn, lê par û îsal zûtir...

Dar têkel bûn; darên sedsalan ên çinaran ko her yek ji wan bi qasî xaniyê Apê Xelef stûr bûn, darên nazenîn ên serwî û bî ko bi bedewî xwe dirêjî çêm dikirin, darên gumreh ên berû ko tevî şax, gulî û çiqilên xwe mîna heyateke şên dixuyan û darên biber ên tû, behîv, biyok û sêvan ko malê herkesî bûn.

Mîna xewna min, hingê jî ez çûm bin dareke şên û kulavê germ ê şi-

vanan ê Apê Xelef li min, li ser totikan rûniştim. Min ji mêj ve dest bi cixarê kiribû, titûna ko min dikêşand, ne bintaya titûnên tewş bû, titûna min, titûneke qamaş a zer ji welatê Mûş û Hekaran bû û pelên cixarê jî ji aliyê Heleb û Bêrûdê dihat. Mam Sefo qutiyeke zîvîn a titûnê ko bi neqşên xweş dibiriqî û Apê Xelef jî hesteyekî kevirî ya ji aliyên çiyayê Şingalê dabûn min. Hingê di bin dara tûyê de, bi hevaltiya dengê çemê ko li ber min diherikî û ronahiya stêrên ko êdî ji min xatir dixwestin, di nav wê bîhntengiya min a bêpayan de min çend cixare pêçandin û ew li pey hev kêşandin. Ji bilî cixarekêşanê min çi dikir, ez li çi difikirîm? Hîç nayê bîra min, lê ez bawer im, dilê min ê tirsok ê bizdayî, ruhê min ê nermijokî û mêjiyê min ê tevizî hingê li çu tiştî jî nedifikirîn. Welê, di nav dûmana ko ji cixarê bilind dibû û mija ko di ser ava çêm re, bi alîkariya bayekî sivik xwe dilivand de, ez xilmaşî bûm û bi qasî bîstekê di xew re çûm.

Çaxa min çavê xwe vekir, êdî ne mij mabû ne dûman, tîrêjên tavê li ser çêm dilîstin, ronahiyeke tenik di navbera şax, gulî û pelên dara tûyê re diseridî, taveke tîr û şewqîn di ser gopikên çiyayan re dirêjî hawîrdor dikir. Beybûnên spî û binevşên mor ko li der û dorên min dixuyan, serî rakiribûn. Ji axa nerm bîhneke nerm a giya û hêşinahiyê difûrî. Canê min, hemû bedena min tevizîbu, min nikarîbû lingên xwe bilivanda. Welê, li ser giyayên ko bi qasî bihustekê bilind bûn, min xwe dirêjî erdê kir û ji jêr ve li jor, li dara tûyê, gewdê, şax, gulî, çiqil, pel û tûyên wê yên zer û kemilî nihêrî. Pel hêdîka diliviyan, bayekî sivik di navbera pelan re diliviya.

Dara tûyê, ez fikirîm, umrê wê ko kesî pê nizanîbû, gewdê wê yê girs ko bi dirêjahiya deh salan hatibû pê, hêz û quweta wê ko bi şev û bi roj, hertim li ber berf û bahozê, baran û pûkê, tav û tîrê li ber xwe dida, reh û rêçên wê ko di kûrahiyên axa reş de mîna gurmistên şerekî bi axê re bûbû yek û çu quwetê nikarîbû ew jê bi dûr xista, heyata wê ko ji reh û rêçan heta pel û libên tûyan di hemû aliyên wê de, bi dûzan, mîna xwîna însanekî hertim diherikî û xwe diguherand, rawest, aramî û gumrehiya wê ko bêyî ko ew xwe bilivîne û bi derekî din de here, hertim di nav tevgereke xurt de bû, bi van hemû milên xwe, dara tûyê emsaleke baş bû hem ji bo min hem ji bo însanan.

Ez hê welê difikirîm, tûyeke bi qasî pêçiyekê ji darê ber bi jêr bû û hate kete ser çavê min ê kor. Siûda min a qebrax! Min bideng got, tû dê were û xwe li aliyê min ê reş biqelibîne!

Min ceza tûyê dayê, ew avêt devê xwe, şîrê tûyê devê min bi şêrînahiyeke ecêb xweş tijî kir. Min ji dora xwe çend libên din jî hildan û avêtin devê xwe. Her danê sibê, berî ko min dest bi cixarê bikira, min pariyekî nan dixwar da ko tahma devê xwe biguheranda. Wê sibê jî xurîniya min, tûyên lezîz û mezin ên çemê Dîcleyê bûn.

Dara tûyê, dîsan ez fikirîm, berî niha bi pênc salan jî dar weha mezin bû, berî niha bi deh salan jî, roja yekemîn ko min xwe li binê veziland jî. Kê ev li vir çandiye? Umrê wê çi ye? Bîst sal, pêncî sal, sed, du sed, sê sed sal? Kê ev dara yekta mîna şitil dîtiye, av daye şitilê, pelên wê yên yekemîn ko bişkovîne, hijmartine, ahengek dane şax û guliyên wê, tûyen wê yên yekemîn xwarine? Kê mîna min di bin de pal daye, di xew re çûye? Kê xwe spartiye siya wê, di bin de sifre danîne û xwarin xwarine? Belê, însan hatine û çûne, dewr û dewran, wext û mewsim hatine û çûne, lê dara tûyê her di cîhe xwe de maye û şahidî li her celeb hatin û çûyinê, li her celeb guherînê kiriye. Xwezî niha zimanê vê darê hebûya, min got, wê serpêhatiyên xwe, tişt û bûyerên ko wê dîtine, gotin, sohbet û stranên ko wê bihîstine, bigota û ji min re behsa tecrubeyên xwe bikira...

Li ser serê min dara tûyê, li ber min jî çemê Dîcleyê û ji min hinekî bi dûr, li qiraxên çêm, çend teyrên mezin ko bi qulingan dişibiyan, dixuyan. Çemê Dîcleyê bi serpêhatî û tecrubeyên xwe yên bi hezaran salan, bi aramî, li ber min diherikî. Çem ji kû dihat û ber bi kû diherikî, li kû diza, li kû winda dibû? Wî li war û welatên din çi didîtin, bi kîjan av, avzê, gol, co, çem û deryayan re dibû yek, ji kîjanê vediqetî?

Dara tûyê, çemê Dîcleyê, ez qîriyam, deng derxin, dengê xwe bilind bikin, çêla însanan, wext û heyamên wan, serpêhatî û tecrubeyên wan bikin. Lê ne dar ne jî Dîcle dipeyivî, bi tenê dengê sivik ê bayê ko di navbera şax, gulî û pelên darê re û di ser pêlên avê de xwe dilivand, dihat.

Dara tûyê, çemê Dîcleyê... tevî bedewî û gumrehiyê, sukûneta wan; tevî xemil, bedewî û aramiya wan; tevî umrekî kevn, dewlemendî, ber, hêşînahî û rengên wan; tevî bêdengiyê, serpêhatî û tecrubeyên wan; tevî bêzar û bêzimanî, comerdiya wan...

Însan jî diviya weha bûya, ez fikirîm; însanekî gumreh, lê sakîn; bi xemil, şox û şeng, lê aram; umrekî xas, lê dewlemend, biber, hertim bi kar û şixul; bêdeng, lê xwedî tecrube û serpêhatî; ne devsist û çengebaz, lê comerdê gotina ders û tecrubeyan...

Zanîn û tecrube, li wir, li ber devê çem, bêyî ko kesekî wan bibîne, dest li min dikirin.

Hingê, di bin dara tûyê de, piştî ko min têr tû xwarin, lê berî ko min dest bi cixarê kir, çavê min li ser tîrêjên şewqîn ên li ser ava Dîcleyê, min biryareke nû ya heyata xwe da û biryara xwe, ji xwe, ji dara tûyê û çemê Dîcleyê re, çend caran, bi deng, dubare kir; Biro, te gaveke nû ya heyatê divê. Biroyê tiredîn, te ders û tecrubeyên nû yên heyatê divên. Biroyê kor ko dixwaze ji korahiya xwe stranan derxe, çavê xwe yê sax veke û li min û li darê binihêre (heke tu dikarî), te mîna vê dara tûyê kemilandin, xemilandin, şax û gulî, ber û dewlemendî divê. Biro, Biroyê nîvçe, nîvçav, nîvêzidî, nîvmisilman, nîvfile, nîvcihû, nîv ji vir, nîv ji wir, de rabe pê, bide rê û here, heta ko ev çemê hanê ko tu pê mezin bûyî, ko tu strana wê dihûnî, diherike, heta ko çem xwe digihîne çemên din an jî deryayên din, tu jî pê re be û pê re here. Biro, sêwiyo, tu bî, tu ji bîr nekî; bipirse, metirse. Biro, tiralo, de rabe ser piya û here nik hevalên xwe, wan yek bi yek, Migo, Heme, Têlî, Yezdînşêr û yên din bibîne û ji wan re bi dengekî nerm mîna dengê vê dara tûyê bibêje; tecrube bi ceribandinê tên pê û ceribandin ji neceribandinê hertim çêtir e...

Dengê nexşeyên bêzar û bêziman, mîna dengê zelzelê, dengekî têkel e ko ji dûr û kûr tê. Piştî ko min biryara xwe da, dengê war, welat, bajar û deverên nû û kevn, şên û kavil di bîr û heşê min de, gav bi gav, bi cîh bû. Min êdî dizanîbû ka daxwaza dilê min çi bû; min dengê wan cîhên ko kahniya ders û tecrubeyên însanî bûn, diviya.

Çaxa ez ji dara tûyê veqetîm, min xwe da kuçeyên teng ko di taxên kevnare yên bajêr re digihîştin mala Mam Sefo. Danê sibeyeke ronî û zelal bû, lê bajêr, ji mêj ve, dest bi heyata rojane kiribû. Bazar, mazat, dûkan, qahwexane, kolan tijî bûn. Pez, dewar, ker, hêstir, hesp, hiştir li bin guhê hev diketin, dengên têkel li hev diqelibîn û gumegumeke welê bi ser bajêr de ketibû ko we dê bigota roja mahşerê ye.

Li mala Mam Sefo ko bi qasî demeke dirêj bû, min serî nedabûyê, tavilê, ez çûm mitbaxê, warê ko hertim tê de şênî hebûn. Çend qewraş bi tiştine mitbaxê daketibûn. Min ji qewraşeke jar û zirav ko berî yên din pêrgî min hat, Migo pirsî.

Migo ne li malê ye, ewê, rûtirş, gote min, lê Armê û dayika wê li jor in.

Ji demeke û vir ve min Armê jî nedîtibû û heke ez rastiyê bibêjim min bêrî jî li wê, li lîstikên wê ko hê berdewam bûn, li endama wê ya dirêj, jar û lawaz, li memikên wê ko li gora bedena wê gelekî kiçik bûn, kiribû, lê min hingê wext nebû ko ez biçûma jor, nik wê û diya wê.

Migo li kû ye? Min ji qewraş, rûbiken, pirsî, tu pê dizanî?

Wê nizanîbû, lê qewraşa ko li ber tifikê bû û agir vedida, li min vegerand.

Eger ez ne şaş bim, Migo divê li dêrê be.

De bi xatirê we, min got û ji wir lezand. Lê berî ko ez ji derî derkevim, li wan vegeriyam û min domand,

Heyra, ji Armê û diya wê re mebêjin ko ez hatime. Ew ê li ber bikevin ko min ew nedîtine. Ez ê piştî şixulên xwe werim.

Bi lez ez çûm dêrê ko ji qesra Mîr bi qasî sê taxan û ji camiya Nebî Nûh bi qasî çend sed gavan bi dûr bû. Bexçeyekî fireh û dirêj ê dêrê hebû ko hertim bi hêşînahiyeke bedew reng dida û tê de her celeb dar û çîçek hebûn. Dêr, bi her awahî, hostahiya avahiyên ermenan nîşan dida. Hosteyên ermenan ew, kevir bi kevir, xemilandibûn, kevirên reş ên çiyayê Cûdî û kevirên spî yên mermer ko ji aliyên Mûsilê hatibûn anîn, mîna bergehekê, li hev anîbûn û jê avahiyeke yekta anîbûn pê. Deriyên mezin ên dêrê yên bi rengê tarî ko ji darê gwîzan hatibûn çêkirin, hemû bineqş û bixemil bûn. Pencereyên dêrê fireh, banê wê bilind bû. Berê jî, ez çend caran, bi Mam Sefo, Migo an jî bi Armê û diya wê re çûbûm wir, lê di wî danê sibê de, dêra ko di nav tîrêjên tavê de leylan dida, mîna avahiyeke efsanewî dixuya.

Di wî danê sibê de Migo li wir çi dikir? Bi meraq, min hêdîka deriyê mezin vekir û ez ketim hundirê dêrê. Belê, Migo li wir, li milê din ê dêrê, li ber xaça stûr a Nebî Îsa ko stûxwar, li serî taca tijî stirî, xwîn li enî, dest û piyên wî bizmarkirî, melûl, li jêr dinihêrî, tevî bi qasî panzdeh xort û keçên din, li piya rawestabû û distra. Cîhê ko Migo û hevalên wî lê bûn, loş bû, lê tiştê ecêb, ew di nav ronahiyeke zahf geş de bûn. Tîrêjên tavê di pencera jorîn re xwe dirêjî wan kiribû û ew hemû, tevî Nebî Îsa, xistibûn nav xelekeke zêrîn a ronahiyê. Hingê li hemû welatê Cizîra Botanê bi tenê çend avahî hebûn ko pencereyên wan bi cam bûn. Dêr, yek ji wan avahiyan bû. Camên taybetî, ez nizanim ka kîjan, lê ji welatekî Ewrûpayê anîbûn û pencereyên dêrê xemilandibûn. Camê pencereyan tîrêj dibirîn û şewqa wan, hîn xurtir, vediguhezandin hundir. Migo û hevalên wî niha di nav wê topa nûrê de distran. Wan, bi hev re, îlahî ko ermenan jê re digotin şaragan, dixwendin. Lê ev îlahiyên ko niha dihate xwendin, ne mîna îlahiyên gaxantan bûn, ew bêtir bi hedîseke Încîlê dişibiya.

Migo ez nedîtibûm, bi qasî çendekê ez welê li kêleka derî, li ser textekî dêrê rûniştim û min guhê xwe da şaraganê. Dêr, stran, şaragan, koma

musîkê, dengê hedîsan ko çêla însanan dikir... tiştên ko min hertim, li her derî jê hez dikir; gotinên ko hal û hewalên însanan digotin, çêla serpêhatiyên însanî dikirin. Ma li Medresê jî ne welê bû? Li wir jî min ji hendese, ebced û hesaban bêtir ji gotin, rêz û hedîsên ko qala bûyer û serpehatiyên însanî dikirin, hez nedikir? Ma gotinên ko dibûn dengên însanî bêtir bala min nedikêşandin? Musîk, deng û gotinên ko çêla keser û janê, veqetîn û hesretê dikirin, hêvî û baweriyê, ked û xwîdanê salix didan, geh li dêrê, geh li mizgeftê, geh li vir, geh li wir, coşeke ruhanî dida min, wan dengine nû di ruhê min de dianîn pê. Li dêrê, li wî cîhê nîvtarî, bedewiyeke ruhanî bilind dibû. Lê ne zêde bi aheng.

Min dest li Migo kir û çaxa Migo ez dîtim û ji komê veqetiya, bêyî ko ez li hêviya wî bisekinim, ez ji dêrê derketim.

Te xêr e? Tu weha danê sibê hatiyî dêrê? Migo gote min, berî ko ew deriyê dêrê di pişt xwe re bigire.

Strana we baş bû, min bi dengekî gelekî nerm lê vêgerand, dengê we li hev dihat û hemû bi hev re awayekî paqij ê ruhanî dianî pê.

Çawan? Wî, hinekî ecêbmayî û bîhnçikyayî, pirsî û ber bi min hat. Bejna min jê dirêjtir bû, lê herçî gewde bû, gewdê wî heke bi qasî gewdê çinarekê nebûya jî, bi qasî gewdê dareke kal a spîndarên girs ên der û dorên çeme Zapê bû. Wî jî simbêl û rîh berdabû, lê ne mîna bavê xwe, mîna keşeyekî dêrê, ko rîh li ser cênik û gumikan jêdikirin, simbêl û rîh bi hev re li ser çengê dikirin yek û şeklekî mîna çerxekê didanê.

Bêguman yekîtiya dengê tîz û dengê qalind girîng e, min destê xwe bir ser simbêlên xwe û gotê. Ahengeke pêwist divê di navbera dengê keçan û kuran de hebe. Bi qasî ko min dît we hîn bêtir xîret divê da ko ahenga dengan were pê; dengên bilind û nizm, dengê keç û kuran, dengê haletên musîkê û însanan.

Biro, wî dîsan gote min, tu van tiştan ji kû hîn dibî? Kî hînî te dike? Tu mîna keşeyê me yê koma dêrê dipeyivî!

Çu kes... min gotê û ez bêdeng rawestiyam.

Çima tu hatî? Wî, piştî bêdengiyeke bi qasî kêliyekê, ji min pirsî. Tu hatî ko van tiştan bibêjî?

Na, min gotê. Na. Ma em dikarin bi hev re herin mala we, kitabxanê?

Niha?

Belê, niha...

Wî dengê xwe nekir. Em ketin rê û bi hev re çûn malê, bêyî ko em li rê ji hev re tiştekî bibêjin, ew bi meraq, ez jî bi sedan pirs û fikiran. Li malê

tavilê me xwe gîhand qata jor, kitabxanê. Min hilma giran a kitabxanê ko min bêrî lê kiribû, bi nefeseke kûr kêşand hundirê xwe.

Kuro ev bîhn, ya toz û gemarê ye, toza kitaban, Migo got, mîna ko bîhna misk û emberê be, tu mîna reqekî avî serê xwe dirêj dikî, difnên xwe vedikî û nefes digirî.

Ne xem bû, bila ew bipeyiviya. Ronahiyê li kitabxanê jî leylan dida, tîrêjê tavê li hundir diçirûsîn. Her tişt li kitabxanê mîna xwe bû. Lê îcar li ser masê kitab zahf zêde bûn. Piştî ko min awirek avêt teyrê tawis ko li dîwêr bû, min lezand deriyê şaneşîna kitabxanê, ew heta dawî vekir, ji wir jî çûm ber masê, bêyî ko ez li wan binihêrim, min hemû kitab dan hev û ew danîn kuncikekî, ber lingê refeke bilind. Migo bêdeng li min dinihêrî, tevî ko hê wext nehatibû ko min merama xwe jê re bigota, ji bo ko ez tiştekî bibêjim, min di ber re avêt.

Di vê roja xweş de xwezî em niha li war û welatekî din bûna...

Wî awirek ji min veda, lê dengê xwe nekir, bisebir li min, li tevgera min a bilez û bez nihêrî. Ez çûm milê derî û ji çaviyeke mezin a refekê min çend nexşe derxistin û anîn, danîn ser masê. Bi dû re jî ez vegeriyam ser refê ko ez hertim li berê bûm, refê kitabên Keso, Naso, Maro û yên din ko dengê dewr û dewranên kevn digîhandin min. Ji wir jî min bi tenê kitaba Keso ya rêwîtiyê wergirt û ez vegeriyam ber masê.

Migo, ji kerema xwe were, min got û li ser masa dirêj nexşeyên çermîn ko bi penûsên rengîn hatibûn nexşandin, vekirin. Sê nexşe li ber me vebûn. Nexşeyek der heqê welatên ko di Tewratê de behs dibûn, bû. Yeka din, hukimdariya mezin û fireh ko Îskenderê Mezin bi ger, tevger, rêwîtî û vegirtinên xwe ava kiribû, nîşan dida. Ya sisiyan jî li ser rêwîtiya Keso û deh hezar leşkerên yewnanî ko pê re bûn, bû.

Li van binihêre, min gote Migo, çavê min li ser nexşeyan, bêyî ko ez lê binihêrim, li van war û welatan, bajar û mekanan binihêre.

Berê jî min ew dîtine, li wan nihêrtiye, ewî, kurt û kin, got.

Di hersê nexşeyan de jî çemê Dîcle û Firatê, mîna du xêzên esasî yên nexşeyan, herweha wan war û welatan, ji welatên bakûr ber bi welatên başûr, bi fitloke, bi çiv, geh li kêleka hev, geh ji hev dûr, ber bi jêr dibûn û li jêr, berî ko ew bi deryayê re bibin yek, xwe digîhandin hevûdu.

Migo, min bi dengekî zahf nizm got, birayê min ê ezîz, ma em ne kurên çemê Dîcleyê ne?

Herê, wî got.

Ma ev hersê nexşe jî çêla me, tarîx, serpêhatî û qedera me nakin?

Heye ko ew dikin...

Na, ne ko heye ko ew dikin, ez ji te re bi misogerî bibêjim, ew çêla me dikin.

Biro, dev ji dînîtiye berde, Migo, biacizî, li rûyê min nihêrî û gote min, tu çi dixwazî bibêjî? Daxwaza dilê te çi ye? Ez divê vegerim dêrê.

Daxwaza dilê min eve ye, min got û rawestam da ko bala wî, bi temamî, bikêşînim ser dengê xwe yê nermik. Daxwaza dilê min birayê min ê delal, ez, tu, Heme, Yezdînşêr û hevalên din, em hemû bi hev re bikevin rê û bidin pey Dîcleyê û pê re herin, heta war û welatê ko ew tê de xwe digihîne deryayê. Em wan war û welatan bibînin, însan, heywan ax û çiyayên wan binasin, li dengên wan ên xerîb guhdarî bikin, ji avên wan vexwin, nan û xwarinên wan ên ko em nas nakin, bixwin.

Biro, hinekî bizdidayî, mîna ko ew veciniqe, got, min dizanîbû ko tu dîn î, lê ne evçend! Te mêjiyê keran xwariye? An te mêjiyê xwe bi kayê re xwariye? Bibêje, çi bi te hatiye?

Na, birayê min, min sakîn jê re got, êdî wext hatiye ko em bi firê kevin, ders û tecrubeyên nû ko ji tarîxeke kevnare tên, li heyata xwe ya xeşîm zêde bikin...

Tiredîno, tu bawer î ko Bavo dê rê bide? Eger ew rê bide jî ka pere, ka îmkan, em ê çawan herin, kî dê me bibe, bi kû de?

Tu van tiştan hemûyan li hêviya min bihêle, birayê xwe yê man û nemanê, min destê xwe yê çepê avêt ser milê wî û gotê, xwediyê sebrê, melîkê Misrê ye. Hîç xem mexwe, kesê ko bikeve dîlanê, divê xwe bihejîne jî.

Baş e, eger em li wan welatên xerîb riya xwe şaş bikin, winda bin?

Şaşî hertim para me însanan e. Ma em li vir jî riya xwe şaş nakin? Ferz bike ko me li wan deran riya xwe şaş kir, lê ma ne îhtimal e ko em bikaribin ji riyên şaş riyeke nû derxin, ne welê?

Tu mîna însanên baqil napeyivî, dev ji van sewdayan berde, here ser kar û şuxilê ko tu pê dizanî, ez divê herim, ewî got û bêyî ko li min vegere an jî guhdarî bike, bi bazdan, da rê û çû...

Ez, kenek li ser rûyê min, di destên min de nexşe û kitêb, derketim şaneşînê û çûm li ser dîwana ko li milê çepê bû, rûniştim. Min nexşe, yek bi yek, dîsan vekirin. Dido ji wan bi latînî, yek jî bi erebî bû. War, welat, çiya, deşt, av, çem, bajar, gund hemû erdên Mezopotamyayê di nexşeyan de, kite bi kite, dixuyan. Dîcle, Firat, Zap, Xabûr, Diyarbekir, Mêrdîn, Cizîrê, Berwar, Mûsil, Bexda, Bedrî, Lalêş, Nînove, Babîl, Ûr, Sûsa, Şet-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ul Ereb hemû li ber min bûn. Mîna ko dengên têkel ên wan war, welat û bajaran ji nexşeyan bilind bin û li ber guhê min kevin, bi qasî bîskekê min çavê xwe girt û guhê xwe bel kir. Ez kî bûm, ji kû bûm, aîdê çi û kê bûm? Heye ko çu kes û çu kesî, çu war û çu welatî. Lê belê heye ko herkes û herkesî, her war û her welatî.

Di nav wan fikir û gumanan de, min bi tenê, bi tiştekî dizanîbû; ez kî bûma, aîdê kê bûma jî, kes û nas, war û welatê min di nav wan nexşeyan de bû.

Piştî ko min çend cixare kêşandin, li nexşeyan nihêrîn, li dengên ko ji nexşeyan bilind dibû, guhdarî kirin, min nexşe danîn aliyekî, li çemê Dîcleyê nihêrî û kitaba stur a Keso vekir. Min dizanîbû ka rûpel û bergeha ko ez lê digeriyam, li kû bû. Min wê rûpelê heye ko berê jî bi sedan caran vekiribû, vekir. Sûretekî ko seranserê rûpel vegirtibû, dixuya; bi qasî deh leşkerên Keso ko hemû çekdar bûn, bi feryad û fîgan, li ser kelekekê, ji qiraxekî asê yê çemekî har ko pêl dida, ber bi qiraxê din ê çêm diçûn. Bi çi zimanî diqîriyan? Qîreqîra wan çawan bû û ya herî girîng, wan ê bikaribûya xwe bi milê din ê çêm bigîhanda? Ew ê bikaribûna ji pêlên har xelas bûna? Li ber min çemê Dîcleyê, bi qasî kêliyekê dirêj, serê min bi pirsên min ên hertimî yên weha tijî, min li sûret, çem, kelek, û însanên li serê nihêrî.

Dengê kelekên çemê Dîcleyê, mîna dengê defê ye, – ko ji dûr ve xweş tê. Gava însan dengê defê dibihîse, welê bawer dike ko dîlan e, her tişt xweş û rind e. Lê rewş pirî caran ne mîna dengê dûr e. Herçî kelek e, gava meriv lê siwar dibe û wê berdide nav çêm, hingê tavilê her tişt diguhere. Mîna her tiştî, kelek jî qayideyên xwe yên xas hene. Bi serê me de jî welê hat, rêwîtiya me ya çêm û serpêhatiya me û kelekê, ne li gora daxwaza me, lê li gora qayideyên kelekê hate pê.

Piştî ko min daxwaza dilê xwe ji Migo re got, bi qasî çend mehan, heye ko bi qasî salekê, ez her li xewna çûyinê fikirîm û min miraza xwe ji gelek kesên din re jî got. Herwekî Migo, di destpêkê de herkesî henekên xwe bi min kirin an jî gunehê xwe bi min, bi xortê sêwî ko heş ne li sêrî bû, anîn. Tevî ko ew war û welatên nexşeyan gelekî nêzîkî me bûn, însanan ew gelekî dûrî xwe didîtin, mîna ko ew heft qat di binê erdê de bin, an jî heft qat li ser asimanan. Ew war û welat, ji bo însanên ko gundekî nêzîkê Cizîrê jî mîna welatekî dûr dihesibandin, mîna war û welatên xewn, efsane û çîrokan bûn.

Bi dû Migo re, ez bi Hemeyê malwêran re, geh li malê, geh li Medresê, peyivîm. Heme ko jar, zirav û bejndirêj bû, xwe dabû îlmê îslamiyetê û wî dil hebû ko bibûya alimekî jîr. Heşê wî ko hertim bi mesele û dozên gelekî manewî û bilind tijî bû, tiştek ji hal û hewalê min, ji bîr û dîtinên min nedibirî. Heme ko hevalên wî, hema çi bigire, hemû mele û feqeyên rîspi û navsale bûn, hê hingê bi cidîyet û rûtirşiya xwe hatibû nasîn, lê gava wî ez didîtim û hinekî li min guhdarî dikir, kenekî şermoke dihat û li ser wechê wî yê esebî vedinişt. Gotina wi ya yekemîn, hertim eynî bû:

Kuro, dev ji dînitiyê berde, hinekî cidî be, ewî digot û mîna mamosteyên me yên Medresê, gotinên xwe yên esasî, mîna libên tizbiyê, di nav pêla gotinan de, li pey hev, yek bi yek, giran bi giran, rêz dikirin; cidiyet esas e, îlahiyet li ser her tiştî ye, manewiyat girîng e, serfiraziya dînî hedef e...

Heme ko simbêlên zirav li lêva xwe ya zirav a jorê zêde kiribû, tesbiyên not û neh libî di destan de, hertim libasên paqij ên nûşuştî li xwe dikirin û herçiqasî bi qasî hedîsên pêxemberan nebûya jî, hê di wî umrî de, hewl dida ko mîna hedîsan ko tijî ders û şîret bûn, bipeyiviya. Lê dawiya dawîn, piştî xîret û rikeke bêpayan, min Heme ko êdî pê re li ser tir û fisên wî henekî nedibû, îkna kir. Rojekê, li Medresê ko êdî bi temamî war û welatê Heme bû, li malikeke teng ko gava Heme bi îlmên bilind radibû, xwe dispartê, min Heme xewle kir û careke din gotin anî ser rêwîtiyê. Kitabên Îbnî Erebî û Ehmedê Xezalî li ber wî, ruh û heşê wî bi nûra îlahî jixweveçûyî, piştî gotinên wî yên herdayim, wî, bi dengekî nerm ko tê de êdî çilkên hêvî û nermahiyê hebûn, ji min pirsî,

Ez dizanim şixulê te, ne şixulê aqilan e, lê tu bibêje min, eger tu dest bi rêwingiyê bikî, te dil heye ko tu herî Bexdayê jî?

Min pirsa wî bêguman fahm kiribû. Pêşî ez li ser Îbnî Erebî û Xezalî û li ser mezinahiya wan, paşê jî, bi qasî kêliyeke dirêj li ser Bexdayê, Harûn Reşîd, padîşahê ko dînê îslamiyetê derxistibû qata heftan a asimanan, medeniyeta îslamî û Bexda, pêwendiya çîrokên Hezar û Şevekê û Bexdayê, Şehrezada ko hemû çîrokên welatên Mezopotamyayê her şev, li pey hev, bêwest û bêrawest digotin, peyivîm.

Hemeyê bira, min gotê, bifikire ko ev çemê Dîcleyê ko tu niha jî dikarî li dengê wî guhdarî bikî, eynî mîna Cizîrê, di Bexdayê re jî derbas dibe. Bifikire birako, ew şevên Şehrezad û şevên ko Şehrezad qalê dike, şevên Bexdayê ne, şevên ko bi stêrên helesor alem û asimanan dineqişînin; ev kitabên ko niha li ber te ne, ew kitabên ko em dixwînin, hemû bi awayekî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwe digihînin Bexdayê. Herçend hemû riyên Ewrûpayê xwe digihînin Romayê, ewçend hemû riyên Rojhilatê jî xwe digihînin Bexdayê. Bifikire, ez, tu, hevalên din, em hemû bi hev re li Bexdayê...

Piştî xeberdana min a dirêj ko ne kêmî gotareke manzûm a neqişandî ya edebiyata erebî bû, ewî dengê xwe nekir, bi bêdengiyê re ez jî hew peyivîm û min hêdîka Heme, tevî kitabên wî, li hicra ko bi hilmeke giran bîhn li merivan diçikand û bi qendîlekê ronî dibû, terk kir û ez derketim.

Lê tiştê ecêb ev yeka hanê bû; însanê ko herî zêde ez jê ditirsiyam ko bibêje na û rê li ber me bigire, ji bervajiyê, însanê herî maqûl derket. Belê, ez qala Mam Sefo dikim. Migo ez tirsandibûm û min welê bawer dikir ko dema min meselê jê re vekira, ew dê bi misogerî bigota no. Lê welê nebû. Û berî ko ez meselê jê re vekim, ewî gotin anî ser mesela rêwîtiyê. Em bibêjin bi qasî şeş, heft mehan bi dû axaftina min a yekemîn a bi Migo re, rojekê, danê êvarê, li mala Apê Xelef, ez û Apê Xelef ko êdî gelekî kal bûbû, li ber derî, bala me li ser tîrêjên tavê ko li ser ava Dîcleyê rengekî sor û mor dianî pê, li ser kursiyên nizm rûniştibûn û qala serhişkî û guherînên Heme dikir. Keyayekî Mam Sefo hat û bangî min kir ko ez biçûma malê, nik Mam Sefo. Min Apê Xelef ko êdî ne dikarîbû li bilûrê xista, ne behsa berîvanên guhantijî bikira û ne jî gunik bifirkanda, di cîh de hişt û bi bazdan ez çûm mala Mam. Mîna gelek caran, Mam, qelûn di dev de, simbêlbadayî, cil û bergên botî yên rengîn lê, li kitabxanê bû. Lê îcar ew ne bi tenê bû, li nik wî pisporekî din ê Mîr, Apê Oxir ko navê wî yê esasî Oganes Çalktiyan bû û mîna Mam Sefo bi eslê xwe ermen, lê însanekî kal ê rîspî û kinik bû, li piyan, li ber masê rawestabû.

Were, Biro were, Mam gote min.

Min deriyê kitabxanê hêdîka girt û ez gav bi gav çûm nik wan, kêleka masê. Li ser masê kitabine nû yên bi çermê reş û sor cîldkirî ko min hîç nedîtibûn, hebûn.

Tu birakê min Oxir dinasî, ne welê? Mam ko êdî kalîtiyê şopên xwe li ser rû û eniya wî bi cîh dikirin, biken, ji min pirsî.

Herê, min, çavê min li kitaban, gotê.

Kitab... van kitaban mamê te Oxir ji Kostantînopolê anine. Ew nû ji wir tê. Piştî vê gotinê, Mam ko hinekî din qelewtir bûbû û hema çi bigire stûyê wî bi mil re bûbu yek, vegeriya ser Apê Oxir û jê re qala min, jîriya min, hewesa min a kitaban, daxwaza min a dengbêjiyê kir. Lê ji nişka ve, ew dîsan vegeriya ser min û bilez pirsî,

Biro, ka tu nabêjî min, mesela te û çûyinê çi bû?

Ewî ji kû bihîstibû? Min dizanîbû ko Migo, ji ber tirsa xwe, pê re nepeyivîbû. Çu pêwendiya Mam û Heme jî nîn bû. Min hê ji Armê re jî, da ko ew pê neêşe, behsa çûyinê nekiribû.

Gava meriv kar û şixulê mîrekiyekê digerîne, bivê nevê, haya merivan ji gelek tiştan dibe, Biro. Min bihîst ko te dil bi rêwîtiyekê heye, ne welê?

Dengê wî nerm mîna qedîfe bû. Min ji deng derxist ko min dikarîbû her tiştî, tevî ko Apê Oxir li nik me bû, jê re bigota. Dîsan bilez û bez min xwe spart nexşeyan, ew derxistin û anîn li ber wan raxistin û mîna berikên tivingeke şeşxane ya helqedar, min gotin li pey hev, bêyî ko ez nefesek bigirim, reşandin. Geh bi dest û pî, geh bi tevger û nîşan, geh bi nexşe û kitap, geh bi rêz û gotinên kitaban ko ez hîn bûbûm, ez bêrawest her peyivîm, – heta ko Mam bi milê min girt û ez dam sekinandin.

Biro, ewî bi hêdîka got û hinekî rawesta da ko ez li xwe warqilim, niha guhê xwe bide min, Biro tu baş dikî, baş difikirî. Here. Migo jî bi xwe re bibe û here... gotineke me heye, dibêjin, bi xweziya kes ranahêjê baqê keziya. Tevger divê. Herin, reh û rêçên me hemûyan, yên te, yên min, yên Migo, yên ehlê file, yên misilmanan, yên cihuyan hemû li wir in, herin wan war û welatan bibînin, hê ko dereng nebûye... Apê te Oxir ko ji Stenbolê tê, xeberên kirêt ên şer anîne. Dûman dîsan ji beroşa Âlî Osmanê bilind dibe, saraya Siltanê Osmanî dîsan dikele. Welê dixuye ko bayê xerbî yê şer ber bi me tê. Berî ko ba xwe bigihîne me, hûn herin, ez ê aliyê we bikim, herin...

Çend hêstir li ser bîbikên çavê min, mîna wê roja yekemîn ko ez li kitabxanê bûm, dîsan min xwe avêt destên wî.

Texmîna wî rast derket, çend sal bi dû wan gotinan re, bayê xerbî yê şer xwe gîhand deverên me jî... bayên xerbî yên şer... gotineke çiqas di cîh de... çêla me jixwe li ser vê gotinê ye, ez ê werim ser bayên xerbî û şer jî, lê niha gotina min li ser çûyinê, çûyina ber bi bayên şerqî yên tarîxê ye.

Piştî ko Mam Sefo vekirî piştgirî li min kir, şixulê min jî gelekî hêsan bû û fikra çûyinê li bajêr deng da. Herwekî ko seriyên simbil ên genim ko gava dikemilin, li pey hev, yek bi yek dibişkivin, piştî gotinên Mam, hevalên min jî yek bi yek hatin ser daxwaza min. Migo gote erê, Heme ko çu carê, ji bo çu tiştî razîbûna xwe diyar nedikir, gote »hele em binihêrin«, lê gotina wî jî herê bû. Min dil hebû ko Yezdînşêr jî bi me re bihata, lê di wan wextan de, ji bo ders û perwerdeyiya eskerî, tevî çend kurên din ên beg û serekeşîran, ew çûbû mektebeke navdar a osmaniyan. Herçî Têlî, kurê Mîr bû, ewî dixwest bi me re bihata, û ne bi tenê ew,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Necîb û Elî Şamil ko birayên wî bûn û êdî bejn avêtibûn, bi xwe re bianiya. Lê Têlî kurê Mîr bû ji herdu çavan kor bû. Ez kor, ew kor, Heme jixwe korê alemê, Migo korê nefs û bedena xwe... Halê me dê çi bûya? Herwekî ko hatiye gotin, heke kor bide pey kor, ew ê di koncalê de werbe. Tirsa min jî eve bû, ko em hemû di nav pêlên Dîcleyê de werbûna. Li milê din, heke tiştekî bi serê wî û birayên wî ko hê jî zarok bûn, bihata, diviya heta mirinê êdî min pê li axa Cizîra Botanê nekira, da ko min bikaribûya xwe ji hêrs û xezeba Mîr ko gelekî nas bû, rizgar bikira. Ji ber vê yekê min cesaret nekir ko ez kel û coşa Têlî rakim û min jê bi tenê xwest ko ew ji bo me û rêwîtiya me dua bike û ji Yezdanê dilovan niyaz bike ko em bi ser kevin.

Ji bilî wan jî zahf kesên din dixwestin bi me re werin, lê me koma xwe fireh nekir û dawiyê biryar da ko Migo, Xerapêt ko bi eslê xwe ermen û hevalekî min û Migo bû, Heme, Kemaledîn, hevalekî Heme yê esebî û jixwerazî ko kurê şêxulîslamê Mîr Mele Evdilqudis bû û ez, bi hev re biçûna. Pênc kes ko umrê wan di navbera hejdeh û bîst û pêncan de bû. Lê koma me ne bi tenê hewqas bû, sê kesên din jî lê zêde bûn; Apê Yaqûb, kurê wî Bedros û segê wan Gurzo. Herê, hûn dikenin, lê segê wan jî bi qasî insanekî, bi qasî min û hevalên min jîr, bîrbir û baqil bû. Heke Gurzo ko segekî gurix ê yeman ê çiyayên Hekarê, deverên Tiyarî bû, bi me re nebûya, heye ko em bimiriyana. Apê Yaqûb ko keldan bû û dostekî baş ê Mam Sefo bû, kelekvanê herî hoste yê hemû navçê bû. Mam Sefo pê re peyivîbû ko ew rêberiya me bike û em rêwîtiya xwe pê re li dar xin. Kurê wî Bedros ko di umrê me de û li dêreke çiyayê Aşîta û Tixûmayê, li ber destê keşeyên nastûrî şagirtî dikir, xwestibû tevî me were.

Ez dirêj nekim, di keleberbangeke sibeyeke destpêka payizê, di wextekî ko stêr edî diheliyan, gupikên çiyan êdî hişyar dibûn, kerwan haziriyên xwe yên rêwîtiyê dikirin, diz ji keleporên xwe vedigeriyan, keleş û mêrkuj tivingên xwe tijî barût û gule dikirin, mele û keşeyan ji bo nimêj û niyazên sipêdê dest û rûyê xwe dişuştin, lê însanên ko her rojeke nû li umrê xwe zêde dikirin, hê jî di nav xew û xewnan de bûn, yanî di wextekî bêdeng de ko ji bilî dengên tebiyetê çu deng hê nîn bû û bi her awayî li çîrok û serpêhatiyan dihat, li milê jor ê çêm, li ber pozê qiraxên Dîcleyê yên Birca Belek a qesra Mîr, Migo, Heme, Xerabêt, Kemaledîn û ez ko her yek ji me xwedî xewneke xas û li pey hedefeke taybetî bû, tevî sindoq, zexîre û barên xwe, em li keleka Apê Yaqûbê simbêlboq, ko kurê wî Bedros û segê wî Gurzo yê çikî spî û bi qasî însanekî girs jî tê de bûn, si-

war bûn, me ji Mam Sefo, Armê, Apê Xelef, Gulîzerê, Têlî û çend heval, dost, xisim û nasên din ko ji bo birêkirinê hatibûn, xatir xwest, berê xwe da welatên jêr û dest bi rêwîtiya xwe kir.

Dengê Lalişê ko ez li pey bûm, bi hêsanî negihîşte min. Lê berî ko ez gotinê bînim ser Lalişê, ez ê kite bi kite, ji destpêkê, ji we re çêla rêwîtiya me bikim. Me di destpêkê de şaşiyeke mezin kiribû, em, rêwiyên kelekê, mîna erd û asiman, roj û şevê, ji hevûdu cihê bûn. Kel û heyecana min çavê min ê sax jî kor kiribû da ko min tiştê nebûyinê, yanî tiştê ko herî berbiçav bû, nedîta. Zaroktiya min, Migo û Heme bi hev re derbas bûbû, lê em êdî mezin bûn û herçiqas derew bûya jî me xwe zilamên xwedî nav, cîh û rûmet dihesiband. Em her yek bi awayekî perwerde bûbûn û her yekî ji me riyek û armanceke xas dabû ber xwe. Migo û Heme, tevî ko ew li hev hatibûn û bi hev re dipeyivîn, jixwe, piştî pevçûna wan, ji hev ne xweş bûn. Xerapêt hevalê Migo bû. Min ew dinasî, lê Heme û hevalê Heme wî nedinasîn. Herçî Kemaledîn bû, hûn bibêjin, xezebê Xwedê bû; esebî, cira wî nexweş, ji ken û henekê bi dûr, pozbilind. Kemaledîn ko di ser pozê xwe re bi çu kesî qayil nedibû, bi bejna xwe ya dirêj û jar, rûyê xwe yê zirav, mezinê me hemûyan bû û mîna bavê xwe ewî jî dabû ser riya îlim û medresê û dîsan mîna bavê xwe, dixwest li herkesî, li her cîhî, her wext, hukim bike.

Ne bi tenê xûy û cira me ji hevudu cihê bû, herweha xewn û hedefên me jî gelekî cihê bûn. Ji lewre herkesî dil dikir ko rêwîtiya me li gora daxwaz û hedefên wî bihata pê.

Hê di roja yekemîn de, piştî ko em ji bajarê Cizîrê veqetiyan û ketin ber pêlên Dîcleyê, danê êvarê ko em, ji bilî Apê Yaqûb û Bedros, hemû bêxew, westiyayî û bi heyecana rêwîtiyê sersem, peregende, li vir û li wir, li ser kelekê dirêj bûbûn, bi qîrîna Kemaledîn, li rastiya xwe ya kirêt vegerîn. Kemaledîn bi dengê xwe yê circirok ko bi dengê qijikekî dişibiya, dikir qîjeqîj;

De rabe here ji nik min, neynok file, zû ke, here. Gemariyê pîs î heram...

Kemaledîn ko ji wê qîjeqîjê û pê de min navê wî qulipand ser Kamoyê circirok, diqîriya ser Migo ko hinekî ji Kamo bi dûr vezilîbû. Migoyê ziko ko girs û qelew bû û hertim, sal dozdeh meh, hem di berfê hem di tavê de jê bîhna xwîdanê dihat, welê dixuya, cîh li Kamo teng kiribû. Heke me rê lê negirta, Migo ko di xew de bû û bi qîjeqîja Kamo veciniqîbû, ê Kamo bi şelpeyekê gêrî avê bikira.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Çi ewteewtê dikî, segê har! Migo gote Kamo û xwe da hev da ko êrîşekî mîna êrîşên pilingên Ermenistanê ko hîç kesekî nedîtibûn, lê herkesî qal dikir, bibe ser Kamo.

Herçiqas bal û endama Migo mîna pilingan nebûya jî, dengê wî bi dengê pilingan dişibiya, nemaze çaxa çavê wî bi perda hêrsê mîna gula bilûrê diçirûsî, orînî pê diket. Lê Apê Yaqûb ko li milê wan, li kuncê kelekê, bi bêrikeke dirêj rê li ber kelekê rast dikir, tavilê xwe gîhand wan û nehîşt ko Migo şelpeya pilingan di rûyê Kamo de biteqîne. Di esasê xwe de, li wir, li ser ava Dîcleyê dengê piling û dengê qijikan rabûna hev û di ser de Kamoyê jixwerazî noqî ave bûya, hîç xirab nedibû, lê me hê nû dest bi rêwîtiya xwe ya xewnan kiribû. Gava em jî gihîştine nik wan, me ew ji hevûdu, heye ko heta dawiya heyata wan, veqetand û Migo hate nik min, milê dawîn ê kelekê û Heme ko herçiqas mîna berê bi ecêbeke giran nebûya jî, hê jê tir û fis diçûn, lezand milê pêşîn ê kelekê û çû nik Kamo, hevriyê xwe yê manewî.

Piştî vê xirecirê ko mîna barana nîsanê ji nişka ve hatibû û bêyî ko dinya bide ber xwe, dîsan ji nişka ve, winda bûbû, dinya me ya biçûk a keleka li ser çemê Dîcleyê hinekî haş bû. Jixwe roja me ya yekemîn jî rojeke germ û zelal a dawiya nîsanê bû. Kesên ko bi hal û hewalê çemê Dîcle û Firatê û rêwîtiya kelekan dizanîbûn, şîret li me kiribûn û gotibûn ko me diviya berî dawiya meha adarê çu rêwîtî nekira. Heyama çile û zivistanê, heyama herî dijwar a Dîcleyê ye, berf, baran, zîpik û bahoz ava çêm diqulipîne ser ava Derya Reş ko hertim bi xezeb diçelqe. Hingê av welê bilind dibe ko pêlên Dîcleyê xwe digihînin sînga gir û zinarên qiraxên çêm. Li gora şîretên Apê Yaqûb, me ne bi tenê meha adarê, lê hema çi bigire hemû meha nîsanê jî li pey xwe hîşt da ko me bikaribûya di heyameke aram û zelal de, bêyî îhtimalên nexweş û endîşeyên xeteran, bi selametî rêwîtiya xwe li dar bixista.

Gerçî min dizanîbû ko li ser ava Dîcle û Firatê, ji hezaran salan û vir ve, hertim, bi kelekan çûyin û hatineke boş hebû û însan, heywan, mal û zexîre hem ji jorî Mezopotamyayê ber bi jêrî Mezopotamyayê hem jî bervajiyê wê, cîh û war guhestin, lê tevî vê yekê, heta ko ez bi kelekê, li ser ava çêm, ber bi jêrî Dîcleyê nebûm, min nizanîbû ko Dîcle û ava Dîcleyê xwediyê heyateke xas e û rêwîtiya kelekan li ser Dîcleyê, dinyayeke xas e. Hê di roja me ya yekemîn de em pêrgî bi dehan kelekên tijî însan, heywan, telîs û sindoq hatin ku, bi tevgereke geş lê aloz geh ber bi jor geh ber bi jêr diçûn. Heyata li ser ava Dîcleyê şên bû, kelekvanan hevûdû dinasîn,

gava ew pêrgî hevûdu dihatin, hal û xatirên hevûdu dipirsîn, ehlê li ser kelekan silav didan hevûdu, kelekan mal û tişt mîna titûn, berikên tivingê, goştê qelî, sebze, hêjîr û tûyê hişk, gwîz û behîv, savar, penêr, çortan didan hevûdu an jî bi hev re diguherandin.

Apê Yaqûb ko hemû umrê xwe li ser avê bihurandibû, gotibû me ko li milê rojavayê Mezopotamyayê, piştî welatê Torê, Mêrdîn, Nisêbîn û Ras-ul Eynê, eynî mîna Dîcleyê û ehlê li ser çemê Dîcleyê, rêwîtiyeke boş li ser çemê Firatê jî hebû. Ne bi tenê ehlê der û deverên çêm diçûn û dihatin, herweha esker û zabîtên ordiya Osmanî, paşa û miteserifên dewletê, karmend û karbidestên welatên Ewrûpayê, şêx û begên ereban, keşe û serekên ruhanî yên ermen, keldan û nasturiyan, mîr û begên kurdan, hemû li ser kelekan, bi kêfxweşî, li ser ava çîk î şîn, rêwîtî dikirin.

Dîcle û Firat... di nexşeyên Mam Sefo de ko dudo ji wan li nik me bû, ev herdu çemên muqedes hertim bi xetên kûr û neqişandî dixuyan. Herdu çeman jî li jor, li welatê Serhedan dest bi heyata xwe dikirin û ji wir, Dîcle li ser xeta Diyarbekir, Cizîr, Nînova û Mûsil, Nemrûd, Aşûr, Tekrîd, Samara, Bexda û Kut-el Amara, herçî Firat bû, ew jî li ser xeta Gerger, Bîrecûk, El Hama, Raka, Dêrezor, Mecadîn, Ana, Hit, Babîl, Ur û Basrayê ber bi jêr dibûn û herdu çem li Şat-ul Erebê digihîştine hev û bi hev re xwe digîhandin deryayên boş ên bêdawîn. Dîcle û Firatê her celeb welat, her texlîd ax, her şêwe xelk didîtin, di erdên wan re dibihurîn û dawiya dawîn di derya boş de winda dibûn. Çiya û zinarên sar ko hertim gopikên wan bi berf û qeşayê spî dikirin, dar û daristanên şox ko însan nikarîbû tê re derbas bûya, newal û geliyên kûr ko ji bilî heywanên dirende çu kesî nedîtibûn, deşt û beriyên zer ko bi erdên xwe yên biber hertim kahniya heyata însanên Mezopotamyayê bûn, çol û qûmên germ ko ji dinya çiya û zinaran gelekî cihê bûn, hemû bi hev re, perçeyekî heyata çeman danîne pê. Bi dehan, heye ko bi sedan ziman, zarave, gel, ehil, eşîr, civak û mîrekiyên ko qedera çeman danîne pê; ziman û kilamên kevnare yên însaniyetê, dîn û olên herî kevn ên hemû cîhanê, şer û pevçûnên xedar ên tarîxê, ev hemû aîdê tarîxa çeman bûn. Welatê Tewratê, serpêhatiyên Nînova û Babîlê, ger an jî vegera deh hezar eskerên Keso, meşa eskerî ya Skenderê Mekedonî û mirina wî, bajarên ko mîna stêrekê çirûsîbûn û bi dû re hilweşiyabûn, medeniyetên ko dewlemendiyeke nû li tarîxa însaniyetê zêde kiribûn û bi dû re winda bûbûn, ordiyên ko hukim li hemû dinyayê kiribûn û bi dû re têk çûbûn, avahî û eserên bêpayan ên însaniyetê ko bi rengekî hêlesor ronahî reşandibûn ser


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

însaniyetê û bi dû re, bi zelzele û tofanên ko ji Mezopotamyayê hîç kêm nedibûn, bi erdê ve bûbûn yek... Welatê navbera herdu çeman, axa bilindahî û hilweşîn, serketin û şikestin bû.

Heye ko li cîhanê ji hemû çeman zêdetir, pî û milên Dîcle û Firatê hebûn, li cîhine navçê, çeman nêzîkî li hev dikirin, li cîhin jî ji hevûdu bi dûr diketin, li herêmên çiyan çemine din mîna Zap û Xabûrê xwe digîhandin çeman û ava wan gurtir, boştir dikirin, li cîhine deştê, çem mîna deryayekê fireh dibûn, di newal û geliyan de, bi çivên fetloke, diqulipîn ser aveke teng mîna co û kahniyan.

Ma însan û însaniyet jî ne weha bû? Tarîxa însan û însaniyetê jî ne mîna çeman û qedera wan bû?

Li ser kelekê, çavê min li qirax û bergehên doraliyên çêm, hema çi bigire hertim di nav van hîs û fikiran de, geh li pê, li nik Apê Yaqûb, geh rûniştî, geh nivistî, ez hêdî hêdî ber bi kûrahiyên tarîxa welatê navbera herdu çeman dadiketim. Keleka Apê Yaqûb, yek ji kelekên herî metîn û qehîm a hemû Cizîra Botanê û Mûsilê bû; kelek ji darên dirêj û qehîm ên gwîzan hatibû pê û dar bi werîsên qehîm hatibûn girêdan. Hemû doraliyên kelekê, ji binî ve, bi meşkên bizinên deverên çiyayên Tiyar, welatê Hekarê ko bi çermê xwe yê qehîm navdar bûn, rapêçayî bû. Helbet meşk hatibûn werimandin û bi xêra meşkan ko li gora gotina Apê Yaqûb, di nav sîh salan de bi tenê du caran teqiyabûn, kelek li ser avê bi nazenîn diherikî. Lê barê me ko bi dû re bû bela serê me, sivik bû. Gava bar giran bû, kelek hîn çêtir û qehîmtir li ser ave diherikî, lê gava bar sivik bû talûkeyên qulipîn û serûbinbûnê hîn bêtir bûn. Beriya rêwîtiyê, me bi vê yekê nizanîbû, Apê Yaqûb jî welê bawer bû ko em, garaneke însan, ê xwedî barekî giran bûna. Lê barê me bi tenê çend telîs zad û zexîre, çend kîs xwarin û şêrînahî, du sindoqên biçûk ên cil, berg û kitaban bûn. Dinya êdî germ bû û me çu tiştên qalind û giran negirtibûn nik xwe. Bi şevê, piştî ko me çend tîke goştê qelî, tevî nan dixwar, me çûl û kulavên Apê Yaqûb ên kelekê radixistin, cil û kîsên xwe datanîn bin serê xwe, cilekî tenik davête ser xwe û pal dida.

Ji bilî wê qîjeqîja Kemaledînê circirok, sê rojên me yên pêşîn, tevî ko ava me bi cokekê de nediçû, bi aramî û xweşî bihurîn, heke em mêş û pêşiyan nehesibînin. Bi bilindbûna tavê re, germahiyeke giran hemû hawîrdor vedigirt û tîrêjan li ser avê, li ser sînga zinarên reş ko lê çu hêşinahî nîn bûn, û zinarên spî ko ji tahtên mermer hatibûn pê û li herdu milên çêm dixuyan, leylan didan. Ne bayekî hebû ne jî hûnikahiyekê ko

însên dikarîbû xwe bispartayê. Danê êvarê, berî ko ro here ava, dinya hinekî hûnik dibû, ji bakûr bayekî sivik bi hêdîka radibû û pişta avê mist dida, lê hingê jî ordiya pêşiyan dewsa tirêjên tîn digirt û pêşiyên har mîna tîrên siwarên moxolan bi însên ve didan. Ji ber tirsa pêşiyan me ne dikarîbû agir veda ne jî qendîl pêxista. Ne tavê, lê belê pêşiyan zora me, xortên ko av di gunikên wan de werdigeriya, birin û bi êrîş û înada xwe, em ji hal xistin. Piştî roja yekemîn, dest, rû û hemû bedena me, bi vedana pêşiyan, bû mîna seradekê ko ji qulên sor hatibû pê. Bi tenê Apê Yaqûb ko ji mêj ve hînî pêşiyan bûbû û Gurzo ko ji nişka ve xwe noqî avê dikir û piştî kêliyekê dîsan bi hêsanî hildikişiya ser kelekê, teslîmî pêşiyan nebûn.

Piştî sê rojên aram her tişt ji nişka ve guherî, roja sisiyan ko me êdî Cûdî, çiya, dar û tixûbên Cizîra Botanê li pey xwe hîştibû, danê êvarê, ewrên reş asiman vegirtin, bayekî gur derket û êvarê jî tevî birûskên ko dikirin çîrqînî, baraneke boş barî. Apê Yaqûb ko rojên weha zahf dîtibû, bi keft û left, lê bi sikûnet heta hinekî jî kêfxweş, dilopên baran û xwîdanê li ser eniya wî ya fireh û simbêlên wî yên palik, stranek jî li ser lêvên wî, kelek kêşand qiraxê çêm, cîhekî dahlde. Barana boş, mîna hatina xwe, welê jî piştî demekê, ji nişka ve çû. Tevî ko dinya girtîbû û ba hebû, baran sekinîbû. Apê Yaqûb kelek dîsan berda çêm da ko berî berbangê me xwe bigîhanda gundekî ko xismên Apê Yaqûb tê de dijiyan. Tariyeke bêpayan dinya vegirtibû, ne stêr û heyv hebûn ne jî bi qasî misqalekê ronahiyek. Me, nemaze min û Bedros aliyê Apê Yaqûb dikir, li ber destê wî, li gora gotina wî, diçûn û dihatin, tişt didan hev, bi bêrikê geh kelek ji qiraxên çêm bi dûr dixist geh rê li berê rast dikir. Ava çêm gelekî bilind bûbû, ava baranê, ava berf û qeşayên çiyan ko diheliyan, ava kahnî û coyên biharê ko xwe bi çêm digîhandin, hemû bi hev re, rehên çêm leqandibûn û av bilind kiribûn. Herikîna avê, heke ne mîna lehiyekê be jî, xurt bû.

Tiştê ko me hîç hêvî nedikir û çu carê nehesibandibû, ber bi destê sibê qewimî. Derengê şevê, piştî ko Apê Yaqûb ji xeweke bi qasî kêliyeke hişyar bû û hate bêrik wergirt, em hemû, li pey rojeke giran westiyayî, peregende, li ser keleka şil, bi cil û kulavên tenik rapêçayî, ketin xeweke kûr, heta ko em bi dengê Gurzo ji xew hişyar bûn. Çilkên yekemîn ên ronahiya sibê, hema çi bigire nû avêtibûn, keleberbangeke nû hê bi temamî serî ranekiribû, lê tariya şevê qelişîbû. Bi hişyarbûna me ve, em hemû veciniqîn; Dîcle har bûbû, pêlên çêm xwe digîhandin sînga zinarên qi-

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

raxê milê rastê yê çêm ko gelekî bilind bûn, kelek bûbû mîna hêlekanekê û li ser avê diziviri. Tiştê herî xirab, Apê Yaqûb bêrik xistibû û êdî çu bêrik, ço, şiv nîn bûn ko ewî bikaribûya pê kelek ji keviran bi dûr xista. Hingê min hêrs û xezeba Dîcleyê jî dît; Dîcle bûbû cinawirekî ko jê agir diçû, ne gotin, ne xîret, ne hewldan, ne lava, ne jî şer lê tesîr dikir. Xuşexuşa avê û xumexuma pêlan tirs û xofeke nedîtî dianîn pê. Di rabûn û ketina kelekê de, pêşî Migo û Heme ko hê jî xew li ser çavê wan bû, gêrî avê bûn. Bi dû wan re jî, jixwe em hemû; pêleke ecêb xurt kelek mîna mûyekî hilda û paşê li ava çêm xist; ji avê pê ve êdî ne kelek mabû ne jî tiştekî din.

Dengê Nînovayê, dengên ko ji binê axa Nînovayê, bi bayê sivik ê berbangan, dinehwirî, li Mûsilê li ber guhê min ket. Lê herwekî we ji çêla kelekê jî fahm kiriye, min xwe bi hêsanî negîhand Musilê jî. Bi serûbinbûna kelekê re, ew xeyalên min ko me dê bêyî çu qeza û belayê bikaribûya rêwîtiya xwe bidomanda, bêguman, têk çûn. Hingê ez têgihîştim ko hedefên ko însan didin ber xwe, ger yên şexsî, ger yên fikrî, hertim ji xewn û xeyalên însên dûrtir û dijwartir in û riya wan ne rasterast, lê xwar û tijî fetloke ye. Xeyalên însên mîna stêra Gelawêjê ne, ko ji dûr ve, piştî nîvê şevan, di tariya şevê de, rê şanî rêwiyan dike. Çu kes nikare xwe bi Gelawêja ko mîna xeyalan hertim heye, bigihîne, lê ew li wir, ji însên û dinyayê bi dûr, di asimanan de ronî ye, diçirûse û rê nîşan dide.

Belê, keleka Apê Yaqûb mîna pelekî dara tûyê yê payîzê, pêşî noqî avê bû, paşê jî li ser pêlên lehiya ko rabûbû, bi qasî wê dema ko me dikarîbû bidîta, geh li vî milî, geh li wî milî, li kevir û zinarên qiraxên çêm ket û bi dû re ji ber çavan winda bû û çû. Lê ji ber bextê me yê çê, kes ji me nemir; kelek li bihureke teng serûbin bûbû, me hemûyan bi avjêniyê dizanîbû û di ser de kelekvanekî hoste mîna Apê Yaqûb û segê wî yê jîr Gurzo hebû.

Ez divê ji we re behsa Gurzo ko ji heft bavên însanan jî baqiltir bû, bikim. Gerçî Apê Yaqûb ko ji çiyayên Hekaran bû, hê di destpêka rêwîtiya me de, destê wî yê rastê li ser eniya çîk î spî ya Gurzo, kenek li ser rûyê wî yê gulover, bi serbilindî, çêla esaleta Gurzo kiribû û gotibû ko Gurzo ji bavikeke giregir, heta însan dikare bibêje tirtire, ji bavikê navdar ê kulabî yê şemoyî, dihat, min esaleta Gurzo ko gelekî mezin û bi pazû bû û hertim boça xwe, mîna aleke vekişandî, ber bi jor rep dikir, di wê kele-berbanga sibê, di ava har a Dîcleyê de dît. Di destpêkê de heşê min tiştekî

ji Gurzo nedibirî, ew jî, heke ez rastiyê bibêjim, mîna min hinekî tiredîn bû, kesî nizanîbû ka wî dê li kû, çi bikira. Çaxa em hildikişiyan qiraxên çêm û me zarûretên xwe bi cîh danîn, ew nedihat, lê gava em dîsan siwarî kelekê dibûn û bi rê diketin, li ber çavê me, ew diçû û li ser telîsan dimîziya; gava em diketin xew, ew dihat û rûyê me, nemaze rûyê min û Bedros dialast û em ji xew hişyar dikirin. Gava me sifra xwe ya seferiyê ko ji nan, pîvaz, bacanê sor, îsot, penêr, çortan, qelî dihate pê, li ser kelekê radixist, ji nişka ve, ewî xwe davêt avê û em û sifre bi çilkên avê şil dikir. Mîna ko ew bi me re qayişê bikişîne, hertim vajiyê tiştên ko bi dilê me bû, dikir; mesela gava tav digihîşte esran û germahî û rêwîtiyê em gêj dikirin, ew dihat li hember me radiwesta, herdu lingên xwe yên dawîn datanî erdê, şeqên xwe vedikirin û ef bikin, têrmaşê xwe yê sor rep dikir û li me dinihêrî. Me dê çi bikira? Lê tiştê herî xweş, wî dizanîbû ka wî dê li hember kê vê yekê bikira; belê, li hember Hemeyê fistûj û Kemaledînê circirok. Gurzo diçû, li hember wan rûdinişt, şeqên xwe vedikirin, têrmaşê xwe mîna tîrekî ko ji kevanê li ber pekandinê be, ber bi wan dikir û bi hizir, li wan dinihêrî.

Dilê Gurzo ketiye we, min bi ken digote wan û ez ji wan bi dûr diketim da ko ew êrîş neynin ser min.

Heye ko ji ber evîna Gurzo ya Heme û Kemaledîn bû, gava em hemû noqî avê bûn, beriya me hemûyan, Gurzo xwe gîhande Heme û wî kêşand kêleka çêm, paşê jî Kemaledîn. Gava me, ji nişka ve, xwe di nav ava sar a Dîcleyê de dît, em veciniqîbûn, di destpêkê de kesî nikarîbû alîkariya kesekî din bikira. Em, her yekê bi xwe ketibûn. Heke kelek li kevir û zinaran biketa, heye ko çend kes ji me bimirana, lê kelek di nav avê de ser û bin bûbû, em jî noqî avê bûbûn. Tevî vê yekê av gur, pêl bi zexm û doraliyên bihurê tijî kevir bûn.

Berî me hemûyan Gurzo bîr bi rewşê bir û kete pey me. Mîna ko gelek caran diqewimî û gelek kes dimirin, heke em di avê de gêr nebûn û nemirin, tê de keda Gurzo gelek e. Serê Heme li kevirekî ketibû û qelişîbû, milekî Migo şikestibû, sê pêçiyên destê rastê yên Bedros jêbûbûn û destê wî qelişîbû, hêtê Kamo, mîna ko te bi kêrê jêkiribe, jêbûbû û goştê wî yê pelizî dixuya. Parsûyên Xerapêtê ko hertim bêdeng bû, şikestibûn. Herçî ez bûm, ajnûya min a rastê pêrgî kevirekî hatibû û ecêb diêşiya. Bi tenê Apê Yaqûb ko bi hal û hewalê avê dizanîbû bêyî ko tiştekî pê bibe, xelas bûbû.

Lê kelek, telîs, sindoq, cil û berg, kitab û nexşe, xwarin û vexwarinên


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

me hemû di ber avê re çûn û rêwîtiya me ya kelekê ko me dil hebû heta Samarayê bidomanda, li wir, di nav bihurê de, bi dawî hat.

Di qewimandinên weha neçê de, divê însan ne li neçêyiyan, lê li çêyiyên di nav neçêyiyê de hene, bifikire, herwekî ko alîmekî ko navê wî niha nayê bîra min gotiye; dewsa ko em li stiriyên gulê bifikirin û li ber kevin, divê em kêfxweş bin ko gul dikare di nav stiriyan de bibişkove. Em ji mirinê xelas bûbûn, bi alîkariya Apê Yaqûb û Gurzo me hemûyan xwe bi qiraxên milekî çêm gîhandibû û gundê ko Apê Yaqûb qal kiribû û bûbû sebebê lezandina me, nêzîkî me bû. Bi dû çûyina Apê Yaqûb û Gurzo ya gund re, em bibêjin bi qasî danê sibehekê, Apê Yaqûb, Gurzo û gundî, tevî hesp, bergîr, nivîn û darbestan hatin û em hildan birin gund.

Bi qasî sê, çar mehan, heta ko havîna kambax a şewitî jî di ser me re qulipî em li gund man da ko birînên me hinekî bicebirin. Halê Heme ko eniya wî ji aliyê çepê ve qelişîbû û hemû qoqê wî kupiyayî bû, gelekî xirab bû. Bi qasî çend heftan, bêyî ko gotinek ji devê wî derkeve, jixweveçûyî, ew raza, lê paşê ew hêdî hêdî, roj bi roj, bi ser xwe de hat. Rewşa milê Migo û parsûyên Xerapêt jî xirab bû, lê ew, mîna birînên Kamo, dicebirîn. Herçî pêçiyên Bedros bûn, tiştekî ko însên bikira nîn bû, ew jî mîna min diviya hînî derbên felaketan ko di bedena însên de şopên kûr dihîştin, bibûya.

Piştî ko me, her yek ji me li malekê, mehên xwe li gundê ko ji keldan û kurdan hatibû pê, pişta xwe dabû qûntarên çiyê û tê de darên givîj, berû û tûyê hebûn, temam kir, em li hev civiyan; me biryareke nû diviya. Biryara min diyar bû; min ê rêwîtiya xwe bidomanda. Rast e, hedef û xeyalên însên hertim dûrî însên in, lê belê însan divê serdestê wan be, ne ko ew bibin serdest. Heme ko ji min zahf eciz bû û jixwe hê di destpêka rêwîtiyê de poşmam bûbû, mîna min nedifikirî û bi çêr û nifiran dikire pitepit: Aqilê sivik, barê giran e, wî digot, em ketin pê vî tiredînê pêxwas û di van deran de derketin! Herê, ev nezanê bêmesûliyet dikare aşê xwe bê av jî bigerîne, lê ez nizanim ka em bi çi sewdayê ketin pey vî ko nikare serê xwe û qûna xwe ji hev veqetîne?

Heme ko ji mirinê xelas bûbû, keysa xwe li min anîbû û di her fersendî de mîna zîpikê dibarî... Li gund, di destpêka payîzê de ko darên tûyê êdî pelên xwe diweşandin û gopikên çiyan bi mijeke boş reşahiyekê digîhandin asimanan, piştî xirecireke bi qasî çend rojan, her yekî ji me biryara xwe da; Heme, Kamo û Xerapêt ê vegeriyana Cizîrê. Apê Yaqûb,

tevî Gurzo, Bedros, Migo û ez, em ê biçûna Mûsilê. Apê Yaqûb ko bêyî kelekan nedihewiya, dê li Mûsilê kelekekê çêkira û Bedros teslîmî dêra keldaniyan ko gelekî bi nav û deng bû bikira û ez û Migo jî, me dê bida pey hedef û xeyalên xwe yên destpêkê; me xeyal çandibûn û diviya me berhemên xeyalên xwe hilda. Herçî birînên me, êşa ajnoya min û ya milê Migo ko ji wê rojê û pê ve hertim dewam kir, ew jî yek ji berhemên xeyalan bû.

Me Heme, Kamo û Xerapêt, tevî çend siwarên kurd û keldan, li ser hespan, ber bi milê rojava, yanî ber bi Cizîrê bi rê kir, da ko piştî çend salan, li Cizîrê, di nav mij û dûmana agirê şer de, ji nû ve hevûdu bibînin. Me jî, tevî kerwanekî dirêj ko ji deverên Wanê dihat û ber bi Bexdayê diçû, di berbangeke sibeyeke ronî de, berî ko tav û germahî hawîrdor vegire, li ser deveyan, berê xwe da aliyê rojhilatê, Mûsilê. Me îcar riya çêm, kelek û keştiyên biçûk ên Dîcleyê nediviya. Heke însan gur, rûvî û keftarên ko nîvê şevan ji nişka ve derdiketin û êrîşî heywanan dikirin nehesibîne, riya kerwanê ermen ko em pê re bûn, ji riya çêm ko ji nişka ve dikarîbû mîna dizekî rûyekî xwe yê din ê tarî nîşanî însên bida û biqulibiya ser tofanekê, çêtir bû. Di nav rengên payîzê de, dar û ber bi rengekî têkel ê belek neqişandî, ax, erd û rê zuha û giyayên zer bi tîrêjên tavê şewitî, asiman bi ewrên gewher xemilandî, tîrêjên tavê bi germahiyê hertim tijî, co û gol bi aveke zelal biriqî, teyrên koçer ji deverên bakûr û rojava, ref bi ref li firê, teyrên dirende, êlo, baz, doxan, başoke, li dora kerwanê dirêj li asimanan, bi baskên xwe yên xurt, geh li jor, geh li jêr, heyv û stêrên êvar û şevan bi şewqeke bêpayan çirûsî, çemê Dîcleyê bi xuşexuşa xwe hertim li kêleka me, xan bi xan, qonax bi qonax, em çûn Mûsilê.

Di bûyera çêm de ko bû derseke nû ya heyata min û min hêrsa çêm ji nêzîk ve nasî, me her tiştê xwe winda kiribû. Ne kitab û defter ne pere û zêr ne jî zad û zexîre mabûn. Lê tevî vê yekê, heke em serdestên hedef û xeyalên xwe bûn, hingê diviya em di riya xwe de biçûna. Hêlîna teyrê kor Xwedê çêdikir. A me jî bêguman, Xwedê kerîm bû.

Li Mûsilê ko li hemberî Nînovayê, li milê rojhelat ê Dîcleyê mîna şûrekî vekişiyayî, bi keleh, birc, sûr, avahî, xanî, xan, hemam, dêr, mizgeft, hewra, kolan, kuçe, hewş û bexçeyên xwe yên zahf kevn, hatibû pê, em li mêvanxana dêra keldanî ko yek ji avahiyên herî bedew ên Mûsilê bû, bi cîh bûn. Mêvanê Xwedê, qewl û dînê wî çi bûya jî, mêvanê Xwedê bû û hemû derî jê re vekirîbûn... Hin keşeyên rîspî yên dêrê ko gelekî baş bi kurdî dipeyivîn û bi eslê xwe ji deverên Şingal û Hekaran di-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hatin, nasên Apê Yaqûb bûn. Wan bi rêz û rêzdarî em li mêvanxanê ko bi hewşa xwe ji kevirên şehkirî yên reş hatibû pê, eywana xwe ya bikember ko hertim hûnik bû û bi jûrên xwe yên bêhejmar bi qesrekê dişibiya, bi cîh kirin. Me li mêvanxanê dixwar û vedixwar, lê Mam Sefo ko serpêhatiya me bihîstibû, dîsan, gihîşte hawara me û pereyekî baş, bi kelekvanekî xort re, gîhande me. Ne hewce bû ko me çu şixul bikira, ez û Migo ko êdî bûbûn sûtarên bajarê Mûsilê, li bazarên tijî şênî, kolanên teng û fetloke, taxa cihûyan ko navenda zîv û zêrkeriya hemû navçê bû, taxa sefaretxaneyên welatên Ewrûpayê ko taxa herî berbiçav a bajêr bû, avahî û qonaxên paşa û karbidestên dewleta Osmanî ko merkezeke qehîm a hemû welatê şerqê bû, qahwexaneyên qiraxên çêm ko hertim bi dûmana nêrgile, qelûn û cixarê mîna dûgehekê bûn, aşxaneyên gemarî yên tijî moz, mêş û kelmêş, dûkanên bazar û qiraxên çêm ko qonaxa herî girîng a kerwanan bûn, digeriyan û me lotik dida xwe. Danê sibê, piştî xwirîniyê ko pirî caran ji çay, nan, penêr û zeytûnan dihate pê, em dadiketin qiraxên çêm, nik necarên ko kelek û qeyîk çêdikirin û êdî bûbû mekanê Apê Yaqûb û Gurzo. Ji nik necaran Dîcle gelek nazenîn dixuya, pira ko berî me heye bi bîst, sî salan ava bûbû û ji sî û pênc çavên ko mîna kevanekî vekişiyayî hatibû pê, deşta ko li pey pirê û avê, bêyî çu dar û beran, mîna deryayeke zêrîn dixuya, çiyayên serqot û tazî ko meseleyên Tewratê dianîn bîra însên, riyên kerwanan ko di deştê de mîna marekî reş ê çivdayî dixuyan, hemû li wir, bi hev re bergeheke bêpayan dianîn pê. Piştî wê, di kuçe û kolanên teng, di bin siya xanî û avahiyan re ko bi kelpîçên qehîm lêbûbûn, havînan hûnik, zivistanan germ bûn û şêweyê herî kevn ê avahiyên navçê nîşan didan, em dadiketin bajêr û diçûn bazarên ko bi hatina kerwan û gundiyan qulipîbûn ser roja mahşerê. Danê êvaran du tişt li ber dilê me şêrîn bûn; em diçûn û li qahwexaneyên ko di qatên duwemîn ên xaniyên qiraxên çêm de, ji sedan salan û vir ve her hebûn û cîhê tiralên bêkeys û bêkar ên Mûsilê bûn, li ser kursiyên nizm û biçûk rûdiniştin, me nêrgile dixwest. Çaxa nêrgile dihat, me agirê nêrgilê gur dikir, simbêlên xwe yên boke badida û rûyê me geh ber bi çêm ko hema çi bigire hertim bi rengekî leylaqî şewq dida, geh li kolanên jêrî me ko lehiya însanan, hemal, parsek, diz, zabît, esker, beg, şêx, mele, keşe, heham, gundî, bazirgan, karmend, karbidest, di nav cil û bergên gelekî ji hevûdu cihê de, diherikî, guhê me li ser dengên têkel ên zimanên erebî, keldanî, tirkmenî, hebreyî, ermenî, kurdî ko li bin guhê hev diketin, gurz bi gurz nêrgile dikêşand. Hingê me kêfa gurê pîr dikir. Tiştê

din ko me gelekî jê hez dikir, gera beden û bircên keleha Mûsile bû. Keleha Mûsilê ko gelekî bi keleha Cizîrê û ya Diyarbekirê dişibiya, ne bi tenê bi riya çêm, lê herweha bi çend deriyên xwe yên tarîxî mîna deriyê Sîncarê, yê Cizîrê ko deriyên kerwanan bûn, pêwendiyeke xurt bi welatên din re dianî pe. Tevî ko keleh gelekî kevn bû, hê tiştekî muhîm pê nebûbû û însan bi hêsanî dikarîbû, di nêrdewanan re hilkişiya ser beden û bircên wê û ji wir li hemû navçê ko ji hêşinahiyê bêpar bû, lê bi asimana boş û axa gewher û belek ko bi tîrêjên tava ko diçû ava, leylan dida û mîna bergeheke çîrokên kevn dixuya, binihêrta.

Herçî êvar bûn, hingê me dîwana xwe ya bi şox û şahî du deveran li dar dixist; li ser banê mêvanxanê ko mîna şaneşîna qesra Mîr fireh bû û li ser bircên keleha Selçûqiyan ko li bilindahiya girekî ava bûbû û hingê di deste paşayê Osmanî û wîlayeta Mûsilê de, lê milekî wî ji ehlê bajêr re serbest bû. Li ser banê dêrê, ji şaraba yaqudî ko keldanên Mûsilê ji tiriyê yekta yê navçê çêdikirin, pê ve çu vexwarinên din nîn bû, lê li ser bircên keleha Selçûqiyan ko li wî milê serbest bû, her celeb vexwarin hebû. Ji ber vê yekê bû ko birc bêtir li ber dilê me ezîz bû. Me sifra xwe ya ko tijî her celeb xwarin û vexwarin bû, li banê bircê ko mîna meydaneke biçûk bû, radixist, di bin kembera ronî ko ji heyv û stêran hatibû pê, carina ez, Migo û Bedros, tevî Gurzo, bi tenê, carina jî mêvan û şagirtên dêrê jî bi me re, em rûdiniştin û heta derengê şevê, carina jî heta ko tîrêjên yekemîn ên tavê hildihatin, ava çem, bi lêdana ronahiyê, mîna mehfûreke hevrêşim î diçirûsî û kelekvanan kelekên xwe berdidan çêm, me dixwar, vedixwar û bi zimanên xwe yên kurdî, ermenî û keldanî stran digotin.

Di şeveke ronî û sakîn a wan şevan de, çaxa stêr êdî diheliyan û wext gihîştibû huzmeyên pêşîn ên ronahiya sibeheke nû, cara yekemîn min navê Stêrê ko bi dû re bû evîndara min a heyatê, bihîst. Ez, Migo, Bedros û Gurzo bi tenê bûn, mêvanên me yên şevê westiyabûn û çûbûn, lê em mabûn û me bi seriyekî xweş û bi dilekî coş, rûyê me ber bi milê Nînovayê, destanên kevnare ko xewa me direvandin û wextên bihurî, bi deng û olanên têkel, bi me digîhandin, digotin. Yek ji sebebên ko em hertim diçûn bircên kelehê jixwe ev bû; keleh li ser girekî ava bûbû û ji wir milê din ê çem, yanî axa Nînovayê, eynî mîna asimên, heta û heta dixuya. Nînova ko hema çi bigire heftê du, sê caran em diçûnê û li gundekî Nînovayê, bi navê Nebî Yûnis ko hê jî şên bû, dew vedixwar, êvaran jî mîna bergeheke bêdeng li ber me raxistî bû. Bedros bi zimanê keldanî ko


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

şêweyekî zimanê aramî yê Îsa pêxember û kitaba Încîle bû, destaneke kevn ko gelekî bi hedîseke dînî dişibiya, lê tê de navê Gilgameş, Enkîdû, Urix derbas dibû, jixweveçûyî, çavgirtî, serxweş digot. Heye ko ew şev, şeva herî xweş a Bedros bû, ji lewre ew li welatê hezar salan ê bav û kalên xwe, li kahniya dewlemendî û medeniyeta kevntirîn a keldanan û herweha a însaniyetê bû. Ma Nînova, ne welatê wan ê destpêkê, bajarê wan ê tarîxî bû? Ma ew gotinên ko Bedros hingê geh bi awayekî zîz û giran, geh bi navber û bîhnvedaneke dirêj digot û deng û pejnên tevgera wextê mîna tevgera pêlên çêm, digîhande sifra me ya feqîr û ruhê me yê xort û har haş dikir, ne gotinên tarîxeke kevnare bûn?

Ji bilî hin nav û gotinan, min ji strana Bedros tiştekî fahm nedikir, lê dengê zîz ê Bedros û şêweyê gotina wî alîkariya min dikir ko ez bikaribim gotinên wî li bêjinga dil û ruhê xwe xim û jê stranek ko aîde min bû, min jê fahm dikir derxim. Heye ko strana Bedros çêla çemê Dîcleyê û keç û jinên ko li deverên sakîn ên çêm xwe dişuştin, dikir; heye ko dengbêjekî li bilûr an jî saza xwe dixist û çêla welatekî bextreş ko hertim di nav xwînê de bû û qedera wî windabûn bû, dikir, an jî stran ê qala însanên sil, sûzen û bîhnteng ko şikestên xedar xwaribûn û nikarîbûn riyeke rast bibînin û bidin ber xwe, dikir.

Piştî ko Bedros destana xwe ya dirêj mîna stran got, ew sekinî. Di nav wan çilkên yekemîn ên tîrêjên tavê de, tevî ko min gelekî vexwaribû û xew li ser çavê min bû, çavê min bi çend rondikên ko li ser rûyê Bedros mîna libên lûlûyan dibiriqîn, ket.

Birako, min gotê, ma gotinên strana te ewçend zîz bû?

No, wî got, heye ko ew ne ewçend zîz bin, lê her cara ko ez wê dibêjim, ez xerîbiya dayik û xwehên xwe ko hertim vê stranê ji min çêtir dibêjin, dikim.

Dê û xwehên te? Migo, ji bo ko tiştekî bibêje û perda bêdengiyê yekcar biqelişîne, got.

Herê, Bedros, serê wî li ber wî, got. Ew li gund, li deverên Aşîta û Tiyariyê ne. Dayika min Tirma û xwehên min Sarah û Ester... Me bi hev re ev stran digot û nemaze dengê xweha me ya biçûk Esterê di nav wan çiya û geliyan de perde bi perde bilind dibû û mîna qedîfê li ruhê mirov hukim dikir.

Ester, dengê Esterê, ez bi dengekî bilind fikirîm û bi dû re min li Bedros vegerand, dengê wê çawan e, ew çawan dibêje, çi dibêje, ji kengî ve?

Min ê pirs hîn direjtir bikirana, lê bi pîrqîna Bedros û Migo ez li xwe

warqilîm û min dengê xwe birî, lê navê Esterê ko bi dû re bû Stêr û meraqa dengê wê hingê li dilê min hate kolan. Ma tovên evîneke abadîn bi meraqeke kûr nayên avetin?

Sibeyeke nû dest pê dikir, diviya em rabûna. Migo û Bedros xwe dan hev, de rabe Biro, Migo gote min, em herin.

No, min gote wan, hûn herin, ez ê hinekî din jî rûnim. Dev ji sifrê jî berdin, ez ê rakim.

Piştî ko ew tevî Gurzo çûn, min rûyê xwe dîsan ber bi Nînovayê ko di bin axa reş de veşartîbû, kir û bi dîqet li girên Nînovayê nihêrt. Di bin wan giran de çi veşartîbû? Ew çîrokên ko Tewrat û kitabên din ên olî digotin, rast bûn an bi tenê çîrok bûn? Ew şêrên yekta ko qalê dibûn û hema çi bigire remza hemû Mezopotamyayê bûn, bi tenê ji bo hişyarkirina meraqa însanan bûn an jî bi rastî ew di wextê xwe de hebûn? Kê, çawan Ninova ava kiribû, çawan ew hilweşiyabû û bi erdê ve bûbû yek? Şer, zelzele, tofan, nexweşî, xela?

Nînova... ew avahiyên yekta yên hemû cîhanê, keleh, beden û bircên ko digihîştin asimanan, şaneşînên ko li ser ava Dîcleyê mîna bexçeyên cenetê bûn, qesr û qonaxên neqişandî yên qralên mezin, kolanên fireh ko bi kemberan digihîştin hevûdu, reqaseyên ko di meclîsên zêrhêlî yên bêser û ber de mîna şahmaranan xwe li ba dikirin... Nînova... ko êdî qulipîbû ser axake qirac ê bêber, ko êdî bûbû welatê mar, marîjok, gumgumok û başokeyan...

Stêr çûn ava, tîrêj li pey bilindahiyên piştî Mûsilê hildihatin, ji bilî dengê quling û teyrên koçber, dîkên sibê û kelekvanên Dîcleyê, hê çu deng nîn bûn. Lê li milê din ê çêm, ji Nînovayê deng dihatin. Yên kê, çawan? Ez nizanim, bayekî sivik hedîka xufexuf, av mîna dengê kahniyekê hêdîka xuşexuş dikir û ji girên Nînovayê, ji kevir û zinarên kilsî dengên têkel dihatin; orîna şêran, çerqîna şûran, hîrîna hespan, reprepa lingan, vizîna tîr û mirtalan, gumîna defan, hûfehûfa gulokên agiran, qîrîna şervanan, qîjîna zarokan, axîna pîrejinan, gotinên dengbêjan... Bi lêdana tîrêjan, dengên Ninovayê jî bi ser min de hatin, guhên min bel, jixweçûyî, dest û milên min vekirî, çavê min girtî, min pejnên ko mîna pêlên Dîcleyê, bêrawest, di pey hev re, ji dewr û dewranên nenas dihatin, kite bi kite, hembêz kirin.

Hingê tîrêj di ruhê min de jî vedan, hingê hemû dinya bû ya min...

Dengê feqîr û qewlên êzidiyan, min dizanîbû, mîna dengên Nînovayê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û ji Nînovayê ne ewçend bi dûr, di newal û geliyên teng ên çiyayên Şengalê de, bêyî çu bendên dewr û dewranan, her û her diherikî. Min diviya xwe bi wî dengê ko yek ji hedefên min ên esasî yên rêwîtiyê bû, bigîhanda.

Êzidiyên deverên Bedir, Şengal û Lalişê, bi cil û bergên xwe yên taybetî yên spî, porê xwe yê gelekî dirêj, rîh û simbêlên xwe yên şehkirî, ji bo kirîn û firotinê, nemaze ji bo firotina heyinên çiyayê Şengalê, mîna gwîz, behîf, mewîj, tû û hêjîrên hişk, carina dihatin bazarên Mûsilê. Tevî ko ew ehlê navçê bûn û bi kurmanciyeke zelal û xweşik dipeyivîn, mîna însanên xerîb, li ser rûyê wan hertim şopên şik, sûzenî û tirsekê diyar bû. Ew bi tevgera xwe bitevdîr, bi nêrîna xwe nerm, bi gotinên xwe nefsbiçûk bûn. Lê belê tevî vê yekê xelkê bajêr, nemaze zarok û xortên ehlê misilman, mîna ko êzidî ji dinyayeke din û mehlûqatên neçê bin, heqaret li wan dikirin. Zarok diketin pey wan û diqîriyan;

Kurên şeytên hatin, kurên şeytên...

Rojek ji wan rojên me yên tiral ên Mûsilê ko êdî payîz ber bi çileyan diçû, lê hê jî dinya germ bû, danê sibê, piştî ko min û Migo ji Apê Yaqûb ko li nik necarekî qiraxên çêm, kêleka keleka xwe ya nû ko necar jê re, bi hostahiyeke mezin çêkiribû, sekinîbû, xatir xwest û berê xwe da taxa cihûyan. Li rê, berî ko em bigihên taxê, em rastî êzidiyekî bûn. Bi qasî deh zarokan dor li êzidiyê reben girtibûn û bi qîreqîr heqaret lê dikirin. Êzidî ko navsale bû, telîsek li piştê, li dora xwe diziviri û xwîdan li enî, rondik li ser çavan, bi lava, bi tenê digot,

Zarokno mekin, bihêlin ez di riya xwe de herim...

Bi leza birûskê em ketin nav zarokan, bi çend şeqamên ko diviya di rûyê Heme û Kamo de jî biteqiya, me zarok jê bi dûr xistin. Êzidiyê ko gelekî jar û kinik bû, ji kerban, bêdeng digiriya û diheziya. Min barê wî hilda û me ew jî bi xwe re bir qahwexanê. Navê wî Husên bû û ji deverên çiyayê Şengalê, gundê Sifnê bû, ji bo firotina hêjîrên hişk daketibû Mûsilê. Piştî ko ew hinekî sakîn bû, çaya xwe vexwar, cixara pêçayî ko min dabûyê, kêşand, bi rêzdarî, li me nihêrî û gote:

Yezdanê dilovan ji we razî be, de ez herim sûkê û hêjîrên xwe bifroşim. Ez ê hevalên xwe li xana nik deriyê Sîncarê bibînim, berî ko ew herin, divê ez şixulê xwe bi ser xim.

Kekê Husên, Migo ko mîna her carê bîrbir û diltenik bû, gotê, ma tu ji bo hêjîrên xwe çi dixwazî?

Bi çend pere jî ji daxwaza Husênê Sifnê zêdetir, Migo hêjîr kirîn da ko

wan yadîgarî dêra keldaniyan ko em lê mêvan bûn, bike. Bi dû bazara me û Hûsên re, bîhna wî derket û çayeke din vexwar. Di wê navberê de, bêguman, min di derheqê wî, malbata wî, çiyayê Şengalê, Laliş, şêx û pîrên êzidiyan, gelek tişt jê pirsîn. Ewî dil nîn bû ko bi dirêjî bersîva pirsên min bida, lê tevî vê, tiştine tevîhev û peregende bi kurtebirî gotin. Çaxa wî çaya xwe xelas kir, qedeh danî ser masa gemarî ya biçûk ko lê vizeviza mêşan bû, çavê wî li qedehê, bi dengekî nerm û nizm gote me: Eger rojî û cejn nêzîk nebûna, ez ê tu carî daneketima vî bajarê kambax ko hertim dijminahiya me dike. Lê rojî û eyd li ber derî ne, zar û zêçan zad û zexîre, cil û xirad divên.

Rojî kengî ye? Min tavilê jê pirsî.

Piştî hefteyekê ye.

Cejn kengî ye, çi cejn e?

Di pey rojên rojiyê re ye, cejna şêşims, ewî, bi meraq li min nihêrî û got, paşê jî ew rabû ser piyan, pereyên xwe xiste bêrîka hundirîn a şepikê xwe, ji me xatir xwest, da rê û çû.

Gotinên Husên daxwaza min a bingehîn dîsan bi bîra min anî; min diviya xwe bi reh û rêçên xwe, bi remz û sirên teyrê tawis bigîhanda. Ji vê çêtir hêncet nîn bû; roja cejna êzidiyan, diviya ez li Lalişê, dilê qewlên êzidiyan ko ji zaroktiyê û vir ve, min, geh bi dizî û veşartî, geh bi alîkariya gotin û remzan, hertim dibihîst û hîs dikir.

Piştî şeş rojan, beriya roja yekemîn a rojiya şêşimsê, derengê danê sibê ko tucar, bazirgan û gundiyan êdî şixulên xwe yên sipêdê biribûn sêrî, tevî du êzidiyên xort ên çiyayê Şengalê ko bejna wan ji ya min jî dirêjtir bû û şixulê xwe li bajêr kuta kiribûn û vedigeriyan gundê xwe, li ser hespên rewan ên belek, me berê xwe da milê bakûr ê Mûsilê û di kêleka Dîcleyê re, em ber bi war û welatê êzidiyan bi rê ketin. Ji coşa min re payan nîn bû, roja ko min hema çi bigire hertim xeyal kiribû, di dawiya dawîn de hatibû. Bicîhbûna xeyalan mîna ava goleke ko di qijeqija havînê de bi kelê dikeve ye, heta av bi tîna tava germ negihîje dereceyekê, ew bi kelê nakeve. Lê gava ew hate dereca xwe, kel jê radibe. Wê rojê, ber bi nîvroyan, xeyalên min bi kelê ketibûn û kela xeyalan jî kela ruhê min rakiribû. Li ser hespekî bedew ê çiyayên Şengalê, boxçika min a cil û bergan li pişta hesp, geh bi meşeke nerm, geh bi rewan, şal û şapikên paqij ên Şengalê li min, di bêrîka min de hinekî pere, titûna zer û heste, lingên min li zengûyan, hevsar di destê min de, bala min li ser bilindahiyên Şengalê ko gav bi gav girstir dibûn, hûnikahiya bayekî sivik ê bakûr li ser

rûyê min, tîna sivik a tava payîzê li ser eniya min, kêfxweş, mesûd, min bi hevriyên xwe, xortên êzidî ko navê wan Xidir û Hadî bû, sohbet dikir û zahf tiştên ko min meraq dikirin, ji wan dipirsî.

Tevî ko Migo jî dil dikir bi min re bihata Lalişê, min xwest, ez bi tena serê xwe bûma da ko min hemû kitekitên reh û rêçên umrê xwe, hemû pirsên dil û ruhê xwe, bi her şêweyî, bikaribûya bidîta, hîs bikira, li serê bifikiriyama û heye ko dawiya dawîn bigihîştima netîceyekê. Dawiyê, piştî xirecireke du rojan, min Migo ko gelekî eciz bûbû û êdî dil dikir vegeriya Cizîrê, îkna kir ko ew li Mûsilê, li nik nasên Mam Sefo ko ermen bûn û hal û wextê wan gelekî xweş bû, bi cîh be û li hêviya min bimîne. Piştî vegera min, me dê bida ser riya çêm û em ê daketina Bexdayê.

Mîna her êzidiyekî, dengê xortan jî baş bû û çaxa pirsên min hinekî kêmtir dibûn, li ser tikaya min, li rê, wan stran û qewlên êzidiyên Şengalê ji min re digotin. Di wê rêwîtiyê de ez hîn bûm ko qewlekî êzidiyan ê rojî û cejna şêşimşê jî hebû. Herdu xortan bi hev re, li ser hespên ko li pey hev, bi gavên nerm, di nav dar û dahlan re diçûn, bi awazekî nerm, qewlê şêşimsê ko methiyeke dirêj a Yezdanê mezin bû, digotin;

Ya Şêşims tu rehîm î<br>
Tu xaliqekî min î ji qedîm î<br>
Ya Şêşims ji hemû derdan re tu hekîm î...

Pêşî em çûn gundê xortan ko li sînga çiyê, di dahldeyekê de, mîna hêlîneke qertelan vedayî bû û xaniyên gund hema çi bigire li ser hev siwar bûbûn, me firavîna xwe ya dereng ko ji tîkegoşt, savar û mehîrê hatibû pê, li ser banê xaniyekî ko jê hemû deşta zer mîna siniyeke zêrhêlî dixuya, xwar. Xort zewicîbûn û Xidir ko gelekî xort bû, ji niha ve, gihîştibû zaroka xwe ya sisiyan. Bi dû xwarinê û çayvexwarinê re, îcar hema çi bigire hemû gund bi me re, tevî zarok, kal û pîran, li ser pişta ker, bergîr û hespan, me berê xwe da geliyên ko di kûrahiyên çiyan de bûn û em dîsan bi rê ketin. Rûyê me ber bi geliyê Lalişê, warê miqedes ê hemû rojî û cejnan bû. Em ji deşta xopan a bi tîna tavê şewitî, toz û gemara erdê qiraç bi dûr ketibûn û hilkişiyabûn bilindahiyên çiyan û bihust bi bihust ketibûn nav dar, ber û hêşinahiyeke boş ko li gora gotinan warê hirç û pilingên yekta bû. Ji bilî jûjî, simore, kêwroşk û pezkoviyan, li rê em rastî gelek însan û komên din ên êzidiyan ko riya wan jî ber bi Lalişê bû, hatin. Herkes, hemû êzidî, bi sedan heye ko bi hezaran, ji deverên Cizîra Botan, Wan û

Serhedan, Xerzan, welatê Qafqasê, beriya Mêrdînê, deşta Wêranşar û Serêkahniyê, siwar an peya, têr an birçî, zarok an pîr, zînde yan nexweş, tevî gotin, qewl û stranan, di ser newalên kûr, tahtên tûj û av û coyên şên re, mîna lehiyeke ber bi geliyê Lalişê diherikîn. Rojî û cejna êzidiyan li dar bû û wan ê di dilê dînê êzidiyan de cejna xwe pîroz bikira. Hema çi bigire hemûyan qewlê ko xortan ji bo min gotibû, digotin û ber bi kûrahiyên çiyê diçûn;

Ji derencê heta derincê,
Şêşims e xwidanê ferecê
Dest û damanê Şêşims radimîsim dewsa kabe, ciyê hecê...

Laliş ko ji çend avahiyên kevnare hatibû pê, di binê geliyekî kûr de, li kêleka gewriyekî, bi ser zinêr de paldayî bû. Şêx Adî ko şêxê herî mezin ê êzidiyan bû û li gora gotinên şêx û pîrên êzidiyan, berî niha bi qasî hezar, hezar û du sed salan li Lalişê jiyabû, tevî çend şêx û pîrên din ên navdar, li wir veşartîbû. Mîna niha tê bîra min, çaxa em daketin binê gelî û Laliş ko însên dikarîbû di nav hemû zinar û tahtên doralî de bi tenê bi riyekê xwe bigîhandayê, li me diyar bû, dilê min mîna çûkekî ko dixwest ji qefesa xwe bifire, welê bi xurtî hilavêt. Ji her çar aliyên çiyê însan, di nav cil û bergên xwe yên spî de, bi gotina qewlê şêşimsê, qor bi qor, rêz bi rêz, li pey hev, ber bi avahiyan diçûn. Heta ko çav didît, her der însan bû, doraliyên avahiyan, kêleka kahniyên ko diherikîn, binê dar û berên ko hawîrdor vegirtibûn, pal û quntarên çiyê, her der tijî bû. Herkesî li derekê, kom bi kom, konê xwe vedabû, çûl an jî kulavê xwe raxistibû û li ser axa Xwedê, mîna min, Biroyê sêwî, bûbû mêvanê Lalişê ko li gora qewlan gur û mîh bi hev re tê de diçêriyan.

Xidir, Hadî, zarok û gundiyên wan li qûntarên zinarekî asê cîhekî fireh peyda kirin û li wir bi cîh bûn. Çu kesê min, an nasên min li wir nîn bûn, ji lewre ez jî tevî wan, bi civata wan, li ser kulavekî qehweyî, boxçika biçûk bahlîfa min, cilekî tenik lehîfa min, li kêleka coyeke biçûk ko ji kûrahiyên çiya diza, di bin siya dareke kal a tûyê ko êdî pelên xwe yên dawîn jî diweşand, bi cîh bûm. Ez, Biroyê sêwî, Biroyê kor, li wir, li nik wan bûm Biroyê êzidî. Ez hertim bi Xidir û Hadî re bûm, lê gundiyekî wan ko li Lalişê, li nik şêx û pîrên giregirên êzidiyan dima û qewal bû, li wir bû hevalê min ê mehên min ên Lalişê. Navê qewalê awazxweş Zerdeşt bû û umrê wî êdî mîna dara tûyê ko bi rehmet û siya xwe ez di-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hebandim, gihîştibû payîza xwe. Kekê Zerdeşt ko hertim digot, Lalişa xweş, warê ewliya û embiya ne, bi zimanê xwe yê şêrîn, bi cil û bergên xwe yên paqij ên spî, bi por û rîha xwe ya dirêj ko êdî bi temamî spî dikirin, bi mêvanperweriya xwe ya bêpayan, xwasî, lê hertim paqij û şuştî, qewlek, rêzek an gotineke bav û kalan hertim li ser lêvan, bi sebreke mezin, bû alîgirê min û pirsên min ên bêdawîn.

Belê, dawî li pirsên min nedihat; êzidî kî bûn, ji kû dihatin, dîne wan çi bû? Ew sir û sihêrên ko li dora wan û dînê wan bûn, çi bûn? Çima hîletê ehlên doralî ewçend ji êzidiyan diçû û dixwestin wan biqelînin? Çima ew hertim ji însanên din direviyan û war û welatê wan bi tenê zinar û çiyayên asê, newal û geliyên teng û kûr bû? Û herweha hîn bi dehan, sedan siwalên welê... Hingê ez li ser rê bûm, riya fetloke, zehmet, asê û bi mij û dûman ko ez dikirim ez, Biroyê dengbêj. Ez gelek tişt hîn bûbûm, min li Medresê gelek kitab xwendibûn, li civat û meclîsan li gelek alîm, seyda û dengbêjan guhdarî kiribû, li kitabxana Mam Sefo, ji sûretên bêzar ên bêhejmar ên kitaban dengine zînde ko ruhê min terbiye dikirin, afirandibûn û hertim min guh dabû dengan, lê belê ew hemû tiştên ko min mîna kesekî birçî ko ji xelayê derketibe, bi lez û bez daqultandibûn, nekemilîbûn. Min kemilandin diviya, lê çawan? Pirsên min ên Lalişê û bersîvên Kekê Zerdeşt, ez bawer im, alîkarî kirin ko ez li ser riya xwe qonaxeke nû herim û bêtir guh bidim dengan, hîs û serpêhatiyan.

Tiştê yekemîn ko ez ji Kekê Zerdeşt, Xidir, Hadî û êzidiyên din hîn bûm, ev yeka hanê bû; tarîx û serpêhatiyên êzidiyan, hertim bi xwîn, jan, keser, tirs û neçariyê ve tijî bû. Hertim ew ji war û gundên xwe reviyabûn, hertim wan xwe spartibû warên asê da ko xwe ji şûr xelas bikin. Geh ordiyên osmaniyan ko bi xwînrijiya xwe nas in, bi serekiya paşayên ko Nemrûdên roja me ne, geh eşîrên doralî yên misilman ên kurd û ereban ko dijminên sondxwarî yên êzidiyan in, hertim êrîşên xedar biribûn ser êzidiyan û ew qir kiribûn. Ne carek du caran, ne salek du salan, ne heyamek du heyaman, lê hertim, di berf û baranê, di germ û tavê de, hem di wext û heyamên şer û pevçûnê, hem di yên aştî û sikûnetê de. Li wir, di wan rojên pîroz ên Lalişê de, rastiyeke kirêt, mîna tîreke jahrîn, dil û ruhê min sot; serpêhatiya hemû êzidiyan mîna hev bû, hemû jî, bi awayekî, ya rastirîn bi mûcizeyekê, ji şûr xelas bûbûn. Bav û kalên Xidir û Hadî li kêleka çemê Dîcleyê hatibûn kuştin û xwîna wan tevî ava Dîcleyê bûbû. Kekê Zerdeşt ko ji min dirêjtir, lê jartir bû, mîna min sêwî mabû, bav, de, bira û xwehên wî hemû hatibûn kuştin.

Yanî ew hemû mîna min bûn.

An jî ez weha bibêjim; ew hemû Biro bûn, an bervajiyê wê, Biro, ew hemû bûn.

Qewl, stran û gotinên êzidiyan, ên yêtîm û sêwiyan bûn.

Tiştê duwemîn ko ez li wir hîn bûm, qîmet û hêza gotinê bû, ji ber ko gotin, qewl, stran, lavij, çîrok ji bo êzidiyan mîna melhemê bûn. Wekî ko ew pê birînên xwe bicebirînin, wan di keleberbanga sibê de, berê xwe ber bi tîrêjên yekemîn ên tava roja nû dikirin û dua dixwendin, danê sibê li ber deriyê gora Şêx Adî rêz dibûn, destê pîr, şêx û feqîrên xwe radimusîn û qewl digotin, danê êvarê, berî ko tav li milê rojava, li pey çiyê here ava, li dora Kahniya Spî ko kahniyeke miqedes bû û jê ava şîfadar a zemzemê diherikî û kahniyên din ên Lalişê diciviyan, tevî dengê bilûr, erbane, def û tembûran, li şêx û qewalên xwe guhdarî dikirin, çaxa ro diçû ava, wan dîsan berê xwe ber bi royê dikir û miraza dilê xwe mîna qewl û rêz digotin û êvaran jî, piştî şîvê, dîsan tevî bilûr û erbanan, li meydanên biçûk ên Lalişê, di bin ronahiya heyverona ko mîna gulokeke êgir diçirûsî, dest didan hev, zincîrên dirêj û gulover danîn pê û bi ahengeke têkûz, tevgereke geş, lebateke bi şox û şeng, geh bi lez, geh giran, lê bêyî ko di zîncîra govendkêşan de şaşiyek an çewtiyek hebe, tevgera her govendkêşî li gora ahenga civata govendê, heta derengê êvarê, bi ruh û xwîdan, jixweveçûyî, govend digirtin.

Ez têgihîştim; gotin, qewl, bilûr, erbane, tembûr ji bo însanê êzidî heyat bû, di şîn û tahziyan, dawet û dîlanan, rojî û cejnan, sefer û koçan de, wan her û her digotin û derbên xedar ên heyata wan ko bi tenê ji jan û kesereke kûr hatibû pê, bi alîkariya deng, gotin û awazê kêmtir dikirin. Qewlê dînî û bilûr û strana kurmancî hêzeke manewî dida êzidiyên ko hertim diperçiqîn û qir dibûn, da ko ew bikaribin, tevî hemû bela û mûsîbetan bijîn û gotina xwe bi nifşên nû bigihînin. Bilûr û erbana sade, li heyata wan a sade û li gotina wan a sade dihat. Çu kesî ji wan nexwendibû, li bajarên mezin mîna Stenbol, Heleb, Şam, Bexda, Tebrîz, Tehranê şêwe û celebên gotin û stranê nedîtibûn, lê tevî vê yekê her yek ji wan hosteyekî yekta yê gotin, stran û govendê bû. Mîna heyat û serpêhatiyên xwe, wan qewl, gotin û stranên xwe jî hertim dubare kiribûn û bi tecrubeyên heyatê hem bûbûn hosteyên veşartina sirên xwe hem jî hosteyên gotina zelal a qewlên êzidî.

Biro, bavê mino, em bi dinyayê nikarin, Kekê Zerdeşt di sohbetên me yên êvaran de digot, lê em bi gotina xwe dikarin û em dizanin ko bi tenê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

quweta gotinê dikare li hember quweta şûr û zilma nefretê bisekine. Ji bîr meke Biro, qerarên ko şûr didin, timî bi xwîn in.

Û ro, tîrêjen royê, tîna royê, siya royê, nûr, nûrahî, ronahî... tiştekî din ko min li Lalişê çêtir fêm kir, pêwendiya êzidiyan û royê bû. Ro navenda heyata wan, bîr û baweriyên wan bû. Gotina şims ko wan hertim bi kar dianî û di qewlê Şêşimsê de derbas dibû, bi erebî ro bû, ferec jî ronahî bû. Piraniya gotin, qewl û ayetên wan li ser royê û ronahiya wê bû. Jixwe îbadetên wan jî bi hilhatina royê dest pê dikir, bi avaçûna royê temam dibû. Hem di hilhatina royê de, hem jî di avaçûna wê de wan rûyê xwe ber bi tavê dikir û qewl dixwendin. Di wan rojên rojî û cejnê de, bi hezaran însanên bindest û neçar ko xwe spartibûn cîhê herî asê yê dinyayê, di berbanga sibê de, rûyê wan ber bi tava ko li pey bilindahiyên çiyan hêdî bi hêdî bilind dibû, destê wan ber bi asimên, bi hev re, bergeheke welê dianîn pê ko ez ne bawer im, li dinyayê di dereke din de, bergeheke welê hebû.

Bi tîrêjên yekemîn ên berbangê, bi dengê dîk û teyrên dar û dahlan re, hemû kes li ser piyan bûn. Feqîr û qewal di nav kon û koman de digeriyan û bi dengekî bilind qewlê gundiyan digotin;

Cindiyo, rabe roj e
Bes vê xewê hindoj e
Xewa berê sibê zor edab û doj e.

Şêxê mezintirîn ê êzidiyan, di destan de gopalê wî, cil û bergên spî lê, şêx, pîr, feqîr û qewal li doralî, rûyê wî ber bi tîrêjên tavê, li ber deriyên avahiya Şêx Adî disekinî û qewlê sibehê digot;

Nûr ji nûrê şifqî
Siphan e, ji te xaliqî
Melek e, li ber tifqî.

Biro, bavê mino, Kekê Zerdeşt ku, piştî rojî û cejnê, nehîşt ez vegerim Mûsilê û li mala ko ew jî tê de dima, ez kirim mêvan, digote min, sî bi derketina xwe deyndarê tîrêjê ye. Însan, heyat û dinya bi hebûna xwe deyndarên royê ne. Ro dihebîne, dibexşîne, vedijîne. Xudavendê mezin erd çekir, asiman afirand, bi dû re ro bexşand. Royê jî tîr û tîrêjen xwe, ronî û nûra xwe bexşand me benî ademên dewranê.

Her tiştê ko pêwendiya wî bi royê re hebû, li ber dile êzidiyan şêrîn bû. Heta mar ko însan jê ewçend ditirsiya û direviya, ji bo wan, remzeke quweta royê bû. Ro hêz û quwetê dide mar, wan digot, gava ro heye û bi tîrêjên xwe pişta mar difirkîne, mar zindî ye, mar dijî, mar dibe mar.

Rojî û cejn çûn, Xidir, Hadî û malbatên wan, gundî û heciyên êzidî çûn. Heyata Lalişê ko hertim bi dengê gotin, qewl û stranên însanan û xwendina çûk û teyran tijî bû, qulipî ser halê xwe yê berê. Roj, hefte, meh li pey hev çûn, lê ez li Lalişa ko ne mîna rojên rojî û cejnê, lê hertim tijî şênî bû, mam. Payîz qulipî ser zivistanê, zivistan ser çilê, çile ser biharê, lê ez her li gelî û newalên dinya veşartî ya êzidiyan ko tijî sir bû, bi roj, tevî şervanên çekdar û xwedî tivingên helqedar ko sal donzde meh nobedarî li Laliş û gelî dikirin, li şikêr, zinar û daristanên Şengalê, tevî seg û tajiyan, li pey heywan û tilûrên nêçîrê, êvaran ko dibû kûzekûza gur, rûvî û wawîkan, li jûrên biçûk û tarî yên Lalişê, di bin şewqa qendîlan de, bi pîr, şêx, feqîr û qewalên êzidiyan re, bi dengê qewl û stranên êzidiyan, mîna ko ez li dinyayeke din bim, dijiyam. Deng, pêjn, hest, gotin û rêzên abadîn ên herî sade yên însên, li wir, bi hev re bûbûn yek û mîna şelaleyên her çar çemên ko di zikê Şengalê de derdiketin, dil û ruhê min dişuştin. Ne dewr û dewran mabû, ne jî war û mekan. Bila Migo li Mûsilê li hêviya min bûya, bila dinya derve bi teşqele û xirecirên xwe yên mal, milk, şan, şoretê bîhn li hevûdu biçikanda, min ne xem bû. Bila qeda li dinyayê û kîn û nefreta wê bihata! Li Lalişê di nav hizûreke abadîn de, bi tasek av, pariyek nan, kulmek mewîj û tû û çend hêjîr, bi tenê bi quweta gotinê bawer, rîheke dirêj li rûyê xwe yê birîndar ko hema çi bigire bi geliyê Lalişê dişibiya, zêdekirî, bi hez, arzû û kêfxweşiyê, min roj û şev li pey hev rêz dikirin. Şevên me jî li meclis û dîwanan ko ji mêvan, dengbêj û qewalên dengxweş ên êzidiyan dihate pê, şevên yekta yên gotin û stranan bûn. Me xwe dispart şevên bêdeng, zelal, aram û ebedî yên Lalişê û bi gotinê jan û keserên xwe melhem dikirin.

Şevek ji wan şevên me yên aram ko êdî bi bîhna giya, gul û kulîlkên biharê difûriya û bi hilhatina heyvê ronîtir dibû, piştî ko hemû mêvan û feqîr û qewal çûn û ez û Kekê Zerdeşt ko bûbû kekê min ê axretê, bi tenê man, mîna ko ewî fahm kiribe ko wexta min û xatirxwestinê êdî hatiye, west û heye ko keserek li ser rû, ji nişka ve, wî gote min,

Biro, bavê mino, min dil heye yadîgarekê bidim te. Lê bi şertekî...

Min dengê xwe nekir, ez westiyayî bûm, min bi ken lê nihêrî, kakilekî gwîzê ji siniya şêrînahiyan girt, xiste nav tasa hingiv û ew bir devê xwe.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ma tu dê nepirsî ka yadîgar çi ye, şertê min çi ye? Wî, mîna ko hinekî eciz be, gote.

Gotina xweş bihara dilan e, kekê Zerdeşt, min lê vegerand, gotina te têrî min dike, min gotê, bihar hatiye û gotina te bihara dilan e, ji çend mehan û vir ve te dilê min kir bexçê gulan ê biharê û ev jî têra min û heft bavê min dike. Tu berxwedar bî.

Wî dengê xwe nekir, rabû ser piyan, qendîl ji dîwêr hilda û çû aliyê hundir ê feqîrxana ko ji çend jûran hatibû pê û ez, ew û çend feqîr û qewalên din tê de diman. Piştî bîskekê ew vegeriya, qendîl bi dîwer ve kir, rûnişt, çog avêt ser çogê, bi dîqet li min nihêrî û gote min,

Em êdî birakên hevûdu yên axretê ne, hem li vê dinyayê, hem li wê dinyayê, hem li ser Pira sor, hem jî li heyata pey vê heyatê, em ê her bi hev re bin. Ez ê niha tiştê xwe yê herî giranbiha ko pîrê ko ez li ber destê wî mezin bûbûm û ez anîbûm Lalişê, dabû min, bidim te; teyrê tawis ko remza melekê tawis e. Di kitaba me Mishefa Reş de tê gotin, Xwedavendê me pêşî milyaket afirandin ko melekê tawis mezinê wan e û bi dû re dinya li ser pişta melekê tawis mîna lûlûyekê xaliq kir. Paşê jî erd û asiman, heyv û ro...

Wî destê xwe yê rastê dirêjî min kir û kefa destê xwe vekir. Tê de kevirekî sedef ko bi qasî gwîzekê lê pahn û gulover bû û bi çilkên ronahiya qendîlê diçirûsî, hebû. Jora kêvir bi quleke biçûk vekolayî bû û tê re benekî çermîn derbaskirî bû da ko meriv bikaribûya wê mîna nivişteke bi stûyê xwe ve kira. Min kevir ji destê wî wergirt û lê nihêrî. Şeklekî xweşik ê teyrekî tawis lê kolayî bû. Teyrê tawis, bi stûyê xwe yê bilind, tarrik û nikilê xwe yê dirêj, çîpên xwe yên mîna mirtal û pûrt û dûvikê ko mîna kevanekî ber bi jor vekişiyayî, bi hostehî, li ser kevirê spî neqişandî bû.

Şertê min jî ev e, ewî du lib hejîr bire devê xwe û bi rûyekî geş got, çu divê tu carî teyrê me nedî kesekî din, ew divê hertim li nik te be. Lê belê, eger hezkar û evîndareke te hebe, rojekê tu pê re heyata xwe bikî yek û tu li qada dinyayê ji herkesî bêtir ji wê evîn û evindara xwe hez bikî û nûra evînê di dilê te de vede, hingê tu dikarî teyrê me bidî wê jî. Lê bi tenê wê û ne hîç kesekî din. Herçî ez im, min evîneke weha bi dest nexist, lê daxwaza min ji melekê tawis ew e ko tu bi dest xî. Melekê tawis nikare te hertim, li her derê biparêze, lê ew ê hertim li qada dinya kambax ko êdî bi temamî tijî şaşî ye û kîn û nefretê rê li ber însanan xwar kiriye, riya rast nîşanî te bide.

Min dengê xwe nekir, lê kevir bir ser lêvên xwe, ew ramûsî, bi qasî çen-

dekê lê nihêrî. Kevirê biçûk ê sar ko wê nîve şevê, heye ko li ber destê sibê, bi roniya qendîlê dibiriqî û mîna qedîfê dûz bû, aramî û germahiyeke ruhî vediguhest însên û tevî ko ez westiyayî û ji dûmana cixare û qelûnê û bêxewiyê sersem bûm, min xwe zînde û kêfxweş hîs kir. Min teyrê tawis dîsan ramûsî û ew bir stûyê xwe û pê ve kir.

Serpêhatiya min û kevirê sedef ê teyrê tawis ko ez ê, di şevên bê de, bi kitekit qalê bikim, direj e. Lê ji niha ve ez bibêjim we ko kevirê teyrê tawis ê Kekê Zerdeşt, li Şamê, warê me yê nefiyê, alîkariya min kir ko ez qatilê evindara xwe Stêrê ko bi derbên xencereke bêwîjdan hate kuştin, binasim û tola Stêra xwe ya bêsiud û bêmiraz bi eynî xencerê xwînrij hildim.

Lê wê şevê, piştî ko Kekê Zerdeşt razên dilê xwe ji min re gotin û kevirê xwe yê giranbiha da min, berî ko em rabin û herin bikevin nav cîhan, wî destê xwe yê rastê bir ser milê min û bi dengekî zîz ji min pirsî,

Biro, bavê mino, bav û kalên me gotine, birîna ko neye vedanê, rehet nabe... meraqeke min heye, ma tu nabêjî min, ka ev birîna li ser rûyê te ko diyar e birîna şûr an xencerekê ye, ji kû ye, ji kengî ye? Kê çavê te kor kir?

Birînên me hemûyan hene, kekê min ê delal, min gotê, em ehlê birînên kûr in, birînên me, carina mîna birînên min li ser rû ne, carina mîna birînên te li ser dil û ruh in... Birînên min... ew berî ko ez bîr bi heyaman bibim, hatine vedan, nayê bîra min ka kengî bû.

Û ez giriyam.

Dengê bêdengiyê ko warekî vegirt, êdî zû bi zû ji wir dernakeve. Heke dengê bêdengiyê ji şopên birînên kûr hatibe pê, hingê bêdengî dibe îlelebet. Hingê bêdengî di nav her celeb dengê heyatê de, mîna çemê ko di bin qeşayên çilê de diherike, mecrayeke xas dibîne û tê de her û her olan dide. Lê belê olaneke welê ko bi tenê dil û ruh dikarin wê bibihîsin. Her cara ko min dil kir ko bi dengên heyatê û bi dengên ko hertim li dora dengbêjekî ne, dengê bêdengiyê ji bîr bikim, çavê min ê kor û rûye min ê qelişî dengê bêdengiyê anîn bîra min. Roj bi roj, sal bi sal hîn bêtir... herçend umrê min kemilî û gihîşte qonaxên nû, dengê bêdengiyê jî ewçend dil û ruhê min guvaşt.

Guhdarên qedirbilind, xortên delal,

Min ê ji kê re bigota ko dilê min bi liyan bû û her bêdengiyekê nîşana dengên ko nayên gotinê bû?


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ez ê niha çawan ji we re bibêjim ko bi çêla pirsa Kekê Zerdeşt re, niha dîsan dilê min liyan e, dîsan wext wexta dengên bedengiyê ye?

Heye ko ji ber dengê bêdengî û olana wî ye ka ez bûm dengbêj û min gotin kire para heyata xwe. Heye ko loma ez weha rûniştime, tevî birînên min ko min gav bi gav dibin gorê, heta berbangan, ji we re kitekitên tarîxeke kirêt û heyatên şikestî dibêjim. Tarîxeke kirêt û heyatên şikestî ko ji jan, keser, hesret, sûzenî, ketin, bêgavî ko bi gotinê nayên zimên, ko dibin hîmên bêdengiyê, hatine pê...

Guhdarno,

Ma jan, keser û hesret jî mîna kêfxweşî şox û şengê ne hewcedarên gotinê ne? Ma jan û kêfxweşî, keser û bextiyarî, hesret û mesûdî ne cêwî ne? Ma gotina min a destpêkê ya şevbuhêrka me ya yekemîn nayê bîra we; dengê jibîrbûyiyan... Yanî dengê bêdengiyê...

Heye ko ji lewre, ko ez bikaribim ji dengê bedengiyê re awazekê bibînim, ez bûm bendî gotinê. Gotina ko hatiye hûnandin, bi deng û awezekê ko tê de bêdengî jî xwedî deng e.

Bêdengiya ko piştî derba şûr an jî pirsên li ser derba şûr hatiye pê, bi çu bêdengiyên din naşibe. Bêdengiya derba şûr xurt, kûr û jîndar e. Belê, jîndar, bêdengiyeke welê ko çu carê namire. Bêdengiyeke welê ko mîna loriya pîrejinên ko li şîn û tahziyan rûniştine, her di dil û ruh de dihênije.

Mîna niha...

Bi dû dengê şûr re bêdengî.
Axur bêdeng, kadîn bêdeng.
Bav, dê û hersê zarok bêdeng.
Hewş, gund, hawîrdor bêdeng.

Ne teyr û tilûrek
Ne heywan û rawirek
Ne jin û mêrek
Ne zarok û kalemêrek

Mal û jûrên ko bi germahiya însên tijî bûn û do jê deng dihatin,
Kahniya ko bi destê hosteyên kevnare lêbûbû û do diherikî,
Xanî û dîwarên ko bi kevirên ferişî yên reş lêbûbûn,
Dar û daristanên ko warê seydên ask û xezalan bûn,

Newal û geliyên ko bi dengê qewl û stranê olan didan,
Dîwan û meclisên ko bi dengê stran û qewlan germ dibûn,
Kalên rîhspî ko dewr û dewran dîtibûn,
Zarokên biçûk ko hê bîr bi çerxa dewr û dewranan nedibirin,
Her yek xwedî canekî, umrekî, heyatekê,
Her yek xwedî navekî, şan û bavikekî.
Gundê ko ji sedan salan û vir ve nas,
Bav û kalên veşartî, li goristana gund a nas,
Dar û berên ko bi destê bav û kalan çandî û nas,
Rez û bexçeyên ko bi tecrube û xatireyên bav û kalan ve nas,
Bav, dê, bira, birazî, xal, xwarzî, heval, dost, hemû nas,
Heta do, hemû bi hev re, bi ked û xwîdan, xewn û xeyal,
Bi heyateke nas.

Hemû niha bi bêdengiyeke nenas,
Ku ji bêdengiya goristanê kûrtir, ji bêdengiya deryayan boştir,
Li ber bayekî sivik ê sibeheke ronî,
Geh li vir, geh li wir.

Derba şûr û mohra mirinê; bêdengî, bi temamî bêdengî...

Lê bi dû bêdengiya dirêj a boş re, mîna mûcîzeyekê, carina
dengekî zirav, pêjneke sivik.
Mîna simbilekî jar ko li pey qimilê maye,
Mîna kevirê stûna pirekê ko li ber lehiyekî rabûyî çûye,
Mîna çivîkekê ko ji hêlîna xwe ketiye,
Mîna qulingê perşikestî ko li pey refê xwe ko di nav gulokên
pûk û bahozê de windabûyî, maye.

Û mûcîze; li kadînê,
Di nav ka de ko bi xwîna însên renk guheriye, deng û pejn
Nalîna zarokê berşîr
Axîna dayika wî...

Dengek, li pey her tiştî dîsan dengek...

Dengê Bexda û Babîlê, bêguman ji dengê Lalişê ko yekcar dil û ruhê min



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

vegirtibû, gelekî cihê bû. Herwekî dengê însanan, dengên cîh û waran jî xweser in. Her war, welat û dever xwedî dengekî xas e, ko tê de hemû serpêhatî, tecrube û tarîxa navçê heye. Welatê êzidiyan ko xwedî dengekî gelekî taybetî yê kevnare bû, li ser riya terbiyekirina ruhê min, bû medreseyeke nû, lê belê ji Lalîş û dengê Lalîşê êdî wexta xatirxwestinê hatibû. Ez, Biroyê êzidî, rêwingê dinyê, diviya di riya qedera xwe ya neçar î teres de biçûma û min riyên nû ko carina kaş an nişîv, carina fetloke an yekpê, carina jî kor an xaç dibûn, bibiriya, qonaxên nû ko carina tê de bi tenê dengê kundan dihate bihîstin û carina jî tê de dengên têkel ên serpêhatiyên însanî olan didan, bida ber xwe. Hîn gelek war û welatên ko min nedinasîn û bi dengên însan, bûyer, serpêhatî û tarixê ve tijî bûn, li hêviya min, li hêviya ruhê min ê qeşmer û fikir û gumanên min ên zarok bûn.

Piştî ko min kelîjana havîna Mezopotamya Jorîn jî li geliyê Lalîşê ko li gora Mûsil û deverên din ên şewitî hûniktir bû, bihurand, min dîsan da rê, di sibeheke ronî ya destpêka payîzê de, berî ko ro li me hilwere, li ser hespekî rewan ê kumêt, tevî qewalê denghevrêşim kek Zerdeşt û ew herdu xortên ko di çûyina min de, ji Mûsilê heta Lalîşê, bi min re bûn, Xidir û Hadî, kevirê sedef ê teyrê tawis ko êdî mîna birînên rûyê min bûbû perçeyekî heyata min, li stûyê min, em ketin rê, me ji Lalîş, çiya, gelî û daristanên aram û ji teşqele û xirecirên însanan dûr xatir xwestin, berê xwe da çola qiraç a Musil û Nînovayê ko mîna her carê di xewa xwe ya tiral a hezaran salan de bûn. Li Mûsil û Nînovayê hîç çu guherîn nîn bû, heke em toz û gemara ko qateke din li toz û gemara wextê qedîm ê herêmê zêde kiribû, nehesibînin. Dîcle bi şêweyê xwe yê nas, bi tevgerên giran ên fetloke di çola şewitî de diherikî; bayê sivik û germ ê şerqê mîna alawên agirekî nûpêketî rûyê însên mist dida; teyrên başoke bi tevgerên giran li doraliyên çêm û girikên Nînovayê, bêmebest, li asimanên şîn ko carina bi ewrên spî dineqişîn, çerx dibûn; dûpişk, mar û marîjok, tîrêjên tîn ên tavê li ser pişta wan, di navbera kuç û kevirên Nînovaya şewitî de hêdîka, çiv didan; kelek û keştiyên biçûk li ser ava Dîcleyê ya sakîn, mîna pez û dewarên li qiraxên çêm ko bi germahiya tavê gêj bûbûn, giran giran xwe dilivandin; qahwexane dîsan, bi dûmaneke giran a cixare, qelûn û nêrgilê, bi vizeviza mêş û pêşiyan û bi qîreqîra tucar û sîmsarên hîlebaz ko kesî nizanîbû ka bezê guhê bavê wan ji kû bû û bi hezar fen û dolaban kaya şil û giyayê ter bi buhayê zêran difirotin gundiyên doralî, tijî bûn; dengên zimanên curbecur ên dêrên têkel ên filehan, mizgeftên

têkel ên şafî û henifiyên misilmanan û hewrayên cihûyan li bin guhê hev diketin. Qayikxaneyên li kêleka çêm, dûkanên bazaran, meydanên kirîn û firotinê, xanên kevnare yên kerwanên dûr û nêzîk ko ji bilî domandina heyata rojane bi kêrî çu tiştî nedihatin, mîna tîmsalên heyata rengîn a Mezopotamya Jorîn ko ji zanîn û şiûra xwe ya tarîxî bi dûr ketibû, şên û geş bûn. Mûsilê, bajarê qedîm ê tarîxê, mîna her carê, bêyî ko haya wî ji tarîxê hebe, di wexteke tarîxî de, heyameke nû li tarîxê zêde dikir.

Lê belê, li wir, însanekî ko bîr bi van hemû tiştan dibir û bi sebir, li hêviya hatina min bû, hebû; Migo. Herçiqas ew bi min re nehatibû Lalişê û heyata Lalişê ko bi qewlên êzidiyan hatibû hûnandin, xetim nekiribû, ewî li Mûsilê, li gora xwe, şêweyên din ên heyatê, ko bi huwiyeta wî ya ermen û bi dînê wî yê xiristiyanî ve gelekî girêdayîbû, xetim kiribû. Wî jî mîna min, mîna nîşana heyama nû ya heyata me ko bi şopên tarîxî yên çemê Dîcleyê li ser rêwîtiyeke xas bû, rîh berdabû. Lê rîha min ko eybên rûyê min hinekî vedişartin, mîna rîha feqîr û qewalên êzidiyan dirêj û şehkirî, rîha Migo ko ji bervajiyê rîha min, bal û endama wî ya girs temam dikir, mîna keşeyên dêra ermenan kurt û hinekî gulover bû. Ez dirêj, rîha min dirêj; Migo gulover, rîha wî gulover bû.

Çaxê êvarê ez, tevî hevalên xwe yên rê, çûm dêra ermenan û di dersxana dêrê de min Migo ko di nav refên kitaban de bi tenê bû û li ber rehleyekê, di bin ronahiya qendîlekê û sûretekî Îsa Mesîh de, serê wî li ber kitabeke vekirî, dinihwirî, dît û me, mîna ko Dîcle û Firat bi hev re bibe yek, welê tavilê xwe avêt hembêza hev, hingê ne bi tenê zikên me yên ko êdî mîna defekî werimîbûn, herweha mûyên reş ên rîhên me jî gihîştine hev û hevûdu ramûsandin. Dest û milên malmîratê Migo bûbûn mîna mengeneyeke hesinî ko ne bi tenê dikarîbû nefesê li min biçikanda û bedena min a dirêj biguvişanda, herweha wî dikaribû, ez bawer im, kolozên pola jî mîna rîsên giya li hev bada.

Lawo, hêdî be, min gotê, te kezeba min di devê min re anî.

Kuro, tu û kezeba te! Kezebreşo, tu li kû yî? Ewî hinekî esebî li min vegerand.

Ev çi halê te ye? Ev rîh, ev zik, ev qelawî. Tu dê biteqî, malmîrato! Min gotê û rê li axaftina wî girt.

Min dizanîbû ko min wî bi mehan, bi tenê hîştibû û mîna ewrên avis ên asimanan ko li hêviya bayekî sivik bûn da ko xurt bibarin, ew eciz bû û li hênceteke digeriya ko ne bi tenê bibare, lê belê mîna şêrekî biore jî. Mîna ko ewî niyeta min fahm kiribe, ew hinekî ji min bi dûr ket, çavek


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

li hevalên min gerand, mîna ko ew ji wan hinekî fedî bike, dîsan awireke sar da min û hêrsbûyî, lê îcar bi dengekî nermtir li min vegerand.

Biro, kezebreşo, ma ez te nas nakim? Tu niha dîsan dixwazî kîrê devan li qûna pisîkan rast bikî!

Bi vê gotinê pîrqînî bi min û hevalên min ket û ez ber bi wî çûm û îcar min ew pihêt hembêz kir.

Em li hev hatibûn.

Dotira rojê ewî bi kitekit behsa heyata xwe ya Mûsilê û wan mehên xwe, min jî behsa Lalişê, êzidiyan, qewl û stranên wan kir. Bi hemû teferuatan, bêyî ko ne ew, ne jî ez, em serpêhatî, fikir, bûyer an jî kiteyekê ji bîr bikin. Bêguman min qewl, hedîs û stranên ko ez li Lalişê hîn bûbûm, jê re geh mîna stran geh mîna gotin, yek bi yek, jiber, vegotin û kevirê xwe yê sedefê ko li gora qewlê Kekê Zerdeşt, ew ê di rojên min teng û neçê de alîkariya min bikira û di stûyê min de mîna nîşana payebilindiyeke mezin li ba dibû, berpêşî wî kir. Çaxa min di berbangeke sibeyeke zelal de, li mêvanxana dêra ermenan ko Migo jî êdî li wir, li nik min bû, di nav cîhan de, çîroka xwe û Lalişê bire serî, berî ko em bikevin xewê, mîna lorînekê, min rêzên dawîn ên Qewlê Şêşimsê jê re xwendin;

Xwidanê keremê, dêrşê geliyê Lalişê,
Meded halî sinetê,
Tu bangî rehmetê,
Rehme li dê û bavên hadiran û guhdaran...

Herçî Migo bû, wî jî mîna min, heye ko ji min jî zêdetir, bala xwe dabû ser tiştên nû û li ber destên keşeyên dêrê Tewrat, Zebûr û Încîl ji nû ve xetim kiribû, li ser medeniyeta Urartûya ko mîratên bav û kalên wî bûn, gelek weşanên ko di kitabxana dêrê de bû, xwendibûn, îlmê xwe yê zimanê ermenî bi pêş de biribû, hinekî bi ermeniya kevnare ko wî jê re digot, krapar, hîn bûbû, mîna şalûrekê bi ermeniya nû ko jê re digot, aşkarapar, dipeyivî, li ser elifbêya ermenî ko beriya wextê me bi qasî hezar û çar sed salan, ji aliyê keşe Mesrob Maşdots ve hatibû pê, hûr bûbû, şiîr û stranên şaîrên navdar ên ermenan mîna Nerses Şnorhali û Sayat Nova ji ber kiribûn û di wê navberê de çend caran çûbû welatê Aşûr û Nemrûdê.

Çaxa me êvaran xwe dîsan dispart bilindahiyên keleha Mûsil û keleha Selçuqiyan û dest bi xwarin û vexwarinê dikir, piştî bîskekê, bi dû çend îskanan re, di bin xalîçeya ronî ya stêran de, bi hevaltiya dengê segên ba-

jêr û kundên Nînovayê, Migo dest pê dikir û mîna ko ewî dixwest dengê xwe bigihîne kûrahiyên ruhê Nînovayê, bi dengekî gelek berz, rêzine ji Tewratê ko wî ji ber kiribûn û çêla Nînovayê dikirin, nîvco û peregende dixwendin;

Ho, tu, bajarê xwelî li serê barî!.. war û welatê derew, kelepor û talanê... dengê qamçiyan, hîrehîra hespan, şirqîniya şûran, vizeviza riman, axîna birîndaran, cendekên behejmar ên miriyan... ho, bajarê ehlîkêf... derman nîn e... birînên te dê çu carê necebirin...

Piştî demeke dirêj li Musil û der û dorên Musilê, me diviya dîsan xwe bida hev û em bi rê ketina. Mam Sefo ko haya wî hertim ji me hebû û ji dûr ve xwedîtî li me dikir, dîsan, kîsekî mezin tijî mecîdiyên osmanî û kîsekî biçûk jî tijî zêrên biçûk, tevî Apê Yaqûb ko di navbera Musil û Cizîrê de, bi keleka xwe ya nû bar û rêwî dibirin û dianîn, şandibû. Me dirav, cil û berg, xwarin û vexwarin, nas û dost hebûn. Me xîret, bîr û bawerî, meraq û berpirsiyarî hebû. Zikê me têr, umrê me kamil, lê heyata me xort, armanca me bilind, hedefa me kûr û dûr bû. Me diviya berê xwe bida oxirê û xwe bisparta axên nû, îklimên nû, dengên nû.

Me pêdivî û tevdîrên xwe, li ser dûkan û bazarên Mûsilê, yek bi yek bi cîh anîn û boxçikên xwe hazir kirin, ji heval û dostên ko bi mêvanperweriyeke bêpayan rabûbûn û em li mal, meclîs û mêvanxaneyên xwe hewandibûn xatir xwestin, du şevbuhêrkên bi şox û şeng, yek li mêvanxana dêra keldanan, yek jî li ya ermenan li dar xistin û di berbangeke payîzê de, berî ko çilka tîrêjên tavê bikeve zikê dinyayê, tevî kerwanekî boş ê erebên bazirgan ko ji deverên Rihayê dihat û ber bi Basrayê diçû, li ser pişta du hespên esîl ko me ji axura dêra ermenan deyn kiribûn û di vegerê de me dê teslîmî wan bikira, em bi rê ketin.

Lê berî ko em bi rê kevin, em daketin qiraxên çêm û çûn nik Apê Yaqûb ko ji bo çend rojan hatibû Mûsilê. Apê Yaqûb, li kêleka wî jî dostê me, segê fedekar û bîrbir Gurzo ko disan dûv û qamîşê wî yê sor rep, li qayikxanê, li kêleka dûkên, li ser kursiyekî gelekî nizm rûniştibû û çay vedixwar. Gurzo em nasîbûn, çawan çavê wî bi me ket, tavilê, ew rabû û şên, bi kêf ber bi me hat û mîna nîşana kêfxweşiya wî, ewî xwe avête ser me.

De bihewe Gurzo, Migo, hinekî esebî qîriya ser Gurzo, lawo, ma tu dê bikutî me?

Piştî ko Gurzo hinekî haş bû, kenek li ser rûyê me, em jî li kêleka Apê Yaqûb, li ser kursiyan rûniştin û me dest bi sohbetê kir. Migo dê

nameyek ko ji bavê xwe re nivisîbû, bidayê û em ê ji bo rêwingiyê pê bişêwiriyana. Piştî bûyera kelekê, hem çavê min hem jî çavê Migo ji rêwingiya kelek û keştiyan tirsiyabû. Bi tenê du rê hebûn, riya çêm û heke riya avê nebûya hingê me riya bejê, riya kerwanan diviya. Gerçî Apê Yaqûb têneh̄edigihîşt ka me li wî welatê başûr ê çol û heriyê çi diviya, lê ew jî di wê baweriyê de bû ko îcar riya kerwanan ê ji bo me çêtir bûya. Bi tenê şîreteke wî li me hebû; di welatê çol û xezebê de her tişt dikarîbu bi serê me de bihata, rê bi keleşên bedewî ko birçî bûn û li pariyek nan digeriyan, çeteyên osmanî ko ji eskeriyê reviyabûn, mar û dûpişkên ko bi tîna tavê har bûbûn, tucar û bazirganên ko heyata wan dek û dolab bû, gundiyên ko daxwaza dilê wan û gotina devê wan ne mîna hev bû, tijî bû, diviya em bi tevdîr bûna, em diviya ne peya, lê siwar bûna û hespên me jî diviya esîl bûna.

Xortino ji bîr mekin, wî gote me, hespên esîl siwarên xwe di rê de nahêlin.

Berî ko em jê xatir bixwazin, piştî qulta dawîn a çayê, min jê kurê wî, hevriyê me yê rêwîtiya kambax a Dîcleyê Bedros pirsî.

Bedros çûye gund, wî got. Ew çûye nik dê û xwehên xwe. Xweha wî Ester hinekî nexweş bû.

Min navê Esterê ko paşê bû stêra ber dilê min, hingê cara duwemîn, îcar ji devê bavê wê, bihîst.

Ester, Estera dengşalûr? Min jê pirsî.

Belê, Ester... tu ji kû dizanî ko dengê wê xweş e? Destê wî yê rastê li ser simbêlên wî yên boq, meraqek li ser rûyê wî, wî li min vegerand.

Bedros gotibû, min bi kurtebirî gotê û em rabûn ser piyan da ko di riya xwe de herin.

Dotira rojê, çaxa me di kêleka çêm re, tevî kerwanê dirêj ko hema çi bigire ji deveyan hatibû pê û bazirganên ereb ên jêhatî û xwedantecrube, dest bi rêwîtiya xwe kir, ji kêfa min re payan nîn bû; hespê min ê nûtimarkirî, mîna ko ew di govendê de be, bi aheng diçû, çavê min geh li ser deşta zer a bêdawîn ko leylan dida, geh li ser çemê Dîcleyê ko kirasê navçê li xwe kiribû û bi rengekî zer î zêrîn diherikî, min hêdîka strana ko min di wê danê sibê de, ji nişka ve li hev anîbû û xwesteka ruhê min bû, dilorand;

Esterê, lê Esterê
Zarşêrînê, lê keçê

Bilbila welatê Hekarê

Esterê, lê Esterê...

Min dil nîn e ko ez niha vê gera me ko bi dû re bû tecrubeyeke girîng a heyata me, ji we re, tevî hemû kitekitan şerh bikim, ji ber ko min hê gelek tişt û bûyerên girîng hene ko ji we re bibêjim. Lê heke ez bi kurtî çêla vê gava diduyan a gera me ko îcar jî bi qasî sê-çar mehan dewam kir, bikim, hingê ez divê bibêjim ko min û Migo xwe gîhand kahniya însaniyetê, dilê hemû medeniyetên însanan, – bêyî ko em pêrgî qeza û belayên mezin werin. Em ji Musilê derketin û hertim di kêleka Dîcleyê re, carina jê hinekî bi dûr, carina li nik, ber bi başûr, welatê çol û germê, gav bi gav, roj bi roj daketin. Kerwan hêdî diçû, dengê hesab, xirecir, pevçûn, stran û henekên bazirganên ereb li bin guhê hev diketin. Bi rojê, nemaze gava tav bilind dibû, tîna tavê leylan dida û hawîrdor diqulipand ser deşteke rût a çîk î zer û êvaran dinya diqulipî ser mehfûreke neqişandî ya welatê Wanê û stêrên çirûsî ko mîna çiyayê abadîn ê Cûdiyê aram, qehîm û ronî di zikê asimanan de radiwestiyan, geh ronahiyeke ecêb xurt direşandin ser dinyê geh jî mîna ko ew bixwazin ders û tecrubeyên çerxa felekê nîşanî me însanan bidin, mîna ko ew bibêjin, umrê însanan jî weha ye, dirijiyan û ji milekî ber bi milekî din dixuricîn û winda dibûn. Li hemû dinyayê, li deverên cihê ko umrê min tê re boriye, min mehfûra neqişandî ya stêran hertim dîtiye, lê ne bi wê ecêba welatê başûr ê çolê. Li wir stêr gelekî nezîkî me bûn, mîna ko ew li ser serê me hilawestibin û çêla hal û hewalê me bikin, bi me re bûn û tevî me bi kerwanê re dimeşiyan.

Her gava ko me davêt, her qonaxa ko me dibirî, tijî deng bûn, dengên tarîxî û jibîrbûyî ko ji bilî min û Migo kesekî din seh nedikirin. Em daketin welatê xopan ê Nemrûdê ko di Tewratê de qalê dibe û hema çi bigire tîmsala avahiyên giregir, şidet û zordestiya însên e. Ji wir me xwe gîhand bajarê qedîm ê bav û kalên Apê Yaqûb Aşûrê ko beriya me bi hezaran salan ava bûbû û navê xwe dabû Împaratoriya Aşûrê û nifşên ko ji hezaran salan û vir ve dihatin bi çîrokên wî mezin bûbûn. Di wir re em daketin Tekrîtê, bajarê Dîcleyê ko ehlê wî bi temamî ereb bû û însan dikare bibêje ko hingê tixûbekî nediyar ê di navbera Mezopotamya Jorîn û Mezopotamya Jêrîn de bû. Ji Tekrîtê em gihîştîn yek ji herêmên herî geş ên welatê çemê Dîcleyê, bajarê Îslamiyetê Samarayê ko qûleya wî, mîna qûleya Babîlê, ji dûr ve dixuya û bi fermana kurê xalîfe Harûn Reşîd, xalîfe El Mutasimbilah hatibû ava kirin û di demeke kurt de bûbû yek ji



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

navendên girîng ên medeniyetên cîhanê û piştî demekê, ji nişka ve, têk çûbû û hilweşiyabû. Ji wir jî me xwe berda bajarê navdar ê çemê Dîcleyê ko bi roj bi tîrêjen tavê, bi şev jî bi ronahiya qendîlan diçirûsî û bi darên xwe yên palmiye, serpêhatiyên xwe yên xelîfeyên îslamiyetê û çîrokên xwe yên Hezar û Şevekê nas bû, yanî Bexdayê.

Ji bilî Bexdayê, heke em bajarên biçûk ko li kêlekên wan ava bûbûn nehesibînin, hema çi bigire hemû bajarên din ên kevnare bûbûn kavil û kund li ser dîwarên wan ên wêran dixwendin û kulî li ser banê wan ê hilweşiyayî dipengizîn. Tarîxek ko riyên nû li ber însaniyetê vekiribû, di nav qûm, ax, toz û heriyên wan bajarên wêran û hilweşiyayî de veşartî bû. Ne bi tenê bajarên ko wextekî mîna stêran diçirûsîn, herweha tarîxeke kevnare û abadîn jî li wir ketibû xewa giran a mirin û jibîrbûyinê. Dîcleyê di nik Aşûrê re ko çirûskên dawîn ên heyatê tê de, ji mêj ve temirîbûn, bi xêzeke fetloke, çiv dida; birc û dîwarên keleha Samarayê yên jihevketî, mîna ko ew li hêviya çilkeke heyatê bin, stûxwar, li çola bêdawîn û stewr dinihêrîn; herçî Tekrît ko li ser girekî ava bûbû, li çêm dinihêrî, li wir jî, mekanên herî jîndar, qahwexaneyên kêleka çêm bûn, ko tê de, mîna qahwexaneyên Mûsilê, bi tenê mêş û kelmêşên rabûbûn govendê, jîndar bûn.

Heyat li wan deran bi tenê Dîcle bû; av, herikîn û tevgera çêm bû ko maneyekê dida heyat û wextê, dewr û dewranê.

Tevî ko havîn û mehên herî dijwar li pey me mabûn, dinya hê jî di nav çola bêdar û bêber de gelekî germ bû, ji lewre meşa kerwên gelekî giran bû, li her qonaxekê, li her bajarekî em disekinîn. Bi tenê li kêleka çêm dar û hêşinahî hebûn, lê li wan deran jî ordiyeke têkûz a pêşiyên xwînxwar ko bi ordiyên kevn ên aşûr û medan dişibiyan û ji tîna tavê û deviyên li ber devê avê hez dikirin, bedena însên di nav kêliyekê de diqulipandin ser seradeke qulqulî. Bêbavê pêşiyan welê êrîşeke bêrawest dibirin ser însên û welê bi însên ve didan ko agirê derbên wan ji agirê tîrên keldanan jî xirabtir bû. Lê ji ber bextê me yê çê, li rê em hema çi bigire hertim pêrgî şivan û keriyên pêz ko bi hêviya misteke giya, bêserûber û gêjik, çerx dibûn, gundên biçûk ên ereban ko xaniyên wan ên teng û tarî bi kerpîçên şewitî lêbûbûn, filehên koçer ên ereb ko konên xwe yên reş ko pirî caran bi mûyên bizinan hatibûn risandin, li ber avekê, bîrekê yan jî di bin siya darine zirav de vedabûn û pêrgî refên cendermeyên osmanî ko hertim li rê bûn û ji devereke Mezopotamyayê vediguhezîn devereke din, dihatin û bi xêra wan, em ji hespan peya dibûn û me bîhna xwe bîstekê berdida.

Herçî çemê Dîcleyê bû, di navbera Musil û Bexdayê de, tijî keştî û kelekên biçûk ên gulover ko ereban jê re digotin gufa, bû. Rêwîtiyeke boş di riya çêm re hem ber bi jor hem ber bi jêr li dar bû.

Di rêwingiya me de, dengên ko herî zêde me dibihîstin, heke em qîreqîra bazirganên kerwên, ewteewta segan, dengê tîz ê pêşiyên bêbavan, hîrehîra hespan û gufegufa deveyan nehesibînin, hingê dengê dolabên avê bû, ko di kêleka çêm re mîna dîwarên ko bi kemeran hatibûn birîn, xwe dirêjî avê dikirin û ava çêm bi alîkariya cok û qetekan digîhandin ser erdan û mîna cinawirekî her û her xurçexurç dikirin û zûrezûra wawîk û kûzekûza çeqelên şevê bû, ko hertim êvaran li dora kerwên digeriyan û bi dengê xwe deveyên kerwên, hespên me, bergîr û kerên bedewiyên ko li rê, li cîhine diketin nav refê kerwên, eciz dikirin.

Li her bajarî kerwansarayine qehîm û kevnare ko tê de her celeb însan ko bi her texlîd kar û şuxilî radibûn û bi her celeb zimanî dipeyivîn, hebûn. Hal û hewalê dinyayê, xeber û nûçeyên war û welatan, pisepisên li pey derî û hewşan, bûyer û serpêhatiyên beg, mîr, şêx, paşa û padîşahan, biha û erzaniya kirîn û firotinê, kelam û stranên ereb, ecem, cihû, keldan û miletên din ên navçê û hema çi bigire her tiştê ko dihate bîra însên li mezelên teng, aşxaneyên genî, mevanxaneyên bi dûmana cixare, qelûn û nergilê tijî û eywanên hûnik ên wan kerwansarayan de dihatine peyivîn û gotin.

Rojekê, li kerwansarayeke gelekî kevn ê welê ko ji mermerê verişî yê spî lêbûbû, li Samaraya xopan ko ji mêj ve aşên xwe betal kiribû, danê êvareke piçekî sayî, li eywana fireh û avkirî ya xanê, li ser sedirên dirêj ên bi cawên neqişkirî dirûtî, rûye me ber bi tîrêjên hêlesor ên tavê, min û Migo, me, cangiran û sist pal dabû. Min, taseke kûr tijî xurme li ber min, xurme lib bi lib davêtin devê xwe û di navberê de jî, çaxa min ji xwarina xurmeyan keys didît, gotin li hev siwar dikirin. Migo jî bedentevizî, çavnermijî di xew re diçû. Dotira sibê, berî ko tîrêjên tavê li me hilbihata, me dê dîsan ber bi aliyê Bexdayê bida rê. Me bîhnvedan diviya. Min ji tecrubeyên xwe yên medrese û kitabxana Mam Sefo dizanîbû ko xelkên dûrbîn û zîrek hebûn ko bûyer, serpêhatî û ger û geştên xwe vediguhezandin ser kaxizan û ew dinivisîn. Lê herçî ez bûm, mîna wan kesan ne zîrekê pênûsê bûm, navbera min û nivisînê ne baş bû, ne pênûs û defterên min hebûn, ne jî kitab û mewkîteyên min, ji lewre min jî tiştên ko min didîtin û dibihîstin, bûyer û hîsên ko di dil û mêjiyê min de olanekê vedidan, bi alîkariya gotinan, diqulipandin ser stranan; stranên



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ko bi tenê min ew li hev danîn, bi tenê min lê guhdarî dikirin û bi tenê min pê dizanîbûn. Hingê, di eywana xana kerwanan de jî, ez her bi şixulê xwe mijûl bûm, li milekî xurmeyên şêrîn, li milekî jî gotinên şêrîn li nik min bûn. Lê Migoyê nefsek ko li ser sedira kêleka min, di xew re diçû, heye ko ew li xurmeyan tamijî be, hişyar bû, destê xwe avête tasa xurmeyan û bi dengekî esebî gote min,

Kuro Biro, babilindo! Ma ez ê ji destê te herim kû? Law tu nahêlî ez bîskekê çavê xwe jî germ bikim! Ev çi qîreqîr û lorelora te ye?

Qîreqîra çi, lorelora çi? Min bi comerdî tasik dirêjî wî kir û gotê, ez bi dengekî nizm çêla ders û tecrubeyan dikim, wan li hev tînim.

Tu û ders û tecrube! Tu li kû, ders û tecrube li kû! Wî got û rahişte tasikê.

Ji bo ko însan bibe xwedî ders û tecrubeyan, divê însan wan li hev bîne, ji ber bike da ko wan ji bîr neke, bavê dapîra mino, Migo.

Yanî tu niha van qîreqîr, pitepit û loreloran ders û tecrube dihesibînî? Wî, dev tijî xurme, bi zehmetî got.

Ne qîreqîr, pitepit û lorelor, lê gotinên sakîn ên ders û tecrubeyan, gotinên zeman û dewranê... gotinên heyatê... min bi awazekî nerm mîna lorînekê gotê.

Migoyê qelew ko diviya min navê wî li wir biqulipanda ser Migoyê xurmexwaro, tafilê hemû xurme xwarin, bi awirekî tirş carekê-du caran li min nihêrî, mîna ko heşê wî ji min tiştekî nebire, çend caran serê xwe li ba kir û bêyî ko bersîva min bide, milê xwe yê rastê xiste bin serê xwe, qûna xwe ya fireh ko bi qasî dolabeke avê mezin bû û jê bîhneke nexweş dihat, ber bi min kir û dîsan pal da.

Migo, xemxwiro, min hêdîka, mîna ko ez wi bilorînim, gotê, heyat, Migo, ji heyata ko em pê dizanin, kûrtir, firehtir û fetloketir e. Çaxa tu dil bikî wê biqulupînî ser riyeke rasterast, ser kaxizeke spî, ser gotinên basîd î hîç û pûç, tu dê şaşî bikî. Heyat ne bi tenê ev kevirên xirbe, ev dendikên xurmeyan, ev ava Dîcleyê ko em dibînin in, lê ba û dengên ko di nav van kevirên xirbe de digerin, reh û rêçên dara xurmê ko di kûrahiya axê de ne, pêl û tevgerên ko di binê ava Dîcleyê de têne pê û em nabînin, evana hemû jî perçeyên heyatê ne. Çaxa tu perçeyekî bihesibînî û yekî din nehesibînî, çaxa tu çavê min ê sax bibînî û yê ko bi derba şûr kor bûye nebînî, hingê tu dê çewtî bikî. Heyat mîrasa bav û kalan e, heyat yadîgara tarîx û wextan e. Û ji bîr meke, hevalê min ê xurmexwar, heyat, belayê serê me ye jî... ev xanî û avahiyên xirbe, birc û kelehên

hilweşiyayî, qesr û qonaxên şewitî, ax û erdê kizirî ko hemû felaket û mûsîbet, jan û êşa însan û însaniyetê bi bîra me tînin, evana jî aîdê heyatê ne. Jan û êş Migo, xizîn û keser... ev jî perçeyên heyatê ne, ev jî dibin ders û tecrube. Lê bi xêra gotin, stran û lorînê, Migo, hevalê min ê qûngeniyo...

Di êvareke, na ne êvar, di şeveke tarî û çikî sayî de, mîna komika keleşan ko hertim xwe dispartin reşahiya şevê, yan jî mîna heramiyên Bexdayê ko bi dizî diketin bajêr û jê derdiketin, kerwanê me jî welê kete Bexdayê, bajarê ko di xeweke kûr de bû. Dinya jixwe girtî bû û ji find û qendîlne qels ko li vir û li wir, di pencereyan re dixuyan, pê ve çu ronahî di bajarê ronî yê medeniyeta îslamiyetê de nîn bû. Bexda ko li milê rojavayê çemê Dîcleyê ava bûbû û xanî û taxên wî li gora tevgerên ava Dîcleyê hatibûn pê, kirasê xewê li xwe kiribû û ketibû nav şevek ji şevên Hezar û Şevekê yên keça narîn, xweşik û bîrbir Şehrezadê ko bi qesta çîrokên şevan û quweta gotina edebî, hêrs û şîdeta hukimdarekî, şev li pey şevê, haş dikir. Lê belê serekên dewr û dewrandîtî yên kerwanê ko em pê re bûn, dizanîbûn ka em ê bi kû de biçûna û kerwanê me, bêyî ko zêde deng derxe, di nav kuçe û kolanên teng re bûrî û xwe gîhande ber avahiyeke kevn û mezin ko jê re digotin Xana El Ortme. Xana El Ortma ko me dotira rojê, bi ronahiya çavan bedewî û xweşiyên wê dîtin, ez dikarim bibêjim, tevî jûrên razanê, banê spehî, aşxana fireh, mêvanxana bi kursiyên nizm ko bi benê kendirê ristî raxistî bûn, dîwana bi sedir û doşegên neqişandî lihevhatî, hewşa fireh a çarkoşe, eywana bilind û axurê bêser û ber, xana herî xweş, baş û kevn a hemû Mezopotamyayê bû.

Bexda bajarekî yekta yê Mezopotamyayê bû; bi avahiyên xwe yên spehî ko bi qermîtên şewitî lêbûbûn, bazarên xwe yên ko tê de ji şîrê şêr bigire heta hêkên teyrê simir, her tişt peyda dibû, xaniyên xwe yên basîd ko bi kerpîçê ava bûbûn; bi mizgeft û minareyên xwe yên ehlê misilmanên şafî, henifî û şiî, dêrên xwe yên filehan ên katolîk û ortadoks, hevriyên xwe yên cihûyên Mezopotamya Jêrîn û hemû navçeyê; bi taxên xwe yên misilmanan ko ji ereb, kurd, faris, tirk, çerkez, moxolî û afganiyan dihatine pê û taxên cihû û filehan ko ji ermen, keldan (aşûr, nastûr, suryan, yaqûbî jî tê de) û firengiyên Ewrûpayê ko li Bexdayê bi karê tîcaretê mijûl bûn an jî bi karê dewletên xwe radibûn; bi hewş û eywanên xwe yên gelekî bedew ko bi yên Mûsil, Diyarbekir û Cizîrê dişibiyan, qonaxên xwe yên hukimeta osmanî ko li kêleka çêm cîhen herî bedew vegirtibûn, şaneşînên xwe yên fireh û xweşik ên xaniyên giregirên Bexda, sefîr û kar-

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bidestên dewletên Ewrûpî û yên kumandar û paşayên osmanî ko li qiraxên çêm bûn û jê bergeheke rengîn, nemaze danê êvaran, berî ko tav here ava, dixuya, bêpayan bû. Li Bexdayê ko di dema xalîfeyê ebasî Harûn el Reşid de gihîştibû bilindahiyên dewlemendî û medeniyetê, her kes, her dîn, her ziman, her qewl, her derew, her lîstik, her bêbavî, her tişt hebû; dengê zimanên samî, arî, moxol û reşikan li bin guhê hev diket, cil û bergên xelkên cihê, bi hev re deryayeke rengan dianîn pê.

Jinên Bexdayê yên ji hemû miletan di nav çarşefên xwe yên reş û dirêj de, bi nêrîna çavên nazdar ên kilkirî, li kolanên teng û şaneşînên fireh, li keştî û qayikên bajêr, li mal û cîhên edebê, bi nazenîn û bi cîlwe arzûya bedena nerm derdixistin qata heftan a asimanan. Bi xêra Mam Sefo ko hema çi bigire me ji bîr kiribû, şûr simbêlên me nedibirî, mecîdiyên me yên giranbiha, zêrên me yên zer hebûn, zikê me têr, cil û bergên me nû, bêrîkên me tijî bûn. Em li xana El Ortmê diman, me arzûya xwe ya xort û har a bedenên nermik li mal û warên germ û musîkşînas, li nik hurmeyên porzer, porreş, çavşîn, çavbelek, zimanşêrîn û dengxweş ko bi ziman û awazên têkel stran digotin, hema çi bigire bêrawest, aş dikir û danê êvaran jî me qayikeke biçûk kirê dikir û li seranserê çêm, geh ber bi jor, geh ber bi jêr, li ser zimanê min gotin û stranên Cizîra Botan û êzidiyan, li ser zimanê Migo jî rêz û kelamên Tewrat û Încîlê, em derdiketin seyranê û ji çêm me bajar, gav bi gav, xanî bi xanî careke din dinasî.

Zivistana wê salê baş derbas bû, ne baraneke boş hat ne jî lehiyên ko diqulipîn ser felaketekê û bajar di bin avê de dihîştin, rabûbûn. Sûtal, tiral û pêxwasên Bexdayê ko mîna parsekên bajêr bêhejmar bûn, di wextê zivistanê de jî, bi qîreqîr xwe ji lengergehên xaniyên kêlekên çêm noqî avê dikirin û bi soberî ji milekî diçûn milê din. Aramiya dinyayê ji bo me jî fersend bû da ko em di riya xwe de biçûna.

Serê sibeyeke sayî û zelal, me hespên xwe yên esîl, têr û nûtimarkirî ji tawleyên xana qedîm a mêvanperwer derxistin, xurc û boxçikên xwe avêtin pişta hespan û ber bi Babîlê da rê. Du riyên çûyina Babîlê hebûn; ya yekê, însan dikarîbî bi siwarî, rasterast ji Bexdayê biçûya Babîlê ko ji Bexdayê ne zêde dûr bû; riya diduyan jî, însan dikarîbû peya yan siwar, ji Bexdayê biçûya bajarê Nasrahiyê ko li kêleka çemê Firatê bû û ji wir jî bi keştî daketa Babîlê. Me dil hebû xweha nazenîn a Dîcleyê Firat jî bidîta û rêwîtiyek, ne bi keştî, lê bi hespan, di kêleka wê re bianiya pê. Loma jî em pêşî çûn Nasrahiyê û me xwe gîhande çemê Firêt ko mîna çemê

Dîcleyê heyateke şên, geş û biber dibexşand navçeya stewr. Li wir, li ber devê Firatê jî em careke din têgihiştin ko kahniya hemû heyata Mezopotamyayê, reh û rêçên hemû medeniyet, ehl û qewmên ko hatibûn û çûbûn, ev herdu çem bûn. Bêyî Firat û Dîcleyê dê ne medeniyetekê bihata pê, ne jî mîraseke birûmet a însan û însaniyetê.

Bêyî ko em bilezînin, gav bi gav, qonax bi qonax, geh taştêyeke bi şîr û nanê hişk ê sêlê li ber konê bedewiyên koçer, geh firavîneke bi savar, sîrmast, humis û acûrên dagirtî, li mêvanxana gundekî kevnare yê ji wextên keldanan mayî, geh şîveke bi tîkegoştên xezalan tijî, li aşxana xaneke gemarî, di kêleka çemê Firatê re ko herdu milên wê tijî bax, bexçe, darên palmiye, xurme, qamîş û hêşinahî bûn, me nezîkî li welatê Babîlê kir û danê êvarekê ko asiman tijî ewrên spî û teyrên qulingan bûn, em gihîştin warê kahniya medeniyetên rojhilatê. Gava çavê min bi gir û bilindahiyên Babîlê ketin, dilê min pihêt hilavêt, mîna ko dewr û dewranek ko berî ziyareta me bi pênc-şeş hezar salan hatibû pê, ji nû ve vejiyabe û ew dewr û dewrana bihurî ji nû ve rabe govendeke ronî û şewqtijî, welê ji ber heyecana min ko min hew dizanîbû ka kefxweşî bû yan xemgînî bû, nefesa min çikiya. Hersê girên esasî yên Babîlê, girê Babîl, Qesir û Emranê, li wir, li ber me, mîna ko ew bang li me bikin, dixuyan. Me ji wan çîrok û meseleyên ko me xwendibû û bihîstibû, dizanîbû ko qesra qralê nemir ê Babîlê Nebûkadnezar ji wan giran bi qasî bîhnekê bi dûr bû; Qûleya Babîlê ko di Tewratê de çêl lê dibû û bûbû sebeba jihevketina qewm û zimanên însanan, li kêleka Firatê, nêzîkî girê Emranê bû; deriyên Xwedawenda babîliyan Îştarê ko bi bircên bilind ên kelehekê dişibiyan û bi neqiş û sûretên kolayî tijî bûn û di wextê xwe de tîmsala xurtî, dewlemendî û mezinahiyê bûn, li wir di nav xwelî, toz, ax, gêç û xîçikan de bû. Şêr û pilingên ko bi qasî zinarekî çiyayên Zagrosê mezin bûn û bi kevirên nehît ê bazal lêbûbûn û conega û firîşteyên ko di dîwarên qesr û qonaxan de hatibûn kolandin di navbera wan gir û bilindahiyan de bûn. Tarîxeke keserkûr, serpêhatiyên xwînxwar, qederên însanî yên tijî jan û xizîn, şer, êrîş û pevçûnên xedar, xwestek û mirazên zahf bilind, evîn û sewdayên kûr, hêrs, kîn û nefreteke bêpayan, rik û înadeke mîna pola, şûr, rim, tîr û xencerên xwînî yên tûj û jahrîn... ev hemû di nav wan gir û di bin wan qûm, xîç, qermît, kerpîç û keviran de veşartî bûn.

Migo jî, heke ne zêdeyî min bûya, bi qasî min, bi heyecan bû, li ser hespê xwe yê kumêt, hûrê wî daketî, gewdê xwe yê mezin dihejand, bi dîqet li kavilên Babîla şewitî dinihêrî û rêzên Tewratê ko çêla Babîle dikirin,



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mîna dînekî çolê ko ji nav xwelî û xîçikên Babîlê vejiyayî be, diqîriya;

Û ziman û gotina hemû cîhanê yek bû... û însanan got, em li cîhanê belav nebin, werin em ji xwe re bajarekî û qûleyekê ko serê wê digihîje asimanan ava bikin û ji bo xwe nav û şoretek li dar xînin... û Rebê Alemîn peya bû da ko bajar û qûleya ko benî ademan ava dikirin, bibîne û Reb got; hemû qewmekî ne û zimanê wan hemûyan yek e... lê werin, em peya bin û zimanê wan li wir tevîhev bikin da ko ew ji hevûdu fêm nekin. Û Rebê alemîn ew ji wir li seranserê cîhanê belav kirin û wan êdî dev ji avakirina bajêr berda; ji ber vê yekê navê bajêr bû Babîl...

Û Migo diqîriya; ba... ba... ba...

Heke mesele were ser tiredîniyê, bêguman, ez jî ne kêmî Migo bûm û lingên min pihêt li ser zengûyan, hevsar di destê min de, li ser hesp ez rabûm ser piyan û min serê hespê xwe yê qemer ber bi qiraxên çemê Firatê berda û ji Migo jî bêtir dest bi qîrînê kir;

Govend e, lo govend e... govenda ronahiyê ya Babîla kambax e... Stran e, lê stran e... strana welatê şêran e...

Bi qasî çend hefteyan, em li Babîl, gundên der û dorê û li kêleka çêm, ber bi milê jêr, heta cîhê ko Firat û Dîcleyê, ev herdu cêwiyên comerd û delal ên Mezopotamyayê, piştî hesreteke bêpayan a welat, dewlet, war û navçeyan, xwe digihandin hev geriyan û bi dû re jî, çaxa em têgihîştin ko dilê me êdî rehet e û deng û pejnên war û welatên ko me dîtine, dewr û dewranên ko me di dil û ruhê xwe de bihîstine, êdî di xewnên me de olan didin, hingê me gotina bav û kalan ko dibêje, kesê ne li ber çav e, ne li ber dil e, bi bîr anî û serê hespên xwe ber bi jor, ber war û welatê bav û kalan ko em jê dihatin, bada.

Lê roja dawîn, berî ko em, tevî çar-pênc alemanên navsere û alîm ko ketibûn pey çîrokên Tewratê û hatibûn Babîlê û bi zimanê fransizî ko Migo pê dizanîbû, hemû kitekitên Babîlê, bi nîşandana cîh û waran, ji me re gotibûn, herin gundê nêzîk û xwarina êvarê bixwin, li ser girê Babîlê, çavê me li dîwar, qûç û avahiyên xirbe, Migo, destekî wî li ser rîha wî, ji min pirsî,

Biro, aqilkêmo, aqilê te ji vê seyehata me ko ne şixulê aqilan bû, çi birî?

Min tavilê bersîv nedayê, qermîtekî sor ê şewitî yê xirbeyan di destê min de, min li tîrêjên ko di nav toz û gemara gir û avahiyan re li pişta dîwarên hilweşiyayî dixistin, dinihêrî. Li hinekî dûrî me jî ava çêm bi tîrêjên tava zivistanê diçirûsî û zilikên li ber devê avê bi bayekî sivik diliviyan û pelên zilikên xwe li ava çirûsî dixistin. Çend teyrên başoke yên

tiral, bi qîjeqîj di ser avê re û li ser serê me difiriyan, marîjok di nav keviran re çiv didan û kuliyên ko bi qasî tiliyekê mezin bûn, ji kevirekî ko bi tîna tavê û toza hezaran salan qulipîbû ser rengekî boz, dipekiyan ser kevirekî din. Ro diçû ava û dinya aram bû, mîna ko ew felaketên însanî ko car bi car qewimîbûn, li van deran nehatibin pê. Mîna ko ew bi tenê çîrok bûn, ne dengek, ne jî pêjnek, mîna ko her tişt, bi temamî her tişt li pey mabe, hawîrdor ewçend sakîn, zelal û bedew bû.

Migo, Xwedê ji te, ji bavê te û heft bav û bavikên te razî be, min piştî kêliyekê gotê. Bav û kalên me gotine, bipirse û netirse. Me jî pirs kir û bêtirs em ketin riyan û heta van deran hatin. Heke em nehatina, niha me dê ji kû bizanibûya ka rengê vî qermîtê destê min çi ye, çima ev teyrên başoke ko ez bawer im, ji hezar salan û vir ve her û her li asimanên welatê Babîlê ne û kuliyên reş ko di Tewratê de qala wan dibe, perçeyên heyata Babîlê ne.

Biro, dev ji van gotinan berde, Migo qermîtê destê min wergirt û li min vegerand, tu dîsan bi mebesta hin tiştan van gotinên şaşo-maşo dibêjî... Bibêje ka tu çi dibêjî.

Mebesta min, deng in, bavê mino, deng... dengê qermîtê, dengê başoke û kuliyan, mar û marîjokan, toz û xweliyan, kavil û xirbeyan... deng û zimanên Qûleya Babîlê, girên bêhejmar ên welatê aşûran, dengê saz û zilikên li ber devê ava Firatê, dengê şêr û pilingên keldanan... dengê şûr û mirtalên li ser bircên bajarê Babîlê, dengê şewat û hilweşîna qesr û qonaxên bajêr... Xwedê ji te razî be, Migo, te ez gîhandim van dengan... Em ji vê gera xwe çi hîn bûn? Em ê çi hîn bibin? Hê jê re wext divê Migo, hê zû ye... ew ê mîna tovê di dil û ruhê me de bikemilin, hêşîn werin, zîl bidin û paşê em ê bibêjin ka ev deng çi ne, yên kê ne, çi dibêjin û çêla çi dikin... Helbet mîna ders û tecrubeyan... û heye ko mîna gotinên stranekê...

Dengê strana Dîcleyê bêguman bêyî dengê çemê Fîratê, cêwiya Dîcleyê, nayê bihîstin. Herdu çem, herdu deng hevûdu temam dikin û jê dengekî tînin pê; dengê qedera Mezopotamyayê.

Mezopotamya me ez
Rehên min av û çem
Heyata min pevçûn, mijarên min xwîn
Lê zimanê min bedewî, gotina min ebedî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hertim, ji gotina her şaîr û waqanûserî bêtir
Wextek li ser lêvên Gilgameş, li qiraxên çemê qedîm
Di heşê Nemrûd
Di ruhê Yûnis
Di dilê Brahîm de, li welatê tofanê
Vekin rûpelên kitabên miqedes
Vekin deriyên ruh û dilê xelkê
Li wan deran im ez
Olana min li wir

Guh bidin min
Guh bidin axa min a bi tav û felaketê şewitî
Tov, zayîn, geşî, xweşî, arzû, evîn, hemû ez
Agir, şewat, hilweşîn, kirêtî, nefret, dijminahî hemû ez
Hemû di reh û rêçen min de, hemû di kûrahiyên axa şewitî de
Her tişt bi min dest pê dike, bi min vedimire

Roj hebû, hesreta min dilopeke baran
Rojeke hûnik, dengekî gur, awazeke zelal
Simbilên şox ên genim, ce, garis
Hesreta min dilopeke av li ser pelên darên tû
Darên palmiye, darên xurme bê ba, bê deng
Giya naçirûsin di nav kavilan de
Quling naxwînin, legleg bê hêlîn
Şev reş, roj cûn
Guh bidin qîrîna axa şewitî
Qîrîn, şewat mîna şûrê mirinê li ser sînga min daçiqî
Hemû rim, misas, şûr, xencer û tîr jengîn
Hemû di dilê min de
Û ez bêdeng, bêtirbe, bêkêl
Ka bexçeyên Semîramîs, baxên Sanherîb
Qesrên Sargon, kolanên Sardanapal, bircên Nabopolasar
Ka havîngehên Nabûkadnezar
Ka çem û bendên Îskender

Guh bidin axîna Firatê, hawara Dîcleyê
Ez, axîn im ez, hawar, hawar

Deng im ez, ji dewr û dewranan
Olan im ez, ji kavil û xirbeyan
Hêrsa axê, tola xwînê
Hukmê wextê, fermana heyamê
Navên do û îro me ez
Li welatê çiyan
Li welatê çolê û li welatê çeman
Bi kilama dengbêjan her û her dijî...



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## ŞEVBUHÊRK ÇAR

**ax**

Dengê min, yanî dengê Biroyê birîndar, xwediyê kevirê teyrê tawis û mêvanê kavilên Nînova, Aşûr û Babîlê, îşev jî, dîsan bi we re ye.

Êvareke nû, şeveke nû, şevbuhêrkeke nû.

Şevbuhêrka çendan? Ji şevbuhêrka me ya dawîn û vir ve çend şev bihurîn? Çend roj hatin û çûn? Çend darên bihîfan kulîlkên xwe yên gewher bişkovandin, çend darên hinaran bi kulîlkên xwe yên çik î sor xwe xemilandin? Dilê çend bêrîvanan bi çilka evînê hate hingavtin? Çend ciwanmêran ji bo çavên kilkirî, porê gulîkirî û bejna rihan stran û dîlan li hev anîn? De bêjin min, xortên çeleng, bêjin min ka ji şeva me ya dawîn û vir ve dil ji bo çi hildavêtine, ruh çi bihîstine, mêjî bîr bi çi birine... Hûn çi dikin, çi dijîn, çi dibêjin? Serê Cizîra Botan a xopan îro li ser çi balîfê ye? Xortên îro, de bêjin vî kalemêrê do ko êdî li ser riya çûyinê ye û gaveke din nêzîkî li xewa ebedî kiriye, ka îro çi ye, çawan e... Evîna îro çi ye, çawan e?

Dîsan êvar e, dîsan dinyaya westiyayî xwe xilmaş dike, dîsan ew ê bikeve xeweke kûr da ko dîsan di sibeheke zû ya ronî de, zînde û vejiyayî hişyar be. Hûn, guhdarên dengê min ko çêla wextekî çûyî dike, hûn, xortên heyama nû, niha, çaxa hawîrdor, her tişt xwe dispêre xewê, dîsan guh bidin dengan; guh bidin axîna bayê çiyayê Cûdiyê, dengê bilûra şivanên ko pezên xwe ji bo hevşiyê hingûran mexel kirine, dengê dengbêjên ko gotinên evîna germ û xort ko li qiraxên çemê Dîcleyê û li ser zozanên çiyayên Zagrosê têne pê, li hev tînin.

Çaxa dinya dikeve xew, çirûsk li asimanan vêdikevin, stêr bi sûzenî dixemilin û aramiyeke kûr ava çêm vedigire, hingê hûn hişyar bin, xortên qedirgir, hişyar bin û li dengan, li kitekitên dengan guhdarî bikin; di nav axîna bayê êvarê de îlahî, lavij û duayên tarîxeke kevnar a xwîntijî hene; di nav dengê bilûra şivanan de nefesa serpêhatiyên do yên kesertijî hene; di nav gotina dengbêjên îro de, bihîstiyariyên evînên do yên windabûyî hene.

Êvar tê, şev tê, şevbuhêrk tê. Ho xortên bîrbir, deriyên dilê xwe yên êvarê vekin, her celeb sistî, sûzenî û endîşeyê bidin alî û xwe bi dengan re bikin yek, bibin hevalbendên dengan, – dengên ko ji hevrêşim nermtir, ji şûr tûjtir, ji şîr şêrîntir, ji avê zelaltir, ji agir germtir in. Yanî dengê ba, bilûr, dengbêj, evîn û serpêhatiyên însanî.

Yanî dengê min ko hema çi bigire, însan dikare bibêje, yekîtiya hemû van dengan e.

Yanî dengê ko di roj û heyamên borî de hertim li pey xweserî û azadiyê bû. Azadî; gotineke gelekî dijwar û tijî tehlûke, gotineke nenas û xerîb. Ma ji bilî kesên mîna min û we, mîna Mam Sefo û Apê Xelef, mîna ew hemû kesên bêgav ên jibîrbûyî, kî ji gotina azadiyê hez dike? Nemaze di Mezopotamya xwînrêj û kambax a jêrîn û jorîn de, – ko qulipiye ser gorekê ko azadî tê de binax bûye, li ber dilê kê azadî û gotina azadiyê ezîz e? We jî bêguman hay jê heye; gotina azadiyê hesteke xurt li nik hewcedarên azadiyê ko lê xeyal dikin û xofeke kûr li nik têkbirên azadiyê ko pê qirfên xwe dikin, tîne pê. Azadî, ji bîr mekin, hertim azadî, li hember herikîna wextê, kesp û kospên heyamê, zor û zulma çerxa felekê, tevî her tiştî azadî; azadî, hûn bi tena serê xwe jî bimînin, di dawiyê de mirin û kuştin jî hebe, dîsan azadî. Azadî, çûyin û dîtin e; keşfkirin û nûkirin e. Gava hesteke xurt kete dilê we, arzûyeke bêpayan ruhê we vegirt û we xwe li tixûbên diyar û nediyar qeliband û mîna ko ew hîç nîn in, we ew gav kirin, hingê hûn gaveke din nêzîkî azadiyê ne. Hingê hûn ê pê bihesin ko bayê nerm ê azadiyê por, rû û bedena we difirkîne û dengê strana azadiyê, ne mîna marşeke eskerî ya osmanî û farisan ne jî mîna qîrîneke beredayî ya berdevkên axa û şêxên kurdan, lê mîna lorîneke pîrejinan, li ber guhê we dinihêje.

Mebesta min bi gotina azadiye ev e; ez û Migo ko ne bi tenê hezkar, lê tiredînên azadiyê bûn, me tixûb dabûn bin lingên xwe, ew gav kiribûn û gaveke din nêzîkî li azadiyê kiribû, bi dû re jî, dîsan di ser tixûban re, em vegeriyabûn welatê bav û kalan, ko çend sal bi dû hatina me re daxwaza azadiyê tê de bû bingor, belê em vegeriyabûn wî mekanê qedîm ko em niha jî lê ne û tû û mewîjê wî dixwin, ava wî vedixwin.

Niha, îşev, hûn ê li vegera me, bûyerên piştî gera azadiyê guhdarî bikin. Niha dîsan wextê gotinê ye; herwekî ko tîrêjên ronî yên spêdê zikê ava tarî ya çemê Dîcleyê diqelişîne û dirêjî kûrahiyên avê dike û avê diqulipîne ser kahniya ronahiyê, gotina vê şevbuhêrkê jî dê welê tariya şevê, bi dengên serpêhatiyan, biqulipîne kahniya dengên qederên însanî.

Gotin ê hawîrdor vegire, kelam ê hukim li wextê bike, heyat ê vejê û do dê li îro zêde be. Eve, arzûya min e. Yanî gotin, bi tenê gotin, gotina serpêhatiyan, qederan, hîsan, dengan... Xwîn germ dibe, reh diguvişin, mêjî dide pey wextên bihurî û dil li dengên windabûyî digere.

Û şevbuhêrk dibin ders, dibin tecrube, dibin guharê guhê we.

Dengên windabûyî yên do, pêr; yên salên bihurî, yên sedsalên çûyî. Hemû di mêjî û dil de li nik hev, li hev siwarbûyî. Dengek ji heyama me ya nû, berî niha bi salek-du salan, dengekî din ji zaroktiya min, yekî din ji dewrên berî niha bi çend sed salan, yekî din ji Babîl û Nînovayê, yek jî ji dema Nebî Nûh û Cûdiyê. Yek tê dinyê, yek dimire, yek di şahiyê de ye, yek di şînê de, li milekî keser û jan, li milekî şadî û kêfxweşî, rojekê kêf û henek, dotira rojê axîn û nalîn. Û dîsan û careke din... Di bîr û heş de hemû bi hev re, hemû dengên do jî, yên îro jî li nik hev, lê belê çaxa ew tên ser zimên, divê ew ji hevûdu veqetin, li gora rêzeke têkûz, pergaleke diyar bêne gotin, yek bi yek, kite bi kite li hev werin, mîna rengên neqaşekî bi hev re neqşekê bînin pê. Bîr û heş divê carina bi leza birûskê here dewr û dewranên herî kevn, carina jî bi gavên giran ên kûsiyekî di kolanên teng ên Cizîrê re, ber bi Cûdiyê derkeve seyranekê, carina tevî stranekê hilkişe gopikên çiyayên doralî, carina bi nefeseke dirêj noqî binî ava çemê Dîcleyê bibe. Xwediyê bîr û heş, yanî dengbêj, yanî guhdar divê hem di nav dewr û dewranan de bin, hem jî li derveyî wan bin, hem bi Cûdiyê re bin, hem jî bibin Cûdî, hem bi Dîcleyê re bin, hem jî bibin dengê strana Dîcleyê, hem bi tarîxê re bin, hem jî bibin tarîx.

Bîr û heş, lê ne bi tenê bîr û heş, herweha dil û ruh jî divê bi gotinê bawer be; bi ava çemê Dîcleyê, bi kevirê çiyayê Cûdiyê, bi pelê dara tûyê, bi tîrêjên tava Nînovayê, bi dilopa barana biharê, bi rondika çavê pîrejinekê, bi dilopa xwîdana cotkarekî û bi dengê misoger ê tarîxê bawer be.

Dengbêj divê bi axîna birîndarekî bawer be.

Çîrokbêj divê bi nêrîna şikestî ya bêgavekî bawer be.

Guhdar divê bi gotina edebî ya hûnandî bawer be.

Wext ê winda bibe, mîna vê qendîla ko li dîwêr ronahî direşîne ser odê, hêdî hêdî, vemire. Lê dengên têvel ên wextan, ji zozan û çiyan, ji dahl û daristanan, ji gund û bajaran, ji çem û giravan, ê werin û odeya me ya neçar tijî bikin. Her tişt ê winda bibe û here, bi tenê deng ê bimînin, ez ê bimînim û hûn, dil û ruhê heyamên nû dê bimînin. Ez ê bang li dengan bikim û ew ê ji tariya şevê, yek bi yek werin şevbuhêrka me ko wext, dewr û dewran li pey xwe hiştiye. Şixulê min ko min dil heye, sibêro bibe şix-

ulê we, bi tenê eve ye; bang li dengan kirin, wan li hev anîn û wan bi rêk û pêkî veguheztin. Bi tenê eve... ji bilî vê yekê ez bi kêrî çu tiştî nehatim û nema têm jî.

Berî niha bi kêliyekê, berî ko hûn werin, piştî ko birînên min derman bûn, min xwe da hev, kevirê xwe yê ezîz ê teyrê tawis xiste stûyê xwe, min rahişt herdu gopalan û derketim der, ber derî. Min dil hebû ko ez heta ber devê çêm biçûma, lê min nikarîbû. Ji lewre ez li ber derî, ji taqetê ketî, hûnikahiya bayekî sivik li ser rûye min, li piyan sekinîm û min li hawîrdor nihêrî. Ji axê bîhna biharê, tebiyeta nûvejiyayî dihat, hêşinahiyeke boş dinya vegirtibû, dar xemilîbûn, pelên darên bêhejmar ên tûyê ko min ewçend hez dikirin, mîna bûkeke xama û bedew xwe dilivandin, nêrgiz û sosinan serî hildabûn, lalezarên rengîn ji qiraxên çêm dirêjî lingên çiyan dikirin, binevşên sor di sînga axê de golên sor anîbûn pê. Ava Dîcleyê ya gur bi xuşînî, bi leylanên tîrêjên tava helesor çirûsî, diherikî. Cizîr, bajarê kevnare yê çemê Dîcleyê, bajarê ko bûye qedera me, li milê jor, bi qasî qonaxek, du qonaxan ji min bi dûr, mîna her carê ko ji pênc hezar salan û vir ve hertim dubare dibû, bi dengên rojane, rojeke din a heyata ebedî bi dawî danî. Keleha bajêr, qesra Mîr, Birca Belek, bax û bexçeyên Mîr li kêleka çêm ko li wir çiv dida, mîna zarokekî stûxwar ko bav û diya xwe winda kiriye, dixuyan. Li pey wan pira Dîcleyê ko herdu qiraxên çêm bi kemberên fireh û mezin digîhandin hev, mîna kevanekî vekişiyayî yê wextên aşûr û medan dixuya. Ji bilî çend ewrên spî ko li dûr, li doraliyên çiyan mîna pîneyekê rawestiyabûn, li asiman çu tevger nîn bû. Asiman ko bi rengê tava ko êdî diçû ava, qulipîbû ser mehfûreke sor a welatê Kirmanşahê, mîna ko wê jî hay ji şevbuhêrka me hebe, haziriya êvarê dikir. Ji doralî deng dihatin, tevî ko min nikarîbû ew ji hev bianîna der, dengên têkel ên bajarê ko dest bi êvareke nû dikir, digihîştin min. Ji bajêr, ji kêleka çêm, ji dahlên li ber qûntarên çiyan.

Deng, bîr û heş, Dîcle, Cizîr, salên ko li Cizîrê bihurîn... Û niha. Piştî umrekî peregende û şerpeze, heyateke derketî li vî welatî, li wî welatî, dîsan veger, dîsan bajarê lîstikên zaroktiyê, evînên destpêkê, gotinên xeşîm ên xortaniyê... Çemê min ê wan rojan, bajarê min ê wan salan... Li ber derî, nefesçikiyayî, xemgîr, birîndar û westiyayî, min dil kir ko ez jî, mîna wan teyrên ko di ser serê min re, ber bi zozanan difiriyan, bifirim û herim wan rojan, wan salan. Danê êvara îro ko yek ji danê êvarên min ên bihejmar ên vê heyata kambax in, heta heye ko danê êvara dawîn be, ji bo min çi îfade dike? Hema çi bigire çu tiştî; ez ne beg û paşa me ko hesabên


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rojên bê bikim û ne jî xwedî mal, milk û zarok im ko mîratekê bihêlim salên bê. Însanekî çavekî wî bi derba şûrê xwînrêjan kor, bêkes, tenê, sêwî, mirazqurmiçî, diranketî, rîberdayî, piştxûz û di ser de jî bi destê hevalekî xwe birîndar, birîndarekî li ber mirinê. Eve, ez im; eve, kurtebiriya umrê min e.

Ez; heyatek ko ne îro, lê di do de maye, umrek ko ne îro, lê ji do ve xelas bûye.

Niha, em vegerin ser heyata do, guhdarên bisebir ên îro, êvar tê û em dakevin kûrahiyên do û dengên xwe yên ezîz hişyar bikin, êvara tijî xem û xeyal bi qendîla gotinê ronî bikin, ronahiya qendîla gotinê bi ronahiya stêran ve bikin yek, perda tarî ya şevê ji xwe, ji gotina xwe, ji hawîrdor bi dûr xînin, xêrhatinî li geş û heyecana biharê bikin, sar û seqema zivistanê ko ez ê careke din nema bibînim û bijîm, bi germahiya gotinê, bi temamî têk bibin, xwe bigihînin bedenên nazik ko li hêviya hembêz, dest û tiliyên dilsoz û hurmetkar bûn, hinarikên nûbişkovî ko li hêviya ramûsaneke germ bûn, çavên evîndar ko li hêviya germahiya evînê û çilka merhametê bûn û xwe bigihînin nik wan însanên ko bêgav û bêçare mabûn. Em taceke narîn ko ji kulîlkên spi yên behîvan hatiye pê, deynin ser serê delaliyên xwe yên narîn, desteyeke gulên mihemedî deynin ber kêlên gorên însanên ketî û straneke geh geş, geh zîz bavêjin ser Dîcleya xopan ko hertim şahidî li her tiştî, her bûyerê dike.

Gelî xortan, zû kin, tasa min a zîvîn a avê tijî av û kodika min a darî a mewîjê tijî mewîj bikin û deynin kêleka min, çend cixare ji titûna Xursê bipêçin û tevî xwelîdankekê deynin ber min. Teyfikeke hêjîrên hişk ên çiyayê Şingalê jî ji bîr mekin, herwekî bav û kalan gotiye, hejîrên Çiyayê Şingalê bênavik in, xurmeyên Bexdayê bêdendik in... Xurmeyên Bexdayê ko min û Migo xwarin û min di şevbuhêrka çûyî de qalê kirin, hejîrên Şingalê ko min di zaroktiya xwe de dixwarin, anîn bîra min. Ez dixwazim îşev bibim zarok, kalê birînxedar ko hertim zarok bû, dîsan dixwaze li zaroktiya xwe vegere û îşev hejîrên wextên xwe yên zaroktiyê jî dixwaze...

De zûkin, ez pê dihesim, ko axa reş a abadîn ko hertim li pey herkesî, her celeb xebat û lebatê, her texlîd qîreqîr û xirecirê, dimîne, hertim bi mêvanperweriyeke bêpayan hembêza xwe ji herkesî re vedike, axa pîroz ko ez jê hatime û hertim qalê dikim, hembêza xwe ya pîroz û aram îcar ji bo min vekiriye û bangî min dike.

Dengê bajarê Cîzîrê, dengê Armê û Gulîzerê, dengê Mam Sefo di vegera me de, êdî ne mîna berê bi aheng û bi olan bû, ji bervajiyê deng zîz, sext û sûzen bûn, heta însan dikare bibêje ko deng ketibûn nav kûrahiya bêdengiyê.

Mîna niha tê bîra min, gava em gihîştin Cizîrê, êdî payîz bû û rojeke aram, zelal û bedew a payîzê diçû ava. Mîna îro, roja vegera me jî ava Dîcleyê dibiriqî û hîsên geş ên aramî û kêfxweşiyê dida însên. Herçî asiman bû, bi zelalî û spehîtiya xwe, mîna topeke nûrê, tîrêjên xwe yên ronî direşandin. Li dûr, li ber qûntarên çiyan, gir, dar û dahl di nav mijekê de bûn, lê belê mij mîna tûlekî tenik ê hevrêşimî dixuya, tûlekî nazik ko keçên xama yên hez û evînê xwe pê dipêçin. Mijê bi rengekî boz ê qurşûnî perde perde, geh ber bi jor, geh ber bi jêr, dar û dahl, kevir û zinar dipêçan.

Li ser wan hespên me yên wefakar ko me li Mûsilê ji wan dostên wefakar ên keldanan deyn kiribûn, tevî kerwanek tirkmenên elewî ko mal biribûn Basrayê, nik erebên şiî û ji wir vedigeriyan welatê xwe, Anatoliya Navîn, bîr û heşê me bi dîmenên Laliş, Mûsil, Nînova, Aşûr, Bexda, Babîl, Firat û Dîcleyê ve tijî, dilê me bi heyecana vegerê keldayî, di kêleka çemê Dîcleyê re, ko me hew diwêrîbû, em tê re derbas bûna, li ser lêvên min gotinên straneke tewş a coş û heyecanê, em ketin bajarê Cizirê. Min bi çavê xwe yê sax, bi hizir û dîqet, tevî Migo, di pêşiya kerwên de, li doralî fekir. Bajar li ber me bû; xaniyên nizm ko bi kevirên volkanîk ên çiyayê Cûdiyê lêbûbûn, mîna neferên ordiyeke şikestî, peregende û stûxwar dixuyan; çem di kêleka bajêr re, li herdu milên wî darên tû, çinar, bî û spîndar, mîna marekî ko li nêçîra xwe dipiçike, welê bi fetloke diherikî, minareyên dirêj ên mizgeftan ko bi kevirên reş lêbûbûn, ber bi asimên bilind dibûn, keleh û qesir li ser girê kêleka çêm, mîna nikulê qertelekî, xwe dirêjî avê dikir, çiya, zinar, kendal li milê çepê bajêr bêtevger, sakîn, lê mîna ko ew li hêviya tevgerekê bin, maxrûr radiwestîn. Bergeheke têkuz ko hîç tiştekî wê ne kêm bû, mîna neqşên têkel ko bi hev re xalîçeyekê tînin pê, li ber me raxistî bû.

Gava bergeha tekûz, bi reng û şêweyên xwe yên têkel, li ber min rabû govendê, hingê ne bi tenê dilê min bi heyecan hilavêt, herweha çavê min ê kor jî dîsan êşiya. Her cara ko êş dikete çavê min ê kor, min bîr dibir ko hingê daxwaz û arzûyên nû yan jî hîs û bihîstiyariyên nû, nasîn û pêwendiyên nû yan jî bûyer û serpêhatiyên nû li rê bûn. Carina yên baş, çê û dilşa, carina yên nebaş, kirêt û felaketan. Ez niha »carina çê, carina


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

neçê« dibejim, lê belê piraniya caran, hema çi bigire hemû caran, ên neçê diqewimîn. Di heyateke bêgav û bindest de kengî bûyerên çê diqewimin?

Lê îcar, di vegera me de, min ê çi bidîta, çi dê biqewimiya? Danê êvarê yê wê roja payîzê ko ewçend aram û zelal bû, bergeha bedew a wê rojê ko ewçend delal bû, bi tenê hîsên germ ên sikûnet, aştî û hizûrê didan însên. Em ji deverên ko bi hezaran salan ji sikûnet, aşti û hizûrê bi dûr bûn û bi tofanên mezin ên însanî hilweşiyabûn, dihatin û bi rastî jî me hewcedarî bi sikûnet, aştî û hizûrê hebû.

Çaxa kerwan ber bi xana bajêr a taxa Medresa Sor ko bi xanên bajarên Musil û Bexdayê dişibiya çû, me ji tirkmenên nefsbiçûk û dilsoz xatir xwest û em raste rast çûn malê, mala Migo wan, mala Mam Sefo, Armê û diya wê, mala ko min bêrî lê kiribû û hema çi bigire êdî mala min bû jî. Haya kesî ji hatina me nîn bû, heye ko wan em ji bîr jî kiribûn, herwekî ko keldanan gotibû, gava çav çavan nebîne, çav çavan ji bîr dike... Berî ko em bigihên malê, li ber dîwarên der ên hewşa fireh a malê, em ji hespan peya bûn û hefsarên hespan di destê me de, bi hêdîka em daketin hewşê. Hem ji qata jêr, ji aliyê mitbexê, hem ji qata jor, ji du jûran ronahiya çireyên pêxistî dixuyan û ji banê xênî, ji dûkêşê dûman bilind dibû. Malê jî, mîna bajêr, haziriya êvarê dikir. Piştî ko me hesp li bexçe girêdan, mîna dizên şevê, bêdeng, em ketin hundir, milê mitbaxê. Ji hemû malê bîhneke xweş û germ a xwarin, şîv û biharatan difûriya. Sê qewraş li mitbaxê bi haziriyên êvarê, şîv û xwarinê mijûl bûn. Gava çavê wan bi me ket, pêşî ew veciniqîn, paşê jî, çaxa wan em nasîn, qîrîniyek ko ez bawer im, ji kêfxweşî û heyretê dihate pê, bi wan ket. Bi qîrîna wan an jî em bibêjin, bi hatina me, sikûneta malê ko perçeyekî sikûneta danê êvarê yê bajêr bû, yekcar têk çû û teşqeleyeke biçûk û xweşik bi malê ket. Keyayê rîhspî û kal ê Mam Sefo ko ermenekî welatê Wanê bû û hingê li malê dima, qewraşên din ên malê jî hatin mitbaxê, lê herçî Mam Sefo, Armê û diya wê bûn, ew nedixuyan. Min bi dengekî nizm ji qewraşekê pirsî ka ew li kû bûn.

Mamo ne li malê ye, qewraş gote min û mîna ko min tiştekî nexweş pê kiribe, bi awireke tûj li min fekir û domand, herçî diya Armê û Migo ye, ew gelekî nexweş e. Û ez bêjim te, herçî Armê ye, ew ji te xeyidî ye, ez bawer im, ji lewre ew danakeve jêr.

Min dengê xwe nekir, mesele diyar bû. Lê gava Migo bihîst ko diya wî gelekî nexweş e, tafilê, bi axîneke kûr û bi gavên welê sivik ko kesî jê nedipa, ew hilkişiya jor, qata diduyan, nik diya xwe. Em gihîştibûn Cizîrê, êdî

çu lez û beza min nîn bû, min hêdîka girêka sist a doxîna xwe şidand, piş-ta min li keçan, gunikên xwe hinekî mist dan, li mitbaxê li ser sedirê kêle-ka pencerê rûniştim û min hem li keçên xama ko mîna simoreyekê bi çapikî di mitbaxê de dipengizîn nihêrî û hem jî xwarinên ko wan pey-derpey di nav teyfikên biçûk de danîn ber min, mîna ko ez ji xelayê der-ketibim, avêtin devê xwe. Hal, xatir, pirs, gotin li pey hev dihatin. Keya û keçan her tişt meraq dikirin û gotin ji devê hev direvandin. Min jî bi kêf û henek, bêyî ko ez bilezînim, bersîva wan dida.

Rêwîtiya li ser hespê ko ji Mûsilê heta Cizîrê hatibû pê, ez ji hev xistibûm; pişta min, stûyê min bûbû mîna minareya mizgefta Nebî Nûh yê qehîm, min nikaribû ew bilivandina. Hêt, qorik û qarçika min welê jan dikir ko qûna min li ser doşega nermik a sedirê jî nedihewiya. Herçî lingên min ên dirêj ko hertim di nav zengoyan de bûn, bûbûn mîna misas. Min ji dîlberên simore ko li min dinihêrîn û bi şermokî dikeniyan, tika kir ko ew legenekê tijî ava germ bikin û bînin da ko ez lingên xwe têx-imê û – heke cenabê wan jî dil bike – qahweyekê bidin min...

Piştî çendekê, ez nizanim ka çiqas, Migo bi rûyekî mirûz û xemgîn dakete jêr, serê wî li ber wî, bi gavên giran, hate nik min û bêyî ko li min feke, gote min,

Dadê te dixwaze.

Bi hatina Migo her tişt rawesta, gotin, henek, xwarin, cilweyên keçan, her tişt. Min bêdeng lingên xwe ko hinekî nerm bûbûn, ji avê derxistin, ew zuha kirin, ji cîhê xwe rabûm, min cil û bergên xwe hinekî dan hev, mîna Migo, bêyî ko ez tiştekî bibêjim, tevî Migo, bi gavên giran, xwasî, hilkişiyam jor, warê terbiya dil û ruhê min. Çaxa çavê qerweşa ko li ber deriyê Senemxanê rawestiyabû, bi me ket, wê tiliya xwe bir ber pozê xwe û xwest ko em bêdeng bin. Em, Migo li pêşî, ez li pey wî, ketin hundir, mezelê diya Migo û Armê ko jê bîhneke giran a derman û ritûbetê dihat. Mezela bêhewa loş bû, li kêleka textê razanê, li herdu milan du find vêketîbûn, li ser refê kêleka text jî qendîleke ko agirê wî xwe li ba dikir, ronahiyeke zirav direşand ser textê razanê. Mayrîga qedirbilind ko çavên wê girtî bûn, mîna her carê di nav nivînên paqij ên spî de razayî bû, lê belê îcar ji her carê bêtir jar û bêhal dixuya. Li herdu milên wê jî du kes hebûn; li milê rastê, Armê, xwediya lîstikên me yên zêrzemînan ko nehatibû jêr, li kêleka diya xwe, destê Mayrîgê di destê wê de, li ser kursiyekî nizm rûniştibû. Li milê çepê jî qewraşeke qut û gulover li pê radiwestiya.

Armê di binî re, bi nêrîneke zîz û sîtemkar ko hem ji xem û keserê hem

ji xeyd û nazê dihate pê, bi qasî kêliyekê li me nihêrî û paşê dîsan çavê xwe ji me da alî û li diya xwe nihêrî. Fîstanekî dirêj ê tarî lê bû, rûyê wê ko gelekî bi rûyê Mayrîgê dişibiya, niha dirêjtir dixuya. Porê wê kintir, çavên wê biçûktir û stûyê wê ziravtir bû. Çaxa çavê min pê ket, germahiyekê ko min nizanîbû ka çi bû, bi ser min de hat. Ez hêdîka çûm kêleka wê û min bêdeng destê xwe dirêjî wê kir. Wê jî, bêgav, destê xwe yê rastê da min. Min bi herdu destan destê wê xiste nava kefên destê xwe û ew hinekî mist da. Gava çavên me, bi nêrîneke germ, gihîştine hev, wê bi qasî bîstekê, bi balkêşî li min nihêrî û dest bi girî kir. Rewş ne çu rewş bû, min destên xwe jê kêşandin, ez zivirîm ser diya wê û bi dengekî nerm min gotê,

Mayrîg, ez hatime, Biro...

Mayrîgê ko hêdîka nefes digirt û dida, bi zehmetî, çavê xwe vekir û li min nihêrî. Piştî ko wê fêm kir ka ez kî me, bi kenekî nerm, li min nihêrî. Lêvên wê jî liviyan, lê ji lêvan çu deng derneketin. Paşê çavên wê dîsan hatin girtin. Xaça wê ya spehî û Încîla Îsa Mesîh ko ez welê bawer im, di hemû heyata wê ya nexweş de mîna dermanekî sikûneta manewî bûn, dîsan li ber serê wê bûn.

Mayrîg, dîsan min gotê, ez, Biro... Mozîk...

Di wan salên min ên zaroktiyê de ko min hê hay ji çerxa felekê nîn bû, ji ber dînîtî û teşqeleyên min ên bêrawest, Mayrîgê ko hingê li ser piyan bû û dikarîbu bikeniya, navê mozîk ko ne ga ye, ne jî conega, lê xwe di ser hemûyan re dibîne, li min kiribû. Da ko ez bikaribim hewaya ziz a mezêl hinekî biguherînim, min dil kir, navê mozîk bi bîra wê bînim. Lê belê jê çu bersîv an tevger nehat. Dewsa wê, Migo ko êdî bi qasî bergirekî girs bû, bersîv da,

Mozîk!.. Tu û mozik... mozîkê ko êdî ne bi tenê ji conegayekî herweha ji gayekî jî mezintir e!..

Bi qasî çendekê ez li mezêl, li ber serê Mayrîgê rawestam, lê paşê, hêdîka, ez ji mezêl derketim û bi gavên giran çûm kitabxanê, warê ko hertim, mîna siya min bi min re bû û rê şanî min dida. Kitabxane tarî û hewayê wê giran bû. Ez rasterast çûm û min deriyê şaneşînê vekir, hewayeke paqij ê êvaran, tevî ronahiyeke qels a stêrên qels ên destpêka êvarê rijiyan hundir. Dengê Dîcleyê û dengê bilûrekê ji nêzîk ve, dengên têkel ên bajêr ji dûr ve dihatin. Piştî ko min qendîl vêxistin, yek di destê min de, ez di nav kitabxanê de, gav bi gav çerx bûm; ref, kitab, mase, kaxiz, pênûs û kitabên li ser masê, dîwan, kursî, lewheyên dîwaran, xalîçe û mehfûrên erdê, her tişt li cîhê xwe yê berê bûn, – bêguman ji bilî wan nexşe û

kitabên ko min û Migo bi xwe re birûbûn û di ava çemê Dîcleyê de gêr kiribûn. Ez çûm ber lewheya teyrê tawis û destê min li ser kevirê teyrê tawis ko li stûyê min bû, lê nihêrî. Teyrê tawis... melekê tawis... teyrê ko di destpêkê de cîhan li ser baskên xwe gerandibû... melekê ko însên ji kirêtî û xirabiyê diparast. Çiyayê Şingalê, Laliş, êzidiyên geliyê Lalişê, şêx, feqîr, qewal... hemû hatin bîra min.

Kitabên Naso, Keso, Maro? Ez çûm ber refên ko ew kitab lê bûn, ew jî li ser refan, li kêleka hev rêzkirî bûn. Min rahiştt kitaba Keso da ko wê rûpelê ko tê de dîmenê çêm hebû, vekim. Gava min rûpel vekir, kulîlkeke beybûnê ya hişkbûyî jê ket.

Beybûna min, bi keserekê, min gote û min rahişt wê û min ew ji erdê rakir. Min beybûna ko êdî bi bîhna ax û giya nedifûriya, berî çend salan, xistibû nav wan herdu rûpelan û welê dixuya ko ji wê rojê û pê ve kesî rûyê kitêbê venekiribû.

Bi ronahiya qendîlê min ji nêzîk ve, bi dîqet, careke din, li rûpelê kitabê û dîmên, çemê har, însanên tirsiyayî, keleka ko diqulipî, nihêrî.

Keso, min dengê xwe bilind kir û got, Mam Keso... min jî ev dever hemû dîtin, ez jî bûm şirîkê qedera te û hevalên te, keleka me jî weha qulipî, em jî weha qîriyan... dinya bi dor e, Mam Keso, ne bi zor e. Piştî te bi qasî du hezar û sê sed-çar sed salan, ez jî çûm wan deveran û min şaşmayî dît ko ew dever her mîna xwe ne, mîna ko te ew li pey xwe hîştibûn.

Min ê gotina xwe hîn jî dirêjtir bikira û ji rûpelê vekirî ya kitabê re qala rêwîtiya xwe û tecrubeyên xwe jî bikira, lê bi dengekî tîz ez li xwe warqilîm.

Te kê li pey xwe hişt, belqityo, tiredîno!

Armê bû.

Armê, min gotê û ber bi wê ko li ber derî rawestabû, çûm, Arme, canê, tu neheq î.

Ez neheq im, wê got û xwe da alî, tu biheq, ez neheq! Ev bûn çend sal ko tu weha winda bûyî û çûyî?

Ez hertim li te difikirîm, min, qendîl di destê min de, li kêleka wê rawestiyam û gotê...

Derew... hosteyê derewan... şixulê te jixwe hertim derew e.

Na, bi serê te be, bi serê Mayrîgê be, na.

Çi na? Tu dixwazî çi bibêjî, sextekar?

Te çima mûyên xwe hilnekirine? Min gotê, da ko ez bikaribim meselê biguherînim û hêrsa we daxim. Mûyên pî û çîpên wê di ronahiya qendîlê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

de, li ser beden û laşê wê yê spî reş dikirin. Bîhneke ko bi bîhna miskê dişibiya, jê dihat. Bejna wê zirav, memikên wê biçûk, hêtên wê teng, çîpên wê sist bûn, lê tiştekî ko min jê fahm nedikir, xweşikî û bedewiyeke taybetî didayê û kela min a hez û hezkirinê radikir.

Na axpara min, na... min bi ken gotê û gotina axparê ko bi zimanê ermenî dihate maneya xweşikê, lê zêde kir û ji nişka ve, bi destê xwe yê serbest min ew hembêz kir û stûyê wê yê zirav maç kir.

Serserî, wê gote û xwe vekişand, çavê te yê din ê jî, ji ber van derew û lîstikên te, kor be... tu dê bibînî, tu dê ji herdu çavan jî bibî, koro!

Belê, koro...

Ev dengê nû jî, yê Migo bû, ew jî hatibû kitabxanê.

Koro, bavo xeber şandiye, Migo domand, ew li nik Mîr e, piştî ko şixulê wî temam be, ew ê were, divê tu bi cîhekî de neçî. Paşê wî xweha xwe jî hilda û vegeriya mezelê Mayrîgê û ez dîsan li kitabxanê bi tenê mam. Ez westiyayî û sersem bûm, ji cîhanekê ko ji rêwîtî, geşt û gerê hatibû pê, dihatim û diketim nav cîhaneke nas ko ji derd, keser, nexweşî û bêgaviyên rojane dihate pê. Lê min taqet nîn bû ko ez li tiştekî bifikiriyama. Min dîwana ko li koşê bû, kêşand û anî ber maseyê, du qendîl danîn ser masê, li dîwanê pal da û peregende li rûpelên kitaba Keso û dîmenên di nav rûpelan de fekir û welê di xew re çûm.

Gava ez bi dengê qert ê Mam Sefo hişyar bûm, êdî berbangê lêdabû û dinya ronî bûbû. Ez qerisîbûm, min deriyê şaneşînê vekirî hîştibû, çu tişt navêtibû ser xwe û welê di dîwana teng de, çogên min di ber zikê min de, nivîstibûm.

Biro, kurê min...

Mam Sefo, Migo, keyayê Mam li ber serê min rawestiyabûn û bi ken li min dinihêrîn. Dengê Mam Sefo yê toq mîna lorîneke bû; rûyê wî yê biken, rawesta wî ya maxrûr, bedena wî ya girs, simbêlên wî yên boq, zimanê wî yê şêrîn, gotinên wî yên balkêş... belê min bêrî li Mam kiribû. Min xwe da hev û ez çûm destê wî, lê wî ez hembêz kirim û ji eniya min ramûsa.

Hingê ez giriyam.

Piştî ko ez çûm avdestxanê, bi qasî çendeke dirêj min mîz kir û bi dû re dest û rûyê xwe şuşt, ez çûm mitbaxê, nik Mam. Taştê hazir bû, çend celeb penêr, şîr, mast, nanê germ ê sêlê, hêk, to, nivîşk, çend celeb sebzeyên teze... her tiştê ko diviya li mala Mam Sefo hebûya, li ber me bû. Mam, Migo, keya û ez, em li sifrê rûniştin. Ez gelekî birçî bûm, bi rûnişt-

inê min mîna gurekî birçi dest bi xwarinê kir.

Bixwe kurê min, Mam Sefo gote min û teyfikine tijî ber bi min kir, kurê min, eve penêrê pûngê ji deverên Hekaran e, eve penêrê sîrik ji deverên Wanê ye, bixwe...

Min ji Mam Sefo hez dikir, min ji penêrên sîrik û pûngê û ji spêdên ronî yên Cizîrê hez dikir... Nefes li min çikiyayî, gepeke mezin di devê min de, biken, min li Mam Sefo nihêrî; eve însanê bejndirêj, lê ne mîna misas, ez hingê fikirîm, bejn û balxweşik, lê ne mîna şitil, ji bervajiyê xanima xwe, zînde, hem bi beden hem bi heş û mêjî, sakîn, bîrbir. Bedeneke xurt, tendirustiyeke têkûz, mil, pî û lingên ko di dahl û deviyan, di çiya û zozanan de bûne mîna pola, bihîstiyariyeke nazik, salên bajarên mezin ên welatên Rom û Frengan ko dewlemendiyeke bêpayan daye heyata wî ya rojhilat. Xwediyê kitabxana yekta ya welatê Botanê, siwarê hespên kihêl, xwediyê şûr û xencerên duban ko ji polayê nêrz çêbûbûn... Pispor, aqilmend. Comerd. Ciwanmêrekî balkêş, mîna lehengekî ko ji dewr û dewranên Babîl û Nînovayê maye...

Hingê, di wê berbanga sibê de ez têgihîştim ko min Mam Sefo ne bi tenê mîna mamekî yan jî zirbavekî, lê herweha mîna tîmsala heyata xwe jî hilbijartibû. Di heyatê de, hertim, herkes hin kes û tiştan ji bo xwe û heyata xwe tîmsal hildibijêrin. Min jî ev zilamê hanê ko bi qasî maxruriya xwe, bi nefsbiçûkiya xwe, bi qasî dengê xwe yê toq û tevgerên xwe yên xurt bi ziravbihîstiyariya xwe jî nas bû, hilbijartibû.

Mam Sefo ko gelekî westiyayî û bi endîşe dixuya, nû ji qesra Mîr hatibû. Me hersiyan jî dil dikir ko ew here û binive, lê ew neçû. Ewî rêwîtiya me meraq dikir û her tişt, kite bi kite dipirsî. Taştêya me ya dewlemend gihîşte nîvroyan û piştî firavînê ko me li mitbaxê xwar û keya ji bo gerandina şixuline malê çû bajêr, em jî hilkişiyan jor, kitabxanê. Bi qasî çendekê Mam çû nik xanima xwe, lê ji bilî wê, em danê êvarê jî, li kitabxanê her axivîn. Danê êvarê, çaxa tîrêjên tavê mîna mirtalan xwe dirêjî hundir kirin û li hundir huzmeyeke zêrîn anîn pê, hingê Mam Sefo bi destê min û Migo girt, em birin şaneşînê û piştî ko em li ser kursiyên nizm rûniştin, gote min û Migo,

Xortno, niha li min guhdarî bikin. Hûn çûn, we gelek tişt dîtin, ders û tecrubeyên nû li umrê xwe zêde kirin û hûn vegeriyan nav refê xwe. Destûra min a heyatê ev gotina hanê ya bav û kalan e; kew qenc e, bi refê xwe re... û herçî refê me ye, ewrên reş doralî lê girtine, êvar daketiye û herwekî ko hûn jî pê dizanin, şeva tarî ji êvarê kifş e. Ne bi tenê mîrekiya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Cizîra Botanê, herweha hemû welat ber bi geremoleke kûr ko dê her tiştî daqultîne û şewateke xedar ko ter û şîl tevde dê tê de bişewitin, dere. Şeva tarî, diz bi hezarî, xortino, gotina min eve ye ko hûn divê bi tevdîr bin...

Piştî van gotinên ko tiştekî zêde jê fêm nedibûn, Mam Sefo bîhnek veda, agirê qelûna xwe nû kir, bi qasî bîstekê li çêm nihêrî û paşê li me, bi dîqet nihêrî û domand,

Dewleta Osmanî gav bi gav dorê li mîrekiyan teng dike, paşayên Diyarbekir, Bexda, Mûsil û Sîwasê tixûbên hukimdariya xwe firehtir dikin, fesad û sîxur di nav eşîr, ehl, terîqet û navçeyên welêt de, bi dizî, digerin, pisepisê dikin, derew û fîtneyan belav dikin. Misilman, file, cihû ji hevûdu bi dûr dikevin, qise û gotinên nexweş di navbera wan de derin û tên. Û navenda van hemû tiştan jî bajarê Cizîrê û mîrekiya Cizîra Botanê ye. Bajarê Cizîrê, Mîrê Botan û mîrekiya Cizîra Botanê bûye stirî û ketiye çavê herkesî. Heke Mîr aştiyek di navbera eşîr, navçe û ehlê welêt de neaniya pê, rewşa xelkê baş nekira, ber bi yekîtiyeke têkûz gav navêta, hingê wî dê ewçend bal nekişanda... Her roj qasid û xeberguhêz derin û tên, niwênerên dewleta Osmanî, dewleta Farsî, dewletên Ewrûpî derin û tên. Em, Mîr û hevalên wî her roj dicivin û heta sibehan li ser vê çûyina kirêt dipeyivin... Rewş ne baş e, xortino, ehlê me nezan, eşîrên me hov, rêberên me yên cimetan serhişk in. Însanên me ne bi zanînê, lê bi şûr û tivingên xwe bawer dikin û şûr û tiving ko eve çendek e jengîn in, dikarin ji nû ve ji kalanan bikêşin û biteqin. Û ji bîr mekin, dengê şûr û tivingan li her derê, hertim dengê edalet, wîcdan û merhemetê dikuje. Îhtimaleke mezin e ko xwîn birêje û gava xwîn rijiya, êdî çu kes nikare rê lê bigire. Hingê daxwaza tolê ko ji hezaran salan û vir ve kahniya herî xedar a mûsîbet û felaketên hemû Mezopotamyayê ye, dê dîsan vejê. Tol ê serî hilde, însan ê ji tolê medet bipên, dîsan bi tolê bawer bin, tol ê mîna nexweşiyeke xedar hemû welêt vegire, kur ê bibe dijminê bav, xwarzî xal, birazî mam. Ji lewre xortno, divê hûn di her hal û mercê de bizanibin ka serê we li ser kîjan balîfê ye û hûn ê çi bikin û heyata xwe çawan bi rê xînin...

Dengê xwarzî û biraziyan ko Mam Sefo qal dikir, min di êrîşa kambax a ordiya osmaniyan de ko li dijî keleha Seîd Begê bû, matmayî, bi hawar û olan bihîst. Herwekî ko bav û kalan gotiye, mûsîbetek ji hezar nesîhetê çetir e, min jî bi mûsîbeta vegirtina keleha Seîd Begê dît ko kîn, rik û tola axa Mezopotamyayê, belayê serê Mezopotamyayê ye û ne kesekî din lê rik û kîna însanên Mezopotamyayê însanên vî welatê mibarek têk

dane û hê jî têk didin.

Çîroka malbata Mîr û ehlên wî gelekî dirêj e û mîna her çîroka ko bi tenê bi xurafe û rîwayetan tê vegotin û vediguheze nifşên nû, tê de rastî û şaşî di nava hev de ne. Tê de çi rast e, çi nerast e, çi hatiye pê, çi lê zêde bûye, însan nizane. Û herweha dîsan mîna hemû çirokên ko berdevkiya hukimdaran dikin û tê de hertim valahî, sir û cîhên veşartî hene, li gora daxwaza dilê kesê li ser hukim e, tê hûnandin. Binemala Mîr gelekî kevnare û tevîhev, gelekî gumreh û mîna dareke qedîm a tûyê stûr bû, – ko çu kes nikare hemû bav û bavikên wê bihijmêre. Mil û şaxên malbatê digihîştin hemû welatên jêr û jor ên Mezopotamyayê. Herçiqasî mezinên malbatê dil bikin ko reh û rêçên xwe geh bigihînin malbata Mihemed Pêxember, geh Xalidê bîn Welîd, geh Selahedînê Eyubî jî, herkes van gotinên hanê mîna rîwayetek ji rîwayetên hûnandina çîrokeke serfiraz a neqişandî dibînin. Lê belê heke ne weha be jî, ji malbatê re »ezîzî« hatiye gotin û hema çi bigire hemû însanên malbatê, hema çi bigire hertim sofî bûne. Gerçî Mîrê ko hertim di destan de tizbiyeke dirêj hebû, bi ayet, dua, rîwayet û gotinan bawer bû û di dawiya umre xwe de, çaxa wî êdî her tişt, mîrîtî, mîrekî, welat, mal, malbat, dost, ehl winda kirin, li welatê xerîbiyê, xwe bi temamî spart ayet û duayan, di eslê xwe de, ne ewçend dîndar bû, lê ji malbatê gelekî dîndar, alîm, şêx û meleyên navdar derketine. Jixwe ji navê bav û kalên Mîr ji dîndariya malbatê diyar dibe; Şeref Xan, Mihemed Xan, Mansûr Xan, Smaîl Xan, Mistefa Xan, Evdal Xan û herweha...

Li gora rîwayetên ko ji devekî veguheziyaye devekî din û ji wir jî devekî din, piştî ko bavê Mîr, Mîr Evdila wefat dike, pismamê Mîr, Seyfedîn Beg tê ser hukim, lê ew nikare şixulên mîrekiyê bi rêk û pêk bimeşîne, ji lewre jî malbat wî ji mîrîtiyê bi dûr dixîne û birayê mezin ê Mîr, Salih Beg dikeve dewsa wî. Lê ji ber ko Salih Beg ko min jî nas dikir, gelekî dîndar bû, wî jî cihê xwe da birayê xwe yê kicik Mîr Bedirxan. Lê belê tevî ko şixulên mîrekiyê weha dimeşiyan, hertim di navbera bav û bavikên malbatê de berberî û dexesî hebûn û çavê herkesî li mîrîtiyê bû. Belê, tevî ko kirasê hukimdariyê pirî caran dibe kefenekî tijî xwîn, herkes li pey wî kirasî ye û ji bo kirasê hukimdariyê berberiyeke kûr hertim di navbera mala Mîr û pismamê wî mala Seyfedîn Begê de hebû.

Heke em niha vegerin ser çîroka xwe û Seîd Begê, divê hûn, berî her tiştî bi vê yekê bizanibin; Seîd Beg ko yek ji begên herî berbiçav ê welatê Cizîra Botanê bû, pismamê Mîr û xalê hevalê me Yezdînşêr bû. Ne bi


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

tenê evçend, lê belê ji bo ko hûn bêbextî, dijminahî û kambaxiya heyata me ko bi bêgavî û peregendehî derbas bû, baş têbigihên, dive hûn vê yekê jî bizanibin; Yezdînşêr ko hevalê min, Migo, Heme û Têlî bû, kurê Seyfedîn Begê ko ji hukimdariya mîrekiya Cizîra Botanê hatibû bi dûr xistin, bû. Tevî ko bav û kalên Mîr û Seîd Begê welatê Cizîra Botanê di navbera xwe de parve kiribûn da ko şer û berberî çênebin, hertim heke şer nebe jî, berberiyeke pirî caran nevekirî hebû. Mîr û bavê Yezdînşêr Seyfedîn Beg pismamên hevûdu bûn. Yezdînşêr û kurê Mîr Têlî yê ji herdu çavan kor ko herdu jî hevalên min bûn, pismamên hevûdu bûn. Yanî xwarzan xal rakiribûn, birazan mam winda kiribûn û heyata însanan û herweha tarîxa mîrekiyekê û heye ko tarîxa welatekî jî di navbera mam û birazî, pismam û xwarziyan de ber bi felaketan gêr dibû.

Min tovên vê felaketê ko ji xwestek û mirazên rind, lê ji netîce û serencamên kirêt dihate pê di êrîşa keleha Seîd Begê de dît. Min di wê gava yekemîn a felaketan de dît ko qedera me, ji vê yeka hanê pê ve ne tiştekî din e; mîna rûviyê xinis em ê jî hertim li tiriya sor a kemilî bifikiriyana, lê me dê çu carê xwe negîhanda tiriyê; me dê bi xewn, xeyal û azrûyên herî çê dest bi kar û şixul bikira, lê di netîcê de, ji bo ko me bikaribûya heyata xwe ya teres bidomanda, me dê hewl bida ko her tiştê xwe, heta xeyala xeyal û xewnên xwe yên destpekê jî, ji bîr bikira, me dê, ji ber jana tecrubeyên me û tirsa heyatê, her tişt, heta xewnên çê jî li xwe qedexe bikira.

Lê belê berî ko ez gotinê bînim ser êrîşê, ez ji we re behsa bûyerek ko bêtir li vê şeva me ya ronî tê, bikim, bûyerekê ko xwediya wê we jî, min jî ji bîr kiriye; Gulîzerê.

Dengê Gulîzerê ko min ji bîr kiribû, ji nû ve, sê roj bi dû hatina me re, careke din, lê îcar di destpêkê de mîna çêr û nifir, bi guhê min ket. Ji ber çûyin û hatina boş û xwarin û vexwarina xweş a mala Mam Sefo, ders û şîretên wî, dengên ko ji kitabxanê bang li min dikirin û nexweşiya diya Armê, ez bi qasî se rojan li wir mam. Lê piştî sê rojan, bêguman piştî ko ez û Migo, em çûn hemama herî xweş a bajêr ko lehîtên wê yên spî yên hundir mîna eywanekê lebûbûn û mîna kevirên firûnekê germ bûn, bi alîkariya çend qalib sabûn û telaqên hoste ko her yek mîna fêris û pêhlewanekî bi gewde bûn û bi kîsên destên xwe ne bi tenê toz û gemarê, herweha çermê însên jî radikirin, me hemû toz û kirêtiya çola Mezopotamyayê ji ten û bedenên xwe avêtin, min, di nav cil û bergên nû

de, simbêlbadayî, maxrûr û qure, mîna ko min bi gera xwe ya Mezopotamyayê dinya vegirtibe, li ser lêvên min gotinên stranekê, li kêleka çêm, di bin siya darên qedîm ên çinar, çilo û tûyan re, berê xwe da mala Apê Xelef.

Di wan sê rojên min de ne Apê Xelef hatibû mala Mam Sefo, ne jî Heme û Gulîzerê. Keyayê Mam gotibû min ko Apê Xelef, tevî panzdeh-bîst şivanan û keriyên pezên Mîr, Mam û begên Cizîrê, derketibû zozanan. Lê çima Hemeyê fistûj ko Xwedê dizanîbû ka li kû çi fesadiyê dikir, nehatibû? Gulîzera gulî reş û dirêj ko bi bejn û bala xwe êdî qulipîbu ser Stiya narîn û dilsoz a destana Memê Alan? Çima ew nehatibûn? Ne mimkun bû ko wan nebihîstibû ko em vegeriyabûn, lê heye ko wan xwe li keriyê danîbûn? Axir, her çi bûya jî, ez niha li rê bûm, heyat mîna her carê, dîsan xwe dubare dikir, ez dîsan di danekî êvarê de, li ser riya ko min bi hezaran caran gav kiribû, çavê min li ser lîstikên tîrêjên tavê ko li ser çêm diçirûsîn û ji zaroktiyê û vir ve, min hertim, lê şahidî kiribû, ber bi mala ko ez lê mezin bûbûm diçûm, – da ko min hevalên ko rûyê wan aşîna bû û ez pê re mezin bûbûm, bidîta.

Gulîzerê, mîna gelek caran, dîsan li ber deriyê mala ko li kêleka çêm bû û bi lorînên çêm dikete xewan û bi vîçevîça teyran ji xewan hişyar dibû, li ser kevirê ber derî rûniştibû û di destan de teşiyek, li ser çogê jî lûfikek dirêj ko nîşan dida ko Gulîzerê ne ji bo henekî, lê ji bo şixulekî girîng, bi şixulê destê xwe rabûbû, hirî dirisand. Fîstanekî tenik ê sade û rengîn ko heta ber lingên wê daketibû, lêbû. Guliyên wê îcar nîn bûn, wê porê xwe veçirandibû û berdabû ser milan û porê ko pêl dida, li ber tîrêjên tavê bi rengekî çîkî reş, bi şox û şeng dibiriqî. Gava min şekl û şemala wê dît, ez sekinîm û bi qasî çendekê, ji dûr ve, min lê nihêrî. Germahiyek ko ez bawer im dilhebînî bû, bi ser min de hate. Gelo min ji vê keça xama û bedew ko êdî mîna porê xwe yê leylandayî şox bû û li ber vê mala neçar ko êdî jê ne bîhna tir û fisan dihate, ne jî dengê stranên şivanekî kal ê şên, rûniştibû, hez dikir?

Bi dengekî berz ez kuxiyam û ber pê çûm. Hingê çavê wê bi min ket û li ser rûyê wê tevgerek ko min jê dernexist ka çi bû hate pê. Heyecan? Coş? Hêrs? Kerb? Tafilê wê rûyê xwe ji min bada û teşiya destê xwe vizand û bi lingê xwe, mîna ko ew tiştekî pihîn bike, wê guloka pengê ji xwe bi dûr xist. Ez bêdeng çûm nik wê û li ber wê, li pê sekinîm. Ne deng ji min derdiket, ne ji wê. Êvar dadiket, dengê şivan û berîvanên ko pez haş dikirin, ji dûr ve dihat; dengê zompê hesinkerekî, mîna awazê deng-

bêjekî kal, bi dûzan û aheng, li ber guhê me diket; ber bi milê çiyayê Cûdî, siwarek hespê xwe rakiribû çargaviyê û di nav kortalên zinaran de winda dibû; bayekî sivik ê êvaran pelên darên tûyê ko hinekî ji me bi dûr bûn, difirkandin û çiqil û pelên daran hêdîka diliviyan; ava çêm ko bi tîrêjên tavê qulipîbû ser rengekî sor û zer, bi aramî diherikî. Û di nav wê aramî û sikûnetê de Gulîzer ko ez bawer im, ne aram bû, bi tevgerên sert teşî dirisand.

Roja te, na ne roja te, êvara te bixêr, Gulîzerê, min bi dengê xwe yê herî nermik û xweşik gotê.

Lê wê ne bersîv da min, ne jî li min nihêrî.

Gulîzerê, zimanşêrînê, tu çawan î? Min dîsan gotê. Min bîr dibir ka çi dê ji zimanê wê birijiya û loma min »zimanşêrînê« li gotina xwe zêde kiribû û bêyî ko ez li bendî bersîveke bisekinim, min gotina xwe domand, welê dixuye ko te bihîstiye ez hatime û tu dê, ji bo min, tiştekî zivistanê birisî?

Hingê wê bi awirekî gelekî tûj li min nihêrî û gote, belqityo! Zimanşêrînê gotina xwe dubare kir; belqityo.

Bi tenê hewqas, lê belê ew gotina wê ji bo min, mîna dilopa şîr zelal, şêrîn û germ bû. Kenekî li ser rûyê min, min bi baldarî lê nihêrî; rûyê wê yê esmer hinekî zirav û gelekî lihevhatî bû, porê wê ko ji dûr ve mîna pêlên çemê Dîcleyê dixuyan, mîna tûlekî hevrêşimî yê nerm bû, tenê wê spî, çavên wê yên kilkirî xweşik û kûr, mijang û birûyên wê dirêj û mîna kevanekê vekişiyayî bûn. Dest û lingên wê henekirî, mijangên wê yên reş, bi kilê, reştir bûn. Jê bîhneke gelekî xweş ko bi bîhna misk û emberê dişibiya, difûrî. Çend qumçikên jor ên fistanê wê vekirîbûn û jê pêsîrên wê yên gewher hinekî dixuyan. Tevî ko ew li ber derî rûniştibû û teşî dirisand, ji kil, hene, bîhn û qumçikan diyar bû ko ew li hêviya yekî yan tiştekî bû.

De ka bibêje, ez hinekî din nêzîkî wê bûm, di ser re min li pêsîrên wê yên şox nihêrîn û min jê pirsî, tu ji min re çi dirisî?

Koro, çavhelisiyo, kezebreşo, wê bi hêrs gote û rabû ser xwe, teşî û hirî avêt erdê û rûyê xwe bada, kete hundir. Lê berî ko ew bikeve hundir, wê dîsan nifireke din li min barand, malşewitiyo, tu bî, tu ji çavê din jî bibî, tu bî, tu muhtacê garisê gilgilî bî.

Ka Heme li kû ye, zarşêrînê, min gotê û çavê min li ser hêtên wê yên vekişiyayî, min bi hedîka da pê.

Ez çi zanim! Ew jî dînekî mîna te ye, ji mêj ve ye, ew naxuyê, kî dizane

di kîjan medrese yan jî mizgeftê de niha dijûnî filehan dide! Yek tiredînekî serserî ko nanê kuçan ketiye zikê û venagere mala xwe, yek jî gêjekî sersem ko bi zekata xelkê zik mezin kiriye û mala xwe ji bîr kiriye! Yek ji yekî xirabtir.

Lê binihêre, tiredînê te hat, min gotê û ber bi wê çûm. Bejna wê ji min kintir, endama wê, bêguman, ziravtir bû. Bedena wê ya narîn kela min rakir da ko ez wê bibest hembêz bikim û parsûyên wê bi herdu destan biguvişînim.

De bicehime û here cîhê ko tu jê têyî, wê xwe hinekî da alî û gote.

Dengê wê ko tijî hêrs bû, bi min mîna dengê berxikekê yan jî mîna dengê şalûrekê dihat; ewçend masûm, delal û zelal. Dengê wê, bîhna wê, bala wê heş ji min bir, min hew dikarîbû xwe rabigirta.

Nazdara min, min gotê û bi leza birûskê êrîşeke xedar birê, bi herdu destên wê girtin û ew xiste erdê. Pêşî ewê, di bin min de, mîna pilingekî ko dixwaze cewrikên xwe ji keftaran biparêze, bi xurtî li ber xwe da, lê paşê, gava ewê fahm kir ko ew nikare xwe ji penceyên min ên qehîm rizgar bike, bedena wê di bin bedena min a qelew de sist bû. Bi sistiya bedena wê dengê wê jî hate birîn. Min jî hew deng kir, deng êdî ne hewce bû, niha diviya me li dengê hilavêtina dil û tevgerên bedenan guhdarî bikira. Li ser mehfûra tenik, ez û wê, bi hev re yekbûyî, em li erdê dirêj bûbûn. Min hêdîka destê xwe yê rastê bir porê wê, rûye wê ko ji min zivirîbû, rast kir da ko ew li min, li rûyê min, li çavê min ê kor û şopa şûr ko mîna pîneyekê li ser rûyê min bû, baş binihêre.

Li ser rûyê wê, di nav bîbikên çavên wê keça xama de nermahî, germahî û hêvî hebû. Hêviya evîn û evîndariyê ko ew hertim, di hemû heyata xwe de hewcedar bû, hêviya hez û şefqatê ko wê ji mala bêdayik û ji bav û birayê xwe nedîtibû, hêviya kêfxweşî û coşa yekîtiya bedenan ko ew bi sebir û metanet hertim, ji wan lîstikên me yên zaroktiyê û vir ve, li pey bû. Ew lîstikên masûm niha qulipîbûn ser tiştekî din ko ne min û ne jî wê dizanîbû ka ew ê çawan kuta bibe. Belê, li ser bîbikên çavên wê hêviya ko bang dikir û digot »were« hebû, lê li milekî din jî hişkahiyek, ez çi dizanim, heye ko sertiyek, xurtiyek jî hebû. Xurtiyek ko bi stranên bavekî şivanê êzidî kemilîbû, bi nanê tisî û şîrê xav perwerde bûbû û bi feqîrî û neçarî hatibû ceribandin.

Çavan digot, were, koro, çima çavê te yê sax min nabîne, were, niha heke tu weha bi hemû giraniya xwe li ser min î û nefesê li min diçikînî, ne ko te xwest, lê ji ber ko min rê da, weha ye. De were, her tiştî ji bîr bike,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

her tiştê ko te dîtiye û tu jiyayî, li pey xwe bihêle û were...

Her tişt li pey mabû, niha bi tenê rastiyek ko min pirî caran lê xeyal kiribû, hebû; ew. Fîstanê wê yê rengîn, rengên sor, zer, kesk, mor ko keçên kurdan jê hez dikin, bişkovên fîstên ko heta navika wê ber jêr dibûn û mîna wê li hêviya vekirinê bûn, mûyên zirav ên pî û çipên wê ko tenê spî û bedena esmer dixemilandin, stû û gerdana wê ya dirêj ko li hêviya ramûsanan bû, şeqên we yên vekirî ko bi hêdîka xwe dilivandin û heş ji min dibirin û çavên wê, çavên reş ko niha bi baldarî û kûr, gelekî kûr li min dinihêrîn. Niha li ser çavan çi dixuya? Ken? Lava? Coş? Ferman? Heye ko hîç tiştekî, heye ko hemû tişt di nava hev de... Eniya wê fireh û li serê çu xêz, qermîçek an nîşandekên wext û felaketan nîn bû. Enî, serî, mêjî hê pêrgî felaketên ko li rê bûn, nehatibû. Lê hingê ne heşê min li bûyeran bû, ne jî heşê wê li tevgerên rojê bê bû, hingê bi tenê ew, rastiya wê hebû. Ji wê danê êvarê, ji destpêka dengên bedenan ev bergeh, bi hemû zelaliya xwe, di heşê min de maye.

Dengê bedenan dest bi axaftinê kirin, wê hêdîka, bêyî ko min ji ser xwe biqulipîne, ez nizanim ka çawan, lê bi hunereke bêpayan, dest û milên xwe ji fîstên rizgar kirin, bi dû re bi destên min girtin û ew birin ser qumçikan. Qumçik yek bi yek vebûn, ji jor, ji memikan ber bi jêr, ber bi navzik. Niha ew heta berzikê tazî bû, di bin fîstên de wê çu tişteki din li xwe nekiribû, memikên gulover û hinekî mezin ko hemû sîng tijî kiribûn, bi hemû gewherî û bedewiya xwe dixuyan. Wê hêdîka destên min birin ser memikan, dest, bêyî lez û bezê, li ser memikan, li dora wan geriyan, bi dû re, dîsan bi alîkariya wê, dest ber bi jêr, ber bi aliyê navikê bûn. Wê zikê xwe hinekî vekişandibû û navik bi kortahiya xwe mîna yaqûteke belek a çirûsî dixuya. Yan jî mîna libeke tiriya kemilî ya tahnebî. Hêtên wê ko hê destê kesî lê neketibû mîna qûna topên osmanî gulover û sert, lê di eynî wextê de mîna meşkên kelekên kambax ên Dîcleyê nerm bûn. Dengê hêviyê ji hêtan jî olan dida; hêt li hêviya destan bûn. Şeq û çîpên spî ko di paş re mîna marekî li min piçikiyabûn, mîna mirtalên şervanên aşûriyan dirêj û lihevhatî bûn.

Heta navik û hêtan her tişt baş bû, lê malkambaxiyê ji wir û pê ve dest pê kir. Tevî ko destên wê dîsan aliyê min dikirin, min kir-nekir, nikarîbû fîstan jê bikira. Û ya herî xirab, derpiyên wê yên dirêj bi doxîneke qehîm hatibû şidandin. Ew, hemû bedena wê, hemû xweşî û bedewiya wê li hêviya destan bû, lê ne doxîn! Gerçî her tişt bi hêdîka, bihust bi bihust bi rê ve diçû, lê fîstanê kambax û doxîna xayîn înad dikirin. Çare nîn bû,

min rahişt fîstên û min ew çirand. Wê dengê xwe nekir, heye ko heta ji vê yekê hez jî kir, lê gava min destê xwe avêt doxînê û xwest wê jî bi destan jêkim, qirîniyek pê ket,

Koro! Hêdî be law, te kezeba min peritand, korê heram! Ava reş bi çavê te yê sax de jî were, pîsê heram!

Dewsa nifiran aliyê min bike, delala min, min gotê û tiliyên xwe yên dirêj û qelew li ser hêtên wê gerandin.

Dewsa ko tu min perçe bikî, weha bibêje, cinawirê çavkor, çavbirçiyo!..

Hingê her tişt ji nişka ve guherî, ew keça xama, lê bêdeng û masûm ko piraniya caran li koşeyekê, bêyî ko dengê xwe derxe, rûdinişt an jî bêdeng bi şixulên basîd ên malê radibû, qulipî ser, ez çi bibêjim, ser teyrekî direnda yan jî ser pilingekî har. Wê ji min re digot cinawir, lê niha ew qulipîbû ser cinawirekê ko bi tevgerên xurt, çapik û zana ez dîl girtibûm. Niha êdî wê her tişt bi rê dixist, mîna şahmaranekê xwe dilivand, qumçikên kirasê min ji hev dikirin, doxîna min ko ji bervajiyê ya wê gelekî sist bû, vedikir, destê xwe li ser sînga min a tijî pirç digerand. Şerm jê bi dûr ketibû, gava wê destê xwe avêt nav heya min, qirîniyeke din ko ji ya berê gelekî cihê bû û tê de ken, kel, best û arzû hebû, pê ket,

Belqityo! Ev singê hanê! Çawan tu dikarî vî nebxêrî di nav şalan de veşêrî?

Min dengê xwe nekir, ma min ê çi bigota? »Biloyê« ko wê ji lîstikên zaroktiyê baş dinasî, bi çerxa felekê û leza salan, qulipîbu ser singekî bêbav. Ez bi tenê keniyam û min bêdeng lê nihêrî; şepalê bi şixulê xwe dizanîbû, ne bi tenê karê malê, lê bi karê ruh û dil jî dizanîbû. Min ruh û canê xwe ko gihîştibû bilindahiyên çiyayê Cûdiyê û di nav mij û dûmana bilindahiyan de govend digirt û bedena xwe ko qulipîbû ser kevaneke vekişiyayî ko di bin tîna tava germ a welatê Babîlê de dibiriqî, heşê min li ser pilingên har û li ser zimanê min jî çend rêzên Melayê Cizîrî ko ji me hinekî bi dûr di gora xwe de dinivist, mîna stranekê, bi hêdîka, teslîmî şepala xwe, teslîmî destên wê yên dirêj û zirav, bedena wê ya narîn kir;

Şox û şengê zuhrerengê dil ji min bir, dil ji min
Awirê heybetpilingê dil ji min bir, dil ji min
Wê şepalê miskîxalê dêmdûrê gerdanşemalê
Cibheta bîskan sema lê, dil ji min bir, dil ji min.

Min dengê kîn û nefretê ko min gelek caran li vir û li wir bihîstibû, di



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

destpêka êrîşa keleha Seîd Begê de, carekê jî, li kitabxana Mam Sefo, ji nav rûpelên Tewratê bihîst. Xwedayo, ew çi deng bûn ko Xwedayê alemîn ji bo ders û tecruban veguhezandibû me, nifşên nû yên însaniyetê, lê me çu carê jê ders û tecrube wernedigirtin.

Piştî ko min çîroka xwe û heybetpilingê jî gote we, niha em dîsan dikarin vegerin ser mûsîbetên ko diqewimîn. Mûsîbetên ko axa welêt qulipandibû ser çola Babîl û Nînovaya xopan, însanên welêt kiribû ker û lal, derew, fort, dek û dolap kiribû huner, hêvî û best kuştibûn û xizîn û kederê kiribû nan û av.

Rewşa Cizîrê, Botanê û hemû welêt, berî çûyina me û piştî hatina me, yekcar guherî bû. Ew azadî û serbestiya bajêr ko em tê de, bêyî ko haya me jê hebe, dijiyan, piştî vegera me, têk çûbû. Dewsa azadî û serbestiya bajêr, çûyin û hatinê, niha pirs, şik, guman, rêgirtin û qedexe hebûn. Mifrezeyên eskerî yên mîrekiyê ko li bajêr û der û dorên bajêr nedixuyan, niha çavnêriya ketin û derketina bajêr dikirin, dengê tivingan ko bi tenê di nêçîr û seydan de, li zozanên çiyayên bilind, dihate bihîstin, niha di meqerên eskerî de ko li der û dorên bajêr û mîrekiyê mîna libên tisbîheke qetiyayî, roj bi roj bêtir belav dibûn, dihate bihîstin. Ya herî balkêş, bêguman, osmanî bûn, ko heta hingê ewçend bi xurtî hebûna xwe nîşanî ehlê Cîzîra Botanê nekiribûn. Pêşî mela, seyda û aqilmendên dewletê ko bi eslê xwe kurd bûn û qasidê paşayên wîlayetan bûn, li bajêr û li dora qesrê xuyabûn, paşê karbidestên Babiâlî ko bi rîhên xwe yên palik, kincên xwe yên alafrangî û fesên xwe yên sor gelekî bala xelkê dikişandin, hatin û çûn. Bi dû wan re jî kumandarên eskerî, eskerên çekdar û mifrezeyên peya û siwar ko ji bo şer û pevçûnan perwerde bûbûn, li mîrekiyê, mîna gizêrên bejî ko ji nişka ve ji bin axê serî radikin, xuyabûn. Ji vê tevgera geş, herkesî, ne bi tenê min ko ji çavekî bûbûm, herweha korên ko ji herdu çavan jî bûbûn, têdigihîştin ko pergaleke nû ko bêtir eskerî bû û bi fermana kumandaran û lûleya tivingê bi rê diket, hêdî hêdî, li welêt dihate pê.

Li milê din tevgera Mîr û mîrekiyê jî, ji her carê bêtir xurtir, geştir û firehtir bûbû; mîr û begên mîrekî û bajarên cîran dihatin û diçûn, aqilmendên Mîr, Mam Sefo jî tê de, hertim civat digerandin, qasid hertim nûçe, xeber û name dibirin û danîn, bazirganan çek û tiving dianîn û li bazaran difrotin, eskerên mîrekiyê di nav şal û şepikên xwe yên rengîn û paqij de di navbera bajar û gundan de diçûn û dihatin.

Bi kurtebirî, asimanên welatê Cizîra Botanê girtîbûn, ewr diguriyan, birûsk û baran li rê bû.

Herçî em bûn, ez û hevalên min, ez û Migo, piraniya caran li mala wan, li hêviya Mam Sefo û xeberên wî bûn, Heme, tevî koma xwe ya dîndar, çûbû welatê Hekaran, Şemzînanê, nik şêxên Nehriyan û hem ders didan wan hem jî ders û tecrubeyên xwe yên dînî dewlemendtir dikir, Têlî ko min carina didît, li medresa biçûk a qesrê ders dida şagirtên malbatê û herçî Yezdînşêr bû, mîna ko bîhna axa avis a baranê bi difnên wî ketibe, çûbû nik xalê xwe Seîd Begê. Bajar, welat ko bi hatina Mîr re ketibû ser riyeke din a bextiyarî û serfiraziyê û heyat, tevî xwarin û vexwarin, zexîre û dewlemendiyê geştir bûbû, tevî me, niha li hêviyê bû ko tiştekî neçê, tiştekî kambax biqewime. Herkesî didît ko aştiya ko Mîr, bi hezaran dijwarî û zehmetiyan, di navbera mîr, axa, beg, şêx, dîn, ziman, ehl û navçeyên welêt de, bi hostahiyeke bêpayan, anîbû pê, mîna pira ko nikaribe xwe li ber pêlên rabûyî rabigire, welê ji binî ve dileqiya.

Mam Sefo ko êdî çavê kesî lê nediket, carina, di nîvê şevan an keleberbanga sibehan de, westiyayî, çavsorbûyî, bîhnteng û zîz, dihate malê. Hingê me dilezand û em diçûn kitabxanê, warê fikir, şik û gumanan û li hêviyê disekinîn. Ew pêşî diçû nik xanima xwe ko êdî çu carê ji jûrê xwe peya nedibû, paşê dihate kitabxanê ko êdî ne bi tenê warê xwendin û nivisînê, herweha çaxa ew li malê bûya, bûbû warê wî yê xwarin, vexwarin, razan û nivînê. Ji ber ko ewî dizanîbû ko em li hêviya wî û xeberên nû bûn, wî bi hatinê ve, heke birçîbûya, tiştekî sivik ko hurmeyên çapik jê re danîn, dixwar û dipeyivî, heke nebirçîbûya, rasterast agahî didan me. Gotinên wî ko berê, piraniya caran, qala xwendin, nivisîn, zanîn, huner, edebiyat, ger, geşt, hînbûn û pêşveketinê dikirin, niha, mîna guherîna rewşa bajêr û welêt, bêtir qala pevçûn, şer, berberî, çek û dijminahiyê dikirin.

Însên şîrê xaf mêtiye û hezkarê xwe, ezîtî û quweta xwe ye, ewî pirî caran digot, qelûna xwe pêdixist, ji ber westa roj û şevan, li ser sedirê pal dida û didomand, însan, nemaze însanên me yên nezan ên navçê ji xwe û ji çek, hêz û quweta xwe hez dikin û tiştê herî xirab, pê bawer dikin û ji ber vê yekê jî dikarin bêperwa her tiştî têk bibin. Heta çilka tirs û xofa têkdanê, dilopa wîcdan û merhemetê nekeve dilê wan, heta ko ew fahm nekin ko xetera herî mezin çekên di destên wan de ye, şixulê me hemûyan, di sêrî de jî, şixulê Mîr gelekî zehmet e.

Herçiqasî haya me, min û Migo, ko di wê geremol û heyecanê de hê dest bi şixulekî diyar nekiribû, ji rewşê û pêwendiyan hebûya jî, bi gotinên Mam Sefo ko bi carekê ji taqetê ketibû û êdî mîna kalekî dixuya,

rewş bêtir zelal dibû. Me ji gotinên wî çêtir fahm dikir ko dewleta Osmanî ko demekê hukimdarê heft duwêlan, ji welatên Maxribê bigire heta çolên Erebîstanê, ji welatên Qafqasiyayê bigire heta navenda Ewrûpayê, hukimdarê nîvê cîhanê bû û alaya Osmanî ne bi tenê li qiraxên çemê Dîcle û Firatê, herweha li qiraxên çemê Nîl û Tûnayê hêl dibû û keştiyên wê ne bi tenê li qiraxên deryayên Spî, Reş û Egeyê, herweha li qiraxên Hazer, Hînd, Atlantîkê jî lenger davêtin, mîna ko bi zelzeleyekê ketibe, niha ji binî ve dihejiya û ji lewre jî di nav tevgereke bêhempa de bû, da ko bikaribe xwe xelas bike. Siltanê Osmanî ko di eynî wextê de xalîfeyê sererz ê hemû qewmên misilmanan bû û di bin baskê xwe de hem ehlê misilman hem jî nemisilman mîna cihû, file, êzidî, pûtperest dihewandin, hew dikarîbû bi gotinekê welatan vegirta, qewman bi rê xista û hukimdariya xwe mîna hukimdariyeke qedîm, qehîm û ebedî nîşan bida. Gelek paşayên ko welatên dûr ên tixûban ko wîlayetên dewleta Osmanî bûn, serî hildabûn û paşayên mîna paşaye Misirê Mihemed Elî zora dewletê biribûn. Yewnanistanê, hema çi bigire, azadiya xwe li dar xistibû, welatên Balkanê mîna Sirbistan, Eflak, Bosna li ser riya azadiyê bûn û bayê azadiyê li ber guhê Trablûs, Libnan, Sûriye û Girîdê ketibû. Ordî ji rewşê ne razî bû, paşayan bi dewletê û bi hev re qayiş dikişandin, xelkê ko ji eskerî, bertîl, bac û qemçûrê bêzar bû, xwe ji her tiştê ko siya dewletê lê bû, bi dûr dixist. Û di ser de dek û dolabên welatên Ewrûpayê, mîna Englîstan, Frense, Îtalye û Rûsyayê rewşa dewleta Âlî Osmanî yekcar aloz kiribû. Wan li milekî dil dikirin ko dewlet li ser piya bimîne û ji lewre aliyê wê dikirin, li milekî jî agir dixistin dawa dewletê û piştgiriya tevgera azadixwazî ya ehlên din dikirin da ko dewlet ji quwetê bikeve û muhtacî wan be.

Welatê azam ê Osmanî feqîr û bêkeys ketibû, paşa bi îdareyeke kêfî xelkê diperçiqandin û heta derpiyê wan jî mîna bertîl an jî bi navê perû, alîkarî û bexşîşê, ji wan distandin, ordiyê law û kurên mal û malbatan, bi navê eskeriyê ko bi qasî umrekî dirêj bû û ji sed kesî not û nehê wan hew vedigeriyan, ji wan werdigirtin û ew di çolên germ an jî di çiyayên sar de, bêyî ko di wicdana wan de olanek bê vedan, didan kuştin. Bindestî û bêgaviya xelkê bi gotinan nedihate salixdan, ji bo her tiştî, heta ji bo nîskê ko diçandin û garisê ko radikirin, ji bo pêlavên ko çêdikirin û cil û bergên ko li xwe dikirin jî bac didan. Û ne bi tenê bac didan cîhekî, wan bac dida padîşêh, dewletê, wîlayetê, paşê, zabît, tahsîldar... herkesî... Li welatê Osmanî herkes ji hinên din eciz bû, herkesî li hinên din dek û dolap di-

gerandin, herkes li pey daf û kemînan bû. Herkes bi hev re, li nik hev dijiya, lê bi rik, kîn, berberî û dijminahî. Herkesî hinên din biçûk û nizm didîtin, ordiyê padîşêh, padîşêh wezîran, wezîran paşayan, paşayan miteserifan, miteserifan mîr, beg û axan, wan jî ehlê xwe. Û herkesî, ji bo gerandina kar û şixulên heyata xwe, hewl dida ko zordarî li hinên din bike. Herkesî ji hinên din nefret dikir, ji hinên din gef dixwar, hinên din êşandibû û herkes li keysa hilanîna tola xwe bû. Tola ko Mam Sefo digot, kemîna herî xirab a însaniyetê bû.

Lê belê tevî ko welatê Âlî Osmanî dileqiya û dikeliya, ewê zext û desthilatiya xwe jî, li der û deverên ko ew pê bawer bû, zêdetir dikir. Hema çi bigire dewletê destê xwe ji welatê Trakya û Balkanê şuştibû û bîr dibir ko welatên Mexrib û çolên Erebistanê jî, ne bi huner û quweta ereban, lê bi dek û dolabên dewletên Ewrûpayî, jê bi dûr diketin. Ji lewre ewê hemû zext û zora xwe dida ser Anatolî û Mezopotamyayê ko piraniya wan misilman bûn. Paşayên herî xwînrêj û garnîzonên herî xedar li Sîwas, Erzerom, Wan, Diyarbekir, Mêrdîn, Riha, Nisêbîn, Mûsil û Bexdayê bûn. Herçend ax û welatên din ji dest diçûn, axa Anatolî û Mezopotamyayê jî ewçend di bin nîrê paşayên rîhpalik û dilqalik de dinalî.

Welatê kurdan ko bi qasî kurdan welatê ermen, asûr, suryan, cihû û êzidiyan bû jî û ji destpêka dewleta Osmanî û vir ve her bi dewletê re bû, di navenda Anatolî û Mezopotamyayê, di navbera herdu çemên tarîxî Firat û Dîcleyê de bû. Welêt ko her û her di navbera mîr û began de hatibû parve kirin, xwe perçeyekî welatê Osmanî didît û mîr û begên kurdan ko hertim li dijî hevûdu bûn, li hember hevûdu qayişê dikêşandin û yeka hevûdu qebûl nedikirin, hukimdariya dewleta Osmanî qebûl kiribûn û yeka dewletê nedikirin dudo. Tevî ordiya osmaniyan, ew diçûn şer û pevçûnan, wan şervan û çekdarên xwe dişandin şerên dûr ên osmaniyan ko li ser tixûbên dûr ên welêt diqewimîn û qada şer hertim dibû zeviyên mirinê û cendekan, gava lê diqewimî, bi serpereştiyê radibûn û sînga xwe ji bo selametiya dewletê û siltanê wê dikirin sîper, bac û heyinên xwe didan dewletê û siltên mîna sultanê xwe yê nemir dizanibûn. Lê bi şertekî; ko ew di nava xwe de xweser bûna, padîşêh carina silavên xwe yên germ an yadîgareke biçûk a bîranînê binihêrta, dewletê qedir û qîmeta wan bigirta û destê xwe dirêji hebûn û heyinên wan nekira. Lê ev şertê hanê ko bi sedan salan di navbera dewletê û mîrekiyan de peymaneke qehîm bû, demên dawîn têk çûbû û paşayên ko dewlet temsîl


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dikirin, ne bala xwe didan vî şertê, ne jî guhê xwe didan îkaz û şîretan û êrîş li ser êrîş dibirin ser hebûn û heyînên mîr û began. Heke ez rastiyê bibêjim, ew hertim di van êrîşên xwe de bi ser diketin, ji lewre di destê wan de çekek ko bihayê wê bêpayan bû, hebû; berberî û dijminahiya navxwe yên mîr, beg, axa û giregirên kurdan. Paşayan simbêlên xwe ba didan, bi ken û fort agir bera wan didan û agir bi welatê wan dixistin, bêyî ko gurzeke pûşê wan jî tê de bişewitiya. Dewleta Osmanî û paşayên wê bi gotina bav û kalên kurdan ko hertim bi tecrubeyên nû yên kirêt dubare dibû, qenc dizanîbûn; berberiyê kurd kuştine, dexesiyê kevandine û belaviyê mirandine.

Mam Sefo di wan dawiya şevan de ko bi rastî jî bûbûn wextekî tarî yê bêdawîn, bedena wî ya girs ji rûniştinê westiyayî, mejiye wî yê ronî û serwext ji pistepist û gotinên pûç sistbûyî, piştî xebardanên me, lê beriya ko ew bikeve xew, heşê wî li ser bûyerên li rê, her digote me,

Xortino, divê ev gotina min bibe guhar û bikeve guhê we, ji bîr mekin, kurmê darê ne ji darê be, zewala darê nîn e.

Ev gotin jê re bûbû mîna lorînekê, lê lorîneke jahrîn, tahl. Wî her digot kurmê darê... kurmê darê û dikete xew, lê mîna ko ew bikeve xewa mirinê yan jî bikeve nav xewekê ko bi tenê ji kabûsên dûjehê hatibe pê. Lê belê şevekê, gava ew hate malê, wî xeberên kirêt ên wê rojê gîhandin me û li ser sedirê kitabxanê pal da û kete xewê, nav kabûsan, wî îcar ev gotin negot û dubare nekir. Îcar wî gotineke din a bav û kalan got û dubare kir;

Axîna vî destî ji destê din re namîne... Axîna vî destî ji destê din re namîne... Axîn... Axîn...

Hingê, piştî ko xewê bi tûlên xwe yên reş Mamê ko bi axîn, axînê ji xwe ve çû, rapêça û bire kûrahiyên tarî yên xewê, min li Migo ko ji ber rewşa bavê xwe, diya xwe, welatê xwe, bi hêdîka digiriya, nihêrî, çûm nik wî, bi destê wî girt û ew derxist şaneşînê. Dinya ronî bûbû, stêr çûbûn, tîrêjên abadîn li pey gopikên çiyayên Cûdî serî hildidan, ava Dîcleyê, mîna ko haya Dîcleya ko hertim şahida her tiştî bû, ji rewşê hebe, welê narîn, mîna ko reşa xwe girêdabe, bêdeng diherikî. Em çûn koşeya herî dûr a şaneşînê û li wir, li ser kursiyên nizm rûniştin.

Birako, min gote Migo ko rondikên çavên xwe paqij dikirin, birako, rondikan ji bo rojên bê veşêre, ji ber ko rojên bê, rojên qiyametê ne.

Qiyametê dest pê kiriye, Biro, ewî, di nav pêçiyên wî de pel û titûn, bi dengekî sext û sist, gote min, ev hesûdî, berberî, dexesî, rewşa dê û

bavê min... ev çi ne?

No, Migoyê dilpak, min gotê û ez rabûm ser piya, çûm nik dîwarê şaneşînê ko bi qasî deh, panzdeh bihustan bilind bû, min doxîna xwe vekir û di ser dîwêr re, min bi qasî çendekê, ber bi çêm, mîza xwe reşand. No, dîsan min gotê, gava ez vegeriyam şûna xwe, no birako, ez nizanim ka te ferq kir, lê îcar Mam lorîna xwe ya kirêt a kurman, dubare nekir. Ewî îcar tiştekî din got.

Law, kerê çolê, ewî, pêşî, hinekî bihêrs got, tu weha kîr û gunikên xwe derdixî û mîzê, mîna ko ew ava zemzemê be, ber bi jêr direşînî! Eger hin te bibîbin, em ê çi bikin? Piştî vê gotinê, gava ewî dît ko ez bersîv nadimê, hingê wî, niha bi dengekî maqûltir, bersîva min da, min ferq nekir ka bavo çi got û cixareyeke pêçayî da min û ya xwe jî bir devê xwe û bi hestê ev vêxist.

Min ferq kir, Migo, min gotê, heste jê girt, cixara xwe pêxist û jê mizeke kûr kêşand. Ji nişka ve teyrê min ê tawis kete bîra min û min destê xwe bire ser teyrê xwe ko di stûyê min de bû û gotina xwe domand, Mamo îcar bi dengekî sistir û zîztir, gotina xwe ya xewê, ez bawer im, beyî ko haya wî jê hebe, guherî û ez vê yekê ne mîna elameta xêrê, ji bervajiyê, mîna destpêka rojên qiyametê dibînim. Na, ne ko ez welê dibînim, lê welê hîs dikim, Migo. Rojên gelekî kirêt li ber me ne...

Belê, wê şevê Mam xebera xirab ko heyameke nû, heyama têkçûn û windabûnê li ber mîrekiyê vedikir, gîhande me; wê şevê biryar hatibû standin ko Mîr jî tevî êrîşa Osmaniyan bibûya û ew ê bi hev re biçûna ser hêzên Seîd Begê ko li hember Osmaniyan rabûbûn.

Wê şevê, li ber destê spêdê, çaxa Mam Sefo hate mal, ew kelegirî bû, jê deng dernediket. Rasterast ew çû serşokê, hurmeyên malê jê re av germ kirin, piştî ko ewî xwe şuşt û bîhna xwe veda, di nav cil û bergên nû yên ewrûpî de, ew hate kitabxanê. Çavên wî yên gir û germ dixwestin bikenin, lê di şûna kenî de keser dixuya. Ew nedipeyivî, qelûn di dêv de, bi tena serê xwe, rast û çep, li ba dikir û di nav kitabxana mezin de, bi gavên giran mîna kesekî ko heş jê çûbe û nizanibe ka ew çi dike, diçû û dihat. Min û Mîgo, ko me xwe dabû kêlekê û bi heyecan li hêviya xeberên wî bûn, bêdeng lê dinihêrî. Piştî çendekê ewî saeta xwe ya zîvîn ji bêrîka yêlegê xwe derxist, lê nihêrî, çû û tevî ko dinya hinekî sayî bû, deriyê şaneşînê vekir, mîna însanekî ko noqî avê bûye û ji nişka ve dîsan derketiye ser avê û nefes digire, wî kêliyeke dirêj nefes girt û da, paşê hate qendîla li ser masê wergirt û çû ber refên kitaban, yek bi yek li wan, li piş-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ta wan, li nav û navnîşanên wan nihêrî. Dawiyê ewî kitabeke qalin û mezin a çermîn ji refê ko kitabên Keso, Maro û yên din lê bûn, wergirt, ew hembez kir, sê caran ramûsî û vegeriya ber masê, li ser kursiyê masê rûnişt û rûpelên kitaba çermîn vekirin. Min û Migo, me herduyan jî kitab dinasî, ew, Tewrat bû. Herdu destên Mamo li ser rûpelên vekirî yên Tewratê, wî serê xwe jê rakir û hêdîka li me nihêrî. Hingê me dît ko rondik ko li ber roniya qels a çirê mîna libên lûlû dixuyan û diçirûsîn, ji çavên wî ber bi jêr dibûn.

Kîn, hêrs, kerb û nefreta ko di vê kitaba miqedes de behs dibe, dîsan serî radike, xortino, ewî, bi dengekî ko kelegirî bû, gote me. Kîn, hêrs, kerb û nefreta ko hildiweşîne, dişewitîne, kavil dike û dikuje...

Wî dê gotina xwe bidomanda, lê ji bo ko ew li nik me bideng negirî, ewî xwe ragirt. Piştî bîskekê, gava ewî agirê qelûna xwe geş kir û jê gurzek kêşand, li lewheyên dîwaran nihêrî, ewî xeberê gote me,

Osmanî dê êrîş bibin ser hêzên Seîd Begê, pismamê Mîr û paşayên Osmanî, qasidên Padîşêh Mîr jî îkna kirin ko ew û hêzên mîrekiyê tev êrîşê bibin. Min nikarîbû xortina, min û çend aqilmend, şêwirmend û kurên Mîr, Têlî û Necîb, me kir-nekir, me nikarîbû rê li ber vê biryarê bigirta. Hîç nebe, Mîr diviya bêteref bima, xortina, lê nebû, Osmaniyan û berdevkên kevneperest ên mîrekiyê ko bi aqilê xwe yê kêm aqilmendiya Mîr dikin, rê nedan Mîr ko ew bikaribe biryareke din bistîne. Şûr û xencerên duban ên xwînî ko ji polayê nêrz û bi destê hesinkerên hoste çêbûne û ev çendek e, bi saya serê Mîr, di kalanê xwe de jengîn bûn, niha dîsan ji kalanan tên kêşandin, dîsan mam û birazî, xal û xwarzî radibin hev, dîsan daxwaza tolhildanê serî radike. Dîsan gotinên Tewratê dubare dibin, dîsan em ê neçar Tewratê dubare bikin.

Mam Sefo weha gotibû û bêyî gotineke din li olana ko di dilê wî de vedida, zêde bike, rûpelên Tewratê vekirî hiştin, rabû ser piya, tevî cil û bergên nû ko em tênegihiştin ka çima ewî li xwe kiribûn, li ser sedirê dirêj pal da, lehîfa tenik kêşand ser xwe û bi gotinên nû ko min qalê kirin, di xew re çû.

Çavê min ê kor dîsan dest pê kiribû û diêşiya û min bîr bi gotinên wî dibir; gotinên nû, nîşana heyama nû bûn.

Dengê sûzenî û keserê ko li ser rûyê Yezdînşêrê matbûyî dikire qîrîn, di dawiya êrîşa keleha Seîd Begê de, tevî dengê şewat û hilweşînê, bi guhê min ket, – dengekî bêdeng, lê ji bo çavekî bîrbir tijî olan, ko ji wê rojê û

pê ve, ez hertim lê difikirim.

Di navbera bavikên Mîr û Seid Begê de, ji bo hukimdariyê, herwekî ko min qalê kir, hertim berberî hebû, lê wan berberiyên xwe, bêyî ko rahêjin çek û sîlehan, hertim bincil dikirin û hêrs û kerba ko hertim li doraliyên wan bû, bi hunera qedîm a eşiriyê, haş dikirin. Lê îcar rewş yekcar guherî bû, îcar bivê-nevê xwîn ê birijiya. Ji çend salan û vir ve, Seîd Begê ko keleha Dêrgulê mîna meqer bi kar dianî û hukim li deverên Erûx û çiyayên ber bi welatê Hekaran dikir, li hember hukimdariya dewleta Osmanî serî rakiribû û hew gotina wan bi cîh dianî û êdî ne bac dida dewletê, ne jî esker dişand ordiyê. Ev tevgera nû mîna sitriyekî dikete çavê dewleta ko ji Ewrûpa, Balkan û welatê Mixribê vedikêşiya; dewletê pêşketineke weha ne qebûl bû.

Piştî ko Mîr jî gote erê û kete nava refên osmaniyan, mifrezeyên çekdar ên ordiya Osmanî ko bi rêberiya paşayekî bejndirêj, rûtirş û jixwerazî, bi navê Mihemed Paşa, gav bi gav hatin der û dorên Cizîrê jî. Pêşî zabit û berdestên wan, paşê paşa û berdevkên wan û bi dû re jî mifrezeyên çekdar û topên wan hatin. Esker ger peyatî û siwar di riya bejî re, ger bi kelekan, ji Diyarbekirê, bi riya çêm re hatin. Topên ko ga û bergîran dikêşandin, heyecaneke mezin li bajarê ko hema çi bigire hîç carekê jî tiştên weha ecêb nedîtibû, anî pê. Mifrezeyan li ber devê riyan ko di kêleka çêm re dibihurîn û li ber qûntarên çiyan ko bi qasî çend qonaxan ji bajêr bi dûr bûn, konê xwe vedan, alaya Osmanî daçikandin bilindahiyan û ji berbangan heta hingûran dest bi talîm û termînan kirin.

Cîzîrê, axa welatê Botanê ko niha bi pêlavên zabît û eskeran û bi tekerên topan dihate hinciqandin, bêdeng û keserkûr li bûyeran temaşe dikir. Deverên şox û şeng ên Dîcleyê ko bi dengê bilûra şivanan û awaza dengbêjan tijî bû, niha bi dengê tivingan, bi nîda û marşên eskeran; axa reş û sor a bi bereket ko zeviyên nîsk, genim, garis û ce bû û payîzê zer, biharê hêşîn dikir, niha bi berikên vala û barûta şewitî ya tiving û topan tijî bû. Û ehlê bajêr ko bixizîn, ji her carê bêtir li kar û şixulên xwe yên rojane hûr dibû, da ko bala xwe ji bûyeran bide alî, dizanîbû ko ev tevger, ev hazirî û lebat li dijî birazî û xwarziyên wan bû.

Lê hingê, di wan rojên tarî de, me nizanîbû ka me dê çi bikira, li mala ko jixwe tê de şîn hebû, yanî li mala Mam Sefo ko yekcar qulipîbû ser maleke bêdeng û kavil, bi rastî, şîn hate pê. Ji ber bextê me yê neçê, heye ko yê çê, şevekê, li ber destê sibeheke ronî û zelal, xanima Mam, diya Migo û Armê, Senemxanê ko ji mêj ve bû, ji hawîrdor xatir xwestibû, îcar


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ji dinyayê jî xatir xwest û wefat kir. Senemxanê ko herkes li benda wefata wê bû, di destpêka heyama nû ya kambax de, berî ko ew jî mîna me, bikeve ber pêlên xedar ên heyama nû, heye ko bi zanîn, di demeke baş de, xaça wê li stû, Încîla Nebî Îsa li ser sîngê, di jûreke tarî, lê di bin ronahiyeke qels a qendîlan de, bêdeng, bêxirexir, bêjan, bi rûyekî aram, di xewa şevan de, xweziya min pê, kete xewa ebedî û hemû xem û endîşeyên dinyê li pey xwe hîştin. Senemxana ko her, bi sebir û metanet, aliyê me hemûyan, mêrê xwe Mam Sefo ko heşê wî bêrawest li ser gerandina kar û şixulên mîrekiyê bû û jê re ji mêrekî bêtir hevalekî bû, zarokên xwe Migo û Arme ko bi delalî û nazdarî mezin bibûn û hertim naz û tîzê wan hebû, min, Biroyê sêwî ko li mala wê germahiya mal û malbatê dîtibû, kiribû, dîsan, lê îcar bi wefata xwe, gihîşte aliyê me. Senemxanê wesiyet kiribû ko Mam, hîç nebe ji bo cara dawîn, ji bo çend rojan, dest ji kar û şixulên mîrekiyê berde û wê bibe welatê bav û kalên wê û li deverên derya Wanê wê veşêre. Ev daxwaza Senemxanê ji bo me hemûyan bû hêncet ko me xwe ji tevger û bûyerên ko dihatin pê, bi dûr xista.

Tu jî bi me re were, Biro, Mam, di nav cil û bergên reş ên alafrangî de, êdî rîhberdayî, zik lê werimî, li kitabxanê gote min, tu jî were, ez ditirsim ko tu li van deran, di van rojên aloz de tiştekî bînî serê xwe.

Mam, mîna Migo û Heme ko hê jî ne diyar bû, rasterast nedigote ko ez tiredîn bûm, lê ew ji tiredîniya min ditirsiya û dil dikir ko ez jî pê re biçûma. Bi rêdana Mîr ko tevî ko hewcedariya wî di wan rojan de gelekî bi Mam Sefo hebû, di keleberbanga sibeheke biharê de, berî ko bajar hişyar be û esker dest bi zirtezirtê bikin, li ser hespan, bi komeke bi qasî bîst kesan, Migo û Arma reben ko yekcar ji xwe ve çûbû, bedena wê ya jar çilmisîbû û ji her carê bêtir hewcedarî germahî û şefqeta min bû, jî tê de, Mam Sefo ko îcar şal û şepikên fireh û belek ên welatê Mikusê li xwe kiribûn li pêş, ez, keya, çar egîdên çekdar ên botî ko bi nîşangeriya xwe nas bûn û lûlikên tivingên wan ên zîvhêlî li ber tîrêjên tavê dibiriqîn jî li doraliyên wî, Senemxana ko xweşik hatibû şuştin û dermankirin, di nav tabûteke gûzîn a dermankirî de diniviya, di nav erebeyeke girtî ya dêra ermen a Botanê de, li pey me, em bi rê ketin. Çûyina me bû geşteke dînî ya ermenan û li her cîh û gundê ko em tê re yan di kêlekê re dibihurîn û tê de ermen hebûn, dihatin nik kerwanê me yê biçûk, diçûn ser Senemxanê ko keça keşeyekî navdar ê hemû cemaeta ermenan bû, mîna ko ew li dora Meryem Xanê, dayika Îsa Mesîh bicivin, welê bi rêz û rêzdarî, li dorê diciviyan, destê xwe dibirin eniya xwe, xaç derdixistin û bi zimanê xwe ji

Încîlê hedîs, nemaze hedîsa Hayr Mer dixwendin.

Piştî rêwîtiyeke dirêj a bi qasî hefteyekê-deh rojan, em gihîştine Wanê, bajarê ko ji hezaran salan û vir ve, hertim paytextiya hebûna ermenan kiribû. Bajêr û hawîrdorên bajêr bihîstibû ko keça wan vedigeriya axa bav û kalan û wan haziriyeke mezin li dar xistibûn. Di danê êvareke hinekî hûnik de, ehlê bajêr, ne bi tenê ermen, tevî keşe û giregirên dêra ermenan, herweha kurd, tirk û cihû jî, tevî rêber û giregirên xwe, hatin pêşiya me û bêyî ko rawestin, wan em hildan û bi keştiyên biçûk ên Derya Wanê, em çûn girava biçûk a Axtamarê ko yek ji warên herî miqedes ên dinya file û ermenan bû. Ewana li wir, li kêleka dêra kevnare ko li ser girekî, ji kevirên reş û spî ava bûbû û mîna nikilê bazekî dixuya, ji bo Senemxanê, gorek vekolabûn. Mîna ko paşê hate serê min jî, Senemxan, piştî umrekî, dîsan vegeriyabû warê nas, warê ko însan bi hizûr serê xwe datîne ser axa wî ya reş.

Piştî ko me Senemxan, bi hedîsên ermenî û bi gotinên ermenî mîna »hayr-vortî-hokîn-surp atsvaz« ko însan dikare bibêje, ew mîna bismillaha misilmanan bû, veşart, em vegeriyan Wanê û li wir man, lê belê heşê min her li ser welatê Cîzîra Botanê û bûyerên wê bûn. Çi diqewimî? Wan topan dest bi teqînê kiribûn, heke kiribin, dengê wan çawan bû? Tevî ko Mam, Migo û Armê bi israr xwestin rê li çûyina min bigirin, dawiya dawîn, piştî çend heftan, ez hew hewiyam, ruhê min ê dîn îsyan kir û di êvareke zelal a heyveronê de ko heyv qulipîbû ser siniyeke zîvîn a mezin û gulover û dinya di nava ronahiyeke helesor de hiştibû, min ew û kesên din li cîh hiştin, yek bi yek ji wan xatir xwest û dîsan li hespê xwe yê kihêl ê belek siwar bûm, mecîdeyên min ko Mam Sefo dabûn min di bêrîka min, teyrê min ê tawis di stûyê min û xencera min a zîvhêlî di pişta min de, min berê xwe da Cizîra Botana xopan.

Çaxê ez di rojeke gelekî germ de, piştî nîvroyan, gihîştim deverên Cîzîrê, tiştê yekemîn ko bala min kêşand, bêdengî bû; ne meqerên eskerî li hawîrdorên bajer mabûn, ne jî topên wan, ne şivan û gavan dixuyan ne jî kerî û garanên wan ko hertim li dora bajêr diçêriyan. Bihar diqulipî ser havînê, tîrêjên tavê û tîneke boş hawîrdor dikizirand û zevî û giyan ko kirasê xwe yê biharê ji xwe kiribûn, zer dikirin. Tavê zora darên çilo, spîndar, çinar û tûyê ko geh li vir, geh li wir, lê her li qiraxên çêm mîna neqşên xalîçeyeke rengîn dixuyan, biribû û dar sist bûbûn, pelan stû xwar kiribû. Ji bilî çend qijikên tiral ko bi dengê xwe yê bed bêdengiya hawîrdor xira dikirin, çu teyr li asimên nedixuyan. Heye ko ji min re welê dihat, lê her

tişt, sist, sext û bêdeng bû, bêguman heke ez gulberojkên balbilind ko xelkê çandibûn û bi maxrûrî û xurtî xwe dabûn ber tavê, nehesibînîm. Li taxên derveyî bajêr jî jin, zarok û pîrejinên ko li ber deriyan, li hewş û kuçeyan dixuyan, bi gavên bitevdîr tevgera xwe girêdidan, bêyî ko ew bixwazin balê bikêşînin ser xwe, bitevdîr li ber çavan winda dibûn.

Bêdengiyê perda xwe rakêşandibû ser bajarê qedîm ko bi hezaran salan her û her warê dengan bû.

Li bajêr ez hîn bûm ko hêzên osmaniyan, bi alîkariya hêzên Mîr û hin begên din ên kurd ko ji kavilkirina gundên Seîd Begê bigire heta vegirtina rê, qonax û şikeftan da ko hêzên Seîd Begê nikaribin herin û werin, bi hemû şixulên berdestiyê rabûbûn, zora Seîd Begê biribûn û ewî, tevî malbat û kumandarên wî, ji keleha Dêrgulê, bi saxî, derxistibûn. Lê tevî ko êdî ehlê li dora Mîr vedigeriyan bajêr, Mîr hê konê xwe ko li qada şer hatibû vegirtin, ranekiribû û venegeriyabû. Roj, ne roja rawest û bîhnvedanê bû, tafilê min hespê xwe yê dilsoz ko ji riyeke dûr, li serê jî kesekî mîna min ko bi qasî topeke osmaniyan giran bû, dihat û gelekî westiyayî bû, li axura Mam Sefo guhert, heqîbên xwe danîn malê û hespekî zînde û çîkî boz ko seyisan ji tawlê derxistibûn, zengo kir, bêyî ko ez herim nik heybetpilinga xwe ko ji ber xirecirên qewimî, min çendeke dirêj nedîtibû, min ber bi keleha Dêrgulê da rê. Danê êvarê bû, tava ko dinya bi agirê dûjehê qelandibû, hedî hêdî, li pey zeviyên boş ên deştê diçû ava. Li rê ez pêrgî gelek kesên ko ji seferê vedigeriyan û gelekî westiyayî dixuyan, hatim. Sefer bi serfirazî kuta bûbû, lê kesên ko ji seferê dihatin, mizafer nedixuyan û çu tişt nedigotin. Bi tenê ev gotin ji devê wan derdiket;

Dêrgul dişewite.

Min hespê xwe rakir çargaviyê û dewsa ko ez ber bi gundê ko Mîr konê xwe li kêlekê vedabû, min xwe da ser riya kelehê. Hingê, gava xelk ji wir, bêyî ko li paş xwe binihêre, gavegav, vedigeriya û ez ber bi kelehê diçûm, Tewrat û ew rûpela ko Mam vekiribû kete bîra min. Heke bê bîra we, min ji we re behsa wê berbanga kirêt ko Mam xebera vegirtina keleha Seîd Begê gîhandibû me, kiribû, berbanga ko Mam rûpelên Tewratê vekiribû û paşê di xew re çûbû. Dotira rojê, çaxê Mam dîsan çû nik Mîr, ez vegeriyam kitabxanê nik masê û min li rûpela vekirî nihêrt. Bêyî ko Mam pê bizanibe, ewî rûpelek vekiribû ko tê de sûretekî mezin ê neqişandî hebû. Di sûret de zilamekî û sê jin hebûn, zilam û du jin li çoleke beyar dimeşiyan û li pey wan jî bajarekî fireh dişewitî. Herçî jina sisiyan bû, ew, hinekî ji wan dûr, rûyê wê ber bi bajarê ko jê dûman

radibû, rawestabû. Ew, Lût, jina wî û herdu keçên wî bûn ko bi ser daxwaza Xwedayê alemîn, berî ko bajar bi barana agir û xweliyê bişewite, dev ji bajarê Sodomê berdabûn û ber bi devereke din diçûn. Lê li rê, tevî ko ji wan re hatibû gotin ko ew ê neziviriyana û li bajarê şewitî nenihêrtina, xanima Lût serê xwe zivirandibû, li bajêr nihêrîbû û di cîh de bûbû kevir.

Niha jî ez, bi meraqa xanima Lût, ber bi keleha şewitî ko herkes, bêyî ko bizivirin û lê binihêrin, jê direviya, diçûm, lê min nizanîbû ka ez gunehkar bûm an ew. Berî ko ez bigihêm kelehê, dengê topên osmaniyan xebera agir û şewatê gîhandine min. Min dengekî welê toq, tijî xof û saw, di hemû heyata xwe de, çu carê nebihîstibû. Tevî ko deng ji dûr dihat, ewî bi olana xwe hemû hawîrdor vedigirt û her çi zindî bû, teyr û rawir jî tê de, ditirsand. Û çaxa keleh li ber çavê min xuyabû, ez li ser hespê xwe veciniqîm; keleha ko li ser bilindahiyên herî jor ên zinaran ava bûbû û mîna hêlîneke teyrên êlo dixuya, bi rastî jî dişewitî û gulokên gur ên agir ber bi asiman bilind dibûn. Ro çûbu ava, êvara ronî daketibû û di êvarê de ronahiya agirê keleha Dêrgulê hawîrdor qulipandibû ser berbangê. Osmaniyan topên ko bi tenê bi hesp û bergîran dikarîbûn bên kêşandin, hilkişandibûn jor, herdu milên bilindahiyên zinaran û ji wir keleh gulebaran dikirin. (Paşê min bihîst ko kurdan ew top hilkişandibûn jor.)

Mîr û begên kurdan ko çu carê nikarin bi bayebilindiyeke mezin, mîna dewlet û hukimdariyê rabin, qîma xwe hertim bi hin payebilindahiyên biçûk tînin. Seyd û nêçîrên gumreh, dengbêjekî ko hem dengê wan hem jî denge tarîxa wan e, mêvanperwerî, dawet û dîlanên ko li ser zimanan e, ji bo wan payebilindî ye. Herweha keleheke asê, qehîm û maxrûr ko di bilindahiyên herî asê yên zinar û çiyan de ava bûye û li milekî tirsekê dide ehlê navçê û li milekî jî xurtî û esaletekê nîşan dide. Keleha Dêrgulê ko esalet û payebilindiya Seîd Begê bû, niha bi topên osmaniyan dihate hilweşandin û jê agir û dûman digihîşte heft qatê asimanan. Bêguman bi alîkarî û rêdana mîr û begên din ên kurdan ko hê nizanîbûn ko ew top ê rojekê di zikê kelehên wan de jî biteqiya. Topan kevir li ser kevirê Dêrgulê nedihîştin, bêguman li ser daxwaza Mîr jî, ko ne ewî, ne jî me, hê nizanîbû ko lilûyên wan topan ê rojekê biziviriyana ser payebilindahiya Mîr, keleha Ewrexê jî.

Dêrgul dişewitî, lê gelek kesên ko di kelehê de bûn, xwe spartibûn çiyan, der û dorên şikeftên ko di eynî wextê de hêlînên teyrên dirende bûn. Ez ê, heke Yezdane Dilovan taqetê bide min, di şevbuhêrken me

yen bê de, bi dirêjî behs lê bikim, lê belê, min dil heye, niha, bi tenê hewqasî ji we re bibêjim, ko çaxa ez pergî çend kesên ko ji kelehê reviyabûn, hatim û ewana ez nasîm, tafilê wan ez hildam û em, peyatî, çûn ser zinarê herî bilind ê hemû navçê, nik hevale min Yezdînşêr, xwarziyê Seîd Begê ko êdî dîl ketibû û li ser riya welatê xerîbiyê bû. Yezdînşêrê ko bûbû peyayekî gelekî çeleng ê bejndirêj, pozberan û simbêlqeytan ko li ser beden û rûyê wî çu eybên mîna eybên beden û rûyê min û Mîgo nedixuyan, li wir ko hemû navçe mîna bergehekê jê dixuya, li ber devê şikeftekê, li ser kevirekî rûniştibû û li keleha ko jê agir radibû û bi bayê êvarê ko nû dest pê kiribû, mîna cinawirekî xwe li ba dikir, dinihêrî. Çavê wî bi min ket, lê ewî ne xwe livand, ne jî rabû ser piyan û ne jî tevgereke din anî pê. Awirê rûye wî çi bû, min jê dernexist, lê çavê wî her li ser gulokên êgir bû. Bêdengiyeke zîz li dar bû, ez bi hedîka çûm nik wî, kesên li doralî ko mîna wî bêdeng bûn, cîh vekirin, ez li kevirê kêleka wî rûniştim, mîna wî min jî çogên xwe kêşandin ber sînga xwe û li jêr, li keleha ko hew payebilindî bû û êdî dê di çîrok û rîwayetan de bima, nihêrî. Lê hîç ji bîra min naçe, hingê ew bêdengiya Yezdînşêr ko min jî baş nas dikir, agir bi ruhê min xist. Dîsan çavê min ê kor êşiya, disan dile min bû bi leyan.

Dengê bêdengiyê, guhdarên min ên bisebir ko niha hûn ê hew gotina min bibihîsin, dengê bêdengiyê bi tenê ji aliyê kesên ko bi taya dengê bêdengiyê ketine, dikare were bihîstin. Niha, bi qesta cixare pêçan û avrêjanê, bi hênceta av, mewîj û bîhnvedanê, ez ê jî biçim, gelî guhdaran, biçim û bikevim nava pêlên dengê bêdengiyê. Piştî deng, pêjn, qîrîn, qîjîn, girîn, nalîn, xirexir, xirecir û teşqeleyan, rastiya heyatê, bêdengî ye; bêdengiya mirinê ko jê xelasî nîn e û bêdengiya ko bi haletên mirin û kuştinê hatiye pê û hew dikare ji kesekî din re bê gotin. Bêdengî mîna sêbera însên e, carina li pey însên, carina li pêş, hertim bi însên re ye û çaxa însan dikeve nava kûrahiyên bêdengiya mirinê, ew jî pê re winda dibe.

Heye ko bêdengî carina ji însên bi dûr dikeve, heye ko însan carina ewê ji bîr dike, lê bi minasebeta hal û hewalekî însanî, ger kêf û henek, ger xizîn û keser, dîsan ew xwe bi bîr tîne û bêdeng diqîre; ez li vir im, ez li vir im...

Niha, piştî ko min hewl da ko ez bêdengiya sar a ruhê sotî yê Yezdînşêr ji dewr û dewranên borî hilînim û bînim, bigihînim we û gewriya min a

ji gotinê zuha niha bi taseke av dîsan şil, bi çend lib mewîj devê min tijî, di nav bayê bêdengiyê de, ez li fira hechecîkan difikirim. Fikir, heş, xeyal û xewn min hildidin û dibin nik hechecîkên reş û spî yên dûvçetel ko her bihar dihatin nik me, gundên me yên hêşîn û avî. Hechecîkên ko ji welatên germ ên çolê, ji axeke şewitî, ji devereke windabûyî dihatin welatê çiya û zozanan.

Hechecîk, banê axuran, darên tûyê, darên hejîran.
Pîrejinên ko bi misînan ava hechecîkan dixistin kortalên
keviran.
Hechecîk, zozanên bilind ên hûnik, dar û deviyên hertim hêşîn.
Xan û kerwansarayên hewşfireh, kemerxwar.
Co, gol, kahnî û bîrên kûr.
Û çem, çemê Dîcleyê ko danê sibehan û danê êvaran tîrêjên zer
ên tavê lê didan.
Û hechecîkên ko xwe noqî ava wê dikirin.
Hechecîk û dengê wan, vîçevîç, vîçevîç, vîçevîç
Dengê ko mûcîzeyekê tîne bîra însên.
Bajarên kavil ko bi perdeyên wextê,
Bi perdeyên xwelî û herî winda bûne
Tê de ne nebat, ne heyat mane.
Û ew, dengê wê, li ser girên ko li ser bajarên windabûyî hatine pê,
Û vîçevîça wan.
Keleheke şewitî û kavil ko di qelîşekên dîwarên wê de
Êdî mar, dûpişk, marîjok û gumgomok çiv didin.
Li maleke hilweşiyayî ko di eywanên wê de
Giya bejn avêtiye.
Di navbera kevirên bîra miçiqî ya hewşê de
Kulîlkên rengîn hêşîn hatine.
Û ew, dengê wê, vîçevîça wê.

Dayiyek û zarokek.
Ku li pey hemû dengên ko bi darbeya şûrê hatine birîn.
Dengê wan, mûcîzeya ko hatiye pê.
Dayik û zarok, di hembeza hevûdu de, li ser hev.
Kadîn. Bîhna ka û pûşî. Bîhna xwînê.
Pêşî deng, nalîn, axîn.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Paşê çav, nêrîn.
Birû, mijang, Bîbik. Di nav xwînê de.
Birîn, xwîn, êş.
Destê dê li ser rûyê zarok. Xwîn, bi tenê xwîn.
Dest xwînê paqij dike. Lê dîsan xwîn.
Lê deng jî, girîna zarok, axîna lêwik.
Heyat, li pey her tiştî dîsan heyat.
Darbeya şûr, mirin, xwîn û li heyatê veger.

Tevî xwînê, çav vedibe. Carek, du caran.
Perdeyeke reş, lê çilkeke ronahî,
Ku di navbera reşahiyê re dixuyê.
Reşahî, ronahî. Reşahî, ronahî,
Mîna kelekeke li ser pêlên avê,
Carekê ber bi reşahiyê, carekê ber bi ronahiyê.
Lê hembêz, hembêza dayik a germ, a nerm, a boş.
Hembêza şil ko jê xwîn diherike.
Nefes, hilm, germahiya dayikekê.
Tevger, pêşî dest, paşê mil, pî, ling, hemû beden.
Bi hedîka, bi tevdîr.
Tevger, carek, du caran...
Kadîn, ka, axur, bêdengiya boş.
Ne dengê pez, ne dengê însan.
Tevger, di erdê re, di ser ka û pûşê re.
Ber bi ronahiyê, ber bi deriyê vekirî.

Li ber derî, li erdê, li ser piştê.
Dayik û zarok, di hembêza hev de,
Di nav xwînê de.
Ronahî, tîrêjên germ ên tavê.
Bîhn. Bîhna axê, giya, çîçek, rihan.
Dar û ber. Bayekî sivik,
Li hawîrdor, di nav çiqil û perên daran de.
Li ser rûye qelişî, jêbûyî.
Tîrêjên sor li ser rûyê ko bi xwînê sor.
Asiman. Çîkî şîn. Tê de xêzên spî, mîna gulokên hirî
Rojeke nû, ronahiyeke nû, nefeseke nû.

Lê ne deng, ne hes, ne pêjn.
Ne zar û zêç, ne jin û pîrejin, ne mêr û kalemêr.
Ne dîk û mirîşk, ne berx û mî

Hingê ew. Bi tena serê xwe, di ser daran re.
Ber bi kahniya gund, ber bi avê.
Xerîb, koçber, mêvan.
Biçûk, nazenîn, narîn.
Reş û spî. Dûvçetel.
Lê ew, dengê wê. Vîçevîç, vîçevîç, vîçevîç.
Hechecîk. Mûcize.
Hingê dengê hechecîkê, dengê heyatê...

Dengê dengbêjên ko hertim dengê methiye û pesnan e, hema çi bigire hertim bi şox û şeng e. Ne agir û tofan xema wan e, ne jî hilweşîn û felaket, ne derd û keserên însên, ne jî bêçaretî û bêgaviya xelkê ketî. Dengbêjên methiye û pesnan, dengê xwediyê xwe ne. Dîn û îmana xwediyan, dîn û îmana wan, gotin, kirin û qewlê xwediyan, yên wan e. Mîna heyva ko li dora dinyê, dinya ko li dora tavê dizivire, ew jî hertim di nav lingên xwediyan de çerx dibin. Wîcdan û merhemeta gotina wan bi qasî wîcdan û merhemata şûrê xwediyan e, heke şûr di kalanan de ye, dengê wan nerm e, heke şûr ji kalan kêşandiye, dengê wan jî mîna şûr tûj e.

Heke hûn meraq dikin ka ez çima, piştî bîhnvedana me, van tiştan dibejim, divê ez bibêjim we ko ne bi tenê Seîd Beg, mal û xismên wî û keleha wî kete ber agirê osmaniyan, herweha dengbejên wî jî. Dengbêjên ketî û şikestiyan nîn in, heke hebin jî dengê wan nayê bihîstin. Ji ber ko çu kes naxwaze dengê ketî û şikestiyan bibihîse û li dengbejên wan guhdarî bike. Çîroka ko ketî û şikestî dibêjin, çîroka ketin û şikestinê ye ko bazara wê zahf kesat e. Ketin û şikestin pirî caran pêşî bêhêvîtiyek û paşê jî tirs û xofeke nediyar tîne pê ko ne bi tenê tevgerên civatekê, herweha ruhê kesên civatê jî vedigire. Qîrîn tên fetisandin, girîn rondikên xwe winda dikin, pirs tên veşartin, bedenên westiyayî sist dibin, derî bi hêdîka vedibin, însan bi endîşe tevgera xwe girêdidin û stêr bêdeng dirijên. Ez ji tecrubeyan dizanim; însan naxwazin bitirsin, naxwazin ketin û şikestinê bi bîr bînin, naxwazin heyata wan di nav tora xofê de bixeniqe. Tiştê bû, mekeve dû, bav û kalan gotiye da ko bîne bîra însên ko her tiştê qewimî ko tê de jan, keser, neheqî û bêbavî heye, li pey bimîne û bal û rû

ne ber bi milê paş, lê ber bi milê pêş be. Ronahî ne li pey, lê li pêş e, herweha hêvî, serfirazî, bextiyarî û heyateke mesûd. Û xewn û xeyal ko însan çu carê bêyî wan nabe. Bi gotinekê, ez dikarim bibêjim, însan weha difikirin; tu dê ji bîr bikî da ko xewn û xeyalên xwe bi ser xî.

Ji lewre, ez bibêjim we, dengbêjên methiye û pesnan ko bi şox û şeng, qala xwediyên xwe û heyatên wan ên mêrane, serpêhatiyên wan ên egîd, fikir û gumanên wan ên bêpayan dikin, ne dengbêjên bibîranînê, ji bervajiyê, dengbêjên jibirkirinê ne. Belê, Seîd Beg ko tevî bi qasî du sed însanên xwe, xwe spartibû kelehê, mal û malbata wî jî pê re, di navbera hezên çekdar ên osmaniyan de, şikestî, stûxwar, berê xwe da welatê xerîbiyê û çû. Bi dû çûyina wî re, wirde wirde, hem Seîd Beg, şewata keleha wî û çûyina wî, hem jî gundên ko hatibûn şewitandin, însanên ko hatibûn kuştin, ji bîr bû, heyat dîsan vegeriya ser qewlê xwe yê berê ko pirî caran bûyeren bûrî, ketin û şikestin tê de naxuyin. Dîsan ehlê Botanê di keleberbangên sibehan de hatin bajêr, kerwan ji bajêr veqetiyan, bayê spêdê yê hûnik di ser çiyayan re pişta dar û deviyan şeh kir, mîna her carê tîrêjên ko li pey çiyayê Cûdî serî hilda, li ser ava çêm ko her û her diherikî, leylan da, jinan li pey deriyan li mêrên xwe nifir kirin, pîrejinan li hewş û eywanan, ji bo neviyên xwe dua xwendin û dengbêjên ko dengê wan dihate bihîstin, strana xurtî û mêrxasiyê gotin.

Wext ko mîna deryayê, ji pêlan tê pê, weha ye; pêlek dere, yeke nû tê. Pêl radibe, xurt dibe, baskên xwe tijî av dike, digihê qata herî bilind û ji nişka ve ber bi jêr dibe û hêdî hedî li qiraxên avê winda dibe. Lê çaxa ew winda dibe, yeke nû bilind dibe. Pêl tên, pêl derin, guhdarno, lê pirsa min eve ye; ka kîjan dengbêj dikare dengê pêlan bi guhdaran bigihîne? Dengbêjên methiye û pesnan ko dengê wan hertim bilind e û tê bihîstin? Dengbêjên ko di dengê wan de sûzenî, sextî û endîşe heye û dengên jibîrbûyî digihînin guhdaran?

Di ser hilweşîna keleha Seîd Begê û kavilkirina navçê re bi qasî du salan derbas bûbû û însan, bi pirsên nû, endîşe û hêviyên nû, di nav tevgerên nû de bûn. Mîrekiya ko xelkê bawer dikir ko wê dê quweta xwe winda bikira, ji bervajiyê, hêz û quweta xwe bêtir kiribû û tixûbên xwe gîhandibûn deverên dûr ko bi çarmedorî digihîştin Mûsil, Şingal, Riha, Siwêreg, Wêranşar, Diyarbekir, Wan, Mikus, Şino, Wirmiye, Seblax, Rewandiz, Hekar û Sêrtê. Mîrê ko hevalbendê padîşahê Osmanî bû û bi şixulên Padîşêh ên şer û êrîşan radibû, di eynî wextê de pêwendiyeke xurt bi Şahê Îranê re jî danîbû û li milekî din jî bi beg, axa, şêx û mîrên din ên

kurdan re jî xweş dikir û hukimdariya xwe geh bi gotina şêrîn, geh bi şûrê tûj li ser wan jî ferz dikir. Ewî aştiyek ko bi tayekî xav hatibû dirûn, anîbû pê û malbata Seîd Begê jî tê de, bi mal û malbatên jênexweş re jî pêwendiyek ava kiribû. Ya herî balkêş jî, ewî Yezdînşêr ko biraziyê wî dihat, îkna kiribû ko Yezdînşêr jî bibe şêwirmendê wî û hertim pê re be. Bazarên bajêr û yên Cizîra Botanê zêde bûbûn, bazirganî bi pêş ketibû, kerwanên bêhejmar dihatin û diçûn, xwarin û vexwarin geş bûbû û halê xelkê jî, ji her carê bêtir, xweş bûbû. Çaxa hal û wextê xelkê li cîh be, bûyer hîn zûtir ji bîr dibin û herwekî ko tê gotin, kes xwe nade ber dîwarê ketî, lê herkes xwe dide ber dîwarê qehîm û kes êdî li tofana li rê nafikire.

Herçî ez bûm, ji bilî mala Mam Sefo, min ji xwe re stariyek peyda kiribû; mala Apê Xelef. Apê Xelef, ew kalemêrê yezidî yê şên û zarşêrîn ko ez xwedî kiribûm û riya umrê min dabû ber min, li doraliyên Tiyarê, di nav zinarên asê û zincîra çiyan de, kulavê wî lehîfa wî, kumê wî bahlîfa wî, bilûra wî li hembêza wî, di bin xalîçeya stêran de, li teniştа şivanên ko li ber destê wî mezin bûbûn, serê xwe danîbû û çavê xwe girtibû. Ma şivanekî ko umrekî, mîna gotinên xwe, sade, lê bi gotin û serpêhatî gelekî dewlemend bihurandibû, dikarîbû ji mirineke weha ko di dilê tebiyetê de dihate pê, çêtir mirin bidîta? Heme ko êdî bûbû alîmekî navdar ê dînê îslamê û nav û dengê wî roj bi roj bêtir belav dibû, vegeriyabû Cîzîrê û qesreke biçûk ko bi kevirên reş ên Cûdiyê lêbûbû, ji cihûyekî botî ko koçî welatê Filistînê kiribû, kirîbû û tevî du jin û sê zarokên xwe li wir bi cîh bûbû. Heme ko li gora gotinan bi mildana şêxên neqşîbendî yên welatê Hekar û Şemdînanê, ji nişka ve bûbû dewlemend û xwedî pez, dewar, mal û milk, du jin, yek ji şêxên Medresa welatê Xerzan, yek jî xweha hevalê wî Kemaledîn ko bi me re hatibû gera me ya Mûsil, Bexda û Babîlê, lê li rê vegeriyabû, kiribû û ji niha ve bûbû xwediyê sê zarokan. Lê belê, çaxê me, piştî çend salan, cara yekemîn hevûdu li şîna Apê Xelef dît û em çûn rûyê hev, ewî, tevî ko şîn û tahziye bû, bi payebilindî, gote min ko wî dil hebû çar jinan bike û bi qasî bîst zarokan çêke. Heme ko mîna berê jar û zirav bû, xweha xwe Gulîzerê ko bi pitepita xwe ya ji bo zewacê guhê min biribû, lê her gava ko keys li min dihat, min memikên wê mîna ko ez porteqalekê bimêjim, dixiste devê xwe, biribû ba xwe, mala xwe ya mezin. Mala stûxwar ko xwediyê xwe winda kiribû û ez tê de, bi bîhna genî ya tir û fisên Heme mezin bûbûm, ji min re mabû û êdî bûbû mala min. Ma Heme ko navê xwe kiribû Hemeyê Malmîran û bi hemû şixulên madî û manewî radibû, dê mala neçar ko ji hev diket, çi bikira?

Mam Sefo ko piştî wefata Senemxanê yekcar ketibû û guherîbû, tevî ko ew ji gelek tiştan nerazî bû, dîsan vegeriyabû ser karê xwe û hema çi bigire hemû wextê xwe li teniştа Mîr û li kitabxanê derbas dikir. Ewî şixulên xwe yên pere, mal, milk û bazirganî êdî teslîmî Migo kiribû û bala wî ji mal û milkên dinyayê bêtir li ser kitab, xwendin û gotinên ko di nav rûpelên kitaban de, mîna wî bêdeng, dinivistin, bû. Ez jî, em dikarin bibêjin, bûbûm keyayê Migo û bêyî ko ji hal û hewalê malê dinyayê tiştekî fahm bikim, hertim pê re bûm û çaxa hesab, hatin û çûyinê bîhn li Migo diçikand, min jê re çend stranên Apê Xelefê rehmetî ko qala bêrîvanên bedenşox û memikgewher dikirin, digotin.

Min mala xirbe hinekî da hev, li ber derî, ew du sê darên bilind ên çamê ko xênî dalde dikirin, birîn, mîna şaneşîna kitabxanê, ji kevirê reş û textê spîndaran şaneşîneke fireh ko dirêjî çêm dikir, da çêkirin, axura teniştê ko êdî bi kêrî tiştekî nedihat, bi paqijiyeke serast, qulipand ser mêvanxaneyekê û çi bilûr, tembûr, saz, erbane û alavên din ên gotin û lêxistinê yên min û yên Apê Xelef hebûn, hemû xistinê, mezelê min û Heme jî kire mezelê razanê, bi kerpîçan bilindahiyek ko bi eywanên malên Mûsilê dişibiyan, da çêkirin û çûlê xwe yê hûnandî yê rengîn û doşega xwe ya hirî li serê raxist. Cîhê razanê girîng bû, ji ber ko ez piraniya caran ji bo xewn, xeyal û çêkirina stran û şiîran diketime nav nivînan. Nivîn êdî warê min ê xewn û xeyalên Gulîzer, Armê, keç û jinên têkel ko min li Mûsil û Bexdayê nasîbûn û gotin û stranên ko min niha ji her carê bêtir dixwest li hev bianiya û jê hunereke bedew afiranda, bû.

Xwendina min, kitabxana Mam Sefo, ger û geştên min, sûtalî û tolaziya min, avahiyên xirbe ko bala kesî nedikêşandin, kal û pîrên piştxozîk û diranketî ko kesî li gotina wan guhdarî nedikir, çolên qiraç ko muhtacî dilopeke avê bûn, golên ko di nav çiyan de xwe veşartibûn, zeviyên ko di bin tava germ de stû xwar kiribûn, xanên gemarî ko tê de însan û mişk bi hev re diniviyan, gundên birçî ko dûkel û ardûyên wan vemirîbûn, qonax û malikxaneyên şewitî ko hew bala kesî dikêşand, hewş û eywanên fireh ên dêrên qedîm ko tê de çêla ders û tecrubeyên bi hezaran salan dibû û ew hemû însan, seyda, feqe, keşe, metran, şivan, mîr, beg, diz, qeşmer, kedxwar, zordar, parsek, sextekar, neçar, feqîr, pîr, durû, dilsoz, bayê destê sibê ko strana tofan û afatên herî kevn ên însaniyetê hê jî digotin, berf û baranên ko hukimdariya kayînatê bi bîra însên dixist, mar û marîjokên ko li pey medeniyetên kevnare mabûn, hemû bi hev re alîkariya min kiribûn da ko ez bibûma însanekî xwedî ders û

tecrubeyan. Lê ez hê jî însanekî bêkar, bêşixul û bênav bûm. Herçiqas min ji kesekî din re negota jî, mîn nav, şan, şoret, afirîn, berhem û şixulê hûnandin û lihevanînê diviya.

Ez dengbêj im, bi tenê dengbêj, min di nava nivînan de, ji xwe re digot, ne tiştekî din, ne tucar û bazirgan, ne esker û şervan, ne alîm û şêwirmend, ne beg û mîrzan, ne jî şivan û gavan, bi tenê kesekî ko bi dengê xwe, bi gotina xwe diafirîne, bi gotinê dijî, bi gotinê radibe. Lê ne mîna dengbêjên şox û şengê ko li pey kêf û henekan in, mîna dengbêjekî ko dikare bi alîkariya gotinê jana çavê xwe yê kor û birîna ruhê xwe yê şikestî derman bike.

Di wan rêwîtiyên xwe de, çaxa ez di nav deng û pêjnên dewr û dewranên windabûyi de, bêyî çu hedef û armancê, digeriyam, min bîr bi tiştekî bir; tenêtî. Tenêtiyeke kûr, qehîm û dûr diviya da ko însên bikaribiya bibihîsta, bijiya û biafiranda. Tenêtî ko ji bo însanên me yên kom û eşîran, tiştekî zahf xerîb bû, kozeke agirê manqelê bû ko hunermend diviya bi destên xwe pêgirta. Deng, yanî dengê sade, zelal û rast ko dengbêjekî hêja hertim diviya, di nava bêdengî û tenetiyê de nezîkî li însên dikir. Bêguman ne bangê hemû dengbêjan yek bû, ne jî dengê wan mîna hev bû, lê dengbêjî ne bi tenê deng û hunera awazê bû, jê re xîretek ko her berdewam bû, sebatek ko tevî her zehmetî li dar bû, metanetek ko dikaribû xwe li ber her tiştî rabigirta û hêzek ko tevî hemû mûsîbetan dikarîbû biafiranda jî diviya, da ko dengbêj bikaribiya riyeke xas bida ber xwe û nemiriyek ji dengê xwe biafiranda. Çu baweriya min bi dengbêjên ko berdevk bûn û nikaribûn riyeke xas bidana ber xwe, nîn bû, ji lewre jî min tenêtiyeke kûr, dengekî xas, riyeke taybetî û awaz û gotineke cihê diviya. Gotinên pak û germ, şêweyekî nû û cihê, çêl û qalên balkêş û lihevhatî, zimanekî nû yê sade, tazî û ji şox û şengan dûr, ko gotinên wî li bêjing û seradan ketine, ko tê de şopa hûnandineke xurt diyar e, tê de dengê fikir, guman û wicdane hertim tê bihîstin... min ev xusûsiyet diviyan.

Qewlê min, ez bawer im, hê di zaroktiya min de, bi ders û şîretên Apê Xelef, diyar bû; ez ê nebûma darek ji darên daristanekê, lê ez ê bibûma dara tûye ya qehîm a qiraxên çemê Dîcleyê ko şahidî li pêwendî, bûyer, qeder û gotinên têkel dikir û jê, ji bo nêrevan û guhdarên giranbuha, ders û tecrubeyek diafirand. Ders û tecrubeyeke nû, lê di eynî wextê de mîna çiyayê Cûdiyê, çiyayekî ji zincîra çiyan.

Gotina min û cûreyê vegotina min diviya sade û zelal bûya. Lê sadebûn



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û zelalî ne şixulê herî hêsan ê dengbêjekî bû, ji bervajiyê, heye ko şixulê herî dijwar bû, ko jê re zanîn, huner, quwet û sebir diviya. Heta ko dengbêj her tişt û hemû xirecirên rojane li pey xwe nehişta û neketa nav kûrahiyên dengan, nav kitekitên bûyer û pêwendiyên aloz û têkel, çu carê ewî nikarîbû xwe bigîhanda gotineke sade û dengekî zelal. Dengbêj diviya jê çi dihat, texsîr nekira, ne zexelî, ne jî sistî, her û her lêhûrbûn, lênêrîn, afirîn û gotin. Careke din, careke din, ji nû ve, bi awayekî nû, bi şêweyekî cuda, heta ko dengbêj bibûya dengbêj, yanî hosteyê gotinê. Ez hîn bûbûm; gotin dikarîbû best, hest, kel û hîsên însanî bigîhanda însanan, lê gava gotin bi şêweyekî sade li hev hatibûya, bi awayekî zelal bihata gotin.

Guhdarno, yek ji dersên hemû heyata min eva hanê ye; gotina ko di xizmeta însên de ye, dikare xapînok be, deng dikare însên bixapîne. Gotin dikre, ji ber şert û mercên doralî, gelek tiştan li xwe qedexe bike. Gotina xav û nekemilandî ko ger bi niyeteke çê, ger neçê tê gotin, dikare daxwaza herî xweş a însanî jî têk bibe, dengê ko ne ji dil, lê ji ber rewşê tê gotin, tevî ko ew çêla hîs û xwestekên herî însanî jî bikin, dikare dinyayek ji derewên pûç raxîne ber çavan. Tu dê çawan li bilûre bixînî, tiliyên te dê bi çi ahengî li ser qulên bilûrê bigere, tu dê têlên tembûrê bi çi şêweyî bînî zimên, tu dê ji kîjan gotinan dengên çawan biafirîni? Tu dê di nav perdeyên deng û awazê de çawan bi hostehî bigerî? Tu dê yekîtiyeke têkûz û qehîm di navbera dewlemendiya gotinan, hunera gotineke nû li ser hîmekî kevnare, pergala lihevanîna wan, ahenga gotinê, hûnandina wan û ûslubê de çawan bînî pê? Hunermendiyeke hêja ko nabe koleya şert û mercan, bersîva van pirsan ji we dixwaze, gelî guhdaran.

Ji lewre ez li mezelê xwe yê xewê ko êdî ne bi bîhna tir û fisên Heme, lê bi bîhna xwîdan û avikê tijî bû, di nav nivînên xwe yên gemarî de dirêj dibûm, piraniya caran dest û tiliyên min di nav şeqên min de, min gunik difirkandin û ez diketim kûrahiya haletên însanî û li dengan, li gotinan, li şêwe û çeşnên lihevanîna wan difikirîm.

Rojekê ko dinya êdî ber bi biharê diçû û hewa, mîna ko ew henekên xwe bi însen bike, di rojekê de heye ko bîst caran xwe diguherand, ji xunaveke boş, tafilê diqulipî ser taveke germ, danê êvarê, ez çûm mala Mam Sefo ko bangî min kiribû. Mala ko hertim jê dengên têkel dihatin, niha bêdeng bû û zarokên malê Migo û Armê çûbûn welatê jor. Migo tevî keriyekî pezê mêşîn çûbû Mikusê û ewî xweha xwe jî bi xwe re biribû da ko ji wir ew biçûna welatê Wanê, nik xismên xwe yên xalan û dayika xwe

ko li wir diniviya, ziyaret bikirana. Gava ez gihîştim malê, qata jor, warê me hemûyan kitabxanê, Mam Sefo li ser sedirê xwe, şal û şepik lê, li ser sînga wî kitabeke qalin a vekirî ko berbixûn bû, çavên wî girtî niviyabû. Bi ketina min a hundir ew hişyar bû û xwe da hev, rabû ser piya. Por, simbêl û rîha wî êdî spî bûn, fera ko hertim li ser bîbikên çavên wî bûn, niha tefiyayî bû û tevgera wî, li gora bedena wî ya girs, girantir bûbû.

Were Biro, ewî gote min û çû deriyê şaneşînê vekir, were kurê min.

Baran sekinîbû û taveke helesor lê dabû, bîhna axa şil ko ji hawîrdor difûriya, heta ber difnên me dihat. Mam Sefo ko ji bervajiyê ehlê Cizîra Botanê hîç tiştekî ji bîr nekiribû û ji jibîrkirinê nefret dikir, heyama nû ko aram û sakîn dixuya, mîna rojên sakîn ên beriya tofana Nebî Nûh didît û hertim gotina xwe dubare dikir da ko em bi tevdîr bûna. Lê îcar ewî ji bo tiştekî din bangî min kiribû.

Piştî ko çay hat û me çaya xwe vexwar, ewî qelûna xwe bi titûneke zer a veçirî dewisand, ew pêxist û jê gurzek, du gurz kêşand, gote min,

Kurê min, piştî çend rojan Newroz e, bi hênceta Newrozê, Mîr şênahiyên gumreh li dar dixîne da ko dost jî, dijmin jî bibînin. Şeva Newrozê, di qesra Mîr de, du tişt têne pê, yek, Mîr û mîr, beg û giregirên hemû welêt ê li Birca Belek şîva êvarê bixwin; dudo, li xanê jî şevbuhêrkeke dengbêjan li dar dikeve. Ez dil dikim, tu jî li wir bî.

Mamo, min gotê, carek, du caran kuxiyam, jê hinekî bi dûr ketim, çûm li bin lewha teyrê tawis sekînim û min gotina xwe domand, te dît, bav û kalan gotiye, bêyî şêx û pîr mere dîwana mîr. Min ne şêx hene, ne jî pîr, ez rebenê Xwedê çi bikim, çawan herim dîwana Mîr?

Biro, kurê min, dev ji henekan berde, eve, ne bi tenê daxwaza min e, şeva berê, li qesrê, di hizûra cimatê de, Mîr tu û hal û hewalê te ji min pirsî. Ewî tu, cara yekemîn, di şeveke Newrozê de dîtiye û dixwaze dîsan di şeveke Newrozê de bibîne. Ew ê jî bê şevbuhêrkê. Ew dil dike ko tu li wir bî.

Min hew dikarîbû tiştekî bigota û ez ê neçar biçûma şevbuhêrkê. Tirsa min ji şevbuhêrkê nîn bû, lê heke tiştekî bihata xwestin, min ê li wir çi bigota?

Bi minasebeta Newrozê, sê roj û sê şevan ehlê Cizîra Botanê kêf kir, xwar, vexwar, govend girt û her celeb şênahiyên welêt li dar xist. Sifreyên ko bi sedan kes, li pey hev, lê rûdiniştin û jê radibûn, tevî her texlîd xwarinên Cizîra Botanê, hatin raxistin, zarokên ehlê misilman, hatin sinet kirin, dawet û dîlan li dar ketin, mahra xort û keçên xama hatin birîn û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

roja dawîn, êvarê, li xana qesrê, şevbuhêrkeke dewlemend a dengan hate pê. Xana qesrê di binê malikxana mîrzayên malbata ezîziyan, yanî malbata Mîr bû û li gora gotinê, mîrza Bengîn ko di çîroka Memê Alan de, birayê Zîna Zêdan bû, ew ava kiribû. Xana ko di nav kelehê de, ji bo mêvanên mîrekiyê hatibû ava kirin, rasterast di bexçê re xwe digîhand çêm û kesê ko bixwesta, dikarîbû di ser çêm re jî, bi qayik û kelekan bihatayê. Xan bi kemeran lêbûbû û her kemerekê mîna mezelekê hatibû raxistin. Mîna ko însan li hemamê bûya, deng li wir perde bi perde bilind dibû, olan dida û heye ko ji ber vê yekê dengbêjan ê şevbuhêrka xwe ya Newroza wê salê, li wir, li dar bixista.

Min cil û bergên xwe yên herî nû û paqij ko bi destê hurmeyên mala Mam Sefo hatibûn şuştin, li xwe kirin, simbêlen xwe badan, ew bi rûnê behîfê biriqandin, girêkeke qehîm avête doxînê, xwe da hev û ez bi rê ketim, çûm qesrê, nik Têlî ko li medresa qesrê li hêviya min bû. Têlî ko mîna min bejndirêj bû, lê ne mîna min ji çavekî, ji herdu çavan kor bû, mîna mamê xwe Salih Beg, bûbû seydayekî temam. Em bi hev re daketin jêr, xanê. Tevî ko êvarê hê nû dest pê kiribû, hema çi bigire xan tijî bû û her komeke dengbêjan mezelek vegirtibû, lê li gora qewle cîhê edebê. Li welêt mîr hebûn, beg, axa, şêx, alîm, milkdar, bazirgan, keya, rîspî û giregir hebûn. Dengbêj, çîrokbêj, bilûrvan, sazbend, qasid, berdevk û qeşmerên wan hebûn. Herkes diviya di meclîs û dîwanan de, di şevbuhêrk û civatan de li gora cîhê xwe yê edebê rûnişta. Xana Mîr ê wê şevê li gora qewlê cîhê edebê ko seyis û keyayên qesrê bi rê dixistin, ji dengbêj û tembûrvanên navdar û xwedî huner ko ji her aliyên welêt hatibûn, heta sibehê, bi dengên wan bigeriya.

Ez, Têlî û du peyayên pê re, em çûn mezelek ko pîr û feqîrên êzidiyên welatê Serhedê lê rûniştibûn. Êzidiyên rîhdirêj, cilspî û libasdirêj, tevî def, erbane, bilûr, saz û tembûrên xwe, rûniştibûn û hêdîka qewlên xwe, mîna stran digotin. Şîv hatibû xwarin, şerbetên têvel û ava hinaran hatibû vexwarin, sifre rabûbû û dor hatibû gotinê. Gotin, kilam û stran mezel bi mezel digeriya, ji yekî vediguhezî yekî din û her mezelê ko gotin werdigirt, bi deng, awaz û ûslubên heremên xwe, carina bi dengê dengbêjekî, carina bi dengê komê, geh bi stran, geh bi çîrok, rengekî nû dida gotinê, ew dixemiland, bi qasî çendekê digot û paşê dewrî mezelê teniştê dikir. Her tiştê ko ji bo stranekê diviya, ji seyd û nêçîrê bigire heta şer û pevçûnê, ji evîn û sewdayê bigire heta dexesî û hesûdiyê, her tişt di nav gotina ko digeriya de hebû. Salixdan, lihevanîn, pesn û methiye tijî bûn.

Yek bi straneke Beriya Mêrdînê radibû û digot,

Paşil tûştirê û kemal keroşkê
Bisk bi têlê û pêşmal şînê
Ser bi zêrê û diran sedefê...
Di nava serê wê de çil û şeş kezî ne
Tiliyên xwe ji mûm û şimayê birîne

Yekî din ji mezelê teniştê gotinê werdigirt, berî ko dest bi stranên heremên xwe bike, ji bo nîşandana hunermendî, jîrî û zanîna xwe, strana ko dihate gotin, didomand.

Siphan ji Xwedê re
Tu dibêjî, newqa xwe ji keroşkê û çavên xwe ji xezalê dizîne
Xurmîn dikeve toq û beniyan
Şewq û şemala vê xezalê davêje çol û çiyan
Davêje ser deryayê li ser pişta gamasiyan...

Bala min li ser wan, guhê min li ser gotina wan, di devê min de ne gotin, lê hejîrên hişk û behîv, ez difikirîm; gelo hêz û quweta van însanan çi bû? Mîna beg, axa û şêxên wan, çek, sîleh, mal, milk û pereyên wan nîn bû, piraniya wan neçar û belengaz bûn, lê tevî vê yekê navekî wan, rêz û rêzdariyek ji bo wan, quweteke wan hebû. Helbet, min digote, quweta wan, gotina wan bû. Beg û axayên ko dengbêjan dipesinandin, dibûn xwedî nav, şan û şoret, yên ko dengbêjan çêr û nifir lê dibarandin, ne li nik xelkê, heye ko li nik jin û zarokên wan jî rûmeteke wan nedima. Gotin, tevî her tiştî, xwedî hêzeke diyar bû ko di şeva xana Mîr de li dar bû.

Derengê şevê, ew dema ko herkes li hêviyê bû, hate. Pêşî kurtepist û tevgerek kete nav şêniyên şevbuhêrkê, paşê peyayên çekdar ên Mîr hatin û li hemû doraliyên xanê belav bûn, bi dû wan re jî berdevkên Mîr û dawiya dawîn jî Mîr. Mîrê ko me hertim navê wî dibihîst, ne bi tenê bi comerdiya xwe ya bêpayan, bi seyd û nêçîrên xwe yên bi heftan û bi hostehiya gerandina karê mîrekiyê, herweha bi doxîna xwe jî nas bû û ji niha ve çar jin kiribûn, xwediyê bi qasî deh cariyan bû û hejmara zarokên wî her roj zêde dibûn; Mîrê ko mîna canbazekî di navbera osmaniyan, farisan, mîrên kurdan, axa, beg, şêx, mertan û keşeyên tirk, kurd, ermen, ereb, ecem, aşurî, nastûrî, suryan û keldanan de diçû û dihat û roj bi roj


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hem nav û navnîşana xwe hem hukim û mîritiya xwe bi pêş dixist, niha, di nav şal û şepikên sade yên botî de, kolozekî rengîn li serî, rîh û simbêlên wî biriqî, rûken, awirgeş, bi bejn û baleke temam lê ji min bi qasî bihustekê kintir, li nik me, li hember me bû. Li dora wî bi qasî deh, panzdeh kesên din ko Mam Sefo û Yezdînşêr jî tê de bûn, hebû. Mîr û koma li dorê, piştî ko şêniyên ko bi hatina wî rabûbûn pê, dîsan li cîhên xwe rûniştin, dest pê kirin û giran giran di navbera mezelên xanê de geriyan. Berdevkên Mîr kom, kes û dengên xanê yek bi yek bi Mîr didan nasîn û ewî jî, bi ken û kêf bi wan re sohbet dikir. Çaxa ew û kom hatin tenişta mezelê me, tevî ko Têlî li nik me bû, ewî silav da me û berî her kesî halê min pirsî. Ewî ez ji bîr nekiribûm, bi ken gote min,

Biro, xortê qenc, ez her ger û geştên te, gotin û kirinên te dibihîzim.

Qesta wi bi gotina »kirinên te« çibû, ez tênegihîştim, lê mîrekî ko destê wî dirêj bû û li her deverî sîxur, qasid, peya û însanên wî hebûn, bêguman dikarîbû bi gelek tiştan bizanibûya. Mîrê ko li dora navê wî efsaneyek hatibû pê û pirî caran, ji ber sertî û tûjiya pergalên wî yên civakî, navê wî xofeke kûr dida însên, niha, mîna min û Têlî, mîna feqîrên êzidî, li nik me, bi me re, bi zimanekî sade ko mîna zimanê xelkê sade bû, dipeyivî. Tevî ko mîrekiya wî dewlemend, erd û axa wî bêsînor, mal û milkên wî bêpayan, hatin û heyinên wî bêdawîn bû, cil û bergên wî, kenê wî, axaftina wî, tevgera wî, her tiştê wî sade bû û mîna xelkê botî û ehlê Cizîra Botanê ko jê hez dikirin, vê sadebûnê germahiyek xiste dilê min jî ko ji wê rojê û pê ve, her û her dewam kir. Lê belê dengê wî ko tê de hêz û quweteke diyar hebû, digel ko ew bi zimanekî sade dipeyivî, dengê mîr, hukimdar û desthilatdaran bû. Gotinên wî bijarte, pêjnên gotinan giran û lihevhatî bûn.

Sefo, Yezdînşêr û Têlî her pesnê te didin û dibêjin ko tu bûyî dengbêjekî jêhatî, ewî li hember bêdengiya min gotina xwe domand. Eve rast e, gelo?

Na, mîrê min, herdu destên min li ber min, mîna Têlî û hemû kesên mezêl, li ser piyan sekinî, min gotê, zêde dikin. Dengbêj, gula civat û govendan in, îcar herçî ez im, hevalên min dibêjin, ez stiriyê gulan im. Ez li kû, dengbêjî li kû!

Na, na, dev ji şermokiyê berde, ez dizanim ko tu ne şermok î, ewî bi ken got, dibêjin, gotinên te, salixdanên te ji ehlê din cihê ne.

Heke ew gotin û salixdan mîna gotin û salixdanên stran û şiîran bête hesêb, min bi nermahî got, ew, ne gotin û salixdanên bi şox û şeng in. Ne

yên kêf û henekan in.

Baş e, ewî got û hate nik min, bi destê min girt, em bi hev re, li ser mehfûr û doşegên raxistî rûniştin, bibêje min, ew gotinên çi ne?

Heke em wan mîna gotin bihesibînin, hingê heye ko ew gotinên dewr û dewranên jibîrbûyî, bûyerên kirêt ên windabûyî û hîsên ko nayên xuyan in.

Yanî tu dibêjî, ewî çavê xwe li koma ko niha rûniştibû, gerand, keniya û gote, gotinên te şerh divên?

Naxêr, min bi lava li Mam Sefo û Yezdînşêr ko li hember Mîr û min rûniştibûn nihêri û gotê. Gava Mîr û ez, li tenişta hevûdu rûniştin, hingê min ji nêzîk ve dît ko Mîr rîh û simbêlên xwe hene û birû û mijangên xwe kil kiribûn. Ne şerh, Mîrê min, min gotina xwe domand, lê heye ko însan wan bikaribe bi çend cûran têbigihê, bi çend şêweyan hîs bike. Yanî mîna çemê Dîcleyê ko bi tenê diherike, lê kesên ko lê dinihêrin, li ava wî guhdarî dikin, bêguman, bi cûreyên cihê difikirin û dibihîsin.

Mîr keniya, welê dixuya ko kêfa wî ji sohbeta tiredînekî re hatibû, ewî lingên xwe avêtin ser hev, ji sêniyê çend lib mewîj girtin û avêtin devê xwe û pirsên xwe domandin,

Dîcle diherike, Biro, kurê min, herkes çêm dibîne, herkes dizane ko çem li vir e û diherike û herkes dibîne ka ew çawan diherike. Ma jê re cûre û şêweyên cihê divên?

Herê Mîrê min, ew diherike, min gote, lê ji hezaran salan û vir ve. Dîcle şahida gelek dewr û dewran, gelek hatin û çûyinan, gelek şer û pevçûnan, gelek qise û gotinan e. Di nava pêlên wê de ko bi lehiyên biharê radibin, gelek deng hene. Heye ko ez di ava çemê Dîcleyê de sûretê Adem û Hawayê dibînim, dengê tofana Nebî Nûh dibihîsim, lê dengbêjekî din heye ko sûretê beg û axayê xwe tê de dibîne û dengên şox ên dîlanekê dibihîse.

Ma ev hemû tiştên ko tu behs dikî, pêwist in, xortê jîr? Ewî bi dîqet li rûye min ê qelişî û çavê min ê kor nihêrî û got,

Herê Mîrê min, pêwist in, heke ne ji bo kesekî din be, ji bo min pêwist in, da ko ez têbigihêm çima rûyê min qelişiye û çavê min derketiye... Çemê Dîcleyê, rast e, Mîrê min, li cîhê xwe ye û her diherike, lê di kûrahiyên ava wî de dengin û bersîvin hene, bersîvek ji bo min, bersîvek ji bo dengbêjekî din, bersîvek ji bo çîrokbêjekî din ko li pey pirs û bersîvan e...

Çaxa bêdengiyek hate pê û çavê min bi awirê tûj ê Mam Sefo ket, hingê

min fahm kir ko gotinên min ên dawîn zêde bûn û ne li gora edebê bûn.

Mîrê min, Mam Sefo, bi dengekî henek, gote, Biro şiîrekê lêdike, şiîrek ko çêla serpêhatiyên Dîcleyê dike, eger te jî dil hebe, bila Biro ji me re şiîra xwe bixwîne.

Mam dîsan gihîştibû alîkariya min. Mîr bi dengekî berz ko ji hemû aliyên xanê dihate bihîstin keniya û gote, çima na, çima na.

Dengê strana Dîcleyê ko hertim di heş û dilê min de bû û hûnandina wê ko rêzine jê bi leza birûskê lêbûn, rêzine jê mîna meşa kîsoyekê bi dirê-jahiya salan, hema çi bigire hemû umrê min girt û çu carê jî bi dawî ne-hat, li çu deverî bi temamî nehate gotin, wê şevê weha bilind bû;

Dîcle me ez, qirîna hezar salan,
Girîna nû ya îro,
Şahid im ez, wext, dewr, dewran
Xewn, xeyal, hêvî
Olana qîrînê, nalîna girînê
Şev, roj, heyam, meh, sal,
Tav, heyv, stêr, hemû bi min re,
Hemû di deriyê min re borî
Dest im ez, li ser deriyên dewr û dewranan
Derî vedibin yek bi yek
Deng dertên, kite bi kite
Riya min, ji jor ber bi jêr
Di nav hemû xweşiyen dinyê re
Di nav axa reş, axa sor, axa kils re
Ax, ez im, ax hêza min...

Hêşinahî, geşî û xweşî
Bereket, ber, heyina axê
Hemû ez, hemû Dîcle, hemû ji min
Rehê min di nav axê de, pê re
Asimanên wê, ewrên wê
Bi çivên min rengîn, bi şewqa min çirûsî
Û pêlên min, bi ba, baran û lehiyan rabûyî
Çavê min, bijangên min
Nobedarên wextê, heyam û dewrê

Û qirîna min, li ser axa şewitî
Di nav çiyayên xopan, geliyên kûr de
Ev çi hal e, ev çi hewal e?
Ka welatê aş, ka zemanên baş?

Dîcle me ez, sebra hezar salan
Li ber ba û bahozê rawestî
Li ber agir û şewatê xwe ragirtî
Li hember lîstikên bîr û heş her zînde
Berxwedan qewlê min e
Ne ji çavsoriyê, ji bêgaviyê
Ne ji zordestiyê, ji bêçaretiyê
Rê û bend li min tên girtin
Ne îro, ne do, ne pêr, hertim
Lê rewan im ez, hertim geh ji vir geh ji wir
Di nava qelîşekên keviran, bihurên zinaran, newalên çiyan re

Ez im, dengê ava qedîm
Dengê min mîrat ji do, mîrat ji bo sibehê
Dengê min di ser şer û pevçûnan
Di ser birîn, mirin û kuştinan re
Bi te re ho însan, ho dilê birîndar, ruhê sûzen
Ho nifşên do yên ketî, nifşên bê yên sext
Ho însan, xwediye mîratê
Tu li kû yî?
Te li kû hembêz bikim, bihewînim
Bi dengê xwe, bi mîratê bihebînim
Li kû dinya kete xewê
Keser, derd, xizîn û birîn sincirî
Deng hate birîn
Li kû deng hişyar dibe
Li kû ez ê dengê xwe bigihîm te, ho însan?

Dengê kîn û nefretê çu carê ji axa welatê bindest, tevî ko Mîr û mîrekiyê ji bo aştiyê hewl didan û her tişt dikirin, bi dûr nediket. Dewlet nîn bû, îdareyeke yekgirtî nîn bû, serekekî ko ji hemû şax, pî û milên welêt dihate qebûl kirin nîn bû, hez û evîneke neteweyî nîn bû. Welat ji mîr, mîrekî,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

herêm, eşîr, qabîle, bavik, mal û malbatan dihate pê û di bin hukimdariya osmaniyan de, her yek bi serê xwe hukimdarê navçeya xwe, ehlê navçê bû. Mîrê Zirav ko êdî hew zirav bû û zik lê mezin bûbû û ji destpêkê heta dawîn hertim ji bo yekîtiyeke xurt dixebitî, heye ko mîrê yekemîn bû ko di welêt de, li ser axeke zahf fireh hukimdariya xwe anîbû pê. Ewî di destpêkê de di navbera eşîr, mal, bavik û malbatên Cîzîra Botanê de yekîtiyek anî pê, bi dû re jî di navbera mîr, beg, şêx û axayên cîran de. Di wan rojên şevbuhêrka Newrozê de ko min qalê kir, halê Mîr û mîrekiyê heye ko halê herî baş bû; Mîr ne bi tenê li Cizîra Botanê herweha di navbera mîrekiyên din de jî bûbû mîrê sereke û bi begên Hekaran Nûrilah û Fetah, begên Wanê Derwêş û Xan Mehmûd, begê Xizanê Xalid, begê Qersê Husên Begê Kor, begê Mûşê Şerîf re pêwendiyeke xurt anîbû pê. Şêxên neqşîbendî û qadirî, şêxên êzidî, terîqetên sunî, şafî, henifî û elewî, malek û metranên filehan, hehamên cihûyan, hemû li doraliyên Mîr mîna perwanê dizivirîn û cîhê xwe, li gora cîhe edebê, li tenişta beg û giregirên kurdan digirtin.

Ji ber kirin û tevgerên Mîr, êdî herkesî dizanîbû ko ew bi quweta şûr bawer bû. Gerandina şixulên mîrekiyê bi pergaleke gelekî sert û îradeyeke mîna pola dimeşiya, li her aliyê mîrekiyê zîndanên tarî ko xofeke mezin dixiste dilê xelkê lêbûbûn, diz, sîxur û keleş bi xurtî dihatine cezakirin, carina dest û milên wan jêdibûn, carina jî serê wan, kes û begên ko gava xwe li gora pergala mîrekiyê nedavêt, pirî caran pêrgî cezayên giran û heta pêrgî mirinê dihatin û begên ko li hember Mîr tevger girêdidan, ne bi tenê ewana, lê mal û malbata wan jî tê de, di agirê xezebê de dihatin sotin.

Di wan sohbetên me yên kitabxanê de Mam Sefo ev celeb gerandina şixulê mîrekiyê weha bi nav dikir; edaleta şûr. Edaleta ko bi şûrê tûj dihate pê.

Mîr bi hêz û quwetê bawer e, Mam Sefo, bêyî ko ew bi xwe pê bawer be, carina kenekî zirav, carina endîşe û sûzeniyeke diyar li ser rû, digot, Mîr hertim dibêje, yekîtiya welêt ê pêşî bi şûr, bi darê zorê û bi tirsê, paşê jî bi rêz û rêzdarî were pê. Zimanê ko ehlê welêt û ehlê osmanî jê fahm dike, fizîna şûr û teqîna berikên tivingê ne, – şûrê ko jê xwîn dilop dike, berikên ko di sînga însên de diteqe. Şûr û tivingê pêşî yekîtiyekê di navbera mîr, beg, axa, şêx û ehlên têkel ên welêt de bîne pê û bi dû re jî îstîklala yekîtiyê. Pêşî perçebûnê ji holê rabe, paşê jî bindestî. Pêşî li welêt haş, paşê jî riya kaş a îstîklalê.

Ji lewre aştî û aramiyek li ser axa Cizîra Botanê ko warê her celeb rêbir û keleş, dizî û talanê bû, hatibû pê, xelkê ko hertim li ser riyan pêrgî keleş û dizan dihatin, niha bi rehetî diçûn û dihatin, gundên dûr ko bi tirsa êrîş û talana çavsoran dikete xewê, niha bêyî çu endîşê diniviyan, tirsa cîranên ko hertim dikarîbûn xayîntî li cîranê xwe bikira û tirsa keleşên biyanî ko ji qonaxên dûr dihatin û gund kavil dikirin, nemabû, herçend girtîgeh û zîndan tijî bûn, mal û milk jî ewçend bi serbestî dihate kirîn û firotin, hêzên çekdar ên mîrekiyê bi şev û bi roj di navbera tixûbên mîrekiyê ko roj bi roj firehtir dibû, diçûn û dihatin û dawet û dîlan bêtirs li dar diketin, pez û dewar, bêyî çu tahlûkê, derdiketin deşt û zozanan.

Ji bo ko aştî û hizûra mîrekiyê û hemû navçê berdewam be, hertim civîn û civat li dar bûn. Herçî Mîr bû, ewî jî, çaxa gotin dihate ser meseleyên giran û girîng, hemû beg, axa û giregirên welêt, tevî şêwirmend, aqilmend, kumandar, seyid û şêx-ul îslamên mîrekiyê, li dîwana Birca Belek berhev dikirin û bi wan dişêwirî, li dîtin û pêşniyarên wan guhdarî dikir, bersîva pirsên wan dida, da ko tevliheviyek neyê pê û aloziyek nekeve nav wan.

Lê belê tevî van hemû tiştan, aştiya ko Mîr bi darê zorê anîbû pê, tevî hukmê şûr û tivingê, aştiyek bû ko bi tayên qels, li ser erdekî fireh ê neqehîm, mîna pîneyên cilekî riziyayî, hatibû dirûn. Aştiya ko Mîr anîbû pê, mîna bendeke qels bû ko li ber lehiya rabûyî ya Dîcleyê hatibû lêkirin. Beroşa ko ji sedan salan û vir de her dikeliya, bi saya serê Mîr, hinekî kela wê danîbû û Mîr devê beroşê girtibû, lê beroş dikeliya û osmanî, faris û qasidên dewletên rojava ko hêz û quweta wan di her şert û mercî de ji ya mîrekiyê zêdetir bû, hertim êzing davêtin agirê ko beroş li serê bû û ew gur dikirin. Dijminahî, berberî, pevçûn, şer, hesûdî, dexesî û çavnebarî di navbera ehlê ko ji osmaniyan pê ve çu carê çu dewlet nenasîbû, bêpayan zehf bûn. Ehlê welêt li hember gotina dewletê û paşayên rîhpalik û dilqalik serê xwe ditewandin, lê li hember hevûdu dibûn şêr û piling. Giyayê hewşê ji wan re tahl bû, lê jahra paşa, miteserif, esker û tahsîldarên osmaniyan, ger ji ber bêgaviyê, ger ji ber cehaletê, ji wan re şekirê şêrîn bû. Ew xusûsiyetên ko min berê ji bo osmaniyan qal kir, ji bo kurdan jî rast bûn; herkes li dijî herkesî bû, herkesî li dijî hin kesên din dek û dolap digerandin û li pey kemînan bûn. Herkesî li gora xwe hin kesên din biçûk û nizm didîtin, quweta xwe ko li hember serdestan têrî serfiraziyeke temam nedikir, li dijî hin kesên din ko ji wan qelstir bûn, diceribandin.

Xelkê ko hertim, ji bav û kalan vir ve, di navbera du quwetên mezin,

osmanî û farisan de hatibûn perçiqandin û çu carê yekîtî û quweteke mezin ko dikarîbû li hember wan herdu hêzên mezin bisekiniya, ava nekiribû û çu carê nikarîbû tixûbên van herdu dewletan gav bikira û xwe bigîhanda dinyê, bêguman, bawerî ne bi quweta xwe, lê bi quweta dewletê ko hertim ne bi dilovanî û şefqet, lê bi zordarî û xedarî xwe nîşan dabû, dianî. Tiştê ko dihate bîra xelkê, bi tenê zordarî, xedarî û tirs bû. Roj diqulipîn, meh û sal derbas dibûn, stêr geş dibûn û dirijiyan, berf û baran dihat û diçû, axa kevnare bi tîna tavê û bi tîrêjên şewitî disincirî, hechecîk, legleg û quling ji welatê çolê dihatin zozanan û ji zozanan vedigeriyan welatê çolê, însan dihatin dinyê û piştî umrekî dimirin, nifşek dihat, yekî din diçû. Lê tirs, tirsa ko bi dengê şûr, tiving û topan ketibû dilê xelkê, tirsa ko pirî caran nedihate zimên, lê kelehên hilweşiyayî, gundên kavil, xaniyên xirbe, zeviyên şewitî û goristanên li quntarên çiyan şahidî lê dikirin û bîr û hîsên ko bêdeng çêla tirs, şîdet û xedariyê dikirin, her û her diman. Xelk, gund bi gund, bajar bi bajar, eşîr bi eşîr, malbat bi malbat, mîrekî bi mirekî, di nav tirseke bêdawîn de, ji dinyayê bi temamî dûr, di nav keft û leftên rojane de, bêyî hedef û armancên mezin, bêyî şiûreke yekîtî û bextiyariyê, lê bi berberî û dijîtiyên bêhejmar, dijiya. Her gav û hewldana ko ber bi bextiyarî û serfiraziyê, ber bi heyateke hêjatir dihate avêtin, di dawiyê de, pêrgî felaketên nû dihat. Ne yekîtiyeke xelkê hebû, ne jî bir û baweriya yekîtiya welêt. Xelkê ko ji xwendin û nivisînê, ji perwerdeyî û agahiyê bi dûr bû, bi tevger, bîr, heş, mêjî, fikir û gumanên xwe, zahf teng û girtî bû, gundê wan ji bo wan hemû dinya, hemû welat, hemû însaniyet bû. Wext û tarîx, bîr û heş, hîs û pêjn, ax û herêm, hêz û quwet, şer û pevçûn, kîn û nefret hemû bi hev re bûbûn yek û ehlê welêt dîl girtibûn.

Qedera axa Mezopotamyayê ji dewr û dewranên Babîl û Nînovayê û vir ve her eynî bû; şer, pevçûn û xedarî. Axa Mezopotamyayê, hertim eynî ax bû; herwekî ko di Tewratê de dihate gotin, axa tofan û xezebê. Axa herî kevn a însaniyetê, axa çemên Firat û Dîcleyê ko bi ava xwe medeniyetên kevntirîn anîbûn pê, axa bexçê cinnetê ko di navbera herdu çeman de bû, çemên Zap û Xabûrê yên Tewratê ko di navbera deşt, zinar, çiya û geliyan re bi çiv û fetlanekên fireh her û her diherikî, keştiya Nebî Nûh ko li gora gotinan, li gopikên çiyayê Cûdî veniştibû û heyameke nû raxistibû ber însaniyetê, zarok, bav û bavikên ko ji pişta Nebî Nûh ketibûn û bajarên ko ewana ava kiribûn; Babîl, Erek, Akkad, Kalne, Aşûr, Kalah, Resenî, Nînova, Riha, Nisêbîn, Cizîr, ev yekên hanê

hemû Mezopotamya û axa wê bû.

Axa Mezopotamyayê ko bi erebî jê re digotin »el Cezîre«, yanî girava li ser avê, yanî axa ko di navbera herdu çeman de bû û bajarê Cizîrê ko bi du milên çemê Dîcleyê ve dihate rapêçandin û mîna giravekê ber bi welatê jêr dibû, cezireyek bû ko di nav derya kîn û nefretê de mîna hêlekanekê diçû û dihat.

Axa Mezopotamyayê; axa şewitî, xopan, kavil û hilweşiyayî. Key, xan, hukimdar, siltan, hêz û ordiyên ko hatin û çûn, êrîş, îstila, vegirtin, şewatên ko bêrawest mîna pêlên deryayeke tofanê, hertim bi ser axa Mezopotamyayê de hatin. Kuştin, şewitandin, qetliyam, rev, sirgûn ko çu carê ji vê axê bi dûr neketin. Pêşî samî ko hîmên medeniyetê li navçê avêtin, paşê keldan ko zora samiyan birin û bajarên mîna Babîl, Nînova, Aşûr ava kirin. Bi dû wan re med û persên ko ji welatê bakûr hatin û hemû ax vegirtin, kavil kirin û hilweşandin. Îskenderê Mezin ko zora persan û keysarê wan Daryûş bir. Ez çi bibêjim? Paşê Sasanî, paşê Emewî, Abasî. Paşê îstilayên moxolan, Hulagû Xan û siwarên wî ko mîna kuliyan ko di her derê ko ew tê re derbas dibûn, kavil dikirin. Bi dû wan re îstilayeke din a Asyayê, ya Tîmûrlenk û tataran. Paşê jî Osmanî ko bi eslê xwe asyayî bûn û ji Asyaya dûr hatibûn. Her yek bi xedariyeke bêpayan navdar, her yek li ser kavilê yê din, her yek hosteyê bêpayan ê vegirtin, şewat û kuştinê. Pêl li pey pêlê, êrîş li ser êrîşê, bêwest, bêrawest... Her kî ko dibêje, tofana Nebî Nûh li ser vê axa xopan, bi tenê carekê rabûye, rast nabêje, ji ber ko her cara ko pêleke nû ya îstilayê hatiye, tofan careke din rabûye. Pêl rabûye, dinya leqiyaye, felekê dev ji çerxa xwe berdaye, wext sekiniye, ba, baran, çûyin, hatin, kerwan, bazar, bêrî, cot winda bûne, giya hêşin nehatiye, dar şax û pel venekirine, gul nebişkovîne, da ko pêla rabûyî dakeve. Piştî ko pêl daketiye, her tişt mîna berê dest bi heyatê kiriye, ba dîsan di navbera pelên darên tûyê de geriyaye, darên hinaran kulîlk vekirine, stêr ji milekî asimên ber bi milekî din xuricîne, mehîn û canû li ser axa ko bi giyayê nû hêşînhatî mîna deryayekê leylan daye, bi hîrehîr û bi çargavî, dane lez û bezê, kerwan ji Anatolî û Kafkasyayê di ser riya hevrêşim a kerwanan re, dîsan ber bi Bexda û Basrayê, Çîn û Maçînê çûne, her tişt di nav tevgereke xurt de bûye, – heta pêleke nû ko li rê bûye, dîsan rabe.

Heke hûn tarîxa vê axê meraq dikin û serê xwe bi sebebên vê xedariyê diêşînin û ji min dipirsin ka dilê min çima bi liyan e, fermo, ji we re hem tarîxa axê, hem jî ya xedariyê ko tê de çê û neçê, kirêtî û başî, xirabî û rindî hertim di nava hev de bûne.

Heke hûn meraq dikin ka ez çima niha qala van tiştan dikim, fermo, ez bibêjim we; tevî ko Mîr mîrekî û welêt hinekî aş kiribû, pêleke nû li rê bû, tofaneke nû radibû. Lê îcar li welatê Hekaran, di nav çiya, zinar, gelî û newalên kûr ên wî welatî de ko çûyina wî hebû, hatina wî nîn bû. Îcar pêl di nav ehlê keldanên nastûrî de dikeliya. Ehlê keldan ji bav û kalan, ji hebûna însaniyetê û vir ve li ser erdê xwe, li nav çiyayên serî li asimanan, di nav kurdên misilman ên cîran de dijiyan. Tiyarî, Tobî, Depreşan û herêmên din ên welatê Hekaran war û axa keldanan bûn. Ew jî mîna kurdan di bin hukimdariya osmaniyan de, bi bac û bertîlên ko hem didan dewletê hem jî mîrên kurdan, di nav xwe de bi serbestî heyata xwe ya kevnare ko bi qewlên Încîla Îsa Mesîh bi rê diket, didomandin. Ew bi şixulê xwe jîr, tevgera xwe xurt, gerandina karê rojane jêhatî û bi cîraniya xwe dilhebîn bûn. Dêrên xwe di sînga çiyan an di kûrahiyên newalan de, di nav zinar û şikeftan de vekolabûn, bi hunereke hoste, qûntarên çiyan qulipandibûn ser bax û bexçe û ava çemên Zap û Xabûrê ko di kûrahiyên newalan de diherikîn, kêşandibûn serê çiyan û pê bax û bexçeyên xwe av didan. Digel ko welatê wan çiya bû û cîranên wan kurd bi şixulê pez û dewaran radibûn, wan di çiyan de, tevî garis, birinc û titûnê, rezên tirî diçandin û jê tiriyekî şêrîn ko her libeke wî bi qasî pêçiyekê bû, radikirin û ji tirî jî şerabeke zahf xweş ko li hemû Mezopotamya jorîn navdar bû, çedikirin. Li welatê wan darên biber ên hejîr, hinar, gûz, givîj, şambelût, hirmî, xox û tûyê bêpayan zahf bû. Ew jî mîna kurdan eşîr, bav û bavik bûn û heye ko ji tirsa misilmanan, hertim li tenişta hev, bi hev re dijiyan. Hêzeke wan a bi qasî panzdeh hezar çekdarên hoste û jîr hebû û di şer û pevçûnan de, ew jî tevî kurdan, bi alîkariyê radibûn. Li gora qewlê pergala osmanî û ya kurdan, wan hem bac didan osmaniyan hem ji mîrê Hekaran.

Lê belê ez nizanim ka çibûbû, di demên dawîn de wan hew bac didan kurdan û Mar Şamûn ko serekê wan ê hem dînî, hem civakî bû, hew li gotina Mîr û Nûrilah Begê Hekaran guhdarî dikir û hema çi bigire li hember Nurilah Beg ko mîna milekî dirêj ê Mîr bû, serî rakiribû. Hin kesan digotin ko keşeyên amerîkî, îngiliz û fransewî ko hertim dihatin nik wan, diketin bin wan û ewana li dijî kurdên misilman sor dikirin. Hin kesên din jî digotin ko osmanî sîxurên xwe li der û dorên wan digerandin û wan û kurdan bera hev didan da ko herdu mil jî qels bikevin. Hin kesên din jî digotin ko kurdên misilmanên tûj ko dijminên axretê yên filehan bûn, bi çêr, nifir, êrîş û dijminahiya xwe, bi şer û pevçûnên xwe, keldan

hêrs û har dikirin da ko ew li hember mîrekiyên kurdan rabin û xwe biparêzin û di dawiya dawîn de jî qetl bibin.

Axir her çi bûya jî, devê beroşê dîsan vebûbû û dûmana kela wê ji çiyayên Hekaran dixuya. Lê belê, berî ko ez gotinê bînim ser çiyayê Hekaran û Stêrê, min dil heye ko em dîsan vegerin Cizîrê, mala min, nik Armê û Gulîzerê...

Dengê vitevit û pisepisa Armê û Gulîzerê di wan rojan de nefes li min çikandibû. Hingê ez li Cizîrê, li mala xwe bûm û min bi tenê du tişt dikirin; gunikên xwe difirkandin û şiîr û stran lêdikirin. Çavê min ne li malê dinyayê, ne jî li şan û şohretek ko ji pere, mal û milkê dinyayê dihate pê bû. Min nav, navnîşan û şoretek dil dikir, lê bi alîkariya gotinê, bi tenê bi lihevanîn û afirîna gotina şiîr, çîrok û serpêhatiyan. Hevalên min hemû bûbûn xwedî mal, milk, şan, şoret û zarok. Hin ji wan bûbûn xwediyê çend jin û bêhejmar zarokan jî, lê min ne jin û zarok hebûn, ne jî mal û milk. Mîna civata ko em tê de dijiyan ko hertim dudilî bû, hertim xwediyê du heyatan, heyateke xuyayî û yeka nexuyayî bû, ez jî pirî caran du kes bûm. Kesekî ko bi şixulê rojane radibû, dixwar û vedixwar, diçû û aliyê Migo dikir, li kitabxanê bi Mam Sefo re dipeyivî, li medresa qesrê li ayet û hedîsên Têlî guhdarî dikir, li bajarê ko êdî bûbû navendeke girîng a gerandina kar û şixulên welêt û dewleta osmanî, li bazarên bajêr ko ehl, ziman, lehçe û qewm li wir li bin guhê hev diketin, li kerwansaray û xanên ko kerwanek dihatê, yek jê diçû, digeriya, li qahwexaneyên ko hertim tijî bû û bi bîhna cixare, qelûn, nêrgile, tir û fisan mîna kulikan bûn, rûdinişt, herçiqas kêm bûya jî carina li dawet û dîlanên ko hertim li dar bûn, dixuya, li şîn û tahziyên ko bi dawet û dîlanan re qayiş dikêşandin, rûdinişt. Û kesekî din ko hertim bi tena serê xwe bû û di nav fikir, guman, şik, sûzenî û gotinan de difetisî. Herçend ew kesê ko di nav şêniyan de bû, xurt û metîn, şên û şeng dixuya, ew kesê li dara dinyayê tenê jî di dil û ruhê xwe de ewçend sext, sist û dudilî bû. Kesê şêniyan dil dikir ko ew bi şêniyan re be û mîna kulîlkên spî yên dara behîvê ko bi hev re dibişkovîn, yek ji wan bûya, lê belê kesê tenê dil dikir hertim cihê bûya, ne mîna şêniyan rabûya û rûnişta û mîna pelê dawîn ê dareke tûyê ko di destpêka zivistanê de, tevî ko hemû pel weşiyabûn, nedabû pey pelên din û hê jî bi israr bi darê ve bû û nediweşiya.

Min, Biroyê dengbêj, yanî ew kesê ko hertim tenê bû, yanî bi gotina Gulîzerê, Biroyê belqityo û bedena wî ya xort bûbû esîrê gotin û avikê.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Min dikir, nedikir, min nikarîbu xwe rabigirta, hem gotin hem jî avik bûbûn mîna çemê Dîcleyê û diherikîn. Doxîna min hertim sist, geh di nav nivînan de, geh li vir û li wir, guhê min li ser dengan, heşê min li ser gotinan, ez, sersem û peregende digeriyam û min gotin li hev dianîn, na ne ko min ew li hev dianîn, li hev siwar dikirin. Gotina ko remza însan û însaniyetê bû, ji destpêka însaniyetê heta îro, bi tenê ji devê însên derdiket û bersîva hest û hîsên însên dida. Gotinê hem însan, ehl, qewm, ziman û dîn nêzî hevûdu dikirin hem jî ew ji hevûdu bi dûr dixistin. Li welatê me jî gotin hem bi şixulê dilovaniyê rabûbû û çîrok, riwayet û serpêhatî afirandibûn da ko me bizanibûya ka dewr û dewranên me yên borî çawan bûn, hem jî bi şixulê tîr, mirtal, şûr û tivingê rabûbû û hin însan, ehl, qewm û ziman binax kiribûn. Gotin hertim hem di xizmeta derewan hem jî di xizmeta rastiyê de bû. Ez ji ders û tecrubeyên heyata xwe hîn bûbûm ko gotin diviya di xizmeta însên de bûya û birînên însên, ko însan çu carê bêbirîn nedibû, bicebiranda. Heke hemû umrê hunermendekî gotinê bikaribûya bi gotinên xwe birînên însanekî, bi tenê însanekî jî sax bikira, hingê gotin û xwediyê gotinê biserketî bûn. Bi min welê dihat ko li welatê me ko herkes li dijî hevûdu bû û qulipîbû ser welatekî kor û kerran ko kesî li wir ne dengê wicdan û merhemetê dibihîst û ne jî dudilî û sûzeniya li ser rû didît, kêmaniyeke zahf mezin a gotinê hebû û heke welat di wî halê kirêt de bû, tê de para kêmaniya gotinê zahf bû. Heke gotin, gotina lihevhatî ya edebî, gotina sade, zelal û nerm ko çêla însên, serpêhatiyên wî û her celeb haletên wî dikir, bi têra xwe hebûya hingê rewşa welêt jî dê cihê bûya. Heke xal û xwarzî, bira û birazî li hember hevûdu radibûn, bi ya min, hinekî jî ji ber kemaniya gotinê bû, gotina ko dikarîbû ew û dilê wan perwerde bikira, alîkariya wan bikira da ko ew ji ders û tecrubeyên bav û kalan bêtir serwext bibûna û riyeke nû bidana ber wan.

Guhdarno, gotin diviya.

Hem ji bo min, birînên min ên ko li ser rûyê mîn mîna pîneyekê dixuyan û yên ruhê min ko çu carê kesekî din nedidît û hem ji bo êş, azar, hêvî, hest û bestên ko di nav beroşa kel lêhatî ya welêt de diçelqiyan.

Ji lewre min zorê dabû gotinê û her digot. Carek, du caran, sê caran, her li pey hev, dubare, ji nû ve. Min stranek lêdikir, piştî çendekê dîsan lê vedigeriyam, dîsan lêdikir, disan lê vedigeriyam, hin gotinên wê, hin cimleyên wê diguherandin, li şaşî û çewtiyên xwe wardiqilîm, ew rast dikirin û dîsan lêdikir û di dawiya dawîn de, di nav nivînên gemarî de,

destê min li ser gunikên min, min ji xwe, ji kesê xwe yê duwemîn dipirsî;

Biro, tiredîno, dîne gotinan, ez dîsan li stranê vegerim?

Di destpêkê de, çaxa ez xeşim bûm û min nikarîbû dengê gotinan baş seh bikira, bi min welê dihat ko min gotin her dubare dikirin û tiştekî nû nedigot. Paşê, gotinan hînî min kirin ko ne welê bû, her cara ko gotin dubare dibû, kûrahiyên gotinê dihatin pêş, sir û siherên wê xwe diyar dikirin, aheng û awaza gotinê bêtir dikemilî û dineqişî, giranî û zêdehiyên gotinê, mîna qaşilê porteqalê yan qalikê gwîz, jê diçûn û bi tenê cewhera gotinê, kakilê wê dima, – cewher û kakilê ko tê de ders û tecrubeyên herî pêwist ên însanî, rastiyên herî rast ên însên ko hertim xwe vedişartin û deng û pêjnên herî pêwist ên dil û ruhê însên hebûn... Ji wan gotinên Apê Xelef, Mam Sefo, feqe û seydayên Medresa Sor, qewal, feqîr, pîr û şêxên êzidî, dengbêjên botî, kitabxana Mam Sefo û hicreyên Medresa Sor fêr bûbûm ko gotin ji bo gotinê bû, bêyî ko tiştekî qezenc bike yan jî winda bike, bêyî ko berdevkiya kesekî bike û ji bilî însên, gotinê têxe xizmeta tiştekî din, gotin, ji bo gotina bûyer û serpêhatiyan, çêl û salixdanê bû. Çaxê cewher derdiket ronahiyê, wê bi bedewî û ronahiya xwe hawîrdor jî dixemiland û wan bi hev re çîrokeke nû ko hem ji cewherê hem ji ronahiya hawîrdorên cewherê dihate pê, diafirîn.

Min li feqîrxana xwe kitabxaneyeke biçûk, ji zimanên erebî, farisî, osmanî û kurdî ko min pê dizanîbû û ji zimanên latîni, îtalî, ermenî, frensewî ko min pê nizanîbû, lê li sûretên wan dinihêrî, anibû pê. Yezdanê dilovan jê razî be, Mam Sefo rê dabû ko min hin kitabên kitabxana wî, mîna kitabên Keso, Naso ko li ber dilê min zahf ezîz bûn û ez pê mezin bûbûm, hilda û bianiya malê. Min ji Medresa Sor jî, tevî Quranê, çend kitabên qalind anîbûn û Têlî jî, bi dizîka, ji medresa qesrê, şiîrên Siyahpûş, dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Şêxê Senan a Feqiyê Teyran jî tê de, çend cîld anîbûn û dabûn min. Li mala neçar ko jê bîhneke giran a xwîdan û gemariyê dihat, niha gotinên devkî û niviskî û sûret û dîmenên ko ji gotinan bêpar bûn, lê min gotin li wan zêde dikir, li bin guhê hev diketin. Niha li malê, mîna daristaneke darên tûyê, daristaneke dengan hatibû pê ko tê de her darekê xwediyê dengekî xas ê însanî û di her dengekî xas jî xwediyê her texlîd awazên însanî bû. Deng, pêjn, olan, qîrîn, nalîn, girîn, lava, bêdengî ko xwediyê dengekî xas bû, hemû li wir, di nav daristanê de, li tenişta min bûn. Ez diketim nav daristanê, li wir pêrgî dengan, însanan, serpêhatiyan, haletên însanî, hest, hîs û daxwazên qederên cihê, awazên têkel dihatim, hin ji wan



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dikeniyan, hin digiriyan, hinan, mîna min bêrawest digot, hin jî bêdeng dipojinîn, şer û pevçûn dihatin pê, beden digihîştin hevûdu, dil hildavêtin, mal bar dibûn, koçên welatê xerîbiyê li dar diketin û ez di daristanê de winda dibûm. Gotina xelkê ko ji bo min digotin, rast, lê kêm bû, ji ber ko ne bi tenê ez, lê ruhê min jî dîn bû û ez di nav daristana deng û gotinan de, di ser cewherên gotinan re dipengizîm û digihîştim kûrahiyên ruhê xwe yê dîn û hîn bêtir har dibûm.

Çaxa ez har dibûm, min xwe davêt kuçe û kolanan, zinar û çiyan, da ko ruhê min dîsan haş bûya. Çaxa ez li gotinan hûr dibûm û wan jî ruhê min har dikir, min xwe davêt bextê çend cîhen ko ji bo min miqedes bûn; tirba Melayê Cizîrî ko li tenişta Medresa Sor, di bin mizgeftê de, li nik çend tirbeyên din ên ewliya û xoceyan de bû; mizgeft û tirba Nebî Nûh ko ji Medresa Sor bi qasî bîskekê bi dûr bû; tirbeyên Mem û Zînê ko di zêrzemînên xaniyekî xirbe de veşartî bûn, dara qedîm a tûyê ko di xortiya min de riyên dûr ên nasîn û kemilandinê nîşanî min dabû û gopikên çiyayê Cûdiyê ko keştiya Nebî Nûh hatibû û lê veniştibû. Piştî ko gotin li min dihatin xezebê û gunik li bedena min sor dibûn, di nîvê şevan an keleberbangên sibehan de, mîna keleşekî, bi hêdîka, min xwe davêt derve, diçûm nik tirba Nebî Nûh ko bi qasî çar, pênc mîtroyan dirêj bû, an diçûm nik Melayê xwe yê xwediye rêzên heybetpilingê ko di nav cawekî kesk î hevrêşimî de dinivist, an diçûm şikefta ko Mem û Zîn, ev herdu evîndarên bextreş ko ji bilî goristanê negihîştin hevûdu, li tenişta hevûdu diniviyan, li ber kêlên wan rûdiniştim, heşê min li ser lihevanîna gotinên ko li min hatibûn xezebê, min li dengê bêdengiya tirbeyên wan guhdarî dikir, heta ko ez li tenişta tirbeyên wan, mîna kurekî wan, di ruhê min de olana dengan, biçûma xew.

Lê belê di nav wan hemû dengan de du dengên din hebûn ko ez ne bêyî wan dibûm ne jî bi wan. Belê dengê Gulîzerê ko êdî heya û fediya wê reviyabû û bi çêr û nifirê dest pê dikir û bi nalîn û hîrehîrê kuta dihat û dengê Armê ko hertim bi naz û tîz, bi mizemiz û vizeviz û belengazî bû. Gava Heme, birayê Gulîzerê ko bûbû alîmekî jixwerazî, komeke dîndar li dora xwe civandibû û bi navê »hedef« tevgereke dînî girêdabû û li hemû navçeyên welêt çerx dibû û ji nimêj û niyazê bêtir bi karê çêr û paşgotiniya xelkê radibû, ji bo kar û şixulên xwe diçû derine dûr, hingê Gulîzera ko mîna mehîneke heşerî jê hîrehîr radibû, dilezand û dihate mala min, yanî mala xwe ya berê. Ewê digot, belqityo, ev çi hal e, ev çi kirêtî ye, ev çi gemar e û dest bi nifirên xwe dikirin û ji bo nîşandana aqil

û feraseta xwe, qala tiştên hîç û pûç ko hîç bala min nedikêşandin, dikirin, lê min ne xem bû, herçî ez bûm, min jî memikên wê difirkandin, bi lêvên xwe ko jê girêz diçû, gerdena wê ya gewher radimûsand û geh stran, geh şiîr, geh serbest, geh biwezîn, jê re rêz û heyranok dixwendin. Ji bilî belqityo û korê pîsê heram, ewê çend navên din ên balkêş li min kiribûn; singo, misaso û mîrkuto. Sing, misas û mîrkutê ko di heyata wê û mala şivanan de hertim girîng bûn, niha xwe gîhandibûn bedena wê û jê deng radikirin.

Heyra, ji nav van navan, mîrkut, yê herî baş e, min digotê û mîna mîrkutek ko dan dihenciqand, dioriyam;

Mîrkuto, lo mîrkuto
Dikute, lo mîrkuto
Mîna darkutkuto
Her dikuto, her dikuto!..

Herçî Armê bû, bedena wê jar, dilê wê bikul, ruhê wê ziravbihîstiyar bû. Heke ez bibêjim we ko ew xweşik bû, derew e, naxêr, ew ne xweşik bû û heke hûn li rê pêrgî wê bihatana, ez êmin im, we dê lê nenihêrta. Heşê wê jî, tevî ko ew keça Mam Sefo û Senemxanê bû, ne ewçend zêde bû, jîrî û jêhatîbûn jê bi dûr bûn. Wê ne dinya nas dikir, ne civat û bajarê ko tê de dijiya û ne jî der û dorên xwe û hîç carekê ev yekên hanê meraq jî nedikir. Lê dengê wê yê zirav û narîn, bal û nêrîna wê ya nazik, gav û tevgera wê ya giran, bedewiyeke nediyar didayê. Tevî ko hertim bîhna wê teng bû, hertim naz û tîz dikir, ji bervajiyê Gulîzerê, ewê çu carê dengê xwe bilind nedikir û jê hîrehîr ranedibû. Dilê wê tenik bû û hem ji min hem ji însanên doraliyên xwe hez dikir û hertim dil dikir alîkarî bike. Ewê behsa qumçikên fistanên xwe, qewraşên ko xwîn li wan ketibû, şorba ko kelê bû, pîrhevoka ko ewê di tenişta nivînan de dîtibû, laleyên ko pelên xwe yên sor vedikirin û mûyên bin çengên xwe ko ewê nikarîbû, bi temamî, jêkira û jê bîhna xwidanê dihat, dikir.

Heyra, bîhna xwîdanê, mîna bîhna misk û emberê ye, min digotê û destê xwe davêt bin çengê wê, heke ji te jî mîna min, her celeb bîhn bihata, te dê çi bikira?

Lê tevî henek û qeşmeriyên min, ew nedikeniya û ji nexweşiya diya xwe û vir ve, ewê lîstikên me yên zarotiyê ko di zêrzemînên mala wan de, piraniya caran bi alîkariya bilo dihatin pê, ji bîr kiribûn. Gava em li mala


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

min, an li mala wan, li mezelê wê û di bin xaç, sûretên Îsa Mesîh, find û qendîlan de, bi tena serê xwe bûn, ewê carina bi tenê tiştekî dikir, radibû ser piyan, dihate teniŞta min, hinekî ji paşve, li milê min ê rastê disekinî, fîstanê xwe ji xwe dikir û memikên xwe yên biçûk nîşanî min dida. Lê helbet min, bi wî terhî, memik nedidîtin, ji ber ko çavê min ê rastê nedidît.

Koro, lê binihêre, ewê digot, lê gava ez hinekî dizivirîm, ew jî, hingê biken, hinekî din dizivirî da ko ez memikan nebînim.

Lê sîh û sê çîrokên hirçê hene û hemû li ser hurmiyê ne. Di heyata min a duwemîn de ko di navbera Gulîzerê û Armê de derbas dibû, sîh û sê çîroken min hebûn û hemû li ser memikan bûn. Lîstika wê ya tekane bêfeyde bû, min xwe dihîgandê û bêyî ko zerarekê bidimê, min parsûyên wê diguvişandin û memikên biçûk difirkandin.

Lê belê gilî û gazinên wan ên zewacê, vitevit û belangaziyên wan ên dawet û dîlanê û çêr û qîrînên Gulizerê roj bi roj zêde dibûn. Carina, ji bo ko ez jî bersivek bidim, min digot,

Heyra, ez dengbêj im, ez stran û şiîran lêdikim, ji min bihewin...

Hingê Gulîzerê bi dengekî ko lê dihat, diqîriya ser min;

Ez guyê ometê têxim nav dengbêjî û şiîrên te!

Armê gotinên weha bi kar nedianîn, lê ewê jî stûyê xwe xwar dikir, bi lava, li min dinihêrî û digote,

Ma deng û şiîr ê heyata te bi rê xe û zike te têr bike? Ma dengbêjên din ko xwedî zar û zêç in, di wextên xwe yên vala de, stran û şiîran lênakin?

Ma min, rebenê Xwedê û dînê gotinan ko hemû umrê xwe dabû gotinê, dikarîbû çi bigota û bi çi celeb gotinan rewşê bi wan bida fahm kirin? Lê hingê, di wan rojan de ko tevnên Armê û Gulîzerê li dora min dihate ristin û cîh li min teng dikir û êdî ez hêdî hêdî têgihîştibûm ko eşq, henek û kêf jî çu carê bêyî stirî nedibû û evîn bêyî êş û azar nedikemilî, sefera min a welatê Hekaran û gundên keldanan hate pê.

Dengê Stêrê hingê, di wê sefera min a çiyayên Hekaran de, cara yekemîn kete guhê min, lê ne mîna gotin û kite, mixabin mîna nalîneke kûr.

Cizîr dîsan bûbû ardûya dadayî ko beroş li serê hatibûn hilawestin û hatin û çûyin, gotin û qise, derew û buhtan yekcar zêde bûbûn. Mîna ko destekî nediyar, ji nişka ve, perdeyeke reş a kîn û nefretê bikêşîne ser bajêr, welê bi tenê çêr, nifir, fort, gotinên neçê yên dijminahî û berberiyê li bajêr digeriya. Bajarê ko hewl dabû da ko bibe navendeke îlim û îrfanê,

biratî û dostiya ehl, ziman û olan û zewaca di navbera misilman û filehan de perû dikir, qulipîbû ser dûjehekê ko jê agir radibû. Xelkê ko di nav agirê dûjehê de bû, bêyî ko dûjehê bibîne û bîr bi agirê dûjehê bibe, qala axret, bihîşt, bexçeyên bihîştê dikir. Dewr û dewran bi mij û dûman bû û guran ji mij û dûmanê hez dikirin; bajar bûbû warê kevneperestan ko dînê îslamê li ser dijminahiya ehlê file şerh dikirin û kuştina filehan mîna sewab, heta mîna ferz nîşan didan. Medresa Sor ko warê îlîm û zaninê bû, niha bûbû warê pistepist û gotinên kirêt, meclîs û dîwanên rîhspiyan bûbûn warê fitne û fesadiya filehan, qahwe û dûkan bûbû warê kambax ê rik û nefretê. Ez nizanim ka ew hemû ji kû, welê bi carekê, peyda bûbûn, lê her celeb xoce, şêx, seyid, mele, alîm û şagirtên dînî, her yek ji derekê hatibû û li Cizîrê civiyabûn û tevgerên nû yên dînî ava kiribûn. Hemeyê fistûj ko êdî mîna Hemeyê Malmîran dihate bi nav kirin, tevgereke xurt, mîna tevgera Hesen Sebehê faris ko bi tehdît û kuştinê jî radibû, ava kiribû û navê wê danîbû Hedef. Hedefa ko Heme û peyayên wî qal dikirin, belavkirina dînê îslamê û qirkirina filehan bû. Bûrayê Heme, Kemaledînê cîrcîrok ko mîna Heme dirêj, zirav û jar bû û dengê wî jî mîna qijikê tîz û bed bû, tevgereke din ava kiribû û navê Riya Rastî lê kiribû. Yanî riya rastiya exret, dîn, îman û bihîştê ko ji dijminahiya kesên ko mîna wî nedifikirî û kuştina filehan derbas dibû. Xwedê Teala çi esebiyet, kîn û nefretên dinyayê hebû, hemû xistibûn zikê wan û ji lewre, ji ber esebiyet, rik û kînê, ew hertim mîna misasê dirêj û zirav bûn. Mîna wan, hîn gelek tevger, meclîs û dîwan li welatê Cîzîra Botanê û Hekaran hatibûn pê û li her derê mîrekiyê û welêt, ayet û hedîs li ser lêvên wan, diqîriyan û digotin;

Kesên xêrê, naçin dêrê.

Ew li bazar, xan, hemam, aşxane, qahwexane, dûkan, mizgeft, gund, şikeft, zozan, meclis û medresan digeriyan û geh bi pisepis, geh bi qîreqîr, digotin;

Hespê kule, seyê tûle, mêrê file lê mebe ewle...

Ev hemû tişt ji bo keldanan bûn û kesên ko kuştina keldanan dixwestin, bi çavsorî, paşgotinî, xirecir û qîreqîreke bêpayan, dengê ehlê aklî selîm û xwedî wicdan birîbû. Her kesê ko mîna wan nefikiriya, mîna wan tevger girêneda, li gora wan, xayînê dîn û îmanê, sûtalê ehleq û pergalê bû. Herkes diviya li wan guhdarî bikira, li gora wan gav bavêta, serekatiya wan qebûl bikira û stûyê xwe li ber wan xwar bikira. Dîsan hukmê şûr û tivingê li dar bû û ji Mîr pê ve, hew kesekî din dikarîbû rê lê bigirta. Bayê



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xezebê dîsan rabûbû, tofaneke nû li rê bû û pêla ko baskên xwe dişidandin, bi hemû hêza xwe dihat.

Herçiqas çêla filehan dibû jî, armanc û hedef keldan, nemaze keldanên nastûrî bûn. Kesî ji bo ermenên heremê çu tişt nedigot û nedikir, lê çaxa qal dihate ser keldanan, agir ji devê herkesî dibarî. Hin şêx û seyidan bi qîreqîr digotin;

Ew filehên pênceperan! Ew kî ko li hember dîne îslamê rabûne? Xwîna wan helal, kuştina wan sewab e!..

Hin kesên xwenda, mîna Heme û Kemaledîn jî bi îzehetên dirêj didan zanîn ko keldan, striyê çavê welatê kurdan bûn, di nav kurdên ezîz ên misilmanan de li pey dewleteke fileh bûn û wan bi pozbilindî û rabûna xwe, xencer li dilê kurdan û misilmanan xistibû.

Herçî beg û giregirên ko di esasê xwe de li pey erd û heyînên keldanan bûn, wan jî li gora xwe mesele diyar dikir û digotin;

Keldan bitir bûne, êdî ne bac didin, ne jî li begên xwe guhdarî dikin, bi wan welê ye ko ew jî tiştekî ne. Wan ders divê, ew divê di xwîna xwe de bêtin gevizandin.

Gotin bêrawest dihatin gerandin, lê xwediyê gotina dawîn Mîr û qesra ko li teniştа çemê Dîcleyê bû, ko mîna nobedareke qedîm a hemû tarîxa navçê dixuya. Herkes bi meraq, li hêviya biryara Mîr bû. Begên Hekaran Nûrilah û Derwêş alîkarî ji Mîr xwestibûn da ko wan bi hev re êrîş bibira ser dever û gundên keldanan û kevir li ser kevir nehîştina, lê Mîr nedilezand û di biryara xwe de giran bû. Dîsan civîn û civat digeriyan, beg û giregir dihatin û diçûn û ji her serî gotinek derdiket. Qendîl û meşaleyên qesrê heta ber destê sibehan pêketî bûn, nobedarên nîşanger, tivingên wan ên zîvhêlî li milê wan, li dora kelehê û li ser bircan diçûn û dihatin, berî ko tav li wan hilwere û kesekî wan bibîne, qasid bi dizîka diketin qesrê û jê derdiketin. Herkesî dizanîbû ko biryar ê, mîna hemû biryarên girîng, di berbangeke nû ya sibehekê de bihata diyar kirin. Ji lewre, li ber destê spêdan, hawîrdor bêdeng bû, tevî ko herkes hişyar bû, însan bêlebat, bêtevger, li hêviya xeberekê bûn. Dinya zahf germ bû, havînê tîna xwe bera dile axê dabû û xelk li ser banan, li ser textan diniviyan û li ber destê sibehan, di nav nivînên xwe de, li rijandina stêran û li tîrêjên yekemîn ên tavê ko li pey çiyayê Cûdiyê serî hildadan, dinihêrtin û guhê xwe bel dikirin da ko xebera li rê bibihîsin.

Bi tenê di wan demên kurt ên destpêka rojeke nû de, çaxa stêr diçun ava û tîrêj serî hildidan, hawîrdor ji kurtepista bêpayan bi dûr bû û di nav

bêdengiyeke kûr de ko bêdengiya mirinê dianî bîra însên, ber bi rojeke nû diçû. Hingê, bi tenê hingê, berî ko cîrcîrok û qîjqîjok dest bi zirt û fortan bikin, ehlê bajêr pêrgî rastiya xwe û heyata xwe ya nediyar, pêrgî tirs, xof, wicdan û merhemata ko hatibû veşartin, dikir. Wan berbangên rojên germ ên havînê, destpêka havîneke din ko bi qasî wan spêdan bêdeng bû, dianî bîra min; rojên êrîşa li dijî Seîd Begê û keleha wî. Hingê jî bêdengiyeke bêpayan û ecêb civat û bajar vegirtibû, dar û dahl, zevî û devî, newal û gelî, însan û teyr, gund û bajar bêdeng bûn, hukmê tirs û xofa bêdeng û şûr û tivinga bideng li dar bû. Bi min welê dihat ko çaxa bira li bira, cîran li cîran dihate xezebê, bêdengiyê jî perdeya xwe ya reş radikêşand ser hawîrdor. Lê îcar bi tenê di destê spêdan de.

Min ji Yezdanê pak hêvî hebû ko dewr û dewran dubare nebûya, rojên Seîd Begê bi şûnde venegeriyana û Mîr bi biryara xwe dewr û dewranên tirs û xofê venejanda. Lê mixabin, di taştêyeke sibeheke çîk î ronî de, mîna cara berê, Mam Sefo ko yekcar ketibû, vegeriya malê, hate nik me, min û Migo ko li kitabxanê li hêviya wî bûn, bi girî, bi dengekî ewçend sext ko min hîç nebihîstibû, kitabên Tewrat, Zebûr û Încîla Lûqa li ber wî, xebera nû gîhande me; her çi kesê ko li hember gotina Mîr rabûya, diviya bi sertî bihata cezakirin û ji lewre Mîr ê êrîş bibira ser keldanan. Ne kêm, ne zêde, wext, ji nû ve dubare dibû û ji ber ko min wexta berê û bûyerên qewimîn, bi kitekit, di şevên borî de gotibû we, ez jî niha mîna wexta teres nekim û gotina xwe dîsan nebêjim û ne çêla halê Mam Sefo bikim, ne jî bûyerên ko li pey biryarê hatin pê.

Ji nû ve tevgereke boş a eskerî dest pê kir, şûr ji kalan hate kêşandin, xencer tûj bûn, berik ketin devê lûleyan û êrîşeke xedar, ji çend milan, siwar û peya, tevî duwa, ayet û hedîsên dîndaran, bi quwetên eskerî yên Cizîra Botan û Hekaran, ber bi çiyayên keldanan rijiya.

Piştî çûyina Mîr û hêzên wî yên çekdar, bajar dîsan kete halê xwe yê berê ko heyateke rojane, bêyî çu armanc û hedefên mezin dimeşand. Ew deng û qîreqîrên ko bajar vegirtibûn, bi sefera Mîr, hate birîn û xwediyê deng û qîreqîran jî tevî hêzên çekdar, berê xwe dan dijminên dîn û îmanê. Piştî biryar û sefera Mîr, êdî çu kesekî ko bikaribûya tiştek bikira, nîn bû, – heke em osmaniyan nehesibînin, lê mîna ko ew jî bi bûyeran qayil bin, tevî ko haya wan ji şer û seferê hebû û wîlayeta Mûsil, Diyarbekir û Wanê gelekî nêzîk bû û esker û sîxûrên wan li her derê welêt digeriyan, deng ji wan dernediket. Hema çi bigire bajar vala bûbû, Mam Sefo herdu zarokên xwe Migo û Armê hildabû û bi qesta ziyaretê dîsan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

çûbû welatê Wanê, Heme jî xweha xwe hildabû, tevî jin û zarokên xwe, çûbû nik şêx û seyidên Şemzînanê, da ko nêzîkî şer û pevçûnê bûya. Yezdanşêr ko êdi bûbû peyayê herî girîng ê Mîr, pê re çûbû û Têlî jî çûbû welatê Xerza, Xelat û Norşînê, nik şêx û medreseyên wan.

Herçî ez bûm, tevî ko Mam Sefo dil kiribû ez bi wan re biçûma û Yezdînşêr xeber şandibû ko ez pê re bûma, ez neçûm çu deverê û li bajêr mam û min xwe ji her carê bêtir da ser gotinê. Dinya germ û hawîrdor ronî bû. Pirî caran, tevî ko lingê min ê rastê, piştî sefera kelekê ya çemê Dîcleyê, hinekî dikuliya, ez pêşî siwar, paşê peya, hildikişiyam bilindahiyên çiyayê Cûdiyê, li wir, li ber devê şifekteke, ko hemû welatê Cîzîra Botanê jê mîna lewheyeke kitabxana Mam Sefo dixuya, li ser tehtekî, kulavê ko ji Apê Xelef ji min re mîrat mabû, di bin min de, rûdiniştim, min cixareyên xwe yên şevê dipêçandin û tevî heste û mewîj, hejîr, gûz û behîfen ko di bêrîken şalên min de bûn û min derxistibûn, datanîn pêşiya xwe, di bin xalîçeya rengîn û çirûsî ya stêran de, li axa xopan a xezebê ko li ber min raxistîbû, dinihêrî û li tofana Nûh, li tofanên ko li pey tofana nûh rabûbûn û li tofana ko di wan rojan de, di navbera neviyên Nebî Nûh de radibû, difikirîm. Pêçiyên destê min ê rastê li ser teyrê min ê tawis ko di stûyê min de bû, geh bi qîrîn, geh bi awazeke nerm, min gotin li hev dianîn û distram. Gerçî gotin, yên min bûn, min ew di kûrahiyên ruhê xwe yê dîn û heşê xwe yê peregende de peyda dikirin û li hev siwar dikirin, lê belê di esasê xwe de, ew hemû gotinên qeder û serpêhatiyên xezeb û tofanên kevnare bûn. Carina bi min welê dihat ko min her gotinên nû, bi awazeke nû digotin, lê di derengê şevê de, gava ji bo kêşandina cixarê ez disekinîm, hingê min bîr dibir ko gotin, gotinên kevnare bûn ko beriya min jî bi hezaran caran hatibûn gotin. Carina jî bervajiyê wê, çaxa min gotinên ko min ji ders û tecrubeyên kevnare wergirtibûn û ji stran û serpêhatiyên berê jiber kiribûn, dubare dikirin, di kêliyên west û bîhnvedanê de, ez li xwe wardiqilîm ko di nav wan gotinên kevnare de gotinên nû jî hebûn. Tarîxê her xwe dubare dikir, lê heye ko bi kirasekî nû, bi risandin û hûnandineke nû; gotinê her xwe dubare dikir, lê heye ko bi hîs, pêjn, hest û bihîstiyarên nû. Qewimîn û rastiyên nû gotinên nû li qal, çêl û qiseyên kevnare zêde dikirin, mîna stêrên ko li ser serê min dilîstin, diçirûsîn, dixuricîn û dirijiyan. Carina, gava stêreke zer a ronî ji milekî asimên ber bi milekî din dixuricî û diheliya, ez jî li qedera însên, milet, ziman û medeniyetan difikirîm. Însan û milet, welat û medeniyet jî mîna stêran bûn; hildibûn, dixemilîn, diçirûsîn, diçirişîn, bi şewqa xwe

ronî direşandin û bi dû re jî, diheliyan û winda dibûn. Lîstikek ko her şev dubare dibû û lîstika abadîn a însan û însaniyetê dianî bîra min.

Xeber û nûçeyên êrîş û şer her roj digihîştin bajêr, lê belê heta ko min netîceyên êrîş û şer bi çavê xwe nedîtin, min bi wan xeberan bawer nekir. Piştî sefera Mîr, em bibêjin bi qasî mehek, mehek û nîvê bi dû çûyina Mîr û çekdarên wî re, keyayê Mam Sefo, di danê êvarekê de, çaxa min haziriya xwe û çûyina çiyayê Cûdiyê dikir, bi dizîka hate malê û xeberek gîhande min; heke ji min bihata, Mam dil dikir ko ez ber bi deverên şer, Tiyarî û Aşîtayê biçûma û heye ko min bikaribûya malbatek ko li wir, di nav agirê şer de mabû, ji agir xelas bikira.

Guhdarên delal, heke bête bîra we, min di şevên me yên borî de, ji we re behsa gera me ya Mûsil, Bexda û Babîlê, rêwîtiya me ya kelekê, xwediyê kelekê Apê Yaqûb, kurê wî Bedros û segê wan Gurzo kiribû. Malbata ko Mam Sefo dil dikir ko min bifilitanda, jin û zarokên Apê Yaqûb bûn. Apê Yaqûb û Bedros, ji agirê şer dûr, li Mûsilê bûn, lê belê malbat di nav êgir de mabû û ewî xeberek gîhandibû Mam Sefo ko li dûr, li welatê Wanê bû û jê alîkarî xwestibû. Mam Sefo, ew însanê ko hew dikaribû gotina xwe bigîhanda Mîr, jina xwe û hevalên xwe yên gerandina şixulên mîrekiyê, bi biryara dawîn a Mîr re, winda kiribûn, lê tevî şikestinê esalet û maxrûriyê terk nekiribû û xwe bêdeng spartibû deng û gotinên kitaban û êdî di warê şer û pevçûnê de ji destê wî çu tişt nedihat, xeberek veguhezandibû min da ko ez biçûma hawara malbatê. Li milekî min nikarîbû gotineke Mam bikira dudo, li milekî jî min nikarîbû çêyiya Apê Yaqûb û Bedros, ew însanên ko bi alîkariya min rabûbûn û bêyî ko çu tiştekî bixwazin, heta Mûsilê bi me re hatibûn, ji bîr bikira û di ser de jî, min mîna her carê, îcar jî bûyer û qewimînên welatê Hekaran zahf meraq dikir û di cîh de min biryar da ko ez biçûma welatê Hekaran û hingê min ji keya tika kir ko ew, ji bo dotira şevê, sê hespên bezê, sê tivingên lûledirêj, sê têrên tijî xwarin, du kûzên tijî av, kîsekî biçûk tijî pere, kîsekî mezin tijî berik û du peyayên ne file, lê misilmanên pêbawer û nîşanger ko dikarîbûn berik ji qula derzî derbas bikirana, li hewşa malê hazir bikira û li hêviya min bisekiniya.

Dotira rojê, çaxa şev daket û bêdengiya ko jixwe bajar vegirtibû, bi temamî perda xwe kêşand ser bajêr, şal û şapikên min ên rengîn ên botî li min, kulozê min ê fireh ê kesk û sor li serê min, teyrê min ê tawis li stûyê min, di kêleka çêm re, bi gavên sivik û çapik, min da rê û çûm mala Mam Sefo. Keya daxwazên min bi cîh anîbûn û hesp, têr, kûz, peye, keya, du

qewraş, li hewşê, li benda min bûn. Êdî gotin nediviya, min silav li hevalên xwe yên rêving kir, ew nasîn, tivingek çeprast avêt milê xwe, rext girêda, li hespê ko keya ji bo min amade kiribû siwar bûm, ji yên mayî xatir xwest û tevî hevriyên xwe û têr û kûzên xwe, bi rê ketim. Lê berî ko em ji hewşê derkevin, keya kîsên pere û berikan jî gîhande min û gote min;

Gundê ko malbat tê de dijî, di navbera Tiyariye û Aşîta de, li bin geliyekî ye. Heye ko xelkê gund xwe spartibe şikeftan.

Gundekî di navbera çiya û geliyan de... şixulê min ne hêsan bû, min ne navê gund dizanîbû, ne jî bi misogerî cîhe gund, di nava şer û pevçûnê de, diviya ez lê bigeriyama û min bipirsiya, lê ne xem bû, heke tiştekî neçê jî biqewimiya û xirabiyek jî bihata serê me, diviya ez biçûma. Me xwe bi hêdîka berda hembêza şeva germ û ronî ya wextekî şer û pevçûnê ko li hêviya me û rêwîtiya me bû. Mîna her şeva kambax ko bi bêdengî û westa şer û pevçûnan rapêçayî bû û çu kesî nizanîbû ka li pey perda tarî ya şevê çi hebû, şeva me jî, tevî ronahî û lîstikên stêran, bêyom bû. Ne bayek hebû, ne jî hûnikahiyekê û hê di destpêka rêwîtiyê de, heye ko ji germê, yan ji xof û sawê, min xwîdan da û bi xwîdana li ser eniya xwe, min hespê xwe ber bi warên hûnik, warên ko ne bi xwîdanê, lê bi xwînê vedigevizîn, ajot. Gav bi gav, qonax bi qonax, me nêzîkî li welatê Hekaran, qata şer kir. Di her gava me, di her qonaxa ko me dibirî de, nîşan û alemetên şer dixuyan. Rê, xan, pir, bihur hemû girtîbûn û bi tenê, bi rêdayina nobedarên çekdar, însan dikarîbû tê re derbas bûya. Hejmara kerî û naxiran kêm bû û ji her cîhê ko esker derbas bûbû, çal, kort û şopên lingên wan û simên hespên wan dixuyan. Gav bi gav hawîrdor asêtir, çûyin dijwartir û xof û tirs bêtir dibû.

Ji ber bextê min ê çê eskeran ez nas dikirim û bi henekên xwe, rê didan ko em di riya xwe de biçûna. Çaxa em ketin nav çiyayên Hekaran, me bihîst ko şer bi serfirazî kuta bûbû, keldan têkçûbûn, patrîkê wan Mar Şemûn ko serekê wan ê civakî û ruhanî bû û malbata wî, tevî keşe û metranên navdar ên nastûriyan, kitab û mîratên wan ên dînî li ser pişta hesp, ker û bergîran, bazdabûn û çûbûn Mûsilê û hêzên Cizîra Botanê û Hekaran, bêyî zirar û ziyanekê, ji çiyan vedikêşiyan. Tarîx dîsan dubare dibû, dîsan hêzên çekdar ên serfiraz welatekî şewitî li pey xwe hîştibûn û vedigeriyan û ez, çavê min ê kor dîsan bi jan û liyan, ber bi şewatê diçûm. Şewat rastiya min bû û ez îcar jî dîsan ber bi şewatê diçûm. Geh di bin tava sincîrî ko mîna topeke agirê dûjehê bû û geh di bin stêrên ko bêziman,

lê ez bawer im, matmayî li me, li însanên ko qira hevûdu dibirin, şahidî dikirin de, her gava ko me hîn bêtir nezîkî li dilê çiyayên Hekaran dikir, rastiya şer jî hîn bêtir li ber me xuyadibû. Herçend rê tengtir, însan û gund kêmtir, dar û dahl boştir, zinar û çiya asêtir, newal û gelî kûrtir dibûn, rastiya ko me didît jî ewçend kirêttir û hovtir dibû. Gotina ko berdevkên şer û cîrcîrok û qîjqîjokên dîn û îmanê, mîna hedîsekê her dubare dikirin, îcar rast bû; kevir li ser kevir nemabû. Dar, dahl, devî, daristan şewitîbûn, pozê çiyan bi dû û dûmanê reş dikir, devê geliyan, da ko kesekî nikaribûya bireviya, bi dar û keviran hatibû tijî kirin, li serê newalan kozik hatibûn vedan. Çaxa em, bi hezar zehmetî, gihîştin bilindahiyên çiyan û kûrahiyên newal û geliyan, yanî dilê welatê Hekaran, warê bav û kalên keldanan, hingê min rastiya şer a bêzar û bêziman, bi hemû zelaliya ko şerekî dikare berpeş bike, dît. Gund hilweşiyabûn, hemû mal û xanî, tevî ka, kadîn û zexîrê, şewitîbûn, zevî, axa çandiniyê, bax û bexçeyên fêkî û sewzeyan, av, co, lîç, ger, bîr, bincan û nêrdewanên bendên avê ko keldanan ji bo avdana zevî, bax û bexçeyan lêkiribûn, kavil bûbûn, dêr şewitî, dîwarên wan hilweşiyayî û xaç û zengilên wan jihevketî bûn. Ji hemû hawîrdor bîhneke giran a şewat, dû, dûman, xwîn, xwîdan û mirinê radibû, komên mêş, pêşî, moz û gêreyan viziniyeke bêpayan dianin pê, cendekên pez, dewar, hesp û bergîran peregende, li vir, li wir, li erdê vegivizîbûn û bi bîhnê difnikên însên dişewitandin, însanên mirî, li ber deriyên malan, li hundir, li ser ban û eywanan, di nav hevşo û kadînan, bax û bexçeyan, di bin quntarên çiyan de bi derbeyên tivingê yan yên şûr ketibûn. Zarok, kal, pîr, jin, mêr her celeb însanên ko di nav xwînê de bûn, niha bûbûn para teyrên dirende ko xwediyê wan çiyayên bilind bûn û para keftar, çeqel, hirç, rûvî û gurên ko xwediyê newal, gelî, şikeft û bihurên welatê Tiyari û Aşîtayê ko navê xwe ji haş û aştiyê wergirtibû, lê niha qulipîbû qata şer, bûn. Li der û dorên me, carina, ji dûr ve, hin însanên ko ji berika tivingê û fizîna şûr xelas bûbûn, li ber çavê me diketin, lê çaxa wan em didîtin, mîna ask, simore û kêwroşkên wan çiyan, baz didan û xwe di nav zinar û daran de vedişartin.

Em gihîştibûn dilê welatê Hekaran ko niha bûbû welatê mirî û kuştiyan. Cendek, mirî û kuştiyan hîseke welê dianî pê ko ne ez ne jî kesekî din dikare bîne zimên. Bêhejmar mirî û kuştî li erdê bûn û êdî çu vegera wan nîn bû û heyatek ko jixwe di nav neçarî, bêkesî û nezaniyê de bû, bi vî terhî, bi tiving û şûrê rik û nefretê, bêyî şîn û tahziye, bêyî stran û dîlan, bêyî gor û veşartin, ji nişka ve, kuta dibû û di bin tava germ de,

mîna ava coyekê miçiqîbû. Hingê, di rewşeke wele de, ez têgihîştim ko însan li hember wê rastiya kirêt hîç ne tiştekî bû. Di kûrahiyên zinar û çiya, dar û daristanên welatê ko ji dinyayê bi dûr bû, mirinê konê xwe vedabû û bêyî çu dengî, li hawîrdor ko bi tîren tavê dikizirî, olan dida. Li wir, di nav geliyên kûr de, ji nişka ve, ez pêrgî rastiya axa xezebê ko ji sedan, heye ko ji hezaran salan û vir ve her qedera herême bû û hem min hem jî kesên beriya min hertim qal kiribûn, hatibûm. Lê belê rastî li ber min û hevriyên min, gav bi gav, her cara ko em hinekî din, di ser taht, zinar û newalên bêbinî re, bi alîkariya hespên me yên jêhatî, hîn bêtir dadiketin binê geliyan, kûrtir dibû. Agirê dûjehê bi daristanê ketibû û hişk û ter tevde şewitîbûn; serî jêbûbûn, mil, pî, ling, dest ji bedenan veqetiyabûn, çav derketibûn, bîvil, guh mîna libên tisbiyan li ser tehtan hatibûn raxistin. Dinya di nav tava germ de disincirî, lê ez, îcar dewsa xwîdanê, ji sermayê diricifîm, dinya bi ronahiya tavê diçirûsî, lê mîna ko perdeyeke reş ketibe ser çavê min ê sax jî, dinya li ber min reş bûbû.

Min ê çi bikira, ji kê, çawan malbata Apê Yaqûb bipirsiya? Bi hezaran însan ko daristana agir pêketî, dianîn pê, peregende, ketibûn û ez jî li pey dareke daristanê bûm. Heke ez biçûma û min ji kurdên misilman bipirsiya, hingê heye ko em jî bibûna darên daristanê. Herçî keldanên saxmayî bûn, ewana jî em kurd dihesibandin û berî ko em bigihên wan, ji tirsan, bazdidan û di nav zinar û taht, dar û dahlan de winda dibûn. Çi tiştekî ko me bikaribûya bikira, nîn bû, bêgav, me rûyê xwe ji rastiya şer zivirand û serê hespên xwe ber bi welatê Cizîra Botanê kir. Lê hingê gava em êdî dizivirîn, tiştekî qewimî û li pey zincîreke zinaran segekî gurêx peyda bû û bi lez û bez dirêjî me kir. Peyayê teniştа min tivinga destê xwe rast kir da ko seg li erdê bigevizîne, lê min ew da sekinandin. Segên gurix ên terbiyekirî, çu carê, bêyî şivan û bêyî pez, dirêjî însên nedikirin û li milê din, segê ko ber bi me baz dida, bi min xerîb nedihat. Çaxa seg nezîkî li me kir, min segê zahf gir, ji stûyê wî yê spî û qalind û ji tevgera wî ya xurt nasî; ew, Gurzo bû. Belê, Gurzoyê Apê Yaqûb ko di sefera me ya çêm de bi me re bû û heyata me xelas kiribû. Welê dixuya ko piştî çendîn salan, ewî disan ez nasîbûm û loma ber bi me hatibû. Tafilê ez ji hesp peya bûm û ber bi Gurzo çûm.

Gurzo, Gurzo, mîna ko ez bav û diya xwe bibînim, min bi qîrîn got.

Gurzo xwe avête ser min, dest û rûyê min alast, ez hembêz kirim. Ez nizanim ka çawan û li kû, lê ew birîndar bû, stûyê wî û hêtê wî yê rastê bi xwîneke hişkbûyî sor dikir. Heye ko ji ber pîrbûnê bûya, lê ew maxrûrî û

nêrîna sert hew li ser rûyê wî û di tevgera wî de dixuya, ewî bi hêdîka kûzekûz dikir û destê min dalast. Min ji tûrekî nan derxist û dayê, lê ew zahf birçi bû, mîna gurekî birçî ewî nan bi carekê xwar. Mîn dîsan dayê. Gurzo, min digotê û destê xwe li ser serê wî digerand, Gurzo, çi bûye, çi qewimiye, ev çi hal e? Çi bi serê we hat, çi bi serê mala Apê Yaqûb hat?

Min dil dikir ko ewî bersîva min bida, bi min re bipeyiviya, da ko min dest bi giriyê bikira û ez têra xwe bigiriyama. Lê ewî bi tenê, bi nalîn, li min dinihêrî. Paşê, çaxa ew têr bû, ew rabû ser piyan, qama boça xwe rast kir û ber bi zinarên ko ew jê hatibû, çû, lê piştî bi qasî sed, sed û pêncî gavan ew sekinî, serê xwe zivirand û li me nihêrî.

De, em bidin dû Gurzo, min ji hevriyên xwe re got û li hespê xwe siwar bûm, ewî dil heye, me bibe cîhekî.

Heta ber devê zinaran em çûn, lê ji wir û pê de, me hew dikarîbûn bi hespan biçûna. Gurzo di qelîşekên zinaran re ketibû nav bihureke teng û li wir, li hêviya me sekinîbû. Em ji hespan peya bûn û me da pey Gurzo. Bihur ko bi zinarên mîna kêrê tûj bû, ber bi jêr, ber bi geliyekî kûr dadiket. Piştî çendeke dirêj, bihur ji nişka ve xelas bû û dahleke şên dest pê kir. Niha diviya em di dahlê, di riyeke zahf zirav a fetloke re derbas bûna, kêr û xencer di destê me de, geh çavê me li der û doran, geh me çiqil, pel û şaxên dahlê jêdikir û gav bi gav ber bi jêr dibûn. Bi dû dahlê re, em pêrgî coyekê hatin û tê re bihurîn. Ez nizanim ka em çiqasî çûn, lê çaxa tav ji milê rojava hêdî hêdî, xwe li pey çiyan veşart û êdi tîna xwe winda kir, em gihîştin binê geliyekî. Di devê gelî de, li ser zinarekî, di nav darên zahf qalind ên mazû de ko bi şax, pel û çiqilên xwe hawîrdor pêçabû, dîwarekî avahiyekê ko bi dêrekê dişibiya, xuyabû. Gurzo ber bi avahiyê lezand. Çaxa em nêzîkî avahiyê bûn û ji binî ve me lê nihêrî, hingê me ferq kir ko ew hilweşiyayî bû û jê bîhna şewat û dûmanê dihat. Banê avahiyê ko bi sitûnên textîn û bi axê lêbûbû, ketibû, dîwarên avahiyê ko bi kevirên şehkirî yên reş lebûbûn, ji her milê avahiyê hilweşiyabûn. Darên mazûyê mîna kulavekî şivanan ko şivên ji serma û pûkê diparast, xwe xwarî avahiyê kiribûn û ew vedişartin. Dinya hê jî ronî bû, lê tîrêj diçûn ava û ez hê jî nizanim ka tîrêjên tavê, di nîvroyan de jî xwe digîhandin avahiyê yan na, ji ber ko dar, pel, çiqil li ser hev siwar bûbûn û hewl dabûn ko avahî veşêrin. Lê heyhat, hewl û daxwaza daran jî bêfeyde bû, ev avahî jî hatibû şewitandin. Ji milê me çu derî yan pencereyeke avahiyê nedixuya. Me diviya bida pê Gurzo û hilkişiyana jor, ser zinar. Gurzo dabû pêş me û riya zirav ko di nav daran re diçû


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

avahiyê, nîşanî me dabû. Li ser zinar ko mîna meydaneke biçûk, tehtekî fireh bû, li milê rojhilatê avahiyê deriyekî biçûk û nizm hebû. Gerçî ji wî milî êdî ne hewce bû ko însan ji derî biketa hundir, ji ber ko dîwar hilweşiyabûn, lê dîsan jî, me serê xwe xwar kir û em ji deriyê ko ji kêlekê şewitîbû, ketin hundir. Bi ketina me ya hundir, bîhneke ecêb giran ko ez bawer im, ji ritûbet, rewa, bêhawayî, xwîn û gemarê hatibû pê, hema çi bigire nefes li min çikand. Çaxa min xwe da hev û li der û dora xwe nihêrî, ji min bi tenê axînek çû û ez li cîhê xwe tewirîm erdê û li ser totikan rûniştim. Em di nav dêrekê de bûn ko hemû têkberên wê şikestibûn, lewheyên dîwaran şewitîbûn, cawên ko sitûnên dêrê rapêçabûn, sotîbûn, kitab û defter bûbûn xwelî û komir û bi tenê hin rûpelên nîvşewitî diyar dikir ko xwelî, ya rûpelan bû. Û di ser van hemû tiştan de, dêr heta dêv, tijî cendek bû. Însan, zarokên kur û keç jî tê de, li ser hev, li tenişta hev, di nav xwînê de diniviyan. Milê dawîn ê dêrê bi temamî şewitîbû û cendekên wî milî jî bi temamî sotîbûn, lê cendekên li der û dorên derî û li milê rojavayê dêrê, nesotî bûn. Gurzo ko beriya me ketibu dêrê, ji derî bi qasî deh gavan bi dûr, li dora çend cendekan sekinîbû û kûzekûz dikir.

Niha min hemû tevgerên Gurzo fahm kiribûn, min destê xwe da dîwarê hilweşiyayî û ez ji cîhê xwe rabûm, çûm nik Gurzo. Di nav cendekan de, çavê min li sê jinên ko li tenişta hevûdu, di nav xwînê de, razayî bûn, ket. Gurzo xwîna li ser rûyê jina pîr dalast. Biviya neviya, ev xanim, bermaliya Apê Yaqûb bû û herduyên ko li herdu milên wê razayî bûn jî, keçên wan. Min difnên xwe girtin û ez xwarî ser cendekan bûm da ko ji nêzîk ve jin û keçên Apê Yaqûb ko çendîn caran min ji devê Apê Yaqûb û Bedros behsa wan bihîstibû, binihêrta. Lê hingê bi min welê hat ko cendekekê xwe livand. Tafilê min bang hevriyên xwe ko li milê din ê dêrê bûn, kir. Çaxa ew jî hatin û em hersê bi hev re li cendekê hûr bûn, êdi çu şika me jê nema; keça ko li milê çepê yê diya xwe razabû, hê bi temamî can nedabû. Bi carekê min rahiştê, bi dîqet, me ew ji dêrê derxist û li ser teht dirêj kir. Her derê keçikê di nav xwînê de bû, min bi destmala xwe û xweziya me hersiyan rû û berçavên keçikê paqij kirin, dest û milên wê mist dan, koloz û pişta xwe ji xwe kirin û danîn bin serê wê û çaxa hevriyekî min daket binê gelî da ko li wir ji dar û textan paxêlekê li hev bîne da ko me keçik pê bibira û yê din jî vegeriya hundirê dêrê da ko binihêre ka kesekî din hê sax bû, ez jî li hêviya keçikê mam ko wê çavê xwe vekira.

Keçik ciwan bû û tevî ko ew li ber mirinê bû, bedewî û xweşikahiyeke

zarîf, sade û spehî li ser rûyê wê yê zer dixuya. Bejna wê dirêj, bala wê zirav, keziyên wê zer bûn. Birû û bijangên wê mîna ko bi qelemê hatibin çêkirin, welê xweşik bûn. Dev û lêvên wê lihevhatî, difnên wê biçûk bûn. Rûyê wê hinekî zirav bû û li ser rû ne êş û azar dixuya, ne jî keder û endîşe. Bi tenê ew, çavgirtî, jixweveçûyî dinivist. Destekî min li ser destê wê, destê min ê din jî li ser teyrê min ê tawis, çavê min jî mîna çavên wê girtî, rûyê min ber bi tîrejên ko êdî nedixuyan, min bi navê Yezdanê dilovanê xwediyê erd û asimanan dua dikir ko keçik ji xewa bêveger hişyar bûya û vegeriya. Ewê çavê xwe venekir, lê tiştekî din kir û heye ko Yezdanê dilovan dengê min bihîst, ewê bi hêdîka xirexir kir.

Yezdanê dilovan keçikê ji xewê vegerîne, vegerîne, min, rondik li ser çavê min, gote û destê keçikê mist da.

Ez tênedigihîştim ka ewê çi digot, lê xirexireke zirav ji gewrî û lêvên wê derdiket. Bedros navê xwehên xwe ji min û Migo re gotibû û ew di bîra min de, ko bîr û heşê dengbêjekî bû, mabû.

Sarah, min bi hêdîka, li ber guhê wê got.

Lê jê deng derneket.

Ester, îcar min dîsan, destê wê di nav destê min de, min gotê.

Hingê jê deng hat û wê serê xwe hinekî livand.

Belê, keçik Ester bû, Estera ko bi dû re bû Stêr, Stêra umrê min ê bêçare, heyata min a kambax.

**– Dawiya cildê yekem –**


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Mîr Bedirxan: 1803 (Cizîra Botan)–1868 (Şam)

Tarîxa destpêka mîrîtiya Bedirxan: 1821

Bûyera keleha Dêrgulê ya Seîd Begê: 1837, gulan

Qetliyama Nastûriyên Hekarê: 1842

Serhildana Mîr Bedirxan: 1846, Şikestina serhildanê: 1847

Sirgûna Mîr Bedirxan û binemaliya wî: 1847

Jiyana penaberî ya Mîr Bedirxan li Xaniya, Girîtê: 1847-1858

Jiyana penaberî ya Mîr Bedirxan li Şamê: 1858-1868

Melayê Cizîrî: Şaîr, nivîskarê Dîwanê, 1570-1640

Feqiyê Teyran: Şaîr, nivîskarê Şêxê Sen‘an, 1590-1660

Ehmedê Xanî: Şaîr, nivîskarê Mem û Zîn, Nûbihara Biçûkan, 1651-1707

Keso: Ksenefon, nivîskar, kumandar, nivîskarê Anabasîs, Vegera Dehhezaran 426-354, Berî Mîladê

Maro: Publius V. Maro Virgilius, Şaîr, nivîskarê Aeneis'e, 70, Berî Mîladê-19, Piştî Mîladê

Naso: Publius O. Naso Ovidius, Şaîr, nivîskarê Tristia, 43, Berî Mîladê-17, Piştî Mîladê

Mayrîg (bi ermenkî): Dê, dayik

Hayrîg (bi ermenkî): Bav

Hayr, vortî, hokîn sûrp, astvadz (bi ermenkî): Bav, kur, ruhê pîroz, Xwedayê Abadîn

Park dîroç (bi ermenkî): Hemd, şikur ji Xwedê re

Dixa (bi ermenkî): Zarok

Baron (bi ermenkî): Beg

Varjabed (bi ermenkî): Mamoste

Aşxarh (bi ermenkî): Dinya

Saragan (bi ermenkî): Ayet, îlahî, lavij

Gaxant: Noel, sersal

Medresa Sor: Ji aliyê Mîr Şerefxan ko ji bapîrên Mîr Bedirxan bû, di sala 1508-an de, li Cizîrê, hatiye avakirin.

Mem, Zîn, Bekoyê Ewan: Qehremanên destana Memê Alan û yên kitaba E. Xanî Mem û Zîn.